

# REJIMA HEQÎQET

## 1- GERDÛN, MIROV, CIVAK, JIYAN Û HEQÎQET

### A- GERDÛN

Pênaseya Gerdûn  
Çêbûna Gerdûnê û Avana Wê  
BÎG BANG (Teqîna Mezin)  
Kêliyên Gerdûnê yên Despêkê û Mezinbûyîna Wê  
Hîpotezên Girêdayî Bi Dawîbûna Gerdûnê  
Cismên Kû Di Gerdûnê De Hene  
Çêbûna Zindiyên Despêkê

### B- EGER MIROV BAŞ WERE ANALÎZKIRIN WÊ GERDÛN JÎ BAŞ BÊ FÊMKIRIN

- 1- Weke Cûre û Pêkhatiya Herî Baş a Maddeyê Mirov
- 2- Weke Cûreya Pêşketî ya Cîhana Biyolojîk Mirov
- 3- Weke Heqîqetê Hatiye çêkirin Mirovê/a Civakî
- 4- Weke Zêhniyeteke Nerm û Azad Xwezaya Mirov
- 5- Weke Heyîneke Dikare Metafizîk Pêk Bê Mirov

### C- LI SER BINGEHÊ HEQÎQETA CIVAKÎ RAST TERÎFKIRINA JIYANÊ

- a- Jiyana
- b- Jiyana Civakî

### D- DESTPÊKEKE KURT LI SER PIRSGIRÊKA RÊBAZ Û HEQÎQETÊ

### E- MANEYA DÎROKÎ YA LÊGERÎNA LI RÊBAZ Û HEQÎQETÊ

### F- XWEZAYA CIVAKÎ Û HEQÎQET

- 1- Pênasekirina Heqîqeta Civakî
  - a- Heqîqeta Civakî û Ji Destdayîna Wê
  - b- Heqîqeta Civakî û Şeweyên Xerîbketinê
- 2- Ji Aliyê Rêbazî Ve Nêzîkbûna ji Civaka Dîrokî
- 3- Yekeya Esasî ya Heqîqetê; Civaka Exlaqî û Polîtîk

## 2- MÎTOLOJÎ

## 3- OL

## 4- FELSEFE

Merheleyên Pêşveçûnê  
Hin Feylesofên Exlaq  
Hin Feylesofên Xwezayê û Piştî Wê

## 5- ZANIST

- a- Zanist Çiye?
- b- Zanist Dikeve Destê Desthilatdara

- c- Pozîtîvîzm (Zanistperestî):
- d- Di Rêya Heqîqeta Civakî de Ji Nûve Şîrovekirina Zanista Civakî

## **A- Gerdûn**

### **Pênaseya Gerdûn**

Di wateya herî giştîde ew valehiya kû hemû hebûnên zindî û nezindî cihê xwe tê de digre. Ev valehî çîye, çawa çêbûye, di hindir de çî hene hertim hatiye mereqkirin û hema bibêje beşekî pir giring yê lêkolînê sazkerîye. Heta di hindirê vê de mirovê kû parçeyekî yê gerdûneye çawa çêbû ya herî zêde tê meraqkirine û mijara serekeye kû herî zêde li ser tê fikirin û ser êşandin. Di roja me de jî xebatêzanistî li ser van babetan bi kûranî tê meşandin.

Di roja me de asta kû zanist gehîştîyê weke eleqederiya parçegokên libin atomê kuantum, girêdayî çêbûnagerdûnê ji kozmolojiye (zanista çêbûna gerdûnê). Di vê wateyê de gerdûnê, ji bo pêşketina wê pêwîstî bi kûrbûna li ser van heye. Ji ber kû mirov di navbera van herdû beşên zanistê de cih digre. Ji ber kû mirov were çareserkerin van zanistan, ji bo van zanistan jî em çareserbikin jî pêwîsteem mirov çareserbikin.

### **Çêbûna Gerdûnê û Avana Wê**

Li esmanê kû bê serî û bê dawî meyzandin de ne bi destê mirove kû mirov heyran nemîne. Bi çav dîtina hêjmarekî neyê jimartin ya stêrkan jî ji bo me têrê dike kû em bizanîn çêkera gerdûnê çiqas tevliheve. Lêbelê bi çav meyzekerina esmanan ji milyaran yek beşekê jî nade diyarkirin. Bi rastî jî gerdûn bi aqlê mirov kû bi kêşandina zoriyê nekaribe jê bikeve xwediyê meznahî tevliheviyekî wusane. Tevîgalaksiyarêya kadizan kû sistema rojê di nava xwede digre, nêzî 200 milyar galaksiyê û bê hêjmar cismên esmanî kû eşkêla ewqas mezin kû gerdûnê pêktîne, hertim mezindibe. Li gel mezinbûna gerdûnê, bi balkêşî û tevlihevbûnê jî sinorê eqlê mirov dixê zoriyê. Enerjiya kû di gerdûnê de heyî tenê ji % 10 ji heyberên kû em dikarin pênase bikin (gerektêrk, stêr, kunên reş û gazên cur be cur) pêktîne. Beşê din yê enerjiya kû ji % 90'ê dimîne, bi navê kû jêre "Heyberên reş" tê gotin. Ji heyberên nayê çavdêrkirin û pênasekerin pêktê. Rêxmê ewqas mezin û tevlihevçêbûna gerdûnê, hebûna hêjmar ya cismên esmanî li gerdûnê, mînakê mêzînek (denge) ya bê hempa dide xuyakirin. Ev hemû taybetmediyên gerdûnê kozmolojiyê (zanista gerdûnê) ji bo mirovên zana bûye beşekî herî binav û deng û beşê zanistê. Mirovên zana yê roja me û yê heta roja jiyankirine, hemû mirovên zana, gerdûn lêkolînkirine û bi taybetî di beşê teoriya kozmolojî de xebatên pir mezin kirine.

### **BÎG BANG (Teqîna Mezin)**

Li derdorê çêbûna gerdûnê de teoriyên cuda hene. Lê ya kû herî zêde giraniya wê tê qezenckirin û bingehê tê girtin teoriya Bîg Bange. Ev bîg-bang raxmê bê dawî pirsyarkirinê girêdayî berê niha bêbersive. Lê belê tiştên kû piştî teqînê hatî jiyankirin, terzekî yê xebatên zanistîyên nêzî rastiyê ronhkiriye. Li gorî vê:

Qasî kû tê zanîn berî niha 14 milyar sal teqîna enerjîyêkî bi pileyekî bê dawî kombuyî û bê dawî germ û mezin çêbûye. Mirovên zana ji vê re gotine teqîna bîg bang. Di vê pêvajoyê de tiştên kû em xiyalbikîn qet tûnebû. Tenê enerjîyêkî bê ser û ber, bê sînor kombuyî û bê sînorî dawî germ hebû. Germahî ew qas zêde bû kû enerjînedikarî were gelhev û vegere heyberan. Dema kû germahî hinekî daket parçegokên enerjîyê tîn gelhev û heyber çêdike. Divê wateyê de heyber enerjiya kombuyî çêdike. Yan jî enerjî bi heyberbûyînehêbûna xwe berdewam dike. Ev rewş di navbera enerjî û heyberan de dualîbûnekî (ikilem) diyalektîkî çêdike. Lêbelê ev diyalektîk bi şêwazekî tûneker, xilasker karnake. Berevajî dualîbûna enerjî, heyber dibine mercên hebûna hev û din. Eger enerjînebe heyber çênabe, eger heyber nebe, enerjî venagere hebûnê.

Ev dualîbûyîna diyalektîkî di hemû merheleyên xwezayê de xwe dide nîşakirin. Tunekirin ne mebdyekî xwezayîye, berevajî jî rê derketineke.

Parçegokên herî biçûk yê heyberan kû parçegokên jêre lepton û kuarkên dibin otomên tê gotinin. Ev parçeyane di navendên kombûnaenerjîyê de dijîn. Kabîliyeta tevgera van bilinde. Di vir de taybetmendiya dûwemîn ya xwezayê derdikeve pêşberî me. Dema kû heyber biçûkdibe, kêrhatin (yetenek) tevger û enerjîyê zêde dibe. Ev rewş di wateyekîtomde hêj jî nehateye daxuyakirin.

Bi teqîna bandora bîg bangê ew enerjîya kombûyî ya bê dawî li her alî belav dibe. Bi zêdebûna belavbûne, leza enerjîyê, kombûna wê û germahî ya wê kêmdibe, enerjî tê li gelhevû parçegokan çêdike. Ev parçeyên kû hatine gelhev, proton û notronên kû dendika atomê pêktînin çêdike. Em bi quralên gerdûnê yê din re rastî hev tîn: "Ji bo xuliqandina hebûnekî nû hatina gel hev, bi yekbûnpêwîste." Diyare kû heta em neyên gel hev û bi yeknebin hebûnekî nû avanabe. Çiqas kuark û lepton hebe jî, heta kû neyên li gelhev û bi yeknebin proton û notrina pêknaynin. Ji bo çêbûna protonên kû dendika atomê pêktîne çêbibe, girêdayî pêkhatina şert û mercên (kêmbûna kombûna enerjîyê) û hatina gel hev ya kuarkan ve girêdayîye.

Dema kombûna enerjîyê kêmdibe notrino û proton, li derdora elektronan dibin yek û çêbûnên nû di afirînin. Ev çêbûna nû atome. Bi hatina gel hev ya atoman ji elementên kîmyawî yên di xwezayê de pêktînin. Rewşên heta vir tîn em jêre dikarin bêjîn şoreşên fîzîkî. Êdî heyberên bingehîn yên fîzîkî pêkhatine.

Bi kêmbûna germahiyê atom bêhtir dibin yek û molekulên pêktînin. Ev hatina gel hev ya ji yek atoman zêdetir. Hê rastir bi yekbûna atomên cudane. Çêbûna molekulên, çêbûnên cuda şoreşek kîmyewî rave dike. Şoreşa kîmyewî bi yekbûna atomên cuda çêbûna molekulane.

Bi kêmbûna kombûna enerjîyê re molekul bi yekdibin û zindiyên organîk pêktînin. Ev di heman demê de parçegokên dibin hucreyê pêkanîne. Ji van re parçegokên dibin hucre de gotin jî raste. Evane çar hebin. Yanî evana Adenîn, Tînîn, Guanîn û Ctosîn'in. Di wateya kû em di zanîn de evana berê çêkera herî biçûk yên zindiyandin. Evana bi gotinekî din pirtûka zanistî ya zindiyandin yan jî hafîzeyê wanin. Her tiştê kû girêdayî zindiyandin şifreyê xwe di virdeye. Hebûna kû jêre çareserkirinên şifreyên genan tîn gotin, çareserkirina wanin. Her çiqas pêşketina zanista genetîkî çêbûye jî hê jî tîrênake.

Ev parçegokên dibin hucreyê weke çêbûna atomê, bi yekbûnê hucreyê çêdike. Êdî hucre berê bingehîn yê çêbûna zindiyane.

Enerjî ne statîk û sekiniye. Hertim bi tevgere. Tiştêkî sekinî û bê tevgertûneye. Gerdûne fîzîkî xwe di mirovde nûdike. Xwezanîn gerdûn zanîne, gerdûn zanîn xwe zanîne. Piştî teqînê ev rewş pêkhatîye.

### **Kêliyên Gerdûnê yên Despêkê û Mezinbûyîna Wê**

Di dema teqîna mezin de kû em dikarin lêkolîn bikin de çi çêbû? çawa çêbû kû bi teqînekî wusan mezin re gerdûnekî evqas xwedî çêkerêkî tevlihev (kompleks) pêkhat? evana wusan bersivên pirsanin. Ev pirsane ençe bi teoriya kozmolojî ya kû xwe dispêrin veriyan dikarin were bersivdan. Lêbelê ji ber kû di destê me de veriyan pêwîst nîne, di vegotina kêliya Bîg Bangê de teoriyên fîzîkî kêmdimîne. Ji ber kû berî wê demê çi çêbûye û hê jî destê me de delîlên takuz nîne niha herî zêde em dikarin piştî teqînê behsa 0,00001 saniyan bikin. Di dema teqînê de ew germahîya pîr mezin kû derketî, piştî teqînê 0,00001 saniyan, kuark (parçegokên dibin atomê de) ketin asta kû proton û notronan pêkbînin de, di vê xalê de H (hidrejen) a kû ji yek atomê çêbûyî û xwediyê çêkera elementa herî hesan ev element çêbû. Piştî teqînê çend deqîqan ji ber bi milyar derece ketina nîrxê germahîya elementên "doteryum", "helyum" û "lîtyum" dest bi çêbûnê dike. Piştî teqîna leza kû pêşdikeve di nîrxekî pîr hesas deye. Li gorî hesapkirinên teorîk li gorî vê mezinbûna lezê, eger ji milyaran yek zêdetir hêdî bûbûya bi bandora kişandina kûtleya mezin wê gerdûndîsan li ser xwede bi keta û tûne bibûye. Dîsan berevajiyê wê, eger pêşketina leza gerdûnê ji milyaran yek zêdetir bi leztirbaya wê parçegokên dibin atomê atom û cismên esmanî yên di gerdûnê de heyî bi awayekî çênebin û belav bibaya. Piştî demekî dirêj ya çêbûna element û atomên despêkê gerdûn dest bi pêşketin û sarbûnê kir, dema kû gerdûn tîra xwe sarbû bi bandora kişana kûtlejê, bi kombûna gazan çêbûna cismên esmanî despêkir. Ji derveyî elementên hîdrojen û helyum yên di gerdûnê de hemû elementên din piştî çêkirina stêrkan, di dendika van stêran de bi helberîna bertekan (tepkim) nukleerî çêbûne. Hatina cismên esmanî ya li gel hev û çêbûna galaksiyan çimaçêbûne hê jî tam nayê zanîn. Danasîna van girêdayî zanîna cismên esmanî kû jêre "enerjîya reş" û "kunên reş" ve ye. Weke encam bi mercên misoger yê zanista roja me kû bi awayekî zelal encamê pêvajoya gerdûnê kû niha ketiye rewşekî çêkera kompleks dernexistiye zanabûnê û ya wan jî sistema rojê 8-50 qatan mezintir re pêktîn. Hêza wan ya kişanê pîr bihêze û her tiştê kû nêzîk dibe didaqurtîne. Ji ber vê sedemê lêkolînkirin zehmete. Sînorê wan nediyare û giraniya wan nîne. Kesên kû dibêjin cihê kû gerdûn lê zirav dibe pêktîne hene. Hinek jî dibêjin; mêzîna galaksiyan pêktîne. Ev curê stêrkan kû jêre Wolf-Rayet tê gotin tenê çend milyon sal jiyandibin û di pêvajoya temenê xweyê kinde, beşek ji tebeqeya ji derve bi bayên bi hêz berdidin fezayê. Sotemeniya hidrojenê kû di navendê de heyî heta ber bi hesinbûyîne ve diçe, dema bertekên dendika disekine ji ber sedema bê mezinbûna mezin ya kişana kûtlejê Stêrk dadikevin kunekî reş pêktînin.

## Hîpotezên Girêdayî Bi Dawîbûna Gerdûnê

**1= Hîpoteza Vekirî (Firehbûn):** Di roja me de girêdayî firehbûnê teorîyên amade hene. Wekî kû di minaka ji hevdûrketina Stêrkan, firehbûna gerdûnê dide diyarkirin. Li gorî vê her kû biçe gerdûn fireh dibe di cemide, wê enerjîya xwe wunda bike û vegere hesinbûyînê, yanî bi qerise. (Stêrka Sîrîus)

**2= Hîpoteza Girtî (Di hindirê xwede qurmiçî):** Li gorî vê jî firehbûn wê bisekine, li gorî pêwîst dibe kişana kitleyê wê gerdûn bi demê re biçûkbibe û germ bibe, bi hebûna germahiya bêdawî wê gerdûn bigihije hacmê sifrê û tûne bibe.

### Cismên Kû Di Gerdûnê De Hene

**NEBULA:** Ewrekî kû ji toz û gazan pêkhatiye, tê gotin kû bi teqîna destpêkê re derketiye holê.

**GALAKSY:** Sîstema kû gerekstêrk di nav de cihê xwe digre. Di hindir de stêrk, peyger û kunên reş jî heye. Galaksî tê wateya Rêya Şîr.

**GEREKSTÊRK:** Cismên hişkin, di navendê de hêza kişanê heye. Ev hêz li gorî gerekstêrkan tê guhertin, hêza tîrêjê (şewqê) nîne. Deh gerekstêrk hene. Pluton ya herî dawîye, hêj jî gerekstêrke yan ne tê nîqaşkirin.

**KUNÊN REŞ:** Hêj jî çine nayê zanîn û lêkolîn berdewamin. Kunên reş bi daketina stêrkên kûtle ya wan jî sistema rojê 8-50 qatan mezintire re pêktên. Hêza wan ya kişanê pir bihêze û her tiştê kû nêzîk dibe didaqurtîne. Ji ber vê sedemê lêkolînkirin zehmete. Sînorê wan nedîyare û giranîya wan nine. Kesên kû dibêjin cihê kû gerdûn lê zirav dibe pêktîne hene. Hinek jî dibêjin; mêzîna galaksiyan pêktîne. Ev curê stêrkan kê jêre Wolf-Rayet tê gotin tenê çend milyon sal jiyandibin û di pêvajoya temenê xweyê kinde, beşek ji tebeqeya ji derve bi bayên bi hêz berdidin fezayê. Sotemeniya hidrojena kû di navendê de heyî heta ber bi hesinbûyînê ve diçe, dema bertekên dendika disekine ji ber sedema bê mezinbûna mezin ya kişana kitleyê Stêrk dadikevin kunekî reş pêktînin.

**STÊRK:** Şewq û germahiyê belavdikin. Weke mirov ji dayîkbûn û mirina wan heye. Sê curên wan hene. Dema kû ciwanin sor, di temenê navîn de şîn û pir di teyîsin, piştî kû bi temenbûn vedigerin sorê matbûyî. Ji mirina Stêrkan re Sûpernova tê gotin. Ev tê wateya teqîna stêrkan.

**METEOR:** Kevirên esmanîne. Parçeyên pir mezin yê kevîrên kû di fezayê de digerin. Jêre serseriyên esmanî jî tê gotin. Di valehiya fezayê de digerin.

**PEYGER:** Cismên hişk yê girêdayî gerekstêrkanin. Ya kû wan li ser lingan dihêlin hêza kişandina gerekstêrkanin.

**STÊRKÊN BI DUVIK:** Aliyekî wê bi qeşayê hatiye girtin, milêdan jî ji toz û gazan pêkhatine.

**ROJ:** Stêrkeke. Şewq û germahiyê dide. Ji cîhanê sed û deh qatan mezintire. Eşkêla wê 1.4 milyar km ye. Ji cîhanê 330 qatan girantire. Hacmê wê 200 milyon tone. Germahiya rûyê wê 6000 pileye.

**SÎSTEMA ME YA ROJÊ:** Navê galaksiya me Rêya kadizane. Di hindirê wê de bîst galaksiyên din jî hene. Bejna gruba wê galaksiyê qasî sê milyon sala tîrêjêye. Di hindirê galaksiya me de tê fikirîn kû dû sed milyar stêrk hene. Galaksiyên nêzî cîhana me, Magelana Mezin, Magelana Biçûk û Andromeda ye. Firehiya galaksiya me sed hezar sala tîrêjêye. Roj ji navendê 28000 sal tîrêjê dûre.

### Çêbûna Zindiyên Despêkê

Wekî em dizanin jiyan beriya niha 3.5 milyar sal di cîhanê de destpêkiriye. Ji dema teqîna Big Bangê û vir ve kêmbûna kombûna enerjîyê û bi guncawbûna şert û mercan re pêkhatina parçegokên dibin atomê, bi yekbûna van re şoreşa fîzîkî çêbûn; bi yekbûna van atoman re molekul, bi yekbûna van re jî çêbûna elementan şoreşa kîmyewîfade dike. Hucreya destpêkê kû çêbûyî navê wê bakteriya prokaryote. Ev bakterî di holên bi kifîk de û di hêvênê mast de tê dîtin. Yê kû bê oksîjen jiyan dikin zindiyên yek hucrene. Zindiyên yek hucre kû jêre "amîp" tê gotin berî niha 3.5 milyar sal derdikevin holê û di avê de jiyan dibin. Zindiyên pir hucreyî berî niha 1,5 milyar sal bi şiklê bê iskelet, bê qalik û ne xwediyê sistema parastinêbûn. Evana kirmik, kezv û ahtaptên despêkêbûn. Navê wan Edi ecera ne. Kevz bi tîrêjên ultraviyole tîmardibin. Karbondioksîtê distîne û oksîjenê didin. Bi vî rengî şinatî bi rêya fotosentezê oksîjene atmosferê zêde dikin. Berî 430 milyar sal jiyan ji avê derbazî bejahiyê dibe. Masî û zindiyên bi bask pêşdikevin. Berî 225-65 milyon sal xişin de derdikevin holê. Xişinde zindiyên xwînsarin. Em vana wekî mar, gimgimok, tîmsah, dînazor dikarin rêzbikin. Berî 60 milyon sal dînazor tunedibin.

Zindiyên bi memik ji berî niha 65 milyon sal pêş dikevin. Zindiyên xwînsarin. Ferxikên wan di rehma dayîkê de mezindibin, şîr dimijin. Ji 33 gruban pêktên. Prîmat ne meymunin, hinek jê di şiklê mişkandene. Dû curên prîmatan hene. Meymun û Homînidîn. Ev cûdahî nêzî 3 milyon sal berê çêdibe.

Yanî ejdadê mirovan berî niha nêzîkî 3 milyonsal derdikeve pêşberî me. Homînînd, tê wateya mirovîbûnê.

**HOMO HABÎLÎS:** Tê wateya mirovê kêrhatî yan jî desbikêr. Kapasîteya mejiyê wan 650 cm kûpe. Ji beriya niha di navbera 2,5 û 1,8 milyon sal jiyانبûyîne. Homo Habîlîs bi giştî weke mînak destpêkê ya cinsê homo tê pejirandin. Zindiyên ji curê homo ihtimala yê herî kêr nêzî curê mirovane. Bejna wan kin û çengên wan dirêjin.

**HOMO ERECTUS:** Tê wateya mirovê tîk (dîk) yan jî dikare xwe li ser lingên xwe bigrine. Berî niha nêzîkî 1.8-2 milyon sal derdikevin holê. Hacmê mêjiyê wan 900 cm kûpe. Li Asya, Avrupa û Afrîkayê de jiyانبûne, ji ber nîr hertim di rewşa koçberan de bûne. Homo Erectusan, li gel çêkirin û karanîna amêran agir jî bi karanîne. Di dema dirêj ya sarbûna û qerisînê de bi karanîna agir di berdewamkirina hebûna wande rolekîgirîng leyistiye. Bi karanîna agir û amêran di jiyana van mirovan de rê li ber gûhertinên mezin vekirîye. Bi demê re ji ber kû bi gûhertinan re nebûne yek, cihê xwe ji curkîdî re hêlane û wundabûne.

**HOMO SAPIËNS:** Tê wateya kû mirovê difikirîne. Kapasîteya mejiyê wan 1400 cm kûpe. Tevî kû hacmê mejiyê Homo Sapiensan ji yê Erectusan firehtir jî di aliyê jiyana civakî û çandî de ciwanîyekî ciddî ne xuliqandine. Homo Sapiensê di navbera xwede dibin dû beş. Curê yekem, li derdora sermaye qeşayî de jiyankirî Homo Sapiens Neandertalîn. Mirovê Neandertal berî niha nêzîkî 300 hezar sal derketine holê. BM 20 - 30 hezar salan ji ber kû bi şert û mercên nîran re ahengî çênekirin ji holê rabûne. Curê din jî, yê bêhtir nermin (ılıman) kû jêre Homo Sapiens Sapiensşn tê gotin û li Riftên Afrîkayê jiyana kirine. Dayîk û bavê mirovê roja me yê herî nêzîk kû bi zanistê tê pejirandin eve.

**HOMO SAPIËNS SAPIËNS:** Mirovê difikire û di axive yan jî tê wateya bi aqilê aqil. BM di navbera 60,000 - 20,000 sal derketiye holê û heya niha jî berdewam dike.

## **B- EGER MIROV BAŞ WERE ANALÎZKIRIN WÊ GERDÛN JÎ BAŞ BÊ FÊMKIRIN**

Em bi redkirina yê beriya Bacon û Descartes dest bi lêkolîn û lêgerîna xwe bikin. Piştî ku me dualîteyên obje-sûbje û ruh-beden red kirin, ji her aliyê ve li cih e ku mirov weke destpêk insên bixe bingeha dabaşê. Em ne behsa dinyayeke mirov di navendê de û ne jî behsa nêzîkatiyeke humanîst dikin. Em behsa rastiyên ku di mirov de gihiştine hev dikin.

- 1- Weke kevîrê bingehîn ê maddeyê atom, hem di warê hejmarê û hem jî di warê rêzbûnê de bi awayê herî dewlemend heye û gihiştîye hev.
- 2- Mirov di cîhana biyolojîk de ji heywan û nebatan hemûyan zêdetir xwedî awantajê temsîliyetê ye.
- 3- Şêweyên herî pêşketî yê jiyana civakî ava kirine.
- 4- Cîhaneke zêhnî ya gelek nerm û azad temsîl dike.
- 5- Dikare metafîzîk bijî.

Ev xislet û taybetmendiyên em behsa wan dikin; mirov dikare di zikhev de û yekpare heman demê li cem însên bibîne. Di vî warî de çavkaniyeke nedîtî ye. Bi awayekî yekpare fêhmkirina vê çavkaniyê di heman demê de fêhmkirina gerdûna pêkhatî ya tê zanîn e. Bi kêmanî xwedî wê qîmetê ye ku ji bo fêhmkirinê destpêkeke rast e.

Sînore herî dawî yê zanist gihiştîyê “kûantûm” û “Kozmos” dîtînen gelek balkêş ji me re pêşkêş dikin. Kûantûm wek pirtikên jêr atomê û pêlên fîzîkî qadên nipî nû li me vedikin. Bi vî awayî tespîtên cuda tene kirin, ji hiskirinê heta tercihên azad, di heman demê de bûyîna du tiştên cuda, ji ber xwezaya mirov, pîvana mirov nikare ti car xwe ji nediyarbûnê xilas bike. Têgihîştina maddeyên bêruh û hişk bi temamî li aliyekî din tene hîştin. Berovajî gerdûneke heta dawiyê zindî û azad derdikeve pêşberî me. Di vê nuqtayê de sirra bingehîn bi taybetî di mirov de dijî. Em behsa îdealîzmê û subjektîvîzmê nakin. Em nakevin guftûgoyên felsefî yê tene zanîn. Em serwest dibin ku li gerdûnê ev çend cihêrengî li sînore kûantûmê diqewimin.

Em dibînin, êdî ji pirtikên atomê jî wêdetir, di gerdûna pirtik-pêlan de bûyerên diqewimin, bi taybetî “zindîtî” her cureyê hebûnê pêk tîne. Em dema behsa pêderxistin û hiskirina kûantûmê dikin ev

vê rastiye destnîşan dikin. Bêguman ev çend cihêrengiya xwezayê bi mejiyekî mezin û terciheke azad dibe. Ji maddeyêke bêruh û hişk çawa ev qas nebat, çiçek, ruhber û mejiyê însan zêde dibe. Her çend tê gotin, metabolîzma ruhber ji molekulan pêk tê jî, em heta bûyerên ji molekulan, atom û pirtikên atomê, sîstema pirtik-pêlan wêdetir rave nekin, gengaz xuya nake ku em karibin cûrbecûrî û cihêrengiya xwezayê rave bikin. Bi heman awayî em dikarin kozmosê jî analîz bikin. Li ser sînorê dawî yê gerdûnê (eger hebe) bûyerên diqewimin dişibin bûyerên di kûantûmê de pêk tên. Di vir de têgihîştina gerdûneke zindî derdikeve pêşiya me. Gelo gerdûn bi xwe, nabe ku bi zêhn û maddeya xwe hebûneke zindî be? Di kozmolojiyê de ev pirsek e, her ku diçe zêdetir tê guftûgokirin.

Em dibînin, êdî ji pirtikên atomê jî wêdetir, di gerdûna pirtik-pêlan de bûyerên diqewimin, bi taybetî “zindîtî” her cureyê hebûnê pêk tîne. Em dema behsa pêderxistin û hiskirina kûantûmê dikin ev vê rastiye destnîşan dikin. Bêguman ev çend cihêrengiya xwezayê bi mejiyekî mezin û terciheke azad dibe. Ji maddeyêke bêruh û hişk çawa ev qas nebat, çiçek, ruhber û mejiyê însan zêde dibe. Her çend tê gotin, metabolîzma ruhber ji molekulan pêk tê jî, em heta bûyerên ji molekulan, atom û pirtikên atomê, sîstema pirtik-pêlan wêdetir rave nekin, gengaz xuya nake ku em karibin cûrbecûrî û cihêrengiya xwezayê rave bikin. Bi heman awayî em dikarin kozmosê jî analîz bikin. Li ser sînorê dawî yê gerdûnê (eger hebe) bûyerên diqewimin dişibin bûyerên di kûantûmê de pêk tên. Di vir de têgihîştina gerdûneke zindî derdikeve pêşiya me. Gelo gerdûn bi xwe, nabe ku bi zêhn û maddeya xwe hebûneke zindî be? Di kozmolojiyê de ev pirsek e, her ku diçe zêdetir tê guftûgokirin.

Ji bo mirovê di navbera kûantûm û kozmosê de radiweste em dibêjin “mîkro kozmos”. Axir tu dixwazî her du gerdûnan; kûantûm û kozmosê fêhm bikî, li mirov serwest bibe û ji hev derbixe! Ya rastî mirov navika hemû pêhesîna ye. Çiqas agahî û zanebûnên me hene berhemên mirov in. Ji kaûntûmê heta kozmosê di hemû qadan de agahiyên me mirov pêş de birine. Ya divê em lêbikolin pêvajoya pêhesîna mirov e. Ev bi maneyek din, dîroka tekamul û beridandina gerdûna me ya 20 mîlyar salî ye ku temenê wê bi qasî hatiye pîvan. Bi rastî mirov kozmosekî mîkro ye. Ji ber ku di wî de sîstema kûantûmê dimeşe. Em ji pirtikên jêr atomê û pêlan heta molekulên DNA yê pêşketî, beridandina dîroka maddeyê dibînin. Her wiha ji qonaxa herî jêr a nebat û heywanan heta qonaxa pêşketina mirov, hemû pêvajoyên pêşketinê dîrokî mumkîne werin dîtîn. Bi awayekî ilmî baş hatiye dîtîn ku genê mirov di hemû qonaxên biyolojîk de xwe dubare dike û mezin dibe. Qonaxên pişt re bi civak û beridandinê temam dibe. Bi beridandina civakê re jî zanistê digihîne qonaxa îro. Lewra hukmekî ilmê ye, ku dibêje; mirov xulase û kurtasiyêke gerdûnê ye.

Eger em şîroveya xwe ya li ser mirov berfireh bikin, em dikarin îdeaya hin faraziye û hîpotezan bikin. Eger di hemû materyalên mirov pêk anîne de zindîtî, pêhesîn û taybetiyên azadiyê nebûna, wek encama van hemû taybetiyan însan jî wê li cem pêhesîn, zindîtî û azadiyê pêş neketa. Ji tiştêkî neyî, tiştêkî nû dernakeve. Ev têgihîştina me ya maddeyên bêcan pûç dike. Bêguman organîzasyonêk mîna cureyê însan û civak nebe, hebûnek xwedî agahî pêş nakeve. Lê belê di vê organîzasyon û civakê de materyalên rol dilîzin, xwedî taybetiyên agahî, pêhesîn, watedarî û azadiyê nebin, agahî û zanebûnê jî nikaribin pêk werin û ev dabeşeke tê fêmkirin. Di cewherê xwe de eger tiştêk nebe, çima were afirandin? Li gorî vê nirxandinê, ne bi bandorên sivik ên ji xwezaya der ve û ne jî mirov bi awayekî Descarteswarî dibe xwedî agahî, van herdu şîroveyan jî piştrast nake. Fikir û dîtina nêzî rastiye ew e, ku taybetiyên di gerdûna kûantûm û kozmosê de diqewimin di mirov de jî têne jiyîn. Bêguman ev gerdûn di çarçoveya rêzik û pîvanên xwe yê xweser de dimeşe. Gerdûn di mirov de têne ziman. Encama ji vê tê derxistin ew e ku eger mirov baş were analîzkirin wê gerdûn jî baş bê fêmkirin.

### **1- Weke Cûre û Pêkhatiya Herî Baş a Maddeyê Mirov**

Pêşî, weke kevîrên atom jê pêkhatî têkiliyên zindî yê di navbera atoman û nava atomê de herî baş di mirov de têne teşxîskirin. Bi awayekî din, mumkîn e, mirov weke maddeyêke rêzbûyî ya difikire were tesewirkirin. Bêguman, bi vê tesewirê em mirov bi tevahî ji maddeyê pêkhatî nahesibînin û maddeyê jî ji hisa zindîtîyê bêpar nabînin. Madde li gorî xwe xwedî hisa zindîtîyê ye, mirov jî ji kombûna vê maddeyê wêdetir xwedî maneyekê ye. Bêguman bi vî awayî manedayîn hewldaneke dijwar e. Divê mirov di vê têgihîştinê de li çavkaniya metafîzîkê bigere. Ji bo têgihîştinê em bi şêwazekî nerm û qayîşokî yê bê sînor diponijîn, heye ku ev yek ji dualîteya madde-maneyê bibuhure. Belkî jî armanca her tiştê zindî û ne zindî bihurandina ji vê dualîteyê be. Armanca maddeyê ew e ku bi mane bibe, armanca maneyê jî ew e ku ji maddeyê bibuhure. Heye ku hilma herî mirî ya eşqê mirov di vê dualîteyê de bibîne. Belkî jî dualîteya ‘dehfdan-kişandin’ bi xwe veguherîbe madde-maneyê. Wexta tê gotin di bingeha gerdûnê de eşq heye belkî jî mebest jê ev dualîte be. Mîna ku ev eşq di mirov de li ser hîmê herî bi hêz rûniştî be.

Eger mirov dualîteya perçik-enerjiyê weke hîmê bingehîn ê gerdûnê bifikire, bêyî ku xwe paşve bidim ez enerjiyê weke azadî destnîşan dikim. Ez bawer dikim ku perçika maddî jî pakêtoka enerjiyê ya di rewşa mehkûm de ye. Enerjî maddeyê rastî nîne; bi gotineke din ruhê maddeyê ye.

Li gorî min lêkolîna maddeya di mirov de rêbaza herî nêzî rastiye ye. Wer xuya ye; li laboratûwarên modernîteyê yên bi awayekî dijwar hatine îzolekirin, mumkîn nîne mirov xwe li ser maddeyê bigihîne şîroveyê nêzî rastiye. Jixwe di fizîka kuantûm de tîkiliya di navbera 'ya çav li ser' û 'çavdêr' de qet rê nade pîvanê. Çavdêr dikare maddeyê biguherîne, ya çav li ser jî di şert û mercên laboratûwarê de dikare xwe ji çavdêr vedize, rizgar bike. Wê wextê fêhmkirineke rast tenê bi çavdêrî û çavê hundirîn mumkîn dibe. Jixwe ji mirov çêtir laboratûwar nabe. Bi vê rêbazê Demokrîtos karîbû atomê keşif bike û rêbaza rast jî pirr ji meş ve destnîşankiribû. Em nabêjin laboratûwar bê kêr e, em dibêjin; cihên prensîbên bingehîn di çavdêriya hundirîn û xweguhdarîkirinê de ye.

Em dikarin prensîba xwe hînê zêdetir xurt bikin. Bi tevahî qanûnên fizîk û kîmyayê mumkîn e, di mirov de nêzî bêqisûrê bê dîtin. Ti laboratûwara kîmya û fizîkê bi qasî di ya mirov de xwedî tevneke bi kapasîte nîne. Agahiyên fizîk û kîmyayê yên herî zêde nêzî rastiye mirov dikare xwe di însên de bigihîne. Maneçêkirina ji tîkiliya madde-enerjiyê dîsa bi şeweyê dewlemend di mirov de heye. Ew derfet heye mirov xwe di mejiyê însên de bigihîne yekîtiya madde-enerjî-fîkrê. Gelo ev yekîtiya di mirov de taybetiyeke gerdûnê ye? Têspîta me dikare me ber bi pirseke wisa mezin ve bibe.

Tê fêhmkirin ku di esasgirtina mirov de prensîba me ya yekemîn heta dawiyê xwedî potansiyela tîgihîştinê ye. Ji lewra em dikarin weke prensîbeke rejîmê ya tekûz ji bo rêyêke bi esas a agahîgirtinê û çawatiya heqîqetê bifikirin.

## 2- Weke Cûreya Pêşketî ya Cîhana Biyolojîk Mirov

Em dikarin dualîteyên zindî û nezindî bi mînakên dewlemend di mirov de bibînin. Di nav zindîtiyên darî çav de ya mirov xwediyê taybetiyên herî pêşketî ye. Pêşketina zindîtiyê di mirov de derketiye asta herî jor. Bi vê re beşê maddeyê jî bi pêşketina zindîtiyê di zikhev de û pêre gihiştîye asteke pêşketî. Bi serûberiya di maddeya mejî de û pêşketina di zindîtiya wî de hînê jî tijî sirr e. Zanist der barê mejî de xwedî agahiyên gelekî bi sînor in. Di mejî de tîkiliyên di navbera qabîliyeta maddeyê ya nîzamî û zindîtiya qabîliyeta fikra mucered de bi dest xistiye, hînê jî weke pîrsgirêkeke mezin a keşfê li pêşiya me radiwest e. Em wexta behsa dewlemendiya mînakan dikin em behsa vî organê muhtesem dikin. Her weha di serî de dil, organên din ên bedenê bi serê xwe mûcîze ne. Ez hema yekser vê bibêjim; organên mirov ew çend kompleks in, nabe ku mirov ji lêkolînên tîbbî re bihêle. Bi yekîtiya tevahiya zanistan hêja ye, lêkolînên hînê baştir bêne kirin. Dualîteya ruh-beden a mirov di qada psîkolojî û tîbbê de hiştin cehaleteke mezin e, û heta bi qasî qetlê gunehêkî mezin e.

Di mînaka mirov de çavdêriya em li ser tîkiliya zindî-nezindî bikin, divê mijarê bi hinek feraziyan rave bikin. Beriya her tiştî divê em qabîliyeta zindîtiyê weke potansiyelê di maddeyê de qebûl bikin. Eger ev qabiliyet nebûya, tevna maddî ya di mirov de wê bi zindîtiya fikir û his a ku jê gelekî pêşketîtir e, nikarîbûya hevalbendiye bike. Eger wisa be, em çawa dikarin bi tîgihîştîneke xurttir di maddeyê de xwe bigihînin potansiyela zindîtiyê? Bersiva yekemîn, divê dualîteya 'dehfdan-kişandin' li serê tîgîna zindîtiya potansiyelê danîn. Ev prensîba xweser a di gerdûnê de tê dîtin, dibe ku manedar be, mirov wê weke potansiyela zindîtiyê şîrove bike. Ya duyemîn jî bi vê prensîbê ve girêdayî karektera pêlê ya bi perçikan ve em dikarin nîşan bidin. Em dikarin li vê dualîte û prensîba di gerdûnê de hebûn-valatiyê zêde bikin. Mirov nikare li hebûneke bê valatî, valatiyeke bê hebûn bifikire. Eger em zorê bidin sînorên fikra xwe, ya rastî wexta mirov ji dualîteya hebûn-valatiyê bibuhure wê herdu jî ji holê rabin. Em dikarin çî navî li pêkhatina nû bikin? Ha ev jî pîrsa duyemîn a mezin e. Hinek weke hînbûne dikarin yekser bersiv bidin û bibêjin; 'xwedê' ye. Lê eger em di vê mijarê de nelezînin dibe ku em bigihîjin fikrên manedartir. Belkî jî em ê karibin bigihîjin maneya sirra jiyane û bersiva wê.

Weke tê zanîn ji bo dehfdan û kişandinê karekterê pêlê yê perçik hewce dike. Karektera perçik a di her teyisandina pêlekê de heye, sedema hejmara leza di saniyê de 300.000 km ye. Jixwe tîgihîştina 'kunên reş' yên rohnîyê dadîqurtûnîn jî rewşa esrarengîn zêdetir giran dikin. Piştî ku hêza lezê ya tîrêjê hat daqurtandin rastiya mirov bigihîjîyê çî ye? Yek ji pîrsên zor jî ev e. Eger em ji kunên reş re giravên enerjiya xam bibêjin, em ê ji enerjiya dîteyise re çî bibêjin? Gelo gerdûn ji kuneke reş a ji dualîteya madde-kun pêk tê? Gelo di vê rewşê de madde ew e ku ya ne madde ye xwe nîşan dide û dike bê dîtin? Eger wisa be, gelo em nikarin vê gerdûna xwe dide dîtin, weke zindiyêke mezin bibînin? Gelo di jiyane de dualîte hemû vê dualîteya gerdûnê bi bîr dixînin? Mînak hezkirin-nefret, qencî-xirabî, xweşikî-krêtî, rast-çewt dibe ku ev xwe nîşandana vê gerdûnê bin? Mirov dikare pîrsan bêserûbin bike. Lê eger em bi pîrsên zanista em pêre dilebikin û nas dikin mijûl bibin, dibe ku hînê zêdetir me hîn bikin û bi kêr bîn.

Bi delîlan piştrast bûye madde enerjîya şîdiyayî ya ketiye serhev e. Hevkêşeya navdar a Einstein tê zanîn. Tê gotin di navbera mirovê mirî û mirovê zindî de ferqa giraniya enerjîyê ya 18 gram heye. Gelo di rewşeke welê de zindîtî dibe sîstemeke taybet a herikîna enerjîyê? Wexta ev enerjî derdikeve û vala dibe, gelo hebûna xwe diparêze? Hingî gelo ruhparêziya di baweriya anîmîzmê de nayê piştrastkirin yan jî qet nebe nayê wê maneyê ku divê ev bawerî li ber çavan were girtin? Gelo ma nabe ku mirov têgihiştina dibêje; 'gerdûn tijî ruh in' yan jî peyva Hegel a 'mejiyê gerdûnê' (Geist) weke 'enerjî ruhê maddeyê yê zindîtîyê ye' binirxîne û weke têgihiştin, hiskirin û şîroveyeke ciddî li ber çav bigire?

Em dikarin pirsên bi vî rengî hînê zêdetir bikin. Ya girîng ew e, em ê têkiliya zindî û nezindîtîyê, ne bi dogmatîzma metafîzîk a serdema navîn şîrove bikin, ne jî bi cihêkirina obje-sûbje, ruh-beden a modernîteya kapîtalîst nêzî heqîqetê bibin. Ne prensîba hêza afirîner a ji derve can dide, ne jî dualîteya madde-ruh a ji mêj ve di gerdûnê de heye dikarin têgihiştina me ya dewlemend a jiyane rave bikin. Pirsên me kirin û mînakên me dan, nîşan didin û rave dikin ka em çiqasî li ser dewlemendiya di mirov de bîpînjîn, em ê hêza xwe ya çavdêrî û lêkolînê xurt bikin, zindî û zindîtî jî di navê de şensa me wê hebe em bûyeran hemûyan (bûyerên mucîzewî jî di navê de) fêhm bikin.

Divê mirov bawer bike ku di gerdûnê de prensîbeke edalet û dadê heye. Ti pêkhatin bêyî şertên xwe û ravekirina xwe dernakeve holê. Xweza, di pêkanîn û çêkirinê de ji dîtina me wêdetir bi edalet e. Ji qabîliyetên me yê çavdêriyê yê şaşkirî û berevajîkirî divê mirov civaka şaristaniyê berpirsiyar bibîne, belkî bi vê tespîtê şîroveya me li cih be. Çêbûna mirov jî pêşketineke adil e ku pêk hatiye. Mirov dikare bibêje; bi tevahî nîzama gerdûnê, cîhana biyolojîk û pêkhatinê civakî di xizmeta hebûna mirov de ne. Ma ji vê mezintir edalet dibe? Eger dewlet û hiyarkerşîya mezin a di civakê de ev rastî berevajîkiribin û ser van rastiyan girtibin, divê mirov weke berpirsiyarê vê jî dîsa van hêzên mirov ên berevajîkar bibîne. Hingî jî mirovên li pey edaletê diçin wê bi xwe wezîfedar bin. Ji bo edaletê yê/ya her cure mane û çalakiyê bike dîsa mirov e. Bêguman mirovên bibêjin 'ez li edaletê digirim' ew kes in ku divê daxwazkar bin, pêdiviyên bi awayekî manedar, çalak, rêxistinîkirî û bi dewamî bi cih bînin.

Di cîhana biyolojîk de nirxandina pirr texlîdî û qonaxên beridandinê di nav perspektîfa me ya sereke de mumkîn xuya dike û hêsan dibe. Mirov bi saya derbasbûyîna di navbera molekulên zindî û nezindî de, dikare fêhm bike ka çawa nebat ber bi heywanbûnê ve beridîne. Zanist di van mijaran de têra xwe pêşde çûye. Tevî kêmasiyan û pirsên bêbersiv mane, em gihîştine dewlemendiyeke mezin a maneyê. Gerdûna nebatan bi serê xwe mucîzeyek e. Ji kevzeke seretayî ber bi dareke mêweyan a nedîtî, ji mêrgan ber bi gulên bi stirî beridîn hêza qabîliyeta zindîtîyê nîşan dide. Jixwe delalbûna gulê û di asta xweşikbûna wê de bi stiriyan xweparastina wê, ji kesê herî korfêhm re jî dikare hinek tiştan bibêje. Aliyê herî balkêş ê beridandinê ew e ku qonaxa paşî qonaxa pêşî di xwe de dihevine û weke parçe û endamekî dewlemendiyeke diparêze. Nebata herî dawî û paşî wekî ku xulaseya tevahiya nebatan be, bi rola 'dayikê' radibe û hebûna xwe dewam dike. Weke ku tê zenkirin, di beridandinê de (Dogmatîzma Darwînîzmê) zindî hevdu tine nakin, dewlemend dikin, zêde dikin û hebûna xwe dewam dikin. Ji texlîdekî gelek texlîd, ji kevza seretayî ber bi cûrbecûriyeke bêserûbinî pêşketinek heye. Divê mirov pirrtexlîdî û cûrbecûriyê weke ziman û jiyana nebatan fêhm bike. Ew jî xwedî malbat, xizm û heta carinan xwedî dijmin in. Ji lewra her texlîd û cins weke prensîb xwedî pergaleke parastinê ye. Hema bêjin; ti hebûn ji parastinê bêpar nîne.

Taybetmendiyeke din a ku divê mirov çavdêrî wê be jî zêdebûna bi cins û bê cins e. Zêdebûna bê cins yek ji şewazên zêde kevin ê zêdebûnê îfade dike, zêdebûna bi cins jî bi cotbûnê zêdebûna texlîda cinsên cihewaz îfade dike. Nêrtî û mêtiya di yek endamê komekê de ji qonaxên derbasbûnê heta îro mane. Ji bo pirrbûn û cihewazbûna texlîdan divê cinsiyet di komên cihê de temsîla xwe bibînin. Mêti û nêrtî bi komên cihê ji hev nebin, nikarin xwe bigihînin cûrbecûriyê. Li vir em harîqayeke xwezayê re rûbirû ne. Zewacên xizman weke dewama vê nêrtî û mêtiya di komê de cih digirin. Di cotbûna van zewacan de em pirrî caran dibînin cins xwe li hev radikişînin, texlîdên bi felç derdikevin holê û ev yek jî weke encameke vê beridandin û tekamulê ye. Cihêbûna cins weke nêr û mê, di tevahiya gerdûnê de weke pîvaneke pêşketinê li ser hîmê nakokiyê erênî, bi cihêbûnê (em jêre dikarin bibêjin diyalektîka pozîtîf jî) pêşketina xwe dewam dike. Pirr êşkere ye ku israra 'weke xwe mayîne' înkara pêşketinê ye. Baş tê fêhmkirin ku her gera li heqîqetê ya mutleq (fikra metafîzîk) ku bi prensîba 'her weke xwe ye' radibe, jê nayê gerdûnê şîrove bike.

Li gerdûnê dualîteya di her zerreyê de çawa ku di ti hebûnê de weke sedema pirsgirêkê nayê dîtin, dualîteya di hebûna mirov de jî nabe ku weke pirsgirêk were bi karanîn. "Gelo hebûn çima dualî ye?" bersiva em bidin vê pirsê divê felsefî be. Analîza ontolojîk (zanista hebûnê) dikare li bersiva vê pirsê (pirsgirêk ne) bigere. Bersiva min ev e: hebûn ji bilî dualîteyê nikare hebûna xwe pêk bîne. Dualîte, şewazê mumkînbûna hebûnê ye. Jin û mêr bi rewşa xwe ya heyî nebin jî ango ne hev-alî bin jî dîsa



nikarin ji dualîteyê xwe xilas bikin. Bûyera jêre ducinsî jî tê gotin ev e. Divê mirov matmayî nemîne. Lê dualîte her tim ji bo pêkhatina cuda meyldar in. Bingehê mirov dikare ji bo mejiyê gerdûnî (Geist) li delîl bigere jî di vê meyla dualîteyê de dikare bigere. Yek ji aliyên dualîteyê ne xirab ne jî baş e, bi tenê divê cuda be. Eger dualîte bibin wekhev wê wextê hebûn pêk nayê. Mînak du jin an jî du mêr nikarin pirsgrêka zêdebûnê ya hebûna civakî çareser bikin. Ji lewra bersiva pirsê “Çima jin an jî mêr?” qîmeta xwe nîne yan jî eger divê bersiva vê pirsê bê dayîn wê wextê divê bersiveke felsefî bê dayîn û bê gotin, ji ber ku gerdûn divê (neçar e, di wê meylê de ye, bi wî aqlî radibe, bi wê xwestekê) welê pêk bê.

Pirsgrêkeke din a divê em balê bikişînin ser jî ew e, ka çima gerdûn dixwaze pêş bikeve? Bi awayekî rasttir, gelo taybetiya pêşketinê ya gerdûnê bi xwe delîlê zindîtiya wê nîne? Tiştêkî qabiliyeta xwe ya zindîtiyê tinebe, ma dikare pêş bikeve? Cîhana biyolojîk bersivdana vê pirsê hêsan dike. Ji bo pêşketina biyolojîk pirsêke din a girîng der barê îstîsnabûna ‘dinya’ me de ye. Bi qasî ku em dizanin û haya me jê heye, tê gotin, di gerdûnê de stêrkeke zindîtî lê hebe, nehatiye dîtî. Ev nêzîkatî bi xwe gelekî bi pirs e. Berê pêşî divê em bi bîr bixin ku ji bo tespîtkirina tevahiya stêrkan, kapasîteya mirov gelekî bi sînor e. Pêşî (kelmêş) çiqasî karibe dinyayê şîrove bike, mirov jî gerdûnê ewqasî dikare (belkî) şîrove bike. Gotina ‘mirov dikare her tiştî zanibe’ îdîayeke fikra metafizîkê ya ji wesweseya wê ye. Ev, helwestek e, dişibe afirandina xwedê.

Ji bo mirov pêkhatina di gerdûnê de qewimiye rave bike, bi hejmaran anîna wê ya ziman û di nava hejmaran de fetisandina wê zêde bi kêr nayê û wê rave nake. Jixwe ji bo serwextbûna li hikmetên dinyayê, hîne em li destpêkê ne. Ji niha ve diyar jî nîne serwextbûn û têgihîştin ê me rastî çî bîne. Pirrî caran tê gotin ‘Her zindiyek gerdûnek xwe heye’ pêwîst e, mirov vê têgihîştinê piştguh neke. Dîsa mirov pêre gerdûnê din jî bifikire, dibe ku hin aliyên din rave bike. Eger em mînakeke weha bidin, em ê baştir karibin qala mebesta xwe bikin: di bedena mirov de her şaneyê zindî li gorî xwe hebûnek e, û heta di şaneyên mejî de fikir çêdibe. Ma hucre û şaneyên bi vê xisletê dikarin bibêjin, bi qasî ku em difikirin, gerdûn heye? Li aliyekî din, ev şane haya wan ji mirov û gerdûna mezin a li dewrûbera mirov nîne. Lê ev rewşa em behsa wê dikin, hebûna mirov û gerdûnê mîkro-makro ji holê ranake. Gelo nabe ku em mirov jî weke şaneyekê di vê gerdûna makro de qebûl bikin? Eger em bi hêsayî wêribin vê bikin, em dikarin ji aliyê cuda ve hukim li hebûna gerdûnan bikin. Mebesta me ji gerdûnê bi hev re ew e; eger her gerdûn girêdayî qonaxekê (sefheyekê) û pîvana pêlekê be, eger wisa tê şîrovekirin, hingî mumkîn e ku bi qasî neyê jimartin gerdûn hebin. Sîstema pêlê ya mirov jî zaye bi tenê yek ji van qonaxan e.

Bi van vegotinan mebesta me spekulasyon nînin. Em dixwazin ji fikra teng xwe xilas bikin. Em dixwazin ji xefîka berevajîkirina bawerî û zanîne ya nîzama dewletê û hiyarkerşiyê rizgar bibin. Pirraniya nexweşiyên rêbazê berhemên wan in. Dîsa van mekanîzmayên dewlet û hiyarkerşiyê ku weke mekîneya derewan û çeloxwarîkirinê dixebitin, gelek fikrên rast jî tine kirine.

Cîhana heywanan bi serê xwe sîstemek e. Di destpêkê de cinsê ku şaneyê hevbeş a heywan û nebatan temsîl dike, derketiye holê. Jixwe bi çavdêriyê baldarî wê bê dîtî ku bêyî cîhana nebatan wê derbasbûna cîhana heywanan nebe. Jiyana nebatî şertê pêş ê jiyana heywanan e. Ya girîngtir jî hebûneke pêşketî ya nebatan şertê hebûneke pêşketî ya heywanan e. Zindîtiya potansiyel di cîhana heywanan de rê vedike li hisên pêşketî yên weke dîtî, bihîstin, êş, xwestek, hêrs û hezkirinê. Ji ber ku timî li pey xwarinê baz dide, hewce dike ku mirov birçîbûnê jî nêz ve hûrûkûr lêbikole. Bi hêsayî mirov dikare têtîkîliya bêparbûna ji enerjîyê bi birçîbûnê re deyne. Careke din têtîkîliya di navbera zindîtî û enerjîyê de derdikeve pêşiya me. Bi dawîhatina li birçîbûnê re ya ku diqewime ew e; enerjîya hewcedarî pê heye rezerv bûye û hatiye hilgirtin.

Pêdiviya bi têtîkîliya cinsî jî hewce ye, ji nêz ve were lêkolîn. Ev pêdiviya xwe dijwar û bi arezû dide hiskirin, fonksiyonek e, dewamkirina jiyânê îfade dike. Zêdebûn û kombûna enerjîyê di pêkhatina têtîkîliya cinsî de dîsa têtîkîliya wê ya bi jiyânê re têne bîra mirovan. Lê divê mirov têtîkîliyên cinsî weke yekane sedema bi tenê ya ji bo dewamkirina jiyânê nefikire. Belkî jî yek ji rastiya pêşneketî ya ji bo dewamkirina jiyânê rêya bi têtîkîliya cinsî ye. Bi vê riyê, mirov tenê li gorî hejmarê jiyana xwe dewam dike.

Curbicurî û beridandin di jiyânê de rê li ber dewlemendiyê vedikin. Wekî din, têtîkîliya cinsî ne tenê xwesteka jiyânê û dewamkirina wê ye, tîrsa ji mirinê, ya rastî mirinê bi xwe di nava xwe de hildigire. Her têtîkîliya cinsî hinekî jî mirin e. Hin heywan hene piştî têtîkîliya cinsî yekser dimirin. Wê wextê mirov dikare bibêje; zêde girêdana bi têtîkîliya cinsî ve pêkhatina mirinê û rewşa jiyânê ya herî paşketî bi bîr dixê. Bi tenê mirov bikeve ber destê têtîkîliya cinsî, ev rêya mirinê xurt dike. Têtîkîliya cinsî çendîn wergere hisên hezkirin û xweşikbûnê, çendîn bê jiyân, ew çend mirov nêzî bê miriniyê dibe. Di berhemên hunerî de hisa bê miriniyê encama vê yekê ye. Zêdebûna bi rêya cinsî, em dikarin weke

şêwazekî parastinê şîrove bikin. Tu çendîn zêde bibî, tu dikarî his bikî ku tu heyî, tu yê dewam bikî û xwe biparêzî.

Çewtiyeke gelekî mezin e ku mirov zewqa di çalakiya cinsî de weke 'eşqê' bi nav bike. Berevajî, zewqa girêdayî têkiliya cinsî înkara eşqê ye. Modernîteya kapîtalîst seksualîte weke kansêrekê mezin kiriye û ev yek jî bi navê eşqê kuştina civakê ye. Eşqa rastî, ew heyecan e, ji zimanê pêkhatina gerdûnê tê hiskirin. Gotina mewlana ya dibêje; **'Di vê alemê de çi heye eşq e, jê pêve tev qal û qîl e'** dibe ku bibe şîroveyeke heqîqî ya eşqê. Kengî mirov karîbû ji zewqa têkiliya cinsî bihurî wê karibe behsa eşqê bike, ya rastî girêdayî dualî pêşketina asta azadiyê ya di exlaqê mirov de ye. Di warê maddî de, têkiliya şehweta cinsî bi bêtevgerî û jidestdana azadiyê re heye. Ya rast ew e ku ne tenê têkiliya di navbera jin û mêr de eşqa di navbera hêmanên tevahiya gerdûnê de divê mirov bi ahenga pêkhatinê ya eşqê ve girê bide.

Pêşketina his û hestan bi serê xwe mûcîze ye. Mînak divê em dîtîne çawa şîrove bikin? Ji sedî sed diyar e ku dîtîna yek ji hêmanê herî pêşketî yê zindîtiyê ye. Dîsa eşkere ye ku bêyî rohnîyê mirov nikare bibîne. Dîtîna şêwazekî fikrê ye. Di serî de seksualîte, girîng e ku mirov bi tevahî taybetmendiyên zindîtiyê weke awayekî fikrê bibîne. Zindîtî bi xwe qabîliyetêke têgihîştin û hînbûnê ye. Di vê çarçoveyê de gotina Descartes a 'Ez difikirim, wê wextê ez heme' li cih e. Eger em hîne bi giştî bînin ziman: em dikarin bibêjin, tevgera gerdûnê ya bi pîvan û rêzikan, hînbûn e. Lê dîsa jî hînbûna bi çavan pêşketineke muhtesem e. Ev gotin tene fêhmkirin: 'Xwedê ji bo xwe bibîne gerdûn afirand.' Hukmê Hegel ê ji bo hay ji xwe hebûnê 'Geist' dibe madde têkildarî dîtîne ye. Dibe ku dîtîna yek ji armancên pêkhatinê be.

Zewq û hisên êşê xwe weke zindîtiya havyan didin hiskirin. Herdu his jî hayjêbûna ji jiyane bi bîr dixînin. Herçiqas bi zewq bibe ewqasî haya xwe ji jiyane dibe, jiyane qebûl dike; dîsa çiqasî êşê bikişîne ewçend haya xwe ji jiyane dibe, lê derdê jiyane nayê kişandin û dewamkirin. Herdu jî ji bo hînbûnê du dibistanên baş in. Zewq û êş ji bo hînbûnê gelekî giranbuha ne. Zewq mirov baş hîn dike, lê dikare rê li ber her dîntîyê veke. Dîsa êş mirov baş hîn dike, ji lewra jî pirr bi hêz dike ku mirov qedir û qîmetê bide jiyane. Dawiya zewqê nêzî êşkişandinê ye, lê di dawiya êşê de şensê jiyaneke bi zewq gelekî zêde ye. Jiyane ji bo cihêtiyên di navbera xwe de nîşan bidin, xwe pirr bi zewq û bi pirr êşkişandinê hîn dikin û datînin holê.

Ji ber ku têkiliya di navbera jiyane û mirinê de têra xwe xwedî karekterêke metafizîk e, ya rast ew e ku mirov vê yekê di mijara civaka insên de bigire dest û li ser raweste. Di dabaşa heywanan de yek ji xusûsên divê mirov li ser raweste mijara goştixwarinê ye. Cîhana heywanan bi tevahî xwe bi nebatan xwedî dike û wisa jiyane xwe dewam dike. Goştixwarin hewcedarî û pêdiviyêke nebatanê nîne. Lê komeke mezin a goştixwaran heye. Divê em van çawa rave bikin? Pirr zêdebûn gefan li jiyane dixwe û ev xusûs dikare bibe hêmanek ji bo em mijarê ji hev derxînin. Bi têkiliya cinsî zêdebûn rêyeke dewama cinsan misoger dike, lê wexta ev zêdebûn sînore xwe derbas bike, dikare derfet û îmkanên jiyane tine bike. Mînak bi lez zêdebûna mişkan dikare nebatan tine bike. Heywanên mîna pez û dewaran jî dikarin qira nebatan bînin. Her weha di cîhana çivîkan de zêdebûneke bê tewazun heye. Di rewşeke welê de jî mar, şêr û baz li ser kar in, ev jî bi armanca tinekirinê nîne, ji bo cîhana heywanan hebûna xwe dewam bike weke mecbûriyetekê derdikeve holê. Heye ku bi tehlûke be, mirov vê dabeşbûna rolan a di xwezayê de bê edaletî bibîne. Lê di vir de wezneke nazik heye. Kengî ev wezin hat xirakirin û naverast tijî mar, şêr û baz bibin, hingî li dawiyê wê kêma heywan bimînin. Xwe bi serûberkirina sîstemên xwezayî tiştêkî gelekî balkêş e.

Em ê li ser zêdebûna bi têkiliya cinsî, girîngiya bi serûberkirina wê di civaka mirov de, cihê wê di dewamkirina jiyane de û têkiliya wê bi exlaq, bi awayekî berfireh binirxînin. Eger em mirov weke hêmanê bingeşîn ê mijara xwe destnîşan bikin û ji nû ve li têkiliya wî ya bi cîhana biyolojîk re veşêrin, em ê karibin bibînin ku bi tevahî xisletên jiyane di mirov de xulase hene. Bi tevahî xislet û taybetmendiyên jiyane yê em ji heywan û nebatan dizanin, em dikarin li cem mirov bibînin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku mirov hem armanca pêşketina cîhana heywan û nebatan ne, hem jî warisê wan e. Ruhberêkî di ser mirov re belkî mirov weke feraziyekê bifikire. Jixwe di mirov de qabîliyetê mezin a fikrê belkî jî dike ku pêkhatineke nû, hewce neke. Qabîliyetê fikir û hînbûnê ku xisleteke bingeşîn a zindîyan e, weke pêşketineke mejî li asta herî jor e. Xwenaskirina gerdûnê bi mirov dibe. Ayeta di Pirtûka Pîroz de dibêje; 'Ji bo bême naskirin min insan afirand' belkî jî bi vê maneyê ye.

Bêguman mirov ketina serhev a zindîtiya heywan û nebatan hemûyan e, berevajiyê wê ne rast e; ango hûn bi tevahî heywan û nebatan bidin serhev nakin mirovek. Di vir de hewce dike ku em mirov weke cîhaneke cihê bigirin dest û li ser rawestin. Mebesta me ew nîne ku em bi têgihîştina gerdûnê ya

'navend-mirov' rabin. Ez qala panteizmê (yekîtiya xweza-xweda) jî nakim. Ez hewce dibînim ku ferqa mirov weke cinsekî xweser rave bikim. Mirov ewçend girîng e ku hewce ye bi awayekî cihê were nirxandin.

### **3- Weke Heqîqetêke Hatiye çêkirin Mirovê/a Civakî**

Wê wextê girîng e ku em bibêjin; mirov di civakeke xweser de xwe pêkaniye û ji bo rejîm û lêgerîna heqîqetê rêbazeke manedar e, û hêja ye, em wî weke cins bikin mijara xwe.

Qutbûna mirov ji 'prîmatan' di warê qonaxên pêşketinê yê cinsan de ji bo mijara me girîng nîne. Bêguman hem di cîhana heywanan û hem jî di cîhana nebatan de gelek mînakên bihevrebûnê yê dişibin kom û civakan hene. Gelek cure û texlîd, heta kom hene, neçar in li gorî xwezaya xwe bi hev re bijîn. Dar bê daristan, masî bê col nabin. Lê civaka mirov jî weke wî xwedî xislet û taybetmendiyên cihêwaz e. Belkî jî civak bi xwe mirovê herî payeberz û bilind e. Yan jî civak ew organîzasyon e ku mirovê jor û bilind afirandiyê, wê biafirîne. Eger em mirov ji nava civakê biavêjin nava daristanê, ew ê nikaribe xwe ji prîmatbûnê xilas bike. Wexta em çend mirovên din wekî wî/wê bidin cem, ya dest pê bike, wê pêvajoyeke mîna li cem prîmatan destpê bike. Heman tişt ji bo cîhana heywanan nabe. Ev rewş bi xwe jî nîşan dide ku qîmeta civaka mirov gelekî cihê ye. Rola avakirina mirov a civakê û avakirina civakê ya mirov jî bûyereke bêhemta ye.

Bêguman mirov nebe, civak jî nabe. Lê mirov eger civakê bi tenê ji koma mirovan bihesibîne şasiyê girîng e. Civaka bê insan ji prîmatan wêdetir nikare bibe tiştê. Civaka bi insan dibe xwedî hêzeke mezin. Xwe digihîne hêzeke mezin a fikrê. Belkî jî biryara mirovekî (teqandina bombeyên nuklêrî) wê karibe dinyayê hemûyî wergerîne çolekê. Ev insan dikare derkeve ezmanan. Dikare vedîtin û keşfê bê sînor bike. Em ji bo hêza civatbûnê nîşan bidin van mînan didin. Herçend avakirina civakê mijara 'sosyolojiyê' be jî ya em dixwazin ji hev derxînin û analîz bikin tiştê din e. Avakirina rejîma heqîqetê û xwegihandina zanîna, wer xuya ye; bê civak nabe. Her tiştê li cem ferdekî diqewime divê civakî be. Em li vir tenê behsa heywan û nebatan, û heta qala ew mirov ê warisekî gerdûna kîmyewî û fîzîkî ye, nakin. Em behsa wî mirovê ku bi civakê çêdibe dikin.

Modernîteya kapîtalîst jî di navê de, sîstemên şaristaniyê hemûyan mirov ji dîrok û civakê qut girtin dest û lêkolan. Ya rastî, pêkhatin û fikir, û her çî tiştê der barê mirov de ji dîrok û civakê qut, weke berhema ferdên jor-civakê hatin destnîşankirin. Ji vir jî qralên tazî û li piştperdeyê, xwedayên bi maske û bê maske hatin vedîtin. Jixwe wexta em têgihîştina xwe ya der barê civakê de hûrûkûr bikin, em ê karibin van xweda û qralan hemûyan analîz bikin, û nîşan bidin ku ji kîjan fikrê tîn, fikra wan ji kîjan pêkhatinê civakî derketiye, û bi taybetî jî em ê destnîşan bikin ka çavkaniya wan çawa sîstemên civakê yê zordarî û mêtîngeriye ne.

Yek ji pirsgirêka bîngêhîna a rêbazê ye ku têkiliya civak-mirov manedar nîşan bide. Bacon û Descartes ku xwe gelekî zanistî dihesibînin, wexta pirsgirêkên xwe yê rêbazê guftûgo dikin, wer xuya dike ku haya wan ji civaka di navê de ne nîne. Em îro baş dizanin ku civaka ew ketine bin tesîra wê, sîstema dinyayê ya bi navê kapîtalîzmê ava kiriye. Li ser navê vê civakê îro welatên mîna Hollanda û Ingilîstanê hene. Rêbazên ava kirine, ji wan fikrên civakê ne, derî heta ser piştê (heta dawî) li kapîtalîzmê vedikin.

Wê wextê, eger em civaka mirov weke kategoriyeke bîngêhîna bigirin dest, em dikarin çî lêbikolin?

**a-** Civak pêkhatineke bi xisletên xwe mirov ji heywên vediqetîne ye. Me ev xusûs têra xwe rave kir.

**b-** Çawa ku civak ji aliyê mirovan tê avakirin, civak jî ferdên mirovan ava dike, çê dike. Di vir de xusûsa bîngêhîna a divê were fêhmkirin ew e ku civak an jî kom bi destê mirov, bi qabîliyeta wî hatine avakirin. Civak pêkhatineke jor-mirov nîne. Ji ber ku bi kûrahî di bîr û hafîzeyê mirov de cih girtine, Herçend ji totem heta xwedê weke nasnameyekê xwe nîşan bidin jî di encamê de eşkere ew bi destê mirov hatine hûnandin. Eger insan tine be, civakeke totem û xweda dewam bike tine.

**c-** Civak ji aliyê dîrok û mekan ve bi sînor in. Bi gotineke din, dema civak tîne avakirin zemanekî wan û şertên wan ên cografîk hene. Avakirina civakan ji dîrok û cografîyê qut tineye. Utopiyayên civakan bê zeman û di her şertî de xeyalên tewş in.

Mijara dîrokê, ji bo zindîyan bi giştî, ji bo mirovan bi taybetî zemanê ew pêve ne, îfade dike. Di serî de demsal gelek dem û dewran di pêkhatina cinsan de zarûrî ne. Jixwe ti pêkhatin tineye, dema xwe nebe. Tê fêhmkirin ku têgîna 'ebed-ezel' jî bi taybetî tenê ji bo 'guhertinê' ye. Ango ya naguhere û ya tenê bê zeman e, guhertin bi xwe ye. Têkiliya dîroka bi civakê hîna zêde û dem kin e. Ji bo gerdûnê behsa mîlyaran salan tê kirin, lê ji bo civakan wexta behsa hezaran salan hat kirin, belkî têgîna demêke dirêj were bi karanîn. Demên zêde ji bo zeman tîne bi karanîn, roj, meh, sal û sedsal in. Mekanê

civakan jî bêtir têtikiya xwe bi hebûna heywan û nebatan re heye. Li herêma qutban û ekvatorê civak îstîsnaî hene. Dewlemendiya heywan û nebatan li herêmekê dikare ji bo civakan jî zemînekî baş çêke.

Gelek dînan û ekolên fikrê yê di nava rêûresma dewlet û hîyarerşiyê de avabûn, sîstemeke ji mekan û dîroka civakî qut, hewldan weke çarenûsekê li ser zêhnê mirov ferz bikin. Çawa ku tê îdîakirin; hin qehremanan dîrok ava kirine, hin şîretkarên dînî û fikran jî sîstemên dîn û fikrê yê di civakê qut ava kirine. Fikra kapîtalîst gelekî cih dide zanistê, lê tevî vê jî nemaze der barê civakê de fikra xwe dispêre ferd bi taybetî esas digire. Kîjan sîstema fikrê ya felsefî û dînî rê li ber çêbûn û şikilgirtina civakê vekiriyê timî di tariyê de tê hiştin. Têra xwe îspat bûye; çawa ku zeman û mekanê civakê ferd ava dike, bi taybetî ferdên bi formasyonê rabûne jî di şikildana siberojê de roleke avakirinê bi cih tînin. Ji lewra jî pirsgirêkên rêbazê û têgihîştina li heqîqetê, hêmanên dîrokî û mekanî weke şertên sereke ferz dikin.

**d-** Yek ji xusûsên girîng jî ew e ku rastiyan civakî di karakterê avabûnê de ne. Pîrrî caran mirov pê dixapin ku saziyên civakî û pêkhatinên wan rastiyan xwezayî dibînin. Rejîmên rewakirinê yê sîstemên civakî xwe weke wê hîç neguherin û pîroz in, pêşkêş dikin. Pîrr bi rêkûpêk wez dikin ku xwediyê saziyên xwedayî ne, û wer hatine wezîfedarkirin. Di modernîteya kapîtalîst û civakê de gotina dawî tê gotin, saziyên lîberal îdîa dikin ku alternatîfa wan nîne, û heta hewl didin enjekte bikin ku 'dawiya dîrokê' ye. Tim û tim behsa destûrên bingeîn û rejîmên siyasî yê naguherin û nayên guhertin dikin. Herhal em dikarin bi dîrokçeyê kin bibînin ku ev pêkhatinên naguherin û nahejin, temenê wan bi tevahî sedsalek jî nîne. Di vir de ya girîng ew e ku mirov bibîne çawa bi gotinên siyasî û îdeolojîk rojane fikir û îradeya mirov girê didin. Kulmozên îstîsmar û desthilatdariyê gelekî hewcedariya xwe bi vê retorîka siyasî û îdeolojîk heye. Bêyî retorîkeke xurt a îdeolojîk û siyasî rêvebirina civakên îro gelekî zehmet e. Ji ber vê yekê, organên medyayê gelekî pêşdebirine û xurt kirine. Dîsa pîrraniya saziyên fikr û zanistê bi kulmozên îstîsmar û desthilatdariyê ve hatine girêdan.

Em çiqasî karibin fêhm bikin ku rastiyan civakî ew rastî ne ku tim û tim hatine avakirin, em ê ewqasî jî karibin hukim bikin ku ji nû ve avakirin û xirakirina wan hewcedariyek e. Rastiyan civakî yê naguherin û nayên xirakirin nînin. Jixwe xirakirin û dejenerekirina saziyên zordar û mêtînger yek ji şertê jiyana azad e ku jê nayê gerîn. Em wexta dibêjin; rastiya civakî, mebesta me bi tevahî saziyên maddî û îdeolojîk ên civakê ne. Ji ziman heta dîn, ji mîtolojiyê heta zanistê, ji ekonomiyê heta siyasetê, ji huqûqê heta hunerê, ji exlaq heta felsefeyê di qadên civakê hemûyan de rastiyan civakî timî di şert û mercên munasib ên zeman û mekan de têne avakirin, xirakirin, restorekirin û yê nû têne pêkanîn.

**e-** Girîng e ku mirov bi awayekî sêbjektîf li têtikiya ferd û civakê nenêre. Ferdên di nav dîrokê de şikil girtine, beşdarî tevahiya qadên civakî dibin yê ku zimanekî xwe yê diyar û rêûresmên xwe hene û me ew qadên behskirî jimartibûn. Ne weke ku ew dixwazin û li gorî dilê xwe beşdar dibin, li gorî rêûresm û saziyên civakê berê û bi nazenîni amade kirine beşdar dibin. Ji civakîbûna ferd re hewldaneke mezin a hînbûnê divê. Ango kengî ferd çanda rabirdûyê ya civakê dawerivand hinavê xwe, wê demê dikare bibe endam û mensûbê wê. Ji bo mirov bibe civakî, timî hewcedarî bi hewldanekê heye. Her çalakiya civakî di heman demê de çalakiyeke civakbûnê ye. Ji lewra ferd, ne ku weke dixwazin, li gorî civak dixwaze ava dibin û nikarin xwe ji vê yekê xilas bikin. Ji ber ku civakên li mêtîngerî û zordariyê vekirî bêguman civakên hîyarerşîk û çînî ne, daxwaza azadî û berxwedanê ya ferd jî wê her hebe. Ferd wê civakîbûnê bi koletiyê têne avakirin ti carî bi riza xwe qebûl neke. Dîsa wê qebûl neke ku bi civakên mêtînger, biyanî û cuda re bibe yek û wê li dijî asîmilasyonê jî li ber xwe bide. Lê dîsa jî wê hewl bidin ferd di nava çerxên saziyên perwerdê û zordariyê yê civakê de bihelînin û heta tine bikin. Çerxên civakî wê mîna aş, bihêrin û li gorî xwe ji ar û hevîr amûran çêkin. Çi nakokiyên navbera saziyan, çî jî mirovê li ber xwe dide wê her tim di nav civakê de li gorî mîzînan li hev bikin û cihekî bigirin. Ne hêza civakê ya mutleq a helandinê heye, ne jî ferd şensê xwe heye bi tevahî ji civakê qut bibe.

Xulase, mirov dikare civakê bi helwesteke nêzî rastiyan li ser mînakî insan bi xebatekê, bi rêbaz û rejîmên heqîqetê bigire dest û bigihîje encamên manedar

#### **4- Weke Zêhniyeteke Nerm û Azad Xwezaya Mirov**

Zêhnê mirov gelekî di asteke nerm û qayîşokî de ye, ev yek jî dike ku xebatên me manedar bibin. Mirov xwezaya zêhnê insên nas neke, îdeyan heqîqet û rêbazê tewş in.

Dema me hewlda zêhniyeta mirov nas bikin, me timî behsa dualîbûna wî kir. Di mejiyê mirov de lob a rastê beşê pêşketî yê fikra hisî ye û di warê beridandinê de kevintir e, lob a çep a mejî jî li gorî fikra analîtîk e, û timî li pêşketinê vekiriyê, ji ber vê xisleta xwe gelekî nerm û qayîşokî ye. Di cîhana heywanan de his û fikir nêzî asteke wekhev in. His bi refleksên bi şert û bê şert bersiva tiştên hîn dibin

didin, ango pêdiviya wan bi cih tînin. Ev reaksiyonên di nava kêliyan de rûdidin. Heman reaksiyon li cem mirov jî hene. Mînak beden yekser bersiva agir dide. Ji bo vê hewcedarî bi fikra analîtîk nîne. Lê ji bo derketina girê Everestê hewcedarî bi analîzkirina sedan şert û mercî heye. Kengî jî bi tevahî şert û merc hatin analîzkirin, paşê biryara ketina ser rê tê dayîn. Di fikra hisî de para pêxapandinê nayê pirsîn. Xwestek û ajoyên hundirîn çawa reaksiyon nîşan bidin, welê tevdiqere. Fikra analîtîk dikare bi salan biajo. Rêbaz, xebat û gera me ya li heqîqetê neçare xwe bispêre vê fikrê. Nîzama xebatê ya zêhnê me neyê naskirin, agahî û zanîna me der barê rêbaza rast û heqîqetê de wê xweber û sererast bin. Wê wextê berê pêşî divê em zêhnê bi xwe baş nas bikin.

Xisleta yekemîn a zêhnê me ew e ku gelekî nerm û qayîşokî ye. Em dikarin bibêjin, ji bilî zêhnê me bi tevahî tiştên di gerdûnê de çêbûne di warê hîlbijartina azad de şensê xwe pirr bi sînor in. Mirov mumkîn e ku qadên azadiyê bi neqebên teng bifikire. Em nizanin di pêkhatinên gerdûna makro û perçikên jêr-atomî de hîlbijartina azad çawa diqewime. Lê belê em dikarin li curbicuriya gerdûna heyî binêrin û vê yekê bi encama cîhana perçikan, bi tevgera nerm a di gerdûna makro de û bi qabîliyeta hîlbijartina azad a mumkîn dibe, fêhm bikin. Di mejiyê mirov de jî ev neqeba nerm û qayîşokî ya bi hêsayî ditewe gelekî fireh bûye. Herî kêr em di warê potansiyelê de xwedî asteke tevgerê ya azad a bê sînor in. Bêguman em ji bîr nakin ku ev potansiyel tenê bi civakbûnê re wê çalak bibe.

Xisleta duyemîn a zêhnê me ew e ku nermbûna zêhniyeta me bi qasî ku li têgihîştinên rast vekiriye, li têgihîştinên şaş jî vekiriye. Li ser hîmê vê xislet û taybetmendiyê, di tevna his, zext û nermbûnê de her kêlî dibe ku ji rê derkeve. Ji ber vê bi mekanîzmayên êşkence û zextê yê armanca wan nêçîra hisane polîtîkayên gêzerê esas têne girtin û ev yek jî bi xapandin û kirinên çewt re têne meşandin. Nîzamên hiyarerşî û dewletê yê bi hezarên salan e, li ser zêhna mirov zordestiya xwe danîne, bandorên gelekî mezin lê kirine, hema bêje zêhniyeteke li gorî xwe ava kirine. Yek ji xisleta zêhnê ew e ku pirrî caran bi xelatdayîna dibe nêçîr. Li hemberî vê, zêhnê me xwedî xisleta berxwedanê ye, ji bo dîtina rêya rast û xwe gihandina heqîqetên mezin jî taybetmendiyên bêhemta nîşan dide. Di van wêfên mirovên mezin de rola zêhna wan a serbixwe diyarker e. Hîlbijartinên azad herî zêde kengî zêhn serbixwe dibin pêk tên. Di navbera têgihîştinên dewlemend û serxwebûnê de têtikiliyeke nêz heye. Ji serxwebûna zêhnê mebest ew e ku hîmê zêdetir dikare bi pîvanên adil tevbigere.

Me got, di binê têtikiliya edalet û rastiyê de pergala gerdûnî heye. Wê wextê mirov dikare bibêje; zêhnê karibe adil bibe, li gorî pergala gerdûnê ew zêhn e ku şensê hîlbijartina azad bi dest xistiye. Ji bo vê jî dîroka azadiyan weke hêzeke mezin a perwerdekar (dîroka civakî) zêhnê me perwerde dike û ji hîlbijartinên azad re amade dike. Nêzikatiyên psîkoanalîtîk hewl didin kûrahiya zêhnê me bipîvin ku her diçe zêde dibe. Psîkoanalîzm weke qadeke nû ya zanîna her diçe girîngiya wê zêde dibe. Lê belê psîkoanalîzm bi serê xwe ji bo gihîştina agahiya rast û kêrhatî têrê nake, ji ber ku ferdê/ferdî serbixwe digire dest. Ango tu mirov ji civakê qut bigirî dest ev yek wê rê li ber agahîgirtineke ne tekûz û kêr veke. Ji bo vê kêmasiyê temam bike wê gavê sosyopsîkolojî jî diyar e rola jê tê xwestin nalîze. Ma sosyolojî hîmê wê rast hatiye danîn ku sosyopsîkolojî encamên rast bide. Bi psîkolojiyê em dikarin zêhnên mirovan baş nas bikin. Em dikarin mirov weke super-heywan bi psîkolojiyê nas bikin. Lê belê em ji bo naskirina mirov weke heywanekî civakî, hîmê em li serê meselê ne.

Em têtigihên, eger bêyî ku em pêkhatina zêhnê xwe baş nas bikin sîstema rêbaz û zanîna bisewirînin, encamên serketî jî êdî xweber û tesadûfî ne. Lê em zêhnê xwe rast û bi kûrahî nas bikin û bigihînin pozîsyona azad-hîlbijartinê (azadiya civakî), ji bo têtigihîstineke rast, rejîma zanîna û rêbaza me wê bersivê bidin. Di van şertan de xebatên me yê li gorî rêbazê tevî agahiyên rast ên gihîştine hev, wê ihtîmala ku em bibin ferdên azad û civakeke azad mezintir bikin.

## 5- Weke Heyîneke Dikare Metafizîk Pêk Bê Mirov

Xisleta mirov a di karekera metafizîk de ji alî sîstematîka agahî û rêbazê ve mîna keke bê hemta ye. Rêbaz û zanista xwegihandina agahiyê (epîstemolojî) kengî xisletên mirov ên metafizîk hatin analîzkirin dikarin hîmê bi kêr bên. Ji bo avakirin û afirandina metafizîkê serwestbûna li mirov dibe mijareke girîng a lêkolînê. Yek ji pîrsgirêkên civakî ya herî kêr hatiye analîzkirin ew e ku em negihîştine wê astê; em mirovê metafizîk nas bikin. Mirov çawa dibe metafizîk? Sedema vê kêjan pêdivî û hewcedarî ye? Aliyên wê yê erênî û neyênî çi ne? Bê metafizîk jîyan dibe? Taybetmendiyên sereke yê metafizîkê çi ne? Gelo metafizîk bi tenê di qada fikir û dînî de ye? Têtikiliya di navbera metafizîk û civakê de çi ye? Weke tê zanîn û bawerkirin, gelo metafizîk dijberê diyalektê ye, mirov dikare bi wê bi sînor bike? Em dikarin pirsan di vî warî de zêde bikin.

Madem mirov sùbjeya bingehîn a zanîna me ye, hingî divê em ji wesfên bingehîn ê vê sùbje, fikra metafizîk û saziyên wê nas bikin; naxwe wê îdîa me ya xwegihandina agahiya têrûtijî ji vê çavkaniyê kê mîmîne. Em behsa qadekê dikin ku çî sosyolojiyê, çî jî psîkolojiyê ji xwe re hîç nekirine derd û pîrsgirêk. Di serî de qada dînî, gelek êkolên fikrî weke metafizîk hatine qebûlîkirin, û vê yekê kiriye mirov nikaribe ji nava pîrsgirêka metafizîkê derkeve. Metafizîk yek ji xisletên sereke yên mirovê civakî ye, û di hîmê nêzîkbûna me ya pîrsgirêka metafizîkê de jî ev taybetmendîya wî heye. Metafizîk avakirineke civakî ye ku mirovê civakî nikare jê bigere. Eger em mirov ji metafizîkê bikin, em ê wî/wê yan weke heywanekî super (Ev têgîna Nietzsche ji bo Elmanan bi kar aniye di dema Elmanya -Nazî- de hatiye îspatîkirin) yan jî weke wergerînin kompûturekê. Mirovatiyek e ku gihîştibe vê astê, gelo çiqas sensê wê heye weke mirov bijî?

### **Em niha binêrin ka mirovê metafizîk çî ye**

- a- Exlaq xisleteke mirovê metafizîk e.
- b- Dîn xisleteke girîng a metafizîkê ye.
- c- Tevî şaxên xwe hemîyan huner dikare tenê weke metafizîkê bê binavîkirin.
- d- Mirov civaka sazîbûyî, û heta civakê bi tevahî weke metafizîkê bi nav bike, li cih e. Bi gelek xisletên din ku em karin rêz bikin, gelo mirov çima û çawa dibe metafizîk?

Yekemîn, kapasîteya fikrê ya mirov e. Weke gerdûna hay ji xwe bûyî mirov, ji bo dehşeta (hem ji alî êşê, hem jî ji alî bexteweriyê) ketiye navê bidebirîne, neçar maye xwe weke hebûnek di serfizîkê re ava bike. Jixwe wekî din nikarîbû ji heqê bextewerî û êşên fizîkî derkeve. Ji bo mirov karibe xwe li hemberî şeran, mirin, şehwet, xwestek, delalî û wekî din ragire sazî û fikra metafizîk hewcedariyên welê ne, dest ji wan nabin. Hewcedariyên behsa wan tê kirin jî ji bo pêk werin; xwedê tine be, xwedê tê vedîtin, hûner tê çêkirin, agahî û zanîn tê pêşdebirin.

Ji aliyekî din ve, mirov metafizîkê weke ji fizîkê wêdetir bifikire, ne hewce dike bê mehkûmkirin û ne jî pesnê wê bê dayîn. Ya rastî, hebûnek e, herî zêde zorê dide sînoren metafizîkê, mirov e. Mirov ji fizîkê wêdetir metafizîkê diji û sedema vê yekê jî ji karektera wî ya ontolojîk e. Ti maneya xwe jî nîne ku mirov tenê weke fizîk mayîne biparêze. Ya rastî, tenê weke fizîk mayîna wê rê li ber bi navkirina 'mîrovê mekanîk' veke. Ev, ji alî Descartes ve ji zû ve bi têgîna weke 'ruh' hatibû binavîkirin ku ravekirineke wê ya zanistî tinebû, û bi vê xwestibû xwe ji vê pîrsgirêkê xilas bike.

Ya duyemîn, civak bêyî exlaq dewam nakin. Ji bo vê jî hewcedarî bi metafizîkê heye.

Civak tenê bi hukmekî azadane dikare bi exlaq were bi rêkûpêkkirin. Sovyeta Rûsyayê û Firewnên Misrê tevî rasyonelîteya xwe hemûyî jî hilweşiyên. Em dikarin vê jî bi mehrûmbûna wan a ji exlaq rave bikin. Rasyonelîte bi serê xwe nikare civakê dewam bike. Belkî karibe civakê bike mîna robotan, yan jî heywanekî pêşketî, lê nikare mîna insan biparêze. Em hinek taybetmendiyên exlaq bijmêrin: xweragirtina li êşê û bi cihanîna hewcedariya wê, bi sînorkirina zewq, xwestek û şehwetê, zêdebûna mirovan ne fizîkî bi pîvanên civakê ve girê dide; li gorî tercîha guhdan û guhnedana rêûresman û dîn biryarê dide. Mînak; tîkiliya cinsî ya mirov pê zêde dibin bi pîvanan girê daye û ev li cem mirovan hewcedariyêke pêwîst e. Em zêdebûna şênîyan kontrol nekin civak dewam nake. Ev mijar bi xwe jî pêdiviyêke zêde bi exlaqê metafizîkê nîşan dide.

Ya sêyemîn, mirov bi hunerê xwe cîhaneke xwe ya xas bi xwe diafirîne. Civak tenê bi afirîneriyên di qadên bingehîn ên weke deng, resim, mîmarî û wekî din de xwe dewam dike. Ma mirov li civakeke bê muzîk, edebiyat û mîmarî dikare bifikire? Afirîneriyên di van qadan hemûyan de tîne maneya metafizîkê. Bi van afirîneriyên civak dewam dike û bêyî wan civak nikare dewam bike. Huner bi tîgihîştineke metafizîk hatiye hûnandin û hewcedariya insan a estetîzmê tedarik dike. Mirov çawa dikare bi exlaq qencî û xirabiyê ji hev bike û maneyê bidîyê, bi hukmê xweşîk û nexweşîk jî maneyê dide tevgera hunerî.

Ya çaremîn, qada rêveberîya polîtîk jî bi gelek hukmên metafizîk tijî ne. Qada polîtîk bi xwe pîr bi xurtî ji avabûnên metafizîk pêk tê. Em nikarin polîtîkayê bi qanûnên fizîkî rave bikin. Jixwe rêveberîya bi qanûnên fizîkî yên zêde robotî ye; bi dirûvekî din 'rêveberîya kerîyan' a faşîzmê ye. Eger em bibêjin; di qada polîtîk de maneya tevgera azad heye, wê wextê em careke din karektera metafizîk a mirovê polîtîk destnîşan dikin. Gotina Arîsto ya dibêje; 'Mirov heywanekî polîtîk e' zêdetir vê rastiyê bi bîra mirov dixê.

Ya pêncemîn, bi taybetî divê em bibêjin; qadên mîna huqûq, felsefe, dîn û heta qada zanistî (scientism) bi metafizîkê barkirî ne. Em dizanin di civaka dîrokî de ev qad bi tevahî ji aliyê çend û çawatiyê bi berhemên metafizîk tijî ne, û barkirî ne.

Piştî ku me di jiyana ferd û civakê de giraniya metafizîkê tespît kir, em niha dikarin ji bo nêzîkatiyên hînê manedar gav ber bi pêş ve biavêjin.

**1-** Nêzîkatiyên metafizîk di dîroka pêşketina xwe de xwe yan bi tevahî mezin kirine û weke heqîqeta bingehîn nîşan dane, yan jî ji aliyê dijberên xwe ve hatine rexnekirin û bi tevahî weke qadeke qelp û dekûdolabekê hatine dîtin, weke gotin û têgihîştinên mirovan dixapînin û rastiya wan nînin, hatine hesibandin. Di herdu nêzîkatiyan de mirov dikare îdîa bike ku yan haya wan ji têgihîştinên civaka dîrokî nînin yan jî mijar zêde mezinkirine û nepixandine. Xusûsa herdu têgihîştin jî haya wan jê nebûye ew e ku metafizîk ji kîjan xislet û hewcedariya civakî peyda bûye. Beşê metafizîkê mezin û bilind dike, têkiliya bi cîhana fizîkî re daye aliyekî, mîna ku bêserûbinî azad be, xapiyaye. Kesên di vî beşî de têkiliya fikir û ruh bi cîhana maddî re yan înkâr kirine yan jî berevajî kirine ku di nîzamên ser xwedayî re gelek caran insan rakirine payeya xwedê, di cîhana fikrê de bist bûne û zêde mezinkirine. Bêguman bûyerên em behsa wan dikin, bandora nîzama dewlet û hiyarerşiyê li ser wan zêde ye.

Beşê girîngiya metafizîkê înkâr dike jî, cîhana materyalist, şaristaniya maddî di van demên dawî de rasyonallîte û pozîtîvîzm kiriye ala xwe û êrîş dike, dibêje: her tiştê bêhna metafizîkê jê tê nexweşî ye, amûrên xapandinê ne, divê bi tevahî bêne redkirin. Lê paşê pê hat hisîn ku bi taybetî pozîtîvîzm û rasyonallîteya modernîteya kapîtalîst xwediyê wê ye, rê li ber têgihîştina jiyane ya 'keriyê faşîst', 'mîrovê robot-mekanîk' û 'sîmulasyonê' û her wisa tinekirina hawîrdorê û hilweşandina civaka dîrokî vekir. Pirr zêde girêdana bi qanûnên fizîkê, hilweşandina civakê û jihevdeketina wê bi xwe re tîne. Bi vî awayî jî îspat dibe ku 'zanist' metafizîka herî xirab e. Eger maneyeke jiyana civakî hebe! Divê ez bi girîngî bibêjim; têgihîştina 'zanistî' meteryalizma herî seresere ye, pisporekî baş ê perwerdekirî yê îstîsmar û desthildaran e, ango bi zanebûn an jî bi nezanî di wê rewşê de ye ku xwe herî zêde dixapîne û şêwazekî bermahiyê metafizîkê temsîl dike.

**2-** Yên li herdu aliyên cih nagirin û mirov dikare wan weke 'nîhîlîst' jî bi nav bike, dibêjin ew neçar nînin li herdu aliyên cih bigirin, alîgirî an jî dijberiya metafizîkê hewce nake û îdîa dikin ku mirov dikare tam serbixwe bijî. Ev tof û komika bê zîrar xuya dike û wer disekine, divê mirov bibêje ku ya rastî, komika herî bi tehlûke ye. Qet nebe herdu aliyê din îdealên xwe yê mezin hene. Haya wan ji buha û nirxên temsîl dikin heye. Di şikildana civak û ji nû ve avakirina ferd de xwedî gotin in. Lê komika tam serbixwe, tevî ku di nava civakê de û bi nirxên wê dijî, bi helwesteke nîhîlîst (înkârwarî) bawer dike ku wê bi jiyaneke ne ji wir karibe bijî. Ew beş e ku herî zêde nêzî metafizîkvanên 'zanistî' ne. Modernîteya kapîtalîst hejmara vî beşî zêde dike. Ev beş ji hêmanên civakê yê têkçûyî, jihevdeketî û avêtine valatîyê pêk tîne. Di heman demê de mirov dikare bibêje ku ev beş herî zêde nêzî heywantiyê ye. Holîganên fûtbolê herî zêde nêzî vî beşî ne, û mîna wan nîşan didin. Komên mîna wan bi lez zêde dibin. Bi van mînan mirov dikare îspat bike ku modernîteya kapîtalîst kansêre çawa weke şewbê belav dike. Herdu helwestên dîrokî yê der barê metafizîkê de di encamê de di têgihîştina zanistî ya pozîtîvîst a modernîteyê de dibin yek. Dîne wan metafizîka kirasê xwe guhertî pozîtîvîzm e, xwedayê wan jî dewleta netewe ye. Xwedayê maskeya xwe derxistî, bi şiklê dewleta netewe di civakên modern hemûyan de bi remz û rîtuêlên berfireh tê pîrozkirin.

**3-** Ez difikirim ku mirov dikare bibe xwedî helwesteke hînê bi tewazun û ev yek jî hem hewce ye, hem jî mumkîn e. Ya rastî, divê mirov metafizîkê weke şiklekî avakirina civakê bizanibe û di polîtîka, huner, exlaq û fikrê de metafizîkeke nêzî 'qencî, delalî, azadî û rastiye' bibîne û pêşxistina tiştêkî wisa jî weke wezîfeyêke bingehîn qebûl dikim. Mirov ne bi tevahî qebûl bike, ne jî bi tevahî red bike û ne jî mirov bikeve nav fikrên beredayî yê serxwebûna tam; divê mirov weke di dîroka civakî de timî hatiye dîtin gera li 'xweşikî, delalî, qencî, azadî û rastiye' dewam bike ku ev cewherê 'jiyana bi fazîlet û feraset' e. Ez bawer dikim ku di civakê de ya jiyane manedar dike, hunerê vî jiyana bi fazîlet e.

Bêguman em mehkûmê metafizîkan nînin. Lê em nikarin ji dîtin û pêşxistina 'qencî, delaltir, azadtir û rastir' bigerin. Çawa ku çarenûsa me nîne, em bibin mehkûmê xirabî, krêtî, koletî û çewtiyê, her wisa şewazê jiyaneke rast, azad, delal û qenc jî ne bê îmkân e. Weke alternatîfa herî xirab, em mehkûmê jiyana 'nîhîlîst' nînin ku bê berpirsiyarî û bêgavî (di serî de modernîteya kapîtalîst bi tevahî pergalekî dewletdar û hiyarerşik) rê li ber vedikin. Pevçûn û pevketina di vî warî de bi qasî dîrokê, ji demên destpêkê yê avakirina civakê dewam dikin. Di roja me ya îro de aliyê vî mijarê yê xweser ew e ku di dema jihevdeketina sistemeke weke modernîteya kapîtalîst de diqewime; ev jî ji bo gera li qencî, delalî, azadî û rastiye helwestên nû yê çalakî û fikrên xweser ên têkoşînê ferz dikin û hewcedariya ji nû ve avakirina civakê nîşan dide. Ji bo vî jî hewcedarî bi xebat û hewldanên bi xwestek ên di asta eşqê de hene, her wisa gera li rêyên herî zanistî yê nû (rêbaz û rejîma heqîqetê) jî hene.

## C- LI SER ESASÊ HEQÎQETA CIVAKÎ RAST TERÎFKIRINA JIYANÊ

Wezîfeya bingehîn a zanista civakî rast binavkirin û terîfkirina jiyane ye. Ji rahibên Sumer û Misriyan heta bi zanyarên civaknas ên pozîtîvîst ên îddîa dikin ku bi karê zanistê radibin, tevî ku maneya jiyana civakî terîf nekirine, li şûna ev wezîfeya herî bingehîn îfadeyên mîtolojîk ên berevajî û mirovan korfêhmî dikin pêşdebirin. Ma ne jiyana heta di çarçoveya civakî de neyê terîfkirin, mirov nikare behsa zanista civakî bike. Tiştêkî neyê binavkirin û terîfkirin zanista wî jî nabe ku were pêşdebirin. Bêguman ev rewş jî di sîstemên şaristaniyan de bi avakirina belovajî ya heqîqetê re têkildar e. Di sîstemên şaristaniyan de ji kêliyên destpêkê heta roja me ya îro heqîqeta jiyana civakî nehatiye eşkerekirin û tevî vê yekê bi kategoriyên mîtolojî, dînî, felsefî û zanistî bi zêdeyî hatiye belovajîkirin û bi şeweyên çewt hatiye avakirin û vegotina wê hatiye amadekirin. Herweha ev vegotin bi huneran hatine çalakirin. Çanda maddî ya şaristaniyê bi çanda wê ya manewî re dixin nava têkiliyeke diyalektîkî, bi vegotina dîrokê ya tê zanîn an jî ji bo zanîna wê destûr tê dayîn di çarçoveya xwestek, bawerî û berjewendiyên xwedayên tazî û bi maske de şewazekî jiyane bi evdan dan qebûlkirin. Herçiqas ev şewazê avakirina jiyane û dayîna qebûlkirinê li nerazîbûna bêjimar a zanyar, tevger û koman rast hatibe, li ber rabûbin û li ber xwe dabîn jî dîsa karîbûye hebûna xwe dewam bike.

Li gorî min zirara herî mezin a kapîtalîzmê di tinekirina terîfa jiyane de ye. Ji vê jî wêdetir, bêbextî û xiyane herî mezin bi têkiliya jiyane ya bi civak û hawîrdorê re kiriye. Hemî di vê de sîstema şaristaniyê ya li piştê wê bi qasî wê berpîrsiyar e. Tê gotin em di dema herî bi hêz zanist û ragihandinê de ne. Lê tevî vê pêşketina awarte ya zanistê, gelekî seyr e ku zanist hê jî nikare jiyana û çarçoveya wê ya civakî terîf bike. Nexwe divê mirov bipirse: zanista çi û zanist ji bo kê? Çiqas bersiva van pîrsan were dayîn, wê baş were fêhmkirin ku çima zanyarên civakî bersiv nadin pîrsa bingehîn a weke "Jiyana çi ye û têkiliya wê bi civakê re çawaye?" Dibe ku ev pîrs gelekî besît xuya bikin. Lê hebûna jêre mirov tê gotin bi qasî jiyana xwe manedar e. Piştî ku ev jî nehat fêhmkirin ma çi qîmeta mirov heye! Di vê rewşê de belkî veguhere mexlûqekî ku ji heywanekî, heta ji jiyana nebatekê bêqîmetir be. Mirovatiyeke maneya xwe, heqîqeta xwe nizanibe yan nîne yan jî hebe bi awayekî herî rezîl û herî hov hebe.

### a- Jiyana

Belkî jî mirov nikare jiyane terîf bike; ya rastî mirov bi awayekî îzafî dikare his bike, hinekî fêhm bike. Eger pêşketina beridînê rast be jî şîroveya beridînê ya Darwînîst ji diyarkirina ravekirina heqîqetê ya pêşketina cureyan û jiyane dûr e. Beriya sê mîlyar sal li nava okyanûsê ji şaneyê hê nebûye zindî heta mirovê roja me ya îro jiyana insên bi awayekî zincîrwarî were şopandin jî pîr kêmkare di manedana jiyane de bi kêr bê. Zanist niha di pêkhatina jêr perçikên atomê de li sîrên jiyane digere. Wer xuya ye ku wê bi vê rêbazê ravekirineke bi sînor a jiyane bê kirin û jê wêdetir neçe. Ji sedî sed têkiliya jiyane bi van vegotinan re heye. Lê ev pîrsgirêkê tam çareser nakin. Mirov jiyane bi mirinê re bide berhevdu jî ji bo maneya wê têrê nake. Ango mirov bibêje "Jiyana beriyan mirinê ye" ev jî nabe şewazekî tatmînkar ê ravekirinê. Ya ji vê rastir ew e, jiyana bi tenê bi mirinê mumkîn dibe. Ez dizanim jiyaneke bêmirin wê nebe. Lê em ji zanîna maneya mirinê jî gelekî dûr in. Mirin jî herî kêmkare bi qasî jiyane nayê terîfkirin. Belkî jî ev encameke îzafî ya jiyana me ye; belkî jî îmkaneke jiyane, şewazekî pêk hatinê ye. Tîrsa ji mirinê, weke ez ê piştê bi berfirehî terîf bikim, têkiliyeke civakî ye. Mirin belkî jî tiştêk e, ji vê tîrsê ye.

Ez dualîteya îdealîzm-materyalîzmê hevgirtî û raveker nabînim. Ev dualîteya xwedî karektera şaristanî di warê ravekirina jiyane de ti qîmeta xwe nîne. Ji bo şîroveya ez dixwazim pêş bixînim dibêjim têkiliya vê dualîteyê bi heqîqetê re bi sînor e. Bi heman awayî têgînên bi can û bê can jî di warê jiyane de ji ravekirinê dûr in.

**Heqîqet 1:** Ji bilî mirovê hewl dide li xwe serwext bibe, her bi can û bê can bi tenê dikarin bîranînên xwe bijîn. Berxika gurr pê girtiye û galaksiya kuna reş wê daqurtandiye belkî jî heman çarenûsa gerdûnî parve dikin. Ev bi xwe jî ji bo serwextbûna li jiyane bi tenê di buhaya sirrekê de ye.

**Heqîqet 2:** Ji bo çêlika xwe ruhberê xwe parçe dike û perçikên jêr atoman ên bi lezeke dûrî aqilan pêkhatinên diyalektîkî bi cih tînin, bi heman pêdiviya rêzika gerdûnî dimeşin.



**Heqîqet 3:** Di civaka mirov de ev rêzika gerdûnî gihiştiye wê rewşê dikare xwe bixe ber lêpirsînê: Ez kî me? Bi vê pirsê rêzika gerdûnî cara pêşî hewl dide xwe bîne ziman.

**Heqîqet 4:** Bersiva pirsê “Ez kî me?” dibe ku armanca dawî ya gerdûnê be.

**Heqîqet 5:** Bi can-bê can tevahiya jiyana gerdûnî belkî jî ji bo xwe gihandina pirsê “Ez kî me?” ye.

**Heqîqet 6:** Dibe ku armanca dawî ev bersiv be “Ez ez im, ez gerdûn im, ez zeman û mekanê pêşî û paşîya wî, nêz û dûrê wî nîne me.”

**Heqîqet 7:** Fenafillah, Nîrwana, Enel-Heq zanyariyên wan ên mutleq dibe ku armanca bingehîn a jiyana civakî ya mirov rave kiribin an jî dikarin eleqeya wî bi jiyana civakî re deynin holê.

Destnîşankirina van heft heqîqetan, nayê wê maneyê ku min jiyana terîf kir. Qada wê ya pêwendîdar lédikolim, dixwazim lèbikolim. Jiyana dema tê jiyîn nayê fêhmkirin. Ji vî alî ve di navbera mane û jiyane de nakokiyek heye. Wexta aşîqek bi maşûqê re ye, ev di heman demê de ew nuqte ye ku mane lê qediyaye. Mutleq fêhmkirin bi tenêbûneke mutleq ango bi bêmaşûqê mumkîn dibe. Gotina dibêje; yan ji yarê yan ji serî, di maneyeke fizîkî de ne, lê di maneya metafizîk de dixwaze vê rastiyê îfade bike. Ji bo mirov karibe xwe li tenêtiya mutleq rabigire divê mirov ji bo fêhmkirina wê mahir be, naxwe nabe. Tenêtiya mutleq tenê û bi tenê wexta gihişt hêza maneyê ango wexta ji têkiliya hêza maddî derket dikare pêk bê. Dualîteya hebûn-tinebûnê dişibe dualîteya mane-maddeyê. Herdu dualîte jî muceredkirî ne, û di rastiyê de nayên jiyîn. Jiyana bi îhtîmaleke mezin qabîliyeta bê dawî ya tertîpkirinê ya van dualîteyan e. Navberên tertîpkirinê weke kêliyên kaosê mîna mirinê xuya bikin jî ji bo pêkhatina jiyane weke mecbûrî xuya dikin.

Bi vê analîza kurt, min hewl da bi sînora be jî bînim ziman ku çima jiyana tam nabe were terîfkirin: terîfa mutleq a jiyane tenêtiya mutleq, hiçtiyê, bêmaddetiye hewce dike ku ev jî bi tenê di asteke muceredkirî de dimîne, ji lewra çî jiyana û çî jî xwe gihandina maneya wê tenê bi dualîte û îzafî pêk tê.

## **b- Jiyana Civakî**

Jiyana civakî tevî ku têgîneke gelekî besît e, weke têgîna bingehîn a tevahiya zanistan têgînek e ku divê were diyarkirin. Tevî ku gelekî tê bi karanîn, berevajî yeqînan, têgînek e ku mirov hê negihiştiye maneya wê. Em nizanin jiyana civakî çiyê. Eger me zanîbûya, em ê bûbûna parêzvanên jiyana xwe ya civakî ya di bin sîstemên hegemonîk de hatiye parçeparçekirin. Di jiyana civakî de zanyarî ne, cehalet serwer e. Jixwe di qutbê dijber ê jiyana hegemonîk de jiyaneke cahilane heye. Eger perdeyên cehaletê bi ser jiyane civakî ve nekin sîstemên hegemonîk nikarin dewam bikin.

Ez ê karektera îzafî ya jiyane li ber çav bigirim û hewl bidim jiyana civakî terîf bikim. Berê pêşî divê ez bibêjim jiyane li her deverê wekhev, bê sînora, monoton û yeknesak nînin. Wexta jiyana îzafî tê gotin jiyaneke bi tenê û tek tê îfadekirin. Tekîti weke tê zanîn û weke divê bê zanîn, gerdûnîtiyê red nake. Ne bi tenê tekîti, ne jî bi tenê gerdûnîti heye. Tekîti-gerdûnîti dualîteyek e ku bi qasî mane-maddeyê tene qebûlkin. Tekîti nebe gerdûnîti pêk nayê. Her tek bêyî gerdûnî nikare bijî. Ji bo baştir were fêhmkirin dikarin mînakekê bidim: bi sedan gulên cuda yek bi yek tek in. Lê belê ji bo ev tevahiya gulana weke gul bêne binavkirin aliyekî wan ê hevpar heye. Ev aliyê wan ê hevpar gerdûnîtiya wan îfade dike. Di tevahiya cûrbicûrkirina gerdûnê de ev rêzik li ser kar e.

Bi awayekî çîrokwarî di vegotina serhatiya mirovê difikire ango Homo Sapiens de para rastiyê gelek heye û bi giştî ev vegotina tê qebûlkin bi kurî weha ye; tê texmînkirin ku dused hezar sal berê li rojhilatê Efrîkayê jiyaye, piştî ji dayikekê bûye û tê texmînkirin ku pêncî hezar sal berê jî gihiştiye zimanê sembolan, bi xilasbûna dema dawî ya qeşayî re bîst hezar sal berê li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê ji civaka berî cotkariyê derdikeve û texmîni ji beriya panzdeh hezar salî û pêve nîzamekî jiyana civakî yê cotkariya qebîleyî û nêçîrvan-berhevkirina nebat-gîhayan di zikhev de pêkaniye. Li ev şewazê jiyane yê weke civaka gund-cotkariyê pêşket dema pênc hezar salî ya şaristaniya navendî jî zêde bû. Civaka gund-cotkariyê û civaka bajar-bazirgan-zenaet û pîşesaziyê weke dualîteyekê heta roja me ya îro behskiribû û min hewldabû bi xetên stûr an jî weke dem-dewranan pêşketina jiyaneke hegemonîk a bi bandor vebêjim. Min qonaxa Ewrûpa ya pêncsed salên dawî ya vê çanda hegemonîk di beşê berî vê de pêşkêşkiribû. Eşkere ye ku ji aliyê pêkhatin û gihiştina wê, heta ji aliyê pêxirtengiyên wê yê avabûnê weke bingeh li vê çandê mohra civaka Rojhilata Navîn heye. Civak û çanda min hewl da maneya wê pêşkêş bikim ev e. Tekîtiyên wê gelek bin û yek ji tekîtiyên wê yê girîng modernîteya Ewrûpayê pêk bîne jî ji aliyê dem û mekanê ve kategorîkirin û bi muceredkirineke teka tekîtiyan her tim mumkîn e.

Rewşa civakê weke tekîtiyekê jiyana cinsê mirov diyar dike. Tekîti û cudahiya di navbera jiyana mirovê li Rojhilata Navîn û jiyana mirovê li Efrîkayê de ev rewşa civakê diyar dike. Nijad an jî xisletên din ên fizîkî diyarker nînin. Eger bi lez nemire, ferdê mirov ê bêcivak ne bi tenê mirovê zanyar, wê nêzî

cureyekî heywan be ku bi zimanê îşaretan qise dike. Mirovê bêcivak anti-mirov e. Avêtina mirovekî derveyî civakê, mirov bêcivak were hiştin ji bo mirovekî cezayê herî mezin e. Mirov tevahiya hêza xwe ji civakê digire. Asta herî pêşketî ya zanistan û zanyaran bi asta civakê ve girêdayî ye. Jiyana civakî weke fenomen û çendayetiye besit ên fizîkî hesabandin xiyaneta herî mezin a pozîtîvîzmê bi mirov re kiriye. Gihiştina asta civaka mirov bi tenê weke pêngaveke gerdûnî dikare manedar bibe.

Mirov jiyana civakî rast nas bike û bi zanebûn wê bijî bi qasî jiyane bi xwe girîng e. Belkî jî jiyana ji bo rast naskirin û terîfkirinê ye. Divê hema yekser ez bibêjim, bi giştî jiyana, bi taybetî jî jiyana mirov encama avakirin û mîmariyeye xweser e. Wê çî bikeve nava vê avahiyê, diyarkirina vê jî wezîfeya bingehîn a zanista civakî ye. Ji bo xusûsa ez dixwazim diyar bikim baş were fêhmkirin, pinpinîka sê meh temenê wê heye dikarim mînak bidim. Avahiya wê ya hundir û ekolojiya dewrûberê jiyana sê mehî ya pinpinîkê diyar kirine. Eger pinpinîk nebe qurbanê qezayekê wê vî sê mehî karibe bijî. Ji ber vê jî bê pêşbûn û paşbûn (pirsa ezel-ebed) bi vî sê mehî bi sînor e. Hîç nafikire ku vê yekê jî bike pirsgirêk. Xwestekeke xwe ya bi vî rengî nîne, hebe jî zêde nake pirsgirêk. Mînak di nava mînak de: weke Gilgamêş. Ez Gilgamêş weke mînakekî neyênî pêşkêş dikim. Ez ê rave bikim. Tevahiya xweza û gerdûnê bi xwe li gorî 'rêzika pinpinîkê' pêk tê, dijî. Tenê li cem mirov ev rêzik ters dimeşe. Rewş vediguhere pirsgirêke gelekî mezin.

Cinsê mirov ji bo temenê xwe ji lêgerîna ebedî-ezelî heta fikirkirina cennetê li ezmên, li bin erdê cehennem dikeve nava gelek hewldanên seyr û balkêş. Ji qral-xwedabûnê heta bi koletiyeye herî rezîl gelek awayên seyr peyda dike. Her roj ji jiyaneke cinsî ya ji rêderketî heta helwestên xwe weke cinsekî bêalî diyarkirin û gelek helwestên sînornenas bi tenê xweserî mirov in. Ji plansazkirina qirkirinê heta bi peyketina ava heyatê gelek helwestên li cem ti ruhberên din nînin, li cem cinsê mirov weke nexweşî dewam dikin û diçin. Ji bo mirov van dînîtiyên xwe yê sînornenas pêşî lê bigire û wan fêhm bike, pêdivî bi naskirin û terîfkirina jiyane heye. Naskirin û terîfkirineke rast dikare bibe gava pêşî ya jiyaneke rast.

Bivê nevê ya jiyana mirov civakîbûna wî ye. Sedema yekemîn a bi israr ez li ser vê mijarê radiwestim ew e, zanista civakî hê hewl nedaye wê bide naskirin, hewl dabe jî heqîqet û maneyeke qîmeta xwe ya zanistî hebe daneniye holê, di avakirina wê ya rêxistinî û civakîkirina wê de bi serneketiye. Ji vê girîngtir û sedema duyemîn ew e, lîberalizma modernîteya kapîtalîst ferd û ferdiyet li ser hîmê dijberê civakê wer nepixandî ava û cinawir kiriye, di erd û ezmên de hilnayê. Bi rewşa heyî, ferdiyet ne tenê pê dewam nabe, pê jiyana jî nabe. Jiyana ferdî ya li cem ti cinsê zindiyana nayê dîtin û li her cure rêderketinê vekiriye, ne hêza civakê ne jî hêza dinya me maye wê hilgire. Ev ferdîti wisa ji rêderketiye, di bîstûçar saetê rojê de ji kuştina mirovan, kirina seks, spor û sinaetê, bi destxistina karê û meşandina êşkencê bêzar nabe. Êşkere ye ku dawiya vê ferdîtiyê nexweşiyên weke kansêr û AIDS'ê ne, jixwe ew jî pirr bi lez zêde dibin. Rojên ji wan re mehşer tene gotin û pêxemberan pirr berê xeber ji wan dane vê dema ferdîtiyê îfade dikin.

Nexwe weke rêzgirtina me ji bo jiyane, wezîfeya me ya yekemîn ew e, divê em zanista civakî ya bi jiyana civakî tê naskirin ava bikin, duyemîn jî divê em jiyana ferdî û sistema li pişt wê rawestînin û şert e ku divê mirov van herduyan bike yek û gav biavêje.

Bêguman civakîbûn xwe dispêre rêxistinîkirin û avakirina jiyana ferdî. Civaka ji ferd qut nabe. Qiyasa ferd û civakê em dikarin bişibînin qiyaskirina elementa hîdrojen û ûranyûmê. Atoma hîdrojenê dema bi serê xwe ye, avahiyeke besit e. Di hin cureyên wê de herçend hinek enerjî û perçik belav bibin jî gelekî bi sînor e. Di ûranyûmê de jî ji heman atomên sentez dibin gelek pêkhate misêwa enerjî û perçikan belav dikin. Jixwe bombeya atomê ji vê xisleta ûranyûmê çêdibe. Di civakê de jî gelek ferd hatine sentezkirin. Lê perçik û enerjiyên belav dike (komên nû û kevin) li gorî mirovê ferdparêz (atoma tenê ji bo dijî û wekî din bi kêr nayê) di astekê de ye, qiyaskirinê qebûl nake.

Ferd wexta ji civakîbûnê derkeve yan jî ji dest bide, herçend fizîkî bijî jî, yan xayînek e, yan jî rezîlek e, piçûkîtiye, beredayî ye. Di herdu mane û rewşan de jî mirî ye.

Em xisletên karakterîstîk ên bingehîn ên jiyana civakî weke pêngava gerdûnî rêz bikin.

**1-** Civak weke dîrok. Komên mirovan bi milyonan salan, li mekanên zor û zehmet di encama hewldan-têkoşînên mezin, bi êş û elem de komên tek ên pêşketî pêkanîne. Hin mekan û dem ji bo civak ji qonaxekê çipî qonaxeke din bike bi roleke diyarker rabûne.

**2-** Civak weke dîrok hewceyî bi asteke mejî dibîne. Asta mejiyê cinsê mirov civakbûna wî diyar kiriye. Civakbûnê jî ev asta mejî di rewşa zêhniyetê de neçarî xebitandin û pêşketinê kiriye. Xwezaya civakî avahiyeke nerm a asta zêhniyeta wê pêşketî pêşkêş dike.

3- Ziman bi tenê amûrê zêhniyeta civakî ne, di heman demê de hêmanekî avakirinê ye. Ziman yek ji xisletên bingehîn e ku pê civak heyî dibe. Weke amûrê mejiyê kolektîf nermbûna xwezaya civakî pirr bi lez pêşde dibe.

4- Şoreşa cotkariyê di çanda maddî û manewî ya civakê de şoreşa herî bi kok a dîrokê ye. Civaka mirov weke bingeh li dora cotkariyê şikil wergirtiye. Mirov civakeke bêcotkarî nikare bifikire. Cotkarî ne bitenê pirsgirêka debarê çareser dike; di serî de mejî, ziman, şênî, rêveberî, bergirî, parastin, cihwarbûn, dîn, teknîk, lixwekirin û avahiya etnîk, di amûrên çandî ên bingehîn ên maddî û manewî de rê li ber veguherîn û pêşketinên bi kok vedike.

5- Ji ber ku jin di domdarkirina civakî de xwediyê hewldana zêde ye, li gorî mêr di civakbûnê de bi rola sereke radike. Anîn, mezinkirin û parastina zarokan dihêle ku civakbûn li ser rêya dayikîyê pêş bikeve. Civak bi giranî nasnameya jin-dayikê hildigire. Di bingehê ziman û dîn de hebûna hêmanên mêtîyê vê rastiye piştrast dike. Di civaka gund-cotkariyê de deng û nasnameya jinê hêza xwe diparêze û dewam dike.

6- Xwezaya civakî bi xwe exlaqî û polîtîk e. Exlaq nîzama rêzikên civakê, polîtîka jî rêveberiya wê diyar dike. Exlaq nîzam û mayîndebûna civakê, polîtîka jî pêşketina wê ya afirîner pêk tîne. Mirov nikare civakeke bêexlaq û bêpolîtîka bifikire. Dejenerebûna di asta exlaqî û polîtîk de bi pêşketina her cure koletî û newekheviyê re di zikhev de pêk tê.

## **D- DESTPÊKEKE KURT LI SER PIRSGIRÊKA RÊBAZ Û HEQÎQETÊ**

Rêbaz weke têngîna rê, hînbûyîn û nêzîkbûnên hestiyarî û aqlane ne ku dikin mirov bi awayekî herî kurtebirr bigihîje armancên xwe û encamê. Kengî zelal bû ku wê kîjan rê te kurtebirr bigihîne hedefa herî rast, wê wextê rêbaz hatiye dîtin. Aliyê rêbazê yê erênî ew e ku hatiye ceribandin û serketina wê ya di warê encamdanê de ye. Ji ber ku dîrûdirêj hatiye ceribandin û paşê diyar dibe, rêwiyên wê yên pê eleqedar dest jê bernadin. Têkiliya murîd-murşîdan tîne hişê mirov.

Rêbaz bi maneya rêya mirov herî kurtebirr digihîne hedefê, têngîneke navend Rojava nîne. Ji serdemên herî kevin ve êkolên hozanî û zanyariyê yên Rojhilata Navîn wê diceribînin. Rêyên kêrhatî yên ji bo xwe gihandina zanîn-agahiyê her tim hatine ceribandin. Di nava wan de yên herî encamgir weke rêbaza bingehîn hatine hilbijartin. Êkolên fikrê herî zêde li ser têngîna mentiqekî ango pêşdebirina rêbazekê ponijîn e ku ev yek usûleke ji rêûresmê ye. Kengî Ewrûpa bû navenda hegemonîk a sîstema şaristaniya dinyayê, di gelek qadan de pêşketinên rê li serdestiyê vekirin di qada zanistî mijara rêbazê de jî xwe nîşan da. Di sedsalên 16. û 17. de Bacon, Descartes û Galîleo bi nêzîkatiyên girîng ên rêbazê derketin holê. Ev derketin û gavavêtina wan ji nêz ve têkiliya xwe bi rewşa Ewrûpayê ya bûye navenda sîstema hegemonîk re heye.

Obje û sêbje ji têngînan girîng ên rêbazê ne. Pêşdebirina cihêkirina van têngînan têkiliya xwe bi hukimkirina li xwezayê re heye. Amûrên nû yên daneheva sermaye û desthilatdariyê, çiqasî giraniya xwe dan ser hem çavkaniyên xwezaya civakî hem jî fizîkî-biyolojîk pirr neçû fêhmkirin ku çavkaniyên li ser sekinîne gelekî kêrhatî ne. Herdu çavkaniyên xwezayê çiqasî kirin obje, ewqasî jî li pey hev kêrhatina xwe ya zêde dibe ji daneheva sermaye û desthilatdariyê re pêşkêşkirin. Di fikrê de berdêla vê pêşketina maddî cihêbûna obje û sêbje ye. Ev rewş li cem Bacon xwe cihêkirina objektîv û sêbje nîşan dide, li cem Descartes jî bi şeweyê dualîteyê tûj a ruh û beden xwe dide der. Li cem Galîleo jî matematîk fena zimanê xwezayê weke pîvaneke obje ya herî pêşketî derdikeve pêş. Di meşa dirêj a dîrokê de ku ji Mezopotamyayê ber bi Yewnanistana Serdema Antîk ve kir, rê li bûyer û pêşketinan vebû, bi awayekî bi heman rengî, lê bi cihêwaziyên xweser ev yek li rojavayê Ewrûpayê dubare dibe. Ya rastî, civaka Sumer jî pratîka jiyane ya li Mezopotamya Jor di parzûnkên hezar salan re hatibû dawerivandin barkirin Mezopotamya Jêr û li vir xweseriyên jiyana xwe jî tevî kirin û bi vî awayî şeweyê orjîn afirandin.

Di sîstemên şaristaniya navendî de sêbje (kirdar) her tim çavkaniya xwe sermaye û desthilatdarî ne. Serwextî, vegotin û îradeya azad temsîl dike. Carnan ferd carnan sazî ye, lê timî heye. Ya para objeyê jî dikeve timî gel, jin û barbarên li derveyî desthilatîyê ne. Kengî mîna xwezayê ji sêbje re weke çavkanî xizmetê bikin tene bîra kirdaran. Jixwe wekî din bi ti maneyê nayên fikirîn û ev jî li gorî ya divê bibe dibe. Di mîtolojiya Sumeran de mirov weke evd ji pîsiya xwedayan, jin jî ji parsûyê mêran hatiye afirandin. Ev çîrokên afirandinê asta objekirinê ya di kûrahiya dîrokê de gihîştîyê nîşan dide.

Bêguman ev nêzîkatiya cihêkirina obje û súbjeyê piştî veguherînên girîng mumkîn bûye ku bigihîje Ewrûpayê. Lê mirov nikare înkâr bike ku pêşketina zincîwarî di vê çarçoveyê de pêk hatiye.

Di roja me ya îro de sînore cihêkirinê yê di navbera obje û súbje de qels bûye û ev jî bi sereketiya kapîtala finansê re têkildar e. Di sîstema şaristaniya navendî de hegemondariya sembolîk a kapîtala finansê tevahî rewşên berê yên obje û súbjeyê ji hev derxistiye. Wexta cihê wê tê her kes xwe súbje, wexta cihê wê tê her kes xwe dixwe şûna objeyê, ev têkiliyeke xwe ya xurt bi şeweyê nû yê daneheva sermaye û desthilatdariyê re heye. Bi amûrên sermaye û desthilatdariyê yên mîna aşûta tê xwarê zêde dibin (çavkaniya xwe milliyetgirî, dîndartî, cinsiyetparêzî û zanistparêzî), hem di asta rastî, hem jî di asta feraziyê de mîna extapot û sermûşaxê xwe li civakê gerandine, alandine. Di van şert û mercan de her kes û her sazî dikare xwe têra xwe di statuya obje û súbje de bibîne. Fonksiyona xwedayên di dema civaka Sumeran de amûrên îdeolojîk werdigirin. Veguherîna di cihêbûna obje û súbje de bivê nevwê wê pêk bê, xisletên nû yên sembolîk ên xwedayan û hukimraniya wan jî bêguman wê cihêbûna heyî bê kêr bike.

Tevahiya dîroka şaristaniya navendî zanîn-agahî her ku çûne parçe bûne û pîrozbûna xwe ji dest dane. Ev rewşa em behsa wê dikin jî çîrokeke xwe ya bi heman rengî heyî. Mekanîzmayên sermaye û desthilatdariyê çiqasî zêde bibin, zanîn-agahî jî ewqasî parçe dibin. Mirov çavdêriya vê xusûsê di dîrokê de dike. Di tevahiya civakên klan û qebîleyan de zanist yekpare ye. Nûnerên wê pîroz têne hesibandin. Zanist weke dayîneke xwedê tê qebûl kirin. Li gorî daxwaz û hewldana her kesî lê tê belav kirin. Di mîtolojiyan de ev bi tevahî welê ye. Di dîn û felsefeyê de nêzîkatiya vê yekê pîvaneke sereke ye. Lê parçebûna pêşî di avahiya zanistî ya Ewrûpaya Rojava û zanistên xwezayê de tê dîtîn. Organîzasyonên zanîne yê nû (akademî û zanîngeh) her ku çûne ji civakê qutbûne û bi tevahî ketine xizmeta elîtên sermaye-desthilatdariyê û bi awayekî eşkere xwe di mertebeya sazîyên nadîde yên dewleta nû (Leviathan) de dibînin. Pêvajoya desthilatdarîbûn û sermayebûyîna zanistê, di heman demê de bûye pêvajoya xerîbketina bi civakê re. Biryargeh û perestgehên zanistê yên pîrsgirêkan çareser dikin êdî bûne navendên hegemondariyên îdeolojîk, xerîb kirin û pîrsgirêk afirandinê. Çiqasî çavkaniyên civak û xwezayê hene, ewqasî beşên zanistî jî hatine zêdekirin. Ev rastî bi serê xwe jî têrê dike ku ji bo mirov ketina zikhev a zanist-sermaye-desthilatdariyê piştrast bike. Qada zanistê ji tevahiya civakê re cihêkî pîroz e, lê ji vê xizmeta wê pîroz dike gelekî hatiye dûr kirin. Navendên zanistê her yek ji wan kirine pîşeyên çavkaniya pereyan, heta bi xwe bûne sermaye; bûne hevparê herî gunehkar ên bi tehlûke yên desthilatdariyê. Em pirr baş dizanin ku di serî de sîlehên nuklêr, her cure sîlehên hilweşîner ên dikarin hawîrdorê bi erdê re bikin yek li navendên zanistê têne çêkirin. Li şûna ku bi fikar xwedî li heqîqetê (wijdanê kolektîf ê civakê) derkeve, weke mamosteyên biaqil ên hilberandina sermayeya herî bi bereket û desthilatdariyê hatine terfîkirin.

Roja me ya îro wexta ku zanist tê gotin pîrsa pêşî tê hişê mirov ev e, “Gelo çiqas pere tede heye?” Lê ya civak ji zanistê hêvî dike ew e, dixwaze ji fikarên xwe yên bingehîn re bersivê bibîne. Ji ber fikarên xwe yên maddî û manewî, civakê zanist bi awayekî yekpare weke pîşeyekî xwedayî hesibandîye û wisa qebûl kiriye. Dejenerebûn û rizîna akademî û zanîngehê bi van şert û mercan ve girêdayî ye. Krîza zanistî çavkaniya xwe van şert û mercan e. Dîroka zanîn-agahiyê bi dîroka şaristaniyê ve girêdayî veguheriyê û ji pêxîrtengiya giştî ya sîstemê di heman astê de para xwe girtiye û ji vê aqûbetê nikarîbûye xwe xilas bike. Li cihê ku xwestiyê bibe amûrê çareseriyê, bi xwe bûye amûrekî girîng ê pîrsgirêk afirandinê. Encam, parçebûna zanistî, belavbûn û kaos e.

Xwezayên yekemîn, duyemîn û sêyemîn, bi gotineke din xwezayên cihêwaz divê mirov li wan serwext bibe. Bi tevahî xwezaya ji derveyî mirov bi şeweyê Xwezaya Yekemîn tê cihêkirin. Ev di nava xwe de têngîneke bi nakok e. Ji ber ku ev yek berê pêşî dikare mirov bibe dualîteyên weke bi can-bê can, heywan-nebat, heta fizîk-kîmya û gaveke din jî wêdetir maddeya xuya dike-ya nake, enerjî-madde cihêkariyên cihêreng ên bêserûbinî bibe û mirov bi vî awayî bide fikirîn. Jixwe her cihêbûnek civakeke xwe ya li gorî xwe heye. Em wexta ji nêz ve li pîrsgirêka xwezayan binêrin, em ê bandora kûr a cihêbûna obje û súbjeyê li ser wan bibînin. Ev cihêkirineke têkûz nîne, herî kêr mirov divê hewcedariya bi şert a cihêkirinê bi vî rengî destnîşan bike.

Civaka mirov weke Xwezaya Duyemîn, bêguman xweseriyên xwe hene û qonaxeke pêşketina xwezayî ya girîng e. Li şûna ku weke xwezayêke cuda were diyarkirin, weke qonaxeke xwezayê ya cihêwaz were bi wesifkirin manedartir e.

Karakterîstîka herî girîng a xwezaya civakê ya wê ji yê din cihê dike ew e, kapasîteya zêhnî bilind e, nerm e, û hêza wê ya xwe avakirinê ye. Bêguman di Xwezaya Yekemîn de zêhn, nermtî û hêza xwe avakirinê heye. Lê li gorî xwezaya civakê giran, hişk û hêdî dimeşe. Xwezaya civakê bi tevahî teorîzekirin gelekî girîng e. Herçiqasî civaknasên pêşî di rêza yekemîn de cih dane vê xusûsê jî ber bi

roja me ya îro ve analîzên parçe û avahiyê zêdetir derketine pêş: çawa ku di analîzên xwezayên din de tê çavdêrîkirin. Herweha cihêkirina xwezaya civakê bi şeweyên avahiyên jêr-jor, bi şeweyê ekonomîk-polîtîk-desthilatdarî dabeşkirin, bi awayê tebeqe û qonaxên weke komina destpêkê, koledarî, feodalîzm, kapîtalîzm û sosyalîzm-kominîzm parvekirin, eger bi tenê li ser bingehê nêzîkatiyeke 'CIHÊWAZTIYÊ' bi baldarî were kirin dikare encamên manedar bide. Ti analîza avahî, tebeqe û parçe nikare şûna nêzîkatiya teorîk a yekpare bigire. Mirov dikare bibêje, di vê mijarê de ti civaknas û filozof ji nêzîkatiya yekpare ya Eflatûn û Arîsto nebihurî ye. Heta mirov dikare bibêje, şîroveyên yekpare yên pêxember û zanyarên bi koka xwe ji Rojhilata Navîn û bi giştî jî ji Rojhilat, li gorî civaknas û filozofên modernîteya kapîtalîst hê bêtir civakî ne, û mirov zêdetir ji wan hîn dibe. Nêzîkatiya wan a hê li pêş û pêşketî ye. Divê bi girîngî were destnîşankirin ku di bêtesîrîkirina nêzîkatiya teorîk a yekpare de rola herî girîng a amûrên daneheva sermaye û desthilatdariyê ye.

Li ser civaka mirov bi awayekî dijwar hewcedarî ji nû ve û nêzîkatiyeke toerîk a kûr a rêbazê heye. Divê mirov bi girîngî fêhm bike ku rêbazên sosyolojîk ên di nava qelebalixiya hejmaran de fetisîne, ji êşkerekirina rastiyan wêdetir ser wan digirin. Eger ez bibêjim sosyolojiyên heyî ji mîtolojiyan zêdetir ser rastiyan digirin û dinixumînin divê ev weke gotinên ji xwe zêde û nepixandî neyên hesabandin. Heta mirov dikare bibêje, hiskirina mîtolojiyê ya rastiye, li gorî maneya di sosyolojiya modernîteya kapîtalîst de heta dawiyê insanî ye, û zêdetir nêzî heqîqetê ye.

Bêguman zanista civakî girîng e, lê ji rewşa heyî re zehmet e ku mirov bibêje zanist e. Vegotinên sosyolojîk ên li naverastê ji rewakirina modernîteya fermî wêdetir zêde maneyekê îfade nakin. Di vê mijarê de hewcedarî bi şoreşeke bi kok a zanistî û gavavêtineke rêbazî heye.

Qonaxa ku mirov dixwaze weke Xwezaya Sêyemîn maneyekê bidiyê, bi tenê ev bi şoreşa zanistî û rêbazî gengaz dibe. Xwezaya Sêyemîn weke têgîn di qonaxeke jor de ji nû ve ahenga Xwezaya Yekemîn û Duyemîn îfade dike. Sentezeke di asta jor de ya xwezaya civakî bi Yekemîn Xwezayê re bi qasî paradîgma teorîk a şoreşger pêdiviya wê bi şoreşeke bi kok a pratîk jî heye. Nexasim jî ji bo li dawîhiştina qonaxa sîstema şaristaniya navendî roja me ya îro sîstema dinyayê ya kapîtalîst ango modernîteya wê ev yek diyarker e. Ji bo pêkhatina vê jî herî kêrhatî divê avahiyên şaristaniya demokratîk bêne lêkirin, weke xusûsên darî çav divê di karektera civakê ya ekolojîk û femînîst de pêşketin bibin, hunerê siyaseta demokratîk fonksiyonel were kirin û civaka sîvîl a demokratîk were avakirin, ev gav divê bi awayekî serketî bêne avêtin.

Qonaxa ku mirov dixwaze weke Xwezaya Sêyemîn maneyekê bidiyê, bi tenê ev bi şoreşa zanistî û rêbazî gengaz dibe. Xwezaya Sêyemîn weke têgîn di qonaxeke jor de ji nû ve ahenga Xwezaya Yekemîn û Duyemîn îfade dike. Sentezeke di asta jor de ya xwezaya civakî bi Yekemîn Xwezayê re bi qasî paradîgma teorîk a şoreşger pêdiviya wê bi şoreşeke bi kok a pratîk jî heye. Nexasim jî ji bo li dawîhiştina qonaxa sîstema şaristaniya navendî roja me ya îro sîstema dinyayê ya kapîtalîst ango modernîteya wê ev yek diyarker e. Ji bo pêkhatina vê jî herî kêrhatî divê avahiyên şaristaniya demokratîk bêne lêkirin, weke xusûsên darî çav divê di karektera civakê ya ekolojîk û femînîst de pêşketin bibin, hunerê siyaseta demokratîk fonksiyonel were kirin û civaka sîvîl a demokratîk were avakirin, ev gav divê bi awayekî serketî bêne avêtin.

Xwezaya Sêyemîn sozdana cennetek an jî utopyayekê nîne; mirov ê cihêwaziya hêza xwe ya serwextbûnê ya li ser xwezayan zêde dibe biparêze, TEVLÎBÛNA xwe ya ahenga mezin pêk bîne. Ev bi tenê sozdana hesret, armanc û utopyayan nîne, hunerê jiyana xweşik û baş e ku maneya xwe ya pratîk a rojane heye. Ez behsa biyollîzmê nakim. Ez tehlûkeya vê nêzîkatiyê dizanim. Ez behsa utopyayên cennetê yên 'Xwedatî' yên danehevên sermaye û desthilatdariyê jî nakim. Ez xwedî pêşbînî me ku ev nêzîkatî jî hûrûkûr çî îfade dike, armancên wê yên bi tehlûke û hilweşîner çî ne. Materyalîzmê jî soza cenneta kominîzmê ya vulger dabû û ew jî kêrhatî nebû, çor bû, ez dikarim bibêjim ku bi awayekî varyanteke ya seriyê din bû. Jixwe em ji tecrûbeyên xwe yên jiyana rojane fêhm dikin ku ji her cure sozdana lîberalîzmê bêhna cehennemê tê.

Ji bo pêkhatina Xwezaya Sêyemîn hewcedarî bi 'dem'êke dirêj heye. Xwezaya Yekemîn û Duyemîn di qonaxeke jor de li ser bingehê cihêwaziyan weke sîstema demokratîk a rejîma pêkhatin û îfadekirina wekhevî û azadiyê, eger di nava wê de xisletên civaka ekolojîk û femînen pêş bikevin mumkîn e. Xwezaya civaka mirov hêzên pêkanîna vê qonaxê hildigire. Ya divê mirov zêde li ser bifikire meseleya xwezayên cihêwaz e, eger mirov bi vê rêbazê nêzîkî wê bibe, dikare mirov bibe pêkanînên hê manedar ên teorîk û pratîkê.

Di van demên dawiyê de pirsgrêkeke girîng a rêbazê di çarçoveya gerdûnîgirî û îzafiyetê de tê guftûgokirin. Mirov vê weke gerdûngirî û taybetbûna maneyê şîrove bike wê heman naverokê îfade bike. Em bi pirsgrêkeke rêbazê re rûbirû ne ku divê bi baldarî ji hev were derxistin. Em dikarin vê

pirsgirêkê weke qonaxa nû ya cihêkirina obje û sûbjeyê gihiştîyê jî terîf bikin. Ji nêzîkatiyên hişk ên amûrên sermaye û desthilatdariyê re bi pirranî 'qanûn' tê gotin, ev yek ji ber şertên maddî yên di bingehê pirsgirêkên rêbazê yên bi vî rengî de ne. Etîketa 'gerdûnîtiyê' li nêzîkatiya qanûnîk tê xistin û ev jî ji nêz ve têkiliya xwe bi amûrên rewakirinê yên îdeolojîk re heye. Gotina "qanûn hesin dibirre" ji vê derê tê. Divê mirov baş fêhm bike ku qanûn berhemekî desthilatdariyê ye. Em ji bîr nekin ku desthilatdarî tê maneya sermayeyê. Hukumraniya desthilatdariyê di heman demê de tê maneya 'qanûnê'. Qanûn jî çiqasî 'gerdûn' be, ewqas jî bi hêz e, û li ber rabûna wê bêîmkan tê kirin. Ji pêjna mirov bi vî rengî avakirina xwedê destpê dîke. Mirovê xwediyê desthilatdariyê dîkteya xwe ya nikare eşkere îfade bike îlahî dîke û bi vî awayî amûrekî rewakirinê dahiyane diafirîne û tesewir dîke ku wê desthilatdariya xwe hê bi hêsanî dewam bike. Ji lewra divê mirov baş fêhm bike ku di bingehê tevahiya gerdûnîtiyan de –hemû nebin jî –hewldanên bi vî rengî bi rêje û nisbeteke girîng cih digirin.

Îzafiyet jî herçiqasî weke qutbekî dijber bê nîşandan jî bi xwe jî tehlûkeyên bi heman rengî hildigire. Rewşa mirovê bi tevahî piçûk hatiye xistin ji rêzik, rê û rêbazê hatiye dûr kirin îfade dîke. Ji têgihiştina li seriyekî din a dibêje "Çiqas mirov hene ewqas jî rêzik û rêbaz hene" derî vekirî dihêle. Li gorî ku di pratîkê de derfet û îmkanê vê yekê nînin, di encamê de bivê nevê êsîrî qanûnên gerdûnîtiyê bibe. Herdu têgihiştin jî para mejiyê civaka mirov an zêde mezin dikin ango digihînin asta 'qanûna gerdûnî', yan jî mijarê dadixin astekê bi şeweyê "Herkes qanûna xwe heye" pirr piçûk dibînin û ji rê derdixin. Gengaz e ku mirov mejiyê civakî hê bi awayekî rastî şîrove bike. Eger mirov şîroveya îzafiyet û qanûna gerdûnî negihîne asta wan bike qutbên dijberê hev weke rewşa rastiyê ya di zikhev de bike têgîn dikare rê li vegotîneke kêrhatî veke. Rêzîkgiriya gerdûnî ya naguhere digihîje pêşketina li ser xeteke rast ku dawiya vê hebûya, di gerdûnê de diviyabû heta niha em gihiştibûnaye. Qusûreke bi vî rengî ya li ser xeta rast a pêşketinê heye. Eger rastbûya ku gerdûn timî ber bi armanckê ve rast diçe, li gorî têgîna 'ezeliyetê' ya naveroka xwe bêserûbiniye, diviyabû heta niha gihiştibûya armanca xwe. Berevajî, eger îzafiyet a têgîna 'xelekwariya bêserûbinî' di nava xwe de di hewîne rastbûya, diviyabû guherîn û pêşketinê heyî yên gerdûnî pêk nehatana, neqewimiyana. Ji ber van sedeman li ser xeteke rast pêşketina gerdûnî û xelekwarîbûn (çemberwarîtî) têgihiştinê rêbazî ne, ji ravekirina pêşketina gerdûnî ya cihêwaz dibe û diguhere mehrûm in. Rêbazên bi qusûr in. Rêbaza nêzîk rastiyê ew e, "Bi cihêwazbûnê re guhertinê mumkîn dîke; bi qasî kêlî, anîha jî di nava xwe de bêserûbinîtiyê di hewîne". Ez yeqîn dikim ku divê bi vê avahiyê were terîf kirin. Pêşketin bi qasî ku xelekwarî ye, xelekwarîtî jî bi qasî ku pêşketin e, bêserûbinîtiyê di kêliya anîha de veşartî ye, di navê de ye, yekparebûna pêkhatina kêliyê jî di nava xwe de bêserûbinîtiyê di hewîne, ji bo avakirina rejîma heqîqetê ev perspektîfeke rêbazî ya bêtir ravekirî û bê fêhmîkirin pêşkêş dîke.

Girîng e ku di mijara rêbaza diyalektîkî de jî em li ser hin xusûsan rawestin. Bêguman keşîf kirina rêbaza diyalektîkî destketiyeke gelekî mezin e. Bi çavdêriyeke hûrûkûr her kêlî mirov keşîf dîke ku gerdûn xwedî karektereke diyalektîkî ye. Lê xusûsa li vir dibe pirsgirêk ew e, divê diyalektîk çawa were terîf kirin. Di mijara diyalektîkê de cudahiya di navbera şîroveya Hegel û Marks de tê zanîn. Hilweşîna herdu şîroveyan rê lê vekirî cihê kêfxweşiyê nîne. Şîroveya Hegelwarî rê li avakirina Dewleta Elman a Milliyetgir vekirî û bi cihanîna faşîzmê encamên xwe yên xeternak nîşan dane. Herçiqasî encamên bicihanîna çînparêziya teng û sosyalîzmê ya peyrewên Marks cuda be jî tê zanîn rê li gelek rewşên neyênî û hilweşînê vekirin. Li vir, li şûna ku mirov qusûrê di Marks an jî Hegel de bibîne, divê mirov qusûrê ya wan kesên diyalektîk têra xwe şaş şîrove kirine û bêtir rast nêzîk nebûne, bibîne. Jixwe rast nîne ku mirov nêzîkatiya diyalektîkî bike malê Hegel û Marks, herweha mirov wê bike malê fikra Yewnana Serdema Antîk jî tespîteke di cih de nîne. Di hozanî û zanyariya Rojhilat de mirov têra xwe li şîroveyên diyalektîkê rast tê. Bêguman li Yewnaniyê Serdema Antîk û Rohnîbûna Ewrûpayê di vê mijarê de destketiyên girîng pêk hatine.

Diyalektîkê ne weke yekîtiya dijberên hevdu hildiweşînin, ne jî guhertinê bê dijber bi şeweyê pêkhatin û afirandina kêliyê şîrovekirin rast e. Têgihiştina yekemîn herî çor e, qutban ber bi meyla dijmintiyê ve dibe, gerdûnê ji rêzikan bêpar û timî di nava koasê de dibîne û jê wêdetir jî ev têgihiştin ti encamê nade. Têgihiştina duyemîn jî pêşketinê bê tengezarî, ji dijberan bêpar, xwedî hêza xwe nîne, pêdiviya bi hêzeke ji derve timî ferz dîke, piştrastkirina vê têgihiştinê jî mumkîn xuya nake. Baş tê zanîn ku mirov di vî derî re digihîje metafîzîkê.

Naxwe gelekî girîng e ku mirov diyalektîkê ji van herdu şîroveyên her yek ji wan li seriyekî rizgar bike û bimale. Diyalektîkeke avaker û ne hilweşîner jixwe xusûseke di bûyeran de tê dîtin. Mînak mirov bi xwe, belkî jî bi qasî temenê gerdûnê yê tê hesabkirin pêşketîneke diyalektîkî di nava xwe de hildigire. Ji perçikên jêr-atomên ên herî pêşketî heta bi atom û molekulan bi tevahî qonaxên biyolojîk ên beridînê di nava xwe de hildigire. Ev pêşketina harîqûlade diyalektîkî ye. Lê bi awayekî neyê

înkarkirin li naverastê ye ku diyalektîkeke pêşdebir û avaker e. Bêguman nakokiyên çîmî (mirov dikare yên qebîleyî, etnîkî, neteweyî û sîstemî jî li van zêde bike) yên gelekî têne guftûgokirin hin dijmintiyên diyar hildigirin. Lê eger em hêza aqil a gelekî nerm ji bîr nekin, bêyî ku tevkujî bibin mirov dikare van nakokiyên li gorî ruhê diyalektîkê çareser bike. Jixwe xwezaya civakê bi mînakên bêhejmar ên van çareseriyên tijî ye. Îdeologan li cihê xwestin pêşketinê baştir rave bikin, belkî jî li derveyî îradeya wan encamên berevajî bi dest xistin û nikarîbûn xwe ji ketina vê rewşê rizgar bikin. Ji ber ku gelek caran ketinê vê rewşê, ev jî hê girîngiya şîrovekirina diyalektîkê nîşan dide.

Di mijara diyalektîkê de ji bo rênedana şaşiyekê divê mirov qiyasa wê bi metafizîkê re jî bi kurtî şîrove bike. Ji ber ku metafizîkê li derve bi afirênerekî li pêkhatinê geriyaye, bêguman ev di dîrokê de nêzîkatîya herî bê kêr e. Felsefe, dîn û zanîspereştiya pozîtîv a vê nêzîkatîyê rê li wan vekir bi temamî sîstemeke 'mêtinkariya zêhnî' afirand. Xwezaya hewcedariya xwe bi afirênerekî ji derve nîne yan jî hebe ev afirêner ji derve na dikare ji hundir be. Lê mirov bi hêsanî dikare îddîa bike ku metafizîkê 'rejîmên mêtinkar ên zêhnî' mîna afirênerekî ji derve li ser mejiyê xwezaya civakî bi cih kir. Ji lewra rexnekirina metafizîkê û jê bihurîn gelekî girîng e.

Lê belê aliyekî din ê metafizîkê heye dixwazim li ser rawestim. Ez dibêjim mirov bê metafizîk nikare bitebite. Metafizîka ez behsa wê dikim, afirêneryên çandî yên civaka mirov in. Tevî mîtolojî, dîn, felsefe û zanistan, her cure huner, polîtîka û teknîkên hilberînê jî di nava wê de cih digirin. Berdêla fizîkî ya hisên qencî û bedewiyê nînin. Ev nirxên xweserî mirov in. Nexasim huner û exlaq nirxên metafizîk in. Li vir a divê were zelalkirin xusûsa dualîteya metafizîk-diyalektîkê nîne, cihêkirina di navbera afirênerya metafizîka baş û xweşik û metafizîka xirab û kirêt de ye. Dîsa dualîteya dîn-bêdînî, felsefe-zanist ne, dîn, felsefe, baweriyên zanistî, heqîqet û rastiyên jiyane balkêş dikin û dihêlin ku mirov karibe bêtir xwe lê ragire.

Divê mirov ji bîr neke ku xwezayê lîstîkeke mezin û pîrrecure li pêşiya jiyana mirov daniye ser dikê. Rola mirov a li ser vê dikê nabe ku mîna ya xwezayê be. Ew li ser vê dikê bi tenê bi lîstîkên çêkirine wê jiyana xwe sererast bike. Ji ber vê rastiya hûrûkûr e ku şano weke nîşandana jiyane tê terîfkirin. Li vir a girîng ew e, di vê jiyana li ser dikê de daxistina asta herî jêr a şaşiyên, aliyên xirab û krêt e; derxistina asta herî jor a rastî, qencî û bedewiyê ye. Em dema behsa metafizîka qenc, xweşik û rast dikin, em vê karakterîstîkiya mirov a kûr destnîşan dikin. Naxwe ez behsa metafizîkên mirov kor, kerr û bêhis nakim. Ez yeqîn dikim ku wexta mirov muqayeseya der barê diyalektîk-metafizîkê de dike, ev tespît gelekî girîng in.

Ez yeqîn dikim ku min binê şêwaza xwe ya nirxandina agahî û rêbaza rexneyê bi xetên stûr xêz kir. Bi kêmanî, min zanist û rêbaza rê li ber modernîteya kapîtalîst vedike bi sînor be jî rohnî û zelal kir. Em ji rastiya wê zêde ne piştrast bin jî li şûna dema 'kaosê' ya ji avahiya modernîteyê peyda dibe, şensê me heye ku 'ji bo gavavêtinên di warê azadî û demokrasîyê de şêwazê xwe yê rêbaz û zanistê pêş bixin.' Ji bo em vegotin û ravekirina xwe hêsan bikin, em ê xulase mijara xwe xal bi xal rêz bikin:

- 1- Divê têkiliya têgihiştina (paradîgma) rêbaz û zanistê ya hîmên wê Roger, Francis Bacon û Descartes danîn, bi kapîtalîzmê re baş bê dîtin û li ser vî esasî bê rexnekirin.
- 2- Objektîvîte û súbjektîvîte zêde ji hev hatine cihêkirin û bi vî awayî cihêbûna behsa wê tê kirin li ser gelek dualîteyên din jî hatiye nîşandan. Bi vê yekê; bi ferdiyetê (súbje) civak (obje) li her cure îstîsmarê hatiye vekirin.
- 3- Bi vê têgihiştina rêbaz û zanistê cihêkirina civakê weke bûrjûva û proleter gelekî xwezayî hatiye dîtin û bi vê yekê, rê hatiye lê vekirin ku proleter weke obje were bikaranîn.
- 4- Modernîteya kapîtalîst bi gotina xwe ya 'zanistê hêz e' têkiliya zanist û desthilatdariyê hûnaye û hîmê wê daniye. Bi vê, pîr zû yekîtiya zanist û desthilatdariyê çêkiriye û ew kiriye sîleha bingehîn a sîstemê.
- 5- Kengî aliyên dîn û metafizîkê yên xurafe (beredayî) û di fikrê de sabit û asêbûyî derketin, modernîteya kapîtalîst şêwazê zanistê yê pozîtîvîst kir veguherand dînekî nû û bi navê têkoşîna li dijî dîn û metafizîkê dîne xwe ava û serdest kir.
- 6- Lîberalîzm (azadîxwazî) kir îdeolojiya xwe ya fermî û ew kir amûrekî herî xurt ê lihevkerinê. Li aliyekî din jî îdeolojiyên dijber hemû bi ser xwe ve kirin û lîberalîzm weke sîleheke

- asîmîlasyonê bi kar anî û fena 'dest û zêhnekî nayê dîtin' hegemonya xwe ya îdeolojîk bi xurtî pêk anî.
- 7- Bi fermîkirina lîberalîzm û pozîtîvîzmê re, gelek êkolên îdeolojîk û dibistanên fikrê ji pêş çavên xwe xistine, piçûk xistine, nameze heta dijber (muxalîf) bi ser xwe ve kirin di vê hewldana xwe de bi îsrar bû.
  - 8- Felsefe û exlaq ji pêş çav xistiye; bi vî awayî kiriye ku şensê dijberên sîstemê di warê perspektîf û helwestdanî de (tercîha azad=exlaq) kêmkiriye.
  - 9- Bi disîplînekirineke zêde yekparebûn û hêza maneyê ya zanistê parçe kiriye; fil bi mûyên wî, daristan jî bi daran rave kiriye. Zanistêke zêde parçekirî hem bi hêsayî bi desthilatdariyê ve te girêdan, hem jî dibe teknoloji û rê li ber qadeke mezin a karê vedike. Ji ber ku êdî armanca zanistê keşîfkirina maneya esasî ya jiyana nîne, armanca bi destxistina pereyan e. Ji xeta zanist-zana ber bi xeta zanist-hêz-pere ve gav hatiye avêtin. Zanist-desthilatdarî-sermaye hevgirtina nû ya pîroz a modernîteyê ye.
  - 10- Şaristaniyê (şaristaniya bajêr a tebeqî) jin kirin jinkok, kirin pîrek (koleya herî pêşketî), di modernîzma kapîtalîst de jî mêr (bi saya welatîbûnê) hat xesandin û ew kirin pîrek. Bi vî awayî kirin ku civakê bi tevahî mîna pîrekê (li gorî Hîtler civak mîna pîrekê ye) bi rê ve bibin. Civak kirin mîna mihîna suwarbûnê û bermaliya dewlet-neteweyê.
  - 11- Di modernîteyê de desthilatdarî hem di nava civakê de hem jî di nava civakan de şerekî dewamî îfade dike. Gotina Hobbes a ji bo civaka beriya kapîtalîzmê aniye ziman 'her kes bi her kesî re timî di nava şer de ye' ya rastî vê gotinê bi hosteyî di bin modernîteya kapîtalîst de cih girtiye. Qirkirin di vî şerî de asta herî jor îfade dikin.
  - 12- Ji ber ku di sîstema modernîteya kapîtalîst de pêvajoya berfirehbûnê ya navend-hawîrdorê tamam nebûye, êkolojî gihiştîye astekê ranake, bê karî, xizanî û kêmbûna heqdestê, burokasiya gihiştîye wê astê ku derve daqurtîne, hedimandina civaka xwedayî, beşê herî kurtêlxur ê sermayê ye ji hilberînê qut ê finansî global hegemonîk bûye û li hemberî van bûyeran hemûyan piraniya civakê û li her qadê tevne berxwedanê yê pêşdikevin, rê li ber krîzeke avabûnê û strukturel vedikin.
  - 13- Di demên krîzên pêwendîdarî avabûnê û strukturel de pêvajoyên hem şoreş û dij-şoreşê, hem jî pêngavên demokratîk-azadî tevî darbeyên totalîter-faşîst dikarin di zikhev de biqewimin. Yê sîstemên rêbaz û zanistê bi hosteyî pêşde bibin û bixin bingehê çalakîyên xwe, herî zêde ew ê bibin xwediyê şensê avakirina sîstema nû ya civakê.
  - 14- Tevgerên demokratîk, êkolojîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz (adil) di demên krîzên strukturel û neqeba kaosê de bi pêngavên destpêkê yê piçûk ên hosteyane dikarin di demên kurt de paşeroja dirêj diyar bikin.

Ji bo vê jî:

- 1- Divê sosyolojî di çarçoveya dîrokî û mekanî de weke rêberê çalakiyan bê dîtin;
- 2- Modernîteya kapîtalîst êdî avabûna wê ya bi kansêr di gelek qadan de xwe dide der, li gorî vê rastiyê, bi çardeh xalên me hewl da bi nav bikin, divê li dijî wê bê derketin û çareseriyên li dijî sîstemê bêne dîtin;
- 3- Divê dualîteyên çor hemû (di serî de îdealîzm-materyalîzm, diyalektîk-metafizîk, lîberalîzm-sosyalîzm, deîzm-ateîzm û her wekî din) yê xwe dispêrin cihêkariya îdeolojîk a sîbjektîvîzm-objektîvîzmê li dawiyê bêne hiştin û manedartiya (hunerê şîroveyê) bi tevahî destketiyên zanistî dixê hîmê xwe esas bigire;
- 4- Metafizîkeke mirov a girêdayî qencî, delalî, azadî û rastiyê hem divê di rêbaza rexneyî de, hem jî di pêngavên avakirina nû de ti carî neyê kêmkirin;
- 5- Divê gotina siyaseta demokratîk esas bê dîtin;



- 6- Divê li qadên krîz û desthilatdarî hebe li dora gotina siyaseta demokratîk bi hezaran organîzasyonên civaka sîvîl (li gorî pêdiviya bi wan ji sisê heta organîzasyonên bi hezaran kes têde cih bigire) bêne pêkanîn;
- 7- Divê civaka neteweyî ya nû were avakirin weke neteweya demokratîk bê sazîkirin; neteweya demokratîk dikare li derveyî dewleta netewe û li kêleka wî yan jî di zikhev de hebe;
- 8- Şêwazê rêveberiya siyasî ya neteweya demokratîk dikare bi awayekî xwecihî, neteweyî, herêmî û li ser hîmê konfederalîzm demokratîk a dinyewî pêşde bibe (neteweyên cihê dikarin xwe weke neteweyekî demokratîk bi rêxistin bikin. Di nav heman neteweyî de dewleta netewe û neteweyê demokratîk dikarin xwe bi rêxistin bikin. Konfederalîzmên herêmî yên demokratîk û Konfederalîzm Neteweyên Demokratîk ên Dinyayê dikarin li gorî Neteweyên Yekbûyî ya niha hewce bin û di çareserkirina pirsgirêkên dinyewî û herêmî-neteweyî de bi tesîr bin.);
- 9- Li hemberî îndustriyalîzmê ya ji modernîteyê maye û yek ji şaxê wê yê xurt e, (Modernîte sê şaxên wê hene: a- hilberîna kapîtalîst, b- îndustriyalîzm, c- dewleta netewe) divê civaka demokratîk ekonomî û teknîkê ekolojîk bike;
- 10- Divê parastina civakê ji aliyê milîsên gel ve bê bicihanîn;
- 11- Li şûna nîzame mêrane yê bingehê xwe dewlet û hiyarkerşiya bi hêz e, divê sistêmên nû yên malbatan ên xwe dispêrin wekhevî û azadiya kûr a ji koletiya kûr a jinê rizgarbûne bêne avakirin.

## **E- MANEYA DÎROKÎ YA LÊGERÎNA LI RÊBAZ Û HEQÎQETÊ**

Bi rexneyeke dijber, ez rêbazeke nû pêşniyar nakim. Ev nayê wê maneyê ku ez bêrêbazbûnê jî pêşniyar dikim. Ne tenê di jiyana mirov de, di jiyana xwezayê ya zindî û nezindiyan hemûyan de qanûn, rêbaz û rêyên bi wan ve girêdayî hene û haya min ji van xusûsan heye. Ez qîmetekê didim rê û rêbazê. Lê di têgihîştina qanûn û rêbazan de her tim cewherekî determînîstîk heye, ji lewra bi girîngî û bi hosteyî divê bibêjim; mayîndebûn û israra di vê yekê de dibe ku rê li ber înkara azadî û pêşketinê veke. Ez nafikirim gerdûnên bê rêbaz û qanûn hebin. Ez her weha ji mekanîzma bingehîn a Descartes bawer nakim ku gerdûnê bi tenê weke nîzameke matematîkî digire dest. Gumanên min ên kûr hene ku mentiqê qanûn û matematîkê bi nexweşî ne. Ez zêhniyeta rahibên sumeran ên matematîk û qanûn vedîtin û zêhniyeta zanistî ya roja me ya îro gelekî dişibînim hevdu. Ez yeqîn dikim ku herdu jî heman şaristaniyê temsîl dikin.

Dijbertiya rêbazê nayê wê maneyê ku mirov wê înkara dike, di heman demê de nayê wê maneyê mirov li rêbazeke alternatîf digere. Divê were gotin; hêja ye ku mirov li şîroveyên alternatîf ên ji bo jiyaneke azad îmkana didin, vekirî be. Eger armanc xwe gihandina maneya jiyane be, divê rêbaz jî navbêynkariya wê bike. Dewleta mezin û hilberîna îndustriyal a mezin bi serê xwe ji bexteweriyê zêdetir ji mirovatiyê re şer û hilweşîn anîne. Dema hilberîn û hêz dibin yek, mirov ji maneyê bêhtir dûr dixin. Kesên mal û milk daneserhev li hemberî jiyane her tim bûne ji wan kesên sereke yên bê hurmet tevgeriyane. Civak her tim bi guman nêzîkî daneserhevê û maldaran bûye. Ji bo mirov ji pirsgirêka rêbazê rizgar bibe yan jî vê pirsgirêkê li dawî bihêle û derbas bike; divê mirov karibe xwe li şaristanî û serdema têde rakişîne û pêre bikeve nava hesabpîrsîn û dayîne. Di demên cihê yên dîrokê de em li mînakên balkêş ên di vî warî de rast tên. Mirov heta kapîtalîzmê û disîplînen zanistî û rêbazên wê yên mohra xwe li qalib û saziyên wê yên hemdem xistine radîkal rexne neke û li ser vî hîmî ji bo zanista mirov nêzîktirî jiyana azad dike, ji bo avakirina nû zendûbenda banede, gera li rêyekê hewldaneke tewş e. Niyeta min nîne ku ez bi kêra dualîteya modernîte-postmodernîteyê bêm. Di vê mijarê de tevî ku hurmeta min ji gelek nêzîkatiyan re heye jî di wê baweriyê de me ku hîne ji cewherê pirsgirêkê gelekî dûr in. Tê qebûlkirin ku postmodernîte kirasê nû ye, modernîte pê hebûna xwe dewam dike.

Ez neçar im ku şîroveya xwe bi têgîna REJÎMA HEQÎQETÊ pêşkêş bikim. Ez bi vê, ji rêbazeke alternatîf wêdetir, li rêyekê digirim ku pê karibim ji nava pirsgirêkên mirov bi wan xapiyane û ji nirxên azadiyê dûr hatine xistin, derkevim. Bêguman di civaka mirov de her tim lêgerîna li heqîqetê hebû. Ji mîtolojiyan heta dînan ji felsefeyan heta gelek zanistên roja me ya îro gelek alternatîf ji bo bibin bersiva vê lêgerînê derketine holê. Jiyan li derveyî van alternatîfan nayê fikirîn, lê di heman demê

de di vê mijarê de îroniyeke nayê înkarkirin heye, ew jî ew e ku guloka pirsgirêkan jî ji van alternatîfan çêbûye. Yanî ne bêyî wan dibe, ne jî bi wan dibe. Rastiyeke welê dualî heye. Lê modernîteya me ya îro cihêtiyeke xwe ya nedîtî heye. Modernîte gihiştîye wan sînoran ku êdî nikare dewam bike. Em dikarin yekser pirsgirêkên wê yên mehşereke rastî tînin hişê mirov weha rêz bikin; şênîyên cîhanê bi lez zêde dibin, dewlemendiyên sererd û binerd diqedin, hawîrdor tê talankirin, derza li civakê ketiye bi lez mezin dibe, têkiliyên exlaqî ji hev dikevin, jiyana ji zeman û mekan qut dibe, jiyana ji avzûnkarî û helbestwarîbûna xwe dibe, streseke mezin, gidîşa çekên nuklêr ên karin cîhanê wergerînin çolekê û cureyên şeran ku xwe li bunyeya civakê hemûyî gerandine û dawî li wan nayê. Gihiştina vê qonaxê bi xwe jî nîşan dide ku rejîmên me yên heqîqetê îflas kirine. Min navê ez tabloyeke bê hêvî û reşbîn çêkim. Lê em nikarin li hemberî jiyana ji destê me diçe bêdeng bimînin û neqîrin. Em bê hêvî nebin, rondikên xwe nebarînin. Lê ji bo vê jî çare divê.

Gelo lêgerîna me ya li heqîqetê hewldaneke tewş bû, naxwe em di serdema hêzên tariyê re derbas dibin? Çewtiyên mezin kengî û li ku hatin kirin; kengî ketinê û di ku de asê man?

Ji xwe bawer ez dikarim bibêjim; modenîteya kapîtalîst bi giranî hêza xwe ji avakirina civakên çewt girtiye. Bêguman nabe mirov înkare bike ku li dijî van çewtiyan gelekî têkoşînên mezin hatine meşandin. Sîstemên serketî hatin nîşandan jî ya bi serê wan hatiye li holê ye. Hingî gelo weke ku sîstem îdîa dike ya ku em têde dijîn, dinyaya dawî û ebedî ye? Gelo dinyayeke din mumkîn nîne? Haya min ji min heye ku ez jî pirsên rojane têne pirsîn dubare dikim. Belê, ji çewtiyên rêbazê yên di gelek xalan de tîn kirin heta bi şaşiyên di disîplînên zanistê de, ji şîroveyên desthilatdarî û aboriyê heta bi têgihiştina hukim li estetîkê dike û sazîbûyîne, ez dikarim rûyê rastî yê gelek diyardeyan raxînim ber çavan. Divê ev yek piçûk neyê dîtîn. Di vê çarçoveyê de ez xwe xwediyê wê hêzê dibînim ku bikevim nava ceribandinekê. Ez vê jî weke wezîfe û deynekî xwe yê li hemberî nixên azadiyê qebûl dikim.

Ji bo ketina nava mijarê, ez dikarim weke hevoka destpêkê bibêjim; dabeşbûn û cihêbûna du qalibên bingeîn ên hukim li fikra mirov kirine obje-sûbje, îdealîst-materyalîst, diyalektîk-metafizîk, felsefî-zanistî, mîtolojîk-dînî mane qelskirine û berevajî kirine. Hûrûkûrbûna di van dualîteyan de yek ji çewtiya bingeîn a rêbazê ye ku rê li ber modenîteya kapîtalîst vekiriye. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de pêşketin an jî pêşdebirina fikir û baweriyên ji aliyê îstîsmarkaran ve hatiye destekkirin û di dewamkirina sîstemên wan de rista rewakirinê bi cih anîne û di kapîtalîzmê de gihiştine asta herî jor. Şîrovekirina van dualîteyan weke dîrokeke neberçav jî ya rastî bi kêra van sîstemên mêtînger û îqtîdarên li ser kar hatiye. Eger bi van dualîteyan serî li zêhniyeta mirovatîyê nehatiba gerandin wê di dîrokê de ti nîzama îstîsmar û îqtîdarê ev çend bi tesîr nebûna. Şerê zêhniyetê yê li dora van dualîteyan tê meşandin, mîna şehwetê hîne zêdetir rê li ber xwesteka desthilatdarî û mêtîngeriyê vedike. Şopger û şopbirrên heqîqetê, çiqas di van dualîteyan de serketîbûn, ewçend jî li cem desthilatdar û mêtîngeran bûne xwedî paye û cihekî berz. Ji lewra gotina 'Heqîqet desthilatdarî ye, desthilatdarî heqîqet e' gelekî cih dîtiye û hatiye piştrastkirin. Rejîma heqîqetê ya li vir behsa wê tê kirin, hevgirtiyê herî baş ê rejîma îstîsmara siyasî ye. Encama vê hevgirtinê bêhtir zordarî û îstîsmar e. Di encama vê de jî jiyana azad û manedar ji dest diçe.

Hingî karê me yê pêşî yê ciddî divê em weke rêbaz bi cih bînin ew e ku em dev ji vê rejîma heqîqetê berdin. Ya rastî divê mirov helwesteke negatîf nîşan bide: divê mirov ji her alî ve negatîf nêzî rejîma heqîqetê ya sîstemê bibe! Ez behsa helwest û beredanîneke hişk û çor nakim. Ez dibêjim; divê mirov wê çareser bike. Ne tenê li dijî tevn û torên desthilatdaran, li dijî kulmoza mêtîngeran jî helwest divê. Kengî van kulmozan li her deverê li hemberî xwe berxwedaneke manedar dîtîn û ji bo avakirina koman xebat hatin meşandin, hingê sîstemê ji dûvikê xwe ve hatibe zevtkirin û êdî wê dest pê bike ji hev bikeve. Bi tevahî civak bi zêhniyetê têne avakirin û berhemê wê ne. Weke tê gotin; dest û ling civakê ava nakin. Eger wisa bûya dinya li pêşiya me wê pirr cihê bûna. Bi tevahî bûyerên girîng ên dîrokê, pêşketin û pêkhatin weke berhemên îrade û zêhniyetên bi bandor derketin holê. Yek ji çewtiyên mezin ên rêbaza Marksîst ew bû; bêyî ku soresê di qadên zêhnî de xurt bike, li bendê ma proleterya rojane di bin nîrê zordestî û îstîsmarê de civaka nû ava bike. Marksîstan nedît ku proleter kole ye ku ji nû ve hatiye keşîf kirin. Ew jî bi gotina beredayî ya weke 'karkerê azad' xapiyane. Tevî kêmasiyên din encama vê jî tê zanîn.

Naxwe tevî destketiyên zanistî yên mirovatîyê ku divê em maneyê bidin wan, zêhniyeta me divê çawa be?

Ji bo em bersiveke zelal bidin vê pirsê divê em objektîvîte û sîbjektîvîteyê hûrûkûr deşîfre bikin. Ji ber ku herdu zêhniyet jî di encamê de li heman benderê ne.

Ya yekemîn, objektîvîte weke ku gelek caran tê îdîakirin, îfadeya qanûnên civak û xwezayê nîne. Eger mirov hay jê hebe û hûrûkûr li ser biponije, mirov ê bibîne qanûna objektîvîteyê ji biwêja berê

'gotina Xwedê' tê û şêwazê wê yê modern îfade dike. Di vê objektîvîteyê de her tim deng di ser civak û xwezayê re holan didin. Eger em hinekî din mijarê veçîrînin û ji hev bijênînin, em ê fêhm bikin ku ev deng ji ber serdestiya îstîsmarkar û zordar tê. Zêhnê objektîv û pergala deng dîbihîse, eleqeya wan ji nêz ve bi sîstemên şaristaniyê re heye. Ji aliyê van sîsteman ve hatine terbiyekirin û guh aşînayî wan kirine. Ji objeyan agahiyên nû bêne girtin jî ev yekser bi ser hin deverên sîstemê ve dibin. Her cara tişteki nû tê dîtin, xwediyên sîstema teknîk wan berê yan jî paşê bi hezaran ben û qeydî bi sîstemê ve girê didin. Eger di berevajiyê wê de israr were kirin; weke gelek mînakên di dîrokê de hatine dîtin; ji Adem heta Brahîm, ji Manî heta Hellac-i Mansûr, ji Saint Paul heta Giordano Brûno wê li xezeba xwedayên sîstemê rast bûn. Ji ber ku objektîvîte nêzî rastî û edaletê ye, dibe ku bi hezaran dijminê wê çêbibin. Eger objektîvîte bi rastî fêhmkirin û çavê dil be, tişteki pirr giranbuha ye; wexta bi nirxa jiyana azad ve girê bide mirov digihîne zanatiyeke rastî. Lê ji bo vê jî divê mirov têkoşeriya fikrê ya mîna Hellac-ê Mansûr û Brûno li ber çav bigire.

Di çarçoveya qanûnên zanistî de divê mirov bi hosteyî zanibe du encaman ji objektîvîteyê bigire. Berxwedan û hewldaneke mezin jêre divê, ji bo ku mirov bizanibe kîjan encama rastiyê û ya din jî encama sîstema hakim a li ser kar e. Şêwazê fikra objektîv ku zêdetir encama fikra analîtîk e, eger bi şêwazê fikra hisî ya kêliyan a çavkaniya wê mejiyê hisî ye, neyê girêdan, di dîrokê de wê rola dînozoren duyemîn bilîze. Cinawirê bombeya atomê çekir, versiyona nû ya Levîathanê berê ye ku bi fikra analîtîk a modernîteya kapîtalîst hatiye teçhîzkirin. Tabloya neyênî ya em behsa wê dikin, berpirsiyarê wê ev versiyona nû ye. Em kengî xwedayê bê maske yê bi şiklê dewleta netewe lêbikolin, em ê ji nêz ve baş bibînin ka fikra analîtîk a objektîv dikare çi bike.

Sûbjektîvîzma li alî dijber ê objektîvîzmê cih digire di wê îdîayê de ye ku mirov dikare bi guhdarîkirina li xwe û spekulasyonên bê obje bigihîje rastiyê. Ev, şêweyekî Eflatûnî ye. Wexta bi serê xwe bimîne, weke objektîvîzmê aliyê wê yê di fikrê de sabit û dixape derdikeve holê, ango rastî bi qasî ku têderxistin û tê hiskirin rastî ye. Bi aliyekî xwe yê din dikare xwe bigihîne fikra mewcûdiyetê (existentialism). Qebûl dike ku mirov xwe bi xwe afirandî ye. Tevî ku li ser navê wê gelek ekolênfikrê ava bûne jî ji bo ku di nava sîstemê de cih bigire weke objektîvîzmê paşve nemaye. Ji ber ku di têgihîştina li civak û xwezayê de ketiye 'sûbjektîvîzmê' (înkarkirina objeyê) dibe hêzeke xurt ji bo mirov ber bi ferdperestiyê ve bibe. Têgihîştina ferdê modernîteyê dike egoîst têkiliya xwe ji nêz ve bi sûbjektîvîzmê re heye. Ji ber ku ev yek li şûna 'ez' a rast ber bi ezeziyê ve dibe, weke motîvasiyona bîngêhî a diçe civaka 'bi tenê dixwe' tê dîtin.

Sûbjektîvîzm ji fikra teqînî a 'çiqas ezîtî ewqas heqîqet' jî berpirsiyar e. Sîstema kapîtalîst gelek fikrên xwe ji vî şêwazê fikrê girtiye. Ev şêwazê fikrê di serî de edebiyat di qada hunerê de jî hatiye nîşandan û bi afirandina cîhana ferazî (imaginary) bi encam bûye. Bi rêya hunerê îndustriyê bi tevahî civak kir bin bandora xwe û meşrûiyeta sîstem hewcedarî wê ye qat bi qat bi cih tîne. Civak kêlî bi kêlî di bin bombebarana ferazî de tê ragirtin û dihêle ku qabîliyeta xwe ya fikirîne wenda bike.

Heqîqet dadikeve asta cîhanê sîmulasyonê. Maneya ferqa di navbera kopî û esil de namîne.

Aliyê erênî yê sûbjektîvîteyê li xwe guhdarîkirin, zêdetir bi fikra hisî ve girêdayî û têkildar e. Di xweguhdarîkirinê de keşîfkirina bi têderxistin û hiskirinê aliyekî xurt e.

Di zanyariya Rojhilata Naverast û Tesewifê de hewldanek hatiye dîtin ku bi rêbaza li xwe guhdarîkirinê yekparebûna civak û xwezayê bê danîn. Bi vê jî gelek qonax hatine derbaskirin. Hîne jî mirov dikare weke çavkaniyeke xurt bike ku bi kêr bê. Li hemberî objektîvîzma Rojava, sûbjektîvîzma Rojhilat di warê exlaqî de bi nêzîkbûna xwe ya civak û xwezayê xwedî roleke li pêş e. Objektîvîzm û Sûbjektîvîzm jî timî ketine nava wê nexweşiyê ku xwe weke dengê Xwedê nîşan dane. Ji vî alî ve herdu digihîjin hevdu. Nêzîkbûnê xweda, xweza û civakê yên eqlê mirov tînegihin û hundirîn in, nikarin xwe rizgar bikin û dikevin xizmeta qralên tazî û li piştperdeyê yên di rewşa xwedayên bi maske û bê maske yên sîstemê de ne.

Roja me ya îro, ya rastî di modernîteya kapîtalîst de objektîvîzm bi saziyên dibistan û zanîngehan ên pozîtîvîst (têgihîştina zanistê ya ku xwe tenê dispêre rastiyên maddî û fizîkî) ; subjektîvîzm jî bi her şêwaz saziyên xwe yên ruhaniyet û dîndariyê bi awayekî zexm û qehîm cihê xwe girtine û ji du aliyan ve sîstemê rewşa dikin. Ji rêbazeke heqîqetê, ji rejîmekê zêdetir bi dondankiya sîstemê radibin. Weke sazî û kadroyên rewakirina desthilatdarî û îstîsmarê, bi qasî saziyên mêtîngerî û zora eşkere bi kêr tînin. Careke din hêzên sîstemê yên bi gotinên 'desthilatdarî heqîqet e', û 'zanist hêz e' bûne yek li pêşberî me ne. Navê lîstika di sêgoşeya sermaye-zanist-siyasetê de ku em dikarin weke 'şîrketê' bi nav bikin, gera li heqîqetê ye. Li derveyî vê lîstikê her gera li heqîqetê ya dijminê sîstemê ye, yan tê tînekirin, yan jî dikîşînin nava xwe û hewl didin wê bihelînin. Mane gelekî zêde ji dest çûye û li hemberî vê rewşê, şaristaniya maddî di qonaxa xwe ya pêşketî de dor li me girtiye. Ji xelesa hêza sermaye-zanist-polîtîk

mirov çawa dikare xwe rizgar bike? Ji Nietzsche heta Michel Foucault filozofên azadiyê li bersiva vê pirsê geriyane û ev pirs ji wan pirsan nîne mirov karibe bersiva wê bide. Fîlozofên em behsa wan dikin, li hemberî modernîteyê hukim dane ku 'civak hatiye xesandin' û 'mirov miriye' ji lewra divê mirov van filozofan fêhm bike. Gelek nexweşî hene van hukmên filozofan piştrast dikin; kampên mirinê, bombeya atomê, şerên qirkirina etnîk, talankirina hawîrdorê, bêkariya girseyî, zêde zêde tengavbûna jiyane, pirrbûna kansêrê û nexweşiyên mîna AIDSê. Ji lewra jî gera li heqîqeta dijber jî gelekî hewce dibe.

Dema dîrokî di warê hûnandina rêbazên cihê yê nû û heqîqetan de berdar e, bi vê tespîtê mirov dikare bibêje; îhtîmala ku civak di asta koman de ji nû ve were avakirin zêdetir e. Ji wezîfeyên rojane yê pratîk in ku utopyayên azadî û wekhevîyê bi awayekî berçav di nava civakê de bêne avakirin. Ya li vir hewce dike nîrxê riya mirov daye ber xwe û hêza îradeya (vîna) azadiyê ye. Em behsa wê demê dikin ku eşqa heqîqetê nêzî jiyana azad dibe. Gotina me ev e: HEQÎQET EŞQ E, EŞQ JIYANA AZAD E!

Wê wextê, hem weke rêbaz û hem jî rejîma heqîqetê em bi eşq bi pey jiyana azad nekevin, em ne karin xwe bigihînin zanîna hewcedariya me pê heye, ne jî em dikarin pêşengên nû û dinya xwe ya civakî ava bikin. Di çarçoveya van tesewirên xwe de em ji nêz ve li mijara zanîn û pêşengiyê binêrin.

## F- XWEZAYA CIVAKÎ Û HEQÎQET

### 1- Pênasekirina Heqîqeta Civakî

Civakbûyîn weke rastiyeke hatiye avakirin a esas afirîneriyeke mirov e. Bêguman em di wî de mîqdara maddeyê û pêşketina wî ya biyolojîk ji nedîtî ve nayên. Em dizanin ku ev weke rastiyeke fîzîk, kîmya û biyolojiyê têne lêkolîn. Her weha antropolojî û psîkolojî yê mirov weke cins û zêhnê lêdikolin di qada xwe de maneyê çêdikin. Herçend em rexne jî bikin, tiştên em ji rewşa parçebûyî ya zanistê hîn dibin hene. Em timûtim behsa asta cihêwaz a serwestbûnê ya rastiya civakî dikin, em vê dikin da ku ferqa wê ji zanistên din were fêhmkirin. Eger em vê ferqê nebînin, em ê jî bikevin şaşiya mezin a pozîtîvîst ketinê û em ê nikaribin xwe ji nexweşiya 'zanistiyê' rizgar bikin.

Xwezaya civakî bi xwe hebûneke welê ye, mejiyê xwezayê herî zêde li cem heye. Belkî mirov hêmanên cihê yê zêhniyetê bifikire di cih de neyê dîtin, lê zanist ji civaka dîrokî hat qutkirin û di xizmeta şaristaniya fermî de bezandin û xistin roleke welê ji desthilatdariyê re kirin çavkaniya hêzê ya herî berhemdar û ev jî dike ku em bi giringî zêhniyeta jiyana şaristaniya demokratîk û avabûna wê di ber çavan re derbas bikin. Zanist û hegemonîdariya îdeolojîk a şaristaniya fermî weke zêhniyet û avabûna wê, tevahiya dîrokê timî çalakiya li dijderketina wê û pêkanîna alternatîfa wê dewam kiriye. Têkoşîna îdeolojîk û tevgerên zanista alternatîfê her tim hebûn. Şaristanyên klasîk ji wan sîsteman in ku herî zêde pêşketina mejiyê analîtîk îstîsmar kirine. Ji bo rastiya îstîsmarkariya xwe veşêrin û ser bigirin, serî li her cure xapandinên tewşo mewşo dane, ji çavîyên form û nîşanên xeyalperest gelekî sûd wergirtine. Di qada mîtolojî, dîn, felsefe û zanistê de rastiya xwe ya maddî weke rastiya giştî ya civakî pêşkêş kirine, û timî hewldane bidin qebûlkirin ku ji bilî heqîqeta wan gera li heqîqetê hewldaneke tewş e.

Li ser vê îdeala 'tekperest', şopên sermaye û yekdestdariyê yê xwe weke 'rêya yekane û tek a rast' dibînin heye. Ji ber ku ew xwe bi vî awayî ferz dikin. Gelek rengên cuda yê Xwezaya Yekemîn û Duyemîn hene, lê mîna ku van rengan bi rengê gewr boyax bikin û hewl dane bidin qebûlkirin ku rengê bi tenê gewr e. Ji nîrxê zêde yê berhevkirî bi mîqdareke gelekî kême weke sermayeya entelektuel bi kar tînin û bi vî awayî ti carî hegemonîdariya îdeolojîk kême nekirine. Sîstemên wan ên dibistan û perwerdeyê bûne cihê jiberkirina şêwazên wan ên jiyane. Zanîngeh, qada lê heqîqet û nasnameya civakî weke ya xwe qebûlkirin ne, weke qadên înkâr û li derve hiştinê hatine bi karandin. Avahî û naveroka zanistê, li ser navê objektîvbûnê bi îhtîmam hatiye tenzîmkirin ji bo rastiya civaka dîrokî ya xwezaya civakî bike obje û wê ji rola sêbje (kirdar) derxe. Mekanîzmayên li ser xeteke hişk a şaristanyê weke form û pîvanên gerdûnî yê îdeal hatine pêşkêşkirin.

Ez yeqîn nakim ku dîroka xwezaya civakî hem paradîgmîk hem jî ampîrîk gihiştîye maneya xwe. Nivîsên li ser dîrokê yê ji wan re dîroka civakî têne gotin, ji beşên zêde parçebûyî yê sosyolojiya pozîtîvîst wêdetir ti maneyê îfade nakin. Ji teswîrkirina parçeyekî yekpareya beden wêdetir naçin.

Heta paradîgma modernîst a kapîtalîst li dawiyê neyê hiştin, bihêlin heqîqeta dîrokî were fêhmkirin, wê ji dîroka dînan zêdetir ser heqîqetê bigire û bê mane bike. Ev nêrtina paradîgmîk a Marks encamên wê yê dîrokî di roja me ya îro de baştir têne fêhmkirin. Dîroka şaş, tê maneya pratîka şaş. Bi giştî şaristanî û bi taybetî jî nêzîkatiyên paradîgmîk û ampîrîk yê modernîteya kapîtalîst heta

li dawiyê neyên hiştin, xwe gihandina nêzîkatiya paradîgmâtîk û ampîrîk a xwezaya civakî pêk nayê. Ya ez li vir dikim, herçiqasî bêyî amadekarî be jî xwe li caribandinekê radikişînim.

Dîrok sê şiklên civakan an jî şêwazê wan nas dike: civaka klan a destpêkê, dewleta çînî yan jî civaka şaristaniyê û civaka demokratîk. Nêzîkatiyên dîrokê weke xetêke dûz digirin dest û pêşketina li ser vê xetê bi navê civaka destpêk, koledarî, feodal, kapîtalîst û sosyalîst kategorîze dikin jî dogmatîk in. Bi gotineke din nêzîkatiyên bi vî rengî îdealîst û qederwarî ne. Ya girîngtir, li gorî bi navkirina min hersê şêweyên civakê jî li ser xetêke dûz pêş nakevin. Ev nêzîkatiya me nêzî sistemekê ye ku li dora xwe hûrûkûr û berfireh digere. Tevî ku ez fonksiyona diyalektîk qebûl dikim jî şîroveya dibêje du serî hevdu tine dikin û pêşde diçin rast nabînim. Nêzîkatiya fonksi-yonên bingehîn ên gerdûnê bi tez, antî-tez û sentezê şîrove dikin dikarin zêdetir bibin mentiqekî kêrhatî yê ravekirinê. Lê belê têkiliya simbiyotîk a hev xwedîkirinê ku cihêti û dewlemendiyê mumkin dike, weke şêwazekî têkiliya diyalektîkî yan jî têgihîştî-nê nêzî rêveçûna diyalektîka xwezayê ye. Yan jî xwedî xisletên ravekirinê ye.

Divê mirov ji bîr neke û haya xwe jê hebe ku di gerdûnê de ji pirtikên piçûk heta yekparebûna di asta kozmosê de, dualîteyên van pêkhatinan mumkin dikin û ya ji bandor û têkiliya van dualîteyan derdikeve holê, herduyan jî di hinavê xwe de dihewî-ne, lê ji yekparebûna herduyan wêdetir şêwazê pêkhatineke cuda esas e, gerdûnî ye. Em di bingehê tevahiya veguherîn û pêşketinê de vî şêwazê pêkhatinê dibînin.

Civak jî li derveyî vî şêwazê pêkhatinê hebûnek nîne. Xwe-diyê heman zimanê pêkhatinê ye. Bi kurtî, dualîteyan timî pêk tîne. Ji ber vê jî herduyan di hinavê xwe de dihewîne, lê ji yek-parebûna herduyan wêdetir jî derfetê dide pêkhatinê nû. Bi vî awayî serwestbûna me li diyalektîka veguherîn û pêşketina civakan, me hewcedarî zêdetir agahiya berçav dike. Em kengî bi vê têgihîştina diyalektîk nêzî şiklê civakan ên ji parçeyên herî piçûk heta yê yekpare pêkhatî bibin hingî hêza me ya hiskirin û şîrovekirinê, xisletên me yên mirovane ango potansiyela me ya mirovê azad wê hînê zêdetir bikevin nava tevgerê. Em dikarin civakê di ferd de berçav bikin hem ferdê azad ê bi berpirsîyarî pêş bixin, hem jî em dikarin civaka ji ferdên azad bi tesîr bûyî azad bikin. Derfetên azadbûnê herî zêde xwedî şensê wekhevîye-ke baş û potansiyela demokratîkbûnê ne.

Ez divê dubare bînim ziman ku wexta ez dînamîzma sêalî ya rastiya civakî destnîşan dikim ez keşfeke nû nakim. Ez bi tenê hewl didim kirasê dînamîzma pêkhatina gerdûnî li civakan bikim. Eger were pirsîn ka çima dînamîzmên sêalî, ez ê bibêjim; ji ber HEBÛNÊ. Eger ji hebûnê re jî weke pirs bersivêk bivê, wê wextê divê em pirsê 'em çima hene' bikin. Lê li gorî min hebûn nayê guftûgokirin. Eger hebûn tinebûya, jixwe hewce bi vê pirsê û pirsên din nedima. Ji tiştêkî tine re cih tineye. Di rewşa tine-bûnê de bi tenê pêk nehatin heye ango mirov dikare behsa ne tiştêkiyê bike, ev bi xwe jî ew tiştê em jêre dibêjin beredayî ye, tewş e.

Eger em hebûn, çêbûyîne qebûl bikin, wê wextê manedar e ku em behsa şêweyê çêbûnê bikin. Pê hisiyabûn ku bi tevahî maneya jiyane, bi tevahî pêşketina fikrê ji pêkhatina guherîn û pêşketinê ye. Li ser vî hîmî, ji kategoriyên fikrê yên zanistî, felse-fî, dînî û mîtolojîk kulliyateke mezin pêk anîbûn. Ma em dikarin van kulliyatan înkâr bikin. Di bingehê meseleyê de bi tevahî hemûyan xwestiye bersiva çêbûn û hebûnê bidin. Hin ji wan serî li rêbaza mîtolojîk û hinan ji wan jî serî li rêbaza dînî daye, van jî têra wan nekiriye, kategoriyên zanist û felsefeyê di hewara wan de hatine. Fonksiyon yek e, lê bersivên wan cihê ne. Li sedemên çêbûna hebûnê, çawa çêbûye û armancên wê her tim hatiye pirsîn û her kategoriyê li gorî disîplîna xwe hewl daye bersivan biafirîne. Weke disîplîna herî bi îdîa zanistê dînamîzma sêalî ya pêkhatinê bi pirranî rohnî kiriye. Wexta ku em di asta mekanîka kuantûmê de li dualîteyên madde-enerjî û pêl-parçik binêrin, em ê bibînin ku timî rê li ber pêkhatinan vedikin. Û encama ku berhema van pêkhatinên dualîte ye, weke dewama wan a sêyemîn derdikeve holê. Jixwe tevgerên vê dualîteya madde-enerjiyê gerdûnî ne. Herdu dualîte xwe di nav a sêyemîn de bi veguherînê dewam dikin, veguherîn bi awayekî pêşketinê yan jî berevajî bi paşketinê xwe dewam dike ango dînamîzma hebûnê piştrast kiriye ku ev şêwaz karakterê wê yên bingehîn e. Jixwe hewce nake ku mirov ji nû ve piştrast bike.

Em li xwe binêrin. Zaroka dê û bav, gelekî dişibe dê û bav, ji herduyan digire û dewam dike, lê ev yek cihêwaziyêke nû û bi şêweyekî nû temsîl dike. Ev cihêwazî gelekî hêdî dibe û ev yek di her bûyera xwezayê de bi vî rengî ye. Ev rewşa mirov weke çêbûna zereyeke ezêlî jî dikare were şîrovekirin. Ya rastî çêbûn bi vî şêwazî dikare di şerê hebûnê de bi ser bikeve. Çi ye şerê hebûnê? Mirov çawa mana xwe misoger dike? Mayîn, xwe bi guherînê dewamkirin e. Çima? Dibe ku ji bo piştrastkirina hebûna xwe be. Yan jî bi guhertinê temaşekirina li xwedayetiya hebûnê be!

Ya bi serê mirov nakeve û dûrî aqilan ev e: diviyabû em bi çavdêriya li tiştên çêbûne yên li nêzî xwe, bibin xwedî mentiqekî, lê çima em ji van heqîqetên bingehîn evqas dûrketin an jî hatin dûrkerin?

Eger em vê rewşa beredayî û dûrî aqilan zelal bikin, em ê wê wextê karibin bèn ser meseleya bingehîn. Ez behsa karekte-rê rêveçûna diyardeya civakî dikim ku hînê ji destpêkê ve bi vegotinan li hev hatiye alandin, sernuxumandin û piştperdekirin. Civakbûnê çima hewcedarî bi van veşartin û piştperdekirinan dît? Mejî li hemberî van bûyeran çima weke hisî û analîtîk bi du awayan dabeş bû? Fonksiyonên wan çi bûn? Bi bersivên em bidin, em ê karibin civakbûyîna xwe weke heyî, weke em di-xwazin şîrove bikin û biguherînin. Mirov weke kirdar **DIKARE ŞÎROVE BIKE Û ÇAWA DIXWAZE DIKARE BIGUHERE**. Lewma mirov hebûneke xwediyê vê qabîliyetê ye. Şîrove û daxwaza gu-hertinê, bi gotineke din fikirkirin, pêhisîn û xwestek çiqasî li gorî dînamîzma pêkhatinê be, şensê pêşketina şeweyê nû ewqasî zê-de ye. Çendîn jê dîr bikeve jî di civakbûnê de yan muhafezekar dibe yan jî paşve dikeve. Pêşketina mejiyê hisî û analîtîk li dora van pirsan pêk tê.

Eger civak bi dualîteyên weke paşketî-modern, kapîtalîst-sosyalîst, pîşesaz-cotkar, pêşverû-paşverû, bi çîn-bê çîn, bi dewlet-bê dewlet bêne pêşkêşkirin, ev zêdetir terîfa nêzî heqîqetê ya civaka xwezayî vedişêre û xwedî meyla sergirtina wê ye. Dualîteyên bi vî rengî mirov ji heqîqeta civakî dîr dixin.

Li şûna ku mirov Xwezaya Civakî bi maneyên mîtolojîk, dînî, metafîzîk û zanistî (pozîtîvîzm) hûnandî weke heqîqeta hişk a gerdûnparêziyê pêşkêş bike, bi şertê zeman û mekan ve girêdayî weke şeweyekî herî nerm ê hebûna gerdûnî li ser bingehên cudahiyên dewlemend manedarkirin wê pêşkêşkirineke zêdetir nêzî heqîqetê be. Her şîroveya bêyî ku xisletên Xwezaya Civakî baş bêne naskirin were kirin wê pêngava zanista civakî û guhertina pratîk dikare rê li ber reaksiyonên ters veke. Ji nêzîkatîyên xwedayî heta bi nêzîkatîyên pozîtîvîst tevahiya dîrokê vegotinên hatine pêşdebirin, eger nikarîbûne li yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê pêşî bigirin ji bo dernekeve asta herî jor, wê wextê divê hûrûkûr xwe rexne bikin û şîroveyeke zêdetir mirovane li ser xwe bikin, ev ji bo xizmeta ji civaka exlaqî û polîtîk re wezîfeyeke bivê nevwê ye.

Ya karaktere Xwezaya Civakî didiyê terîfa civaka exlaqî û polîtîk e ku di nava cudatîyê de yekîtiya xwe dewam dike, dîroktî û yekparetiya wê ya sereke bi rola diyarker radibe. Der barê civakê de sifetên weke kovî, modern, fodal, koldedar, kapîtalîst, sosyalîst, pîşesazî, cotkarî, bazirganî, peredar, dewletdar, neteweyî, hegemon û hwd. yên gelekî têne bi karanîn ti ji wan sifetê diyarker ê Xwezaya Civakî îfade nake. Berevajî ser digire, di encamê de maneyeke parçebûyî dide û ev jî der barê civakê de cewherê bi cihanîn û nêzîkatîyên teorîk û pratîk ên şaş pêk tînin.

Rejîma heqîqeta civakî bi zêdetir rexneyan divê ji nû ve were birêkûpêkkirin. Bêguman ez behsa ji nû ve afirandina xwedatîyeyekê nakim. Lê ez bawer dikim ku xisleta herî jêhatî ya aqlê mirov di wê hêzê de ye ku li heqîqetê bigire û ava bike.

### **a- Heqîqeta Civakî û Ji Destdayîna Wê**

Xwezayên civakî aliyê wan ê zêhnî pêşketî û nerm in. Mane barkirî ne. Bi giştî barê maneyê yê li cem bi canan ji yê bê canan zêdetir e. Ji perçikê herî besît ê atomê ber bi pêkhatinê herî tevlîhev mane zêde dibe. Zêdebûna maneyê têkiliya xwe bi azadiyê re heye. Di dualîteya enerjî-maddeyê de aliyê jêre perçikê maddî yê hişk tê gotin her tim bi astengkirina maneyê berpîrsiyar e. Mîna dîwar e. Dîwar ên di nava xwe de diparêze, lê di heman demê de wan hepis dike. Di gerdûnê de ev dualîte di her diyardeyê de heye. Dîwar carnan bi temamî dibe amûrekî parastinê, carnan jî vediguhere amûrekî hepiskirin û girtîxaneyê. Beşê maddeyê timî xisleteke xwe ya bi vî rengî heye. Di xwezaya civakî de (di gerdûnê de, di maddeyê de) kombûneke gelekî pêşketî ya maneyê heye. Sîstem, avahî, endam û komên civakî bi xwe weke mane têne diyarkirin. Civakên maneya xwe herî baş tînin ziman, bi gotin û avahî dikin weke civakên herî pêşketî têne terîfkirin. Ev civakên asta wan a azadiyê pêşketî ne. Civakên azad ew civak in, xwe pirr baş bi mane dikin, tînin ziman, didin axaftin û li gorî pêdiviyên pirralî xwe ava dikin. Civakên ji azadiyê mehrûm û bêpar jî civakên welê ne, berevajî nikarîne zimanê xwe pêşde bibin, eşkere bidin axaftin û xwe pirralî ava bikin.

Di çarçoveya vê terîfê de tevahiya serdeman girtina dest a pêşketina heqîqet û maneya civakî cewherê zanista civakî ye. Ji ber ku heqîqet, di bingehê xwe de tevahiya serdeman rewşa manedaniya civakî ya di serwextbûna mirov de gihiştîyê îfade dike. Bi rêyên mîtolojîk, dînî, felsefî, hunerî û zanistî xwe îfadekirin û ji bo xebata di vî warî de em dikarin lêkolîna heqîqetê û anîna wê ya ziman bibêjin. Civak bi tenê ji heqîqetan nehatine hûnandin, di heman demê de hêza diyarkirinê ne. Civaka nikaribe heqîqeta xwe diyar bike ketiye rewşa herî giran a koletiyê, asîmîlasyon û qirkirinê ku ev jî bi awayekî tê wê maneyê, ji hebûnê qut dibe û dibe ku ji rastiye derdikeve. Civakek û heta ferdek wexta heqîqeta xwe nebe, ew civak û ferd hatine bêmanekirin, bûne hebûnên welê ku nasnameya xwe ji dest dane û di nava heqîqetên sûbjeyên din de heliyane, ji vî jî wêdetir bûne hebûnên maneya xwe nemane. Di vê

çarçoveyê de, di navbera mane û heqîqetê de têkiliyeke xurt heye. Mane bi awayekî potansiyela heqîqetê ye. Ev potansiyel çiqasî were ziman, bi awayekî azad bipeyive û were avakirin wê bigihîje rewşa jêre heqîqetê gotin.

Eger timî were gotin 'heqîqeta di hundirê min de' û tim bê gotin 'zarokê di hundirê min de yê nikare bipeyive' ev rewşa herî kambax û xirab a civakî û ya ferd ketiyê îfade dike. Manedanên civakî (bi rêbazên mîtolojîk, dînî, felsefî, hunerî, zanistî) heta negihîjin heqîqetê, heta negihîjin wê qonaxê û aktîvîteyê nikarin (ji potansiyelê ber bi enellegayê) bi cih bîn û jiyana bibin. Ev tê wê maneyê ku ji zarokatiyê xilas nabe, ji zimanê Ezop nikare bibihure û ev rewş jî xwe negihandina heqîqetê îfade dike. Rastiyên civakî yên di bin zorê de têne girtin vê rewşê gelekî dibînin. Em wexta ji aliyê heqîqetê ve li rastiya civakî binêrin, bi tenê ev rastî (xwezayên civakî, avahiyên wê) bi yek ji rêbazên heqîqetê (mîtolojîk, dînî, hunerî, felsefî û zanistî) çiqas bê ziman û aktîv bibe, ji nû ve xwe bi rêxistin û ava bike, em ê bibînin ku em karin ji civaka manedar derbasî civaka bi heqîqet dibin. Em wexta ku di çarçoveya heqîqetê de serdemên civakî lêbikolin em van diyar bikin:

**1- Serdema Klanên Civakî:** Di vê serdemê de ji ber ku manedan hînê zêde tevlihev nîne di komên klanên de heqîqet gelekî bi sînor, bi zimanekî nepêşketî, carnan bi vegotinên devkî û pirranî jî bi zimanê bedenê îfadekirin.

**2- Serdema Civaka Gund-Cotkariyê:** Ji ber ku di mijarên cihûwar, debar, lixwekirin, zêdebûna mirovan û parastinê de şeweyekî tevlihev ê avabûnê heye, rastiyeke civakî ya kapasîteya wê ya manedanê xurtbûyî mewzûbehs e. Di wezna kapasîteya manedanê de pêşketina serdemeke heqîqetê destpê dike. Nexasim serdemeke heqîqetê ya mîtolojîk, dînî û hunerî li dora jin-dayikê (serdema heykelên jin-dayika qelew) pêş dikeve bi hemû pîroziya xwe derdikeve ser dikê. Ziman pêş dikevin. Hêza îfadeyê ya mîtolojîk, dînî û hunerî, serdemek e ku qîmeta xwe ya orjînalbûnê zêde, dide destpêkirin. Serdema herî bi heybet a prehistoryayê ye. Ew serdemek welê ye, civaka cara pêşî ye ku xwe bi heqîqetên pîroz (bi rêbazên mîtolojîk, dînî, hunerî) diyar dike. Mirovatî hê jî mîrateya vê demê dixwe. Di serî de zanista tîbbî û hozantiya felsefî, herdu şeweyên din ên heqîqetê di vê serdemê de hîmê xwe danîne. Hozantiya jinê û tibba wê di vê demê de weke heqîqetên bi tesîr ên demê di jiyana de cihê xwe dîtine. Xwedawendiya jinê di vê serdemê de serwer bûye, ji ber ku jinê di pênc qadên girîng ên heqîqetê de hêz bi destxistiye. Bêguman di vê bidestxistina hêzê de pêşdebirina wê ya cotkarî û aboriya malê bi rola sereke radibin.

**3- Serdema Bajar û Civaka Şaristaniyê:** Bi bajarbûnê re civakbûna zêde dibe weke erkekî diyalektîkî dijberê xwe pêşde dibe. Di vê serdemê de dijberiya diyalektîk çînîbûna civakî û dewlet derxistiye holê. Çînîbûn û dewletbûn weke ji rêderketina civakî di mijara heqîqeta civakî de rê li dabeşbûn û qelşê mezîna vekiriye. Ji ber ku dabeşbûn û qelş li ser hîmê dijberên şiddetê di xwe de di hewînîna pêk tîna, serdema bi şiddetê tepisandina heqîqetan jî destpê dike. Ev rewş bi awayekî berçav xwe weke şerê heqîqetan dide der.

Hilgirtina heqîqetê ya maneya çîn û dewletê kirin dîrok bi xwe. Dîrok çawa û bi kîjan rêbazê were îfadekirin bila bê kirin, bi şeweyekî mohra çîn û dewletê hilgire hat avakirin, nivîsandin. Rastiya civakî ango wexta qelş li heqîqeta civakî dikeve bingehê her cure xerîbketinê tê danîn. Xerîbketin bi rêderketina maneya civakî ve girêdayî heqîqeta wê jî ji îfadekirina rastiye dîr tê girtin. Heta rastiya hatiye berevajîkirin barkirine şeweyên îfadeyê. Bi awayekî bingehîn xerîbketina ferdê civakî di dîrokê de xirabiya herî mezîna e. Mirov dikare xerîbketina civakî weke xiyaneta dîrokî şîrove bike. Xerîbketin di her astê de ye. Bi tevahî qadên civakî yên çanda maddî û manewî digire nava xwe. Kengî xerîbketina bi kedê re bi xerîbketina zêhnîyetê re dibe yek, sîstema şaristaniya hegemonîk dikare xwe dewam bike. Ango sîstema civaka çînî û dewletdar weke serdema şaristaniyê, kengî qadên civakî bi kûrahî qelişîn û xerîbketinê pêk tîna.

Civakbûna şaristaniyê rastiyeke welê ye, dewamî şer û dabeşbûnê ferz dike. Xwe weke lêgerîneke kûr a heqîqetê û pevçûnê jî hebûna xwe ferz dike. Hêzên tehekumkar ên yekdestdariya zor û mêtinkariyê di destê xwe de digirin, çiqasî heqîqeta civakî bitepisînin û berevajî bikin civakên ji komên bîndest û mêtîngêh, ferd û gelan pêk tîna, ava dikin. Ev beşên civakê maneya xwe ango heqîqeta xwe wenda kirine û weke keriyana tîna meşandin. Beşên behsa wan tîna kirin wexta heqîqeta xwe ji dest didin dikevin rewşekê mîna keriyana tîna meşandin. Dîroka şaristaniyê di çarçoveya maneyek teng de hem weke mane hem jî weke heqîqet dîroka avakirin û meşandina mîna keriyana e.

## **b- Heqîqeta Civakî û Şeweyên Xerîbketinê**

Rastiya civakî çî di nava xwe de çî li derveyî xwe qadê ji zordestî û mêtinkariyê re nehêle, mirov dikare behsa mane û heqîqeta azadiyê bike. Di vê rewşê de mane û heqîqet azad e. Azadbûn bi mane û bi heqîqetê mumkîn e. Ya-yê azadiya wî-wê nebe nasnameya wî-wê ango mane û heqîqeta wî-wê nabe.

Civakên dikevin bin serweriya tehlûke (tinebûn, xela, heywanên dirrinde, zehmetiyên avhewayê, sewb) û bereketên (hebên zêde yên fêkiyan, mêwe, heywanên nêçîrê, avhewayaya xweş, rewşên têkûz û ewle) ji ber şertên xwezayî pêk tên û civakên li ser wan mêtinkarî û zordestî têne meşandin şêweyên heqîqetên wan cuda pêk tên. Em dikarin van şêweyên heqîqetan wisa bi xalên sereke rêz bikin:

1- Di şert û mercên hê tehekuma civakî pêşneketî de şêweyên sereke yên heqîqetê mîtoloji, dîn û huner in. Di diyarkirina heqîqetê de para zanist û felsefeyê bi sînor e. Şêweyê îfadeyê yê giraniya xwe heye mîtoloji ye. Mîtoloji weke tê zanîn vegotinên bi şêweyê çîrok, çîvanok, efsane û destanî ne. Di mîtolojiyan de mutleq heqîqetek veşartî ye. Ya rastî, heqîqet şêweyekî vegotina heqîqetê ye. Dîne di şaristaniyê de hatiye dakirin jî li gorî mîtolojiyê aliyê xwe yê bawariyê zêdetire û şêweyekî vegotina heqîqetê ye ku misoger nixê heqîqetê xurt dike. Dîn ew mîtoloji ne ku ji sedîsedbûna wan tê bawer kirin. Di hukim û baweriyên dîn de wekhevîbûn û yeksanbûnek bi heqîqetê re heye. Zanyartî (felsefe) û zanistî tesîreke giran a dîn û mîtolojiyê li ser wan heye. Huner weke şêweyekî heqîqetê bi zêhniyeta dînî û mîtolojîk di nava têkiliyê xurt de ye. Dixwaze maneyê weke muzîk û xêzan îfade bike. Ji lewra lêkolînkirina maneya li muzîk, resim û heykelan hatiye barkirin xebateke girîng a heqîqetê ye. Ya girîng resim, muzîk û heykel bi xwe nînin; weke mane û heqîqeta îfade dikin nirxa wan e.

Bingeh û şert e ku zimanê mîtoloji û dîn helbestwarî be. Ziman bi xwe, ji dema derketina xwe demeke dirêj xwedî vegotineke helbestwarî ye. Ango di navbera helbest û heqîqetê de têkiliyê xurt heye. Helbest ziman û heqîqeta civaka azad a berê ye ku tehekumê nas nake. Hozanên destpêkê pêşiyên zanyar û pêxemberan in ku heqîqet diyarkirine. Hêza vegotinê ya hozanwarî û zimanê helbestwarî yê civakê nîşan dide ku ew civak çiqasî xwedî rastiyeke manedar û azad e.

2- Civaka şaristaniyê weke sîstema civaka çînî û dewletdar ji ber ku hem di nava xwe de hem li derveyî xwe li tehekumê rast tê û diqelişe, weke mane û heqîqet jî parçe dibe. Wexta ku tehekum tevî vegotina mîtolojîk û dînî dibe heqîqet xerîb dikeve. Xerîbketin der barê cewher û hebûna civaka şareza de ye, bi tenê xwe naspêre vegotinê. Rêxistiniyên tehekumê ji ber ku maneyên di naveroka xwe de di hewînî weke heqîqet pêşkêş dikin paradîgmayên wan ên jiyana civakî hûrûkûr diguherin. Di civakê de şêweyên paradîgmayên jiyana ên bi nakok û yên rê didin ber, pêk tên. Xerîbketin bi kerritandin, verotin û helandina heqîqetê pêk tê. Xerîbketin nirxa xwe weke heqîqetê di encama hewldanê ji bo qebûlkirina berevajîkirin, zordestî û reşkirinê de timî kêmtir dibe. Wexta ku heqîqeteke pêre şer bike namîne, civaka xerîbketî vediguhere lodeke bêmane. Avahiyên behsa wan têne kirin ji bo civakê bi tenê bar in; bi awayekî nexweşiyê civakî ne. Muhafizekarî, hişkebawerî weke faşîzm bi navên patolojîk têne hildan. Xerîbketin weke rastiyeke civakî ya nexweşketî êdî bêmane ye. Ji destdana maneyê rewşa herî bi tehlûke ya civakê nîşan dide.

Di tevahiya şêweyên heqîqetê de şer û qelşên di xwezaya civakî ya heqîqetê de pêk hatine mirov dikare bişopîne. Nirxa heqîqetê ya mîtoloji û dîn çiqasî dikeve, xweda û xwedawendên bi mane û bi hewayeke mîhrîcanên gurrûgeş îbadet ji wan re dihat kirin şûna xwe ji pûtên qîmeta xwe ketî re dihêlin. Ji serdema xwedawenda pîroz, bi heybet û mukafat dide gav tê avêtin serdema xwedayên evdan çêdikin û ceza didin. Ya rastî veguherîna civakî (ji civaka komin ber bi civaka çînî ve) xwe bi heqîqetê bi vî awayî îfade dike. Di civaka Sumer de mirov dikare vê veguherînê bi awayekî zindî bişopîne. Herweha di nava xwedayan de jî şer derdikeve. Li cihê ku rêûresma Dionysosî xwe weke heqîqeta civakî ya komin a cotkariyê nîşan da, rêûresma Zeûsî jî weke heqîqeta beşê tehekumkar ê vê civaka cara pêşî qelişî û veguherî nîşan dide. Şerê van rêûresman maneya xwe ya orjîn jî di civaka Sumer de dibîne. Ev herdu rêûresm bi awayekî balkêş û bi tesîr di hunerên serdemê de têne nîşandan. Serdema xwedawendan heta bi dayika Îsa Meryemê xwe nîşan dide. Wexta ku kapîtalîzmê xwe kir sîstema serdest, 'jinên cadû' yên nûnerê dawî yê serdema xwedawendanbûn şewitandin û modernîteya xwe ava kir. Ev bûyera têra xwe mirov difikirîne û mirov hîn dike.

Di serdema şaristaniyê de zanist û felsefe weke şêweyên îfadekirina heqîqetê girîng dibin. Di vê de têkoşîn û lêgerîna heqîqetê bi roleke bingehîn radibe. Şûna qral-xwedayên nikarin bi maskeyê xwe weke berê bi vegotina mîtolojîk û dînî veşêrin, sîstema hewl dide bi metafîzîkê xwe binuxumîne cih digire. Kengî dînen yek xwedayî ketin kêmasiyê, metafîzîk û îdealîzma objektîv weke sîbjektîvtiya sîstemên serdest ên şaristaniyê hat pêşdebirin. Li şûna xwedê 'îdea' weke heqîqet têne danîn. Îdealîzm, weke dewleta dibe xwedê mîna heqîqetê tê pêşkêşkirin. Ji ber vê sedemê, di navbera îdealîzm û



xerîbketinê de têkiliyeke xurt heye. Heqîqetên civakî bi xwedayan ne, hewl didin bi îdeayan îfade bikin. Brevajîkirin, helandin û dejenerekirina heqîqeta civakî bi îdealîzmê re gelekî pêşde diçe.

Gelek dewletên xwe şareza dihesibînin weke sîstema mêtinkarî û desthilatdariya hegemonîk, ji bo manedana civakî ya her diçe teng dibe veşêrin, giraniyê didin şeweyên hunerî yên xemilandî, bi heybet, zêde nepixandî û pirole. Mînak şaristaniya Roma û Grek di qada mîmarî, heykel, muzîk û mozaîkê de weke heqîqet girîngî bi pêşkêşiyêke bi vî rengî daye. Sîstem xwe çiqasî nepixandî pêşkê bike, ewçend jî hewl dide maneya civakî (rastiya bindestan û yên tene mêtin) veşêre û berevajî bike. Mîna di dema mîtolojîk û dînî de zanist, felsefe û hunerê bi desthilatdariyê ve girê didin û hewl didin wan dewletî bikin. Ango pêvajoyeke têkoşînê ya felsefî û zanistî ya li gorî qelşa li civakê dikeve, tê. Zanist û felsefe çiqasî li hemberî jidestdana maneyê li ber xwe bidin ewçend hêza wan a îfadekirina heqîqetê zêde dibe. Çiqasî bikevin bin fermana xwediyên desthilatdarî û dewletê ewqas jî têkiliya wan a bi heqîqetê re kêmtir dibe, weke amûrêkî bi rola vegotina xerîbxistinê radibin. Felsefe û zanista weke îfadeya heqîqetê li dijî îfadeyên mîtolojîk û dînî yên têkiliya xwe bi heqîqetê re ji destdayî pêşketine, ji bo civakê bi xwe ne, ji ber ku ji bo berjewendiyên yekdestdarên mêtinkar û zordestiyê rol guhertine, mîna xerîbxistinên mîtolojîk û dînî yên berê dogmatîk dibin û dikevin pêvajoya bi heqîqetê re têkiliya xwe ji dest didin. Di huneran de jî pêvajoyên bi heman rengî pêk tên. Hunerên bi heqîqetê re têkiliya xwe ji dest didin, dikevin rewşekê ku zêde nepixandî û pûç in, û ji ber ku mînimâlîze dibin ji îfadekirina rastiya civakî dûr dikevin.

Di serdema şaristanyê de pirsgirêkên civakî yên ji ber tehekumê çêdibin, di tevahiya şewazên îfadeyê yên heqîqetê de li ser xwe çareseriyê û lêpirsînê ferz dikin. Bi qasî ku çavkaniya pirsgirêkên heqîqetê civakî ne, ewqasî jî çareseriyên wan di çarçoveya zanista civakî de ye. Zanista bi civakbûnê re têkiliya xwe ji dest dayî xerîb dikeve anga bivê neyê têkiliya xwe bi heqîqetê re qut dibe. Civakên xwe di tevahiya rêbazên heqîqetê de hostekirî, ji pirsgirêkbûnê derketine, ji xerîbketinê xilasbûne, civakên wekhevîxwaz, azad û demokratîk in. Anga civakên exlaqî û polîtîk in.

## 2- Ji Aliyê Rêbazî Ve Nêzîkbûna ji Civaka Dîrokî

Nabe ku paradigma û rêbazên ji bo Xwezaya Civakî bêne pêkanîn, bi yên der barê Xwezaya Yekemîn de wekhev bêne kirin. Nêzîkatiya gerdûnparêz der barê Xwezaya Yekemîn de zêdetir rê li encamên nêzî heqîqetê (Lê ez tiştêkî weke heqîqeteke mutleq nafikirim) vedike, lê îzafiyetgiriya der barê Xwezaya Civakî de zêdetir nêzî rastiye ye. Mirov gerdûnê ne dikare bi vegotina gerdûnparêz a li ser xeteke rast, ne jî xelekên çemberwarî yên bêserûbinî yên bi heman awayî rave bike.

Rêbaza bi awayekî gerdûnparêz li ser xeteke rast pêşketinê qebûl dike, di zanistên civakî de herî kêmtir bi qasî dogmatîzma dînî rê li pirsgirêkên fêhmkirinê yên rastiye vedike. Di hukmin xwe de weke yên dînî vebirî ye: Gerdûn bêserûbinî pêşde diçe; di Lewh-î Mehfûzê de çi hatibe nivîsandin ew bi cih tê. Bi gotineke din, ya pêk tê, ew tişt e ku divê pêk bê. Her tişt çawa hatibe xwestin bi wî rengî pêk tê.

Li gorî şîrovekirina dîrokê ya li ser xeteke rast, piştî civaka gund û cotkariyê civaka bajêr a mezin û bilind bû di hukmê 'gotina dawî' de ye. Çîrokçêkirinên şaristanyê li dora bajêr rastî bi xwe ne. Hêza li bajêr rêveberî xistiye destê xwe û xwe weke dewleta dînî bi rêxistin kiriye, weke çîna serwer hêza motor a dîrokê ye. Çi kiribe rast û pîroz e; pêkhatina çarenûsa muqader e. Ji bo vê jî hegemondariyên îdeolojîk ên xwedayî tene hildan. Her dengê dijber an jî ne li gorî wan, weke xiyaneta bi gotina ezê û ebedî re anga bi îfadeya wî ya jiyane re tê hesabandin û 'xezeba xwedê' bi sera de radikin. Bi tevahî karûbarên bê rûmet ên despot weke xwedê yan jî gotinên wan ên pîroz ji devê rahiban tene xwarê. Êdî li hemberî qanûnên xwedê stûyê evdan ji mû ziravtir e. Stû were jêkirin jî naêşe.

Şaristanî, serdema bajêr weke rêxistiniya sermaye û zorê bi rewşeke orjîn a mîtolojiyê yan jî bi vegotineke seresere ya dîn bi gelek awayan veguheriye û heta roja me ya îro hatiye. Tevî ku cewherê wê weke xwe maye, retorîk û formê (şeweyê rêxistiniya wê) wê her hatiye guhertin û her hatiye pêşkêşkirin cîlayên wê hemû jê hatine xwarê û hîç paxav nake bi awayekî hişkî çor weke faşîzma dewleta netewe xwe pêşkêş dike. Rêxistiniya zor û sermayeyê ya bajêr weke qefesa hesinî burokrasî tevî yên di hundirê wê de kansêrbûna wan a biyolojîk û AIDS her diçin zêde dibin, rewşeke ji vê jî bi tehlûketir xwezaya civakê bi hemû avahiyên xwe yên hundir û bi hawîrdora xwe ya xwezayî ketiye qonaxa kansêrbûnê. Ji bo were fêhmkirin ku ev vegotina me bi xetên stûr anî ziman zêde vegotineke nepixandî nîne, mirov bi tenê li şer û mêtîngiriyên çarsed salên dawî yên sîstema dinyayê (herî zêde pênc hezar salên dawî), rewşa şer a li tevahiya civakê belav bûye û rewşa rojane ya felaketa hawîrdorê binêre tere dike.

Em dema ku li tevahiya şeweyên hegmondariya îdeolojîk ên lîberal û zêdetir jî li qadên fermî (îdeolojiyên dewletê) dinêrin, wisa nuqte li dawîya dîrokê hatiye danîn. Bi gotineke din, di asta herî jor a serdema global de sîstema kapîtalîst rewşa gotina dawî ya ebedî îfade dike. Ev qalkirin nû nîne, em dizanin di her serdema girîng a sermaye û zordestiyê de îlanên bi vî awayî yên 'ebediyetê' têne dayîn. Ha heqîqeta 'zanistên' şaristaniya pênc hezar salî bi hezar kirasan pêçayî û kirine rêbaz ev e. Ango rêbaz bûye heqîqet, heqîqet jî bûye rêbaz.

Wexta ku bi pistepistî be jî di ber guhên mirovan re bê avêtin ku dikare hebûna dinya, zanist û rêbazên din mumkîn be, tevî gotinên cehennemî, jirêderketî û kafirî her şeweyê 'terorê' yên sînornenas dikevin dewrê. Şeweyê serjêkirinê yê herî sivik û besît e. Li çarmîxê xistin, di nava agir de sewitandin, bi dar ve kirin, heta bimire kelekvanî, êşknece, heta bimire xebitandin, di zindanan de rizîn, pîrekirin, şeweyên bê sînor ên mêtîngêkirinê, asîmîlasyon û hwd.

Şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ku hewl dide civaka gund û cotkariyê hilweşîne, bi awayekî mîna heyfa xwe jê hilîne tevdiqere. Em dibînin di salên 2000î de dixwaze vê civakê bi tevahî têk bibe û şopên wê yên dawiyê jî bi temamî ji holê rake. Têkbirin û hilweşandina hawîrdorê ya rastî şeweyê herî dawî yê tolhîlanîna ji CIVAKA GUND û COTKARIYÊ ye. Gelekî seyr û balkêş e, li şûna Xwezaya Civakî ya hatiye bêtengkirin, Xwezaya Yekemîn bi felaketên cûrbicûr ên rê li wan vekiriyê (germbûna avhewayê, hişkbûn, bi lez helîna qeşayên qutban, bi lez tinebûna cureyên heywan û nebatan, rabûna lehiyan, babîsok û felaketên din) bersivê dide van hilweşandin û têkbirinan. Carnan mirovatî (mirovatiya hatiye bêtengkirin) dikare bibe xwezaya herî bê zar û ziman. Rast e, ev cihê xemê ye, lê kî dikare rastbûna wê înkâr bike?

Di paradîgmaya dîrokê de guhertina herî bîngêhîn ew e, civaka gund-cotkariyê (10000 B.Z. heta roja me ya îro) nebe yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê ya bîngêhê xwe bajêr jî pêş nakeve. Di vê nuqteyê de mirov dikare guhertina herî bîngêhîn a rêbazê bike. Rosa Luxemburgê bi şeweyekî gelekî di ser re wisa terîf kiribû "Civaka ne kapîtalîst e, nebe, yekdestdariya daneheva sermayê û kapîtalîzm nabe." Divê mirov vê terîfê bi tevahî li şeweyên sermayeyê û dîrokê bixe, wê ev bibe şewazekî rastir. Ji ber ku ev di tevahiya civaka dîrokî de ji hev derxistin û analîzkirina sermayeyê îfade dike. Modela civaka saf kapîtalîst a K. Marks, şaşiya wî ya herî bîngêhîn e. Ji ber ku civakeke bi vî rengî ne pratîkî, ne jî weke teorîk mumkîn e. Piştrastkirina vê gelekî hêsan e: mînak em bibêjin di civakekê de bi tenê kapîtalîst (tevî burokratên xwe) û karker (tevî bêkarên xwe) hene. Ji ber ku li gorî civaka saf a kapîtalîst divê ev wilo be. Em ferz bikin ku li fabrîka sermayeyê bi giştî yekeya sed malî tê hilberandin. Yekeya bîstûpênc malî di berdêla heqdestên wan de dibe ya karkeran. Bila yekeya bîstûpêncan jî ji bikaranîna çîna sermayedar re bimîne. Baş e, yekeya pêncî malê mayî wê çî bibe? Yê mayî yan wê birize yan jî belaş were belavkirin. Li gorî modela civaka saf kapîtalîst bi awayekî din mumkîn nîne.

Rosa wexta ji vê nuqteyê destpê dike û dibêje, eger yekeya pêncî malî bi armanca karê ji civaka ne kapîtalîst re were firotin wê pêkhatina sîstemê mumkîn be, li keviyên rastiyê diçe û tê. Rastiya civakî hê berfirehtir e. Herweha divê mirov baş bizanibe û ji bîr neke ku berdêla kar û daneheva sermayeyê ya xwe dispêre wê, mayeya civakî ye ku nehatiye dayîn. Civaka ne kapîtalîst kîjan civak e? Di serî de civaka dîrokî ya gund-cotkariyê ye; civaka jinê ya girtine malê ye; beşê karker (bi xêrê debara xwe dike) û zenaetkar ên kedkar û xizan ên bajêr in. Dema ku rastî welê bê danîn, îmkan û derfet çêdibin ji bo mirov karibe şaristaniya pênc hezar salî û dema wê ya herî sîstematîk çarsed salên dawî yên sîstema dinya kapîtalîst analîz bike. Di tevahiya dîrokê hemûyî de sermaye û desthilatdariya xwe weke şebekeyê (arîstokrasî, efendî, bûrjûvazî, dewletlû, desthilatdar û hwd.) bi rêxistinkirin ti carî ji sedî dehê şênîyên giştî derbas nekiriyê. Ji lewra gewdê giştî yê xwezaya civakî her tim di ser ji sedî nodî re ye.

Hingê ji aliyê rêbazê ve em bipirsin: Gelo mirov ji sedî dehî bike dîrok, bike sîstem û bike objeyê bîngêhîn ê fikrê ji aliyê zanistî ve rêyeke rast e, yan mirov ji sedî nodî bike dîrok, bike sîstem, bike objeya bîngêhîn a fikrê rêbazê rast a zanistî ye? Rastiya bîngêhîn a divê mirov li bersiva wê bigere ev e. Mirov dikarin bibêjin, ji ber ku pîrraniya fikir, zanist û rêbazê di bin yekdestdariya ji sedî deh de ye bi awayekî din mumkîn nabe. Lê ev yekdestdarî, li gorî tehlîla dawî, ma li ser desteserkirin û vedizîna mayeya civakî pêk nehatiye? Ji ber ku koma herî rêxistinkirî û îdeolojîk e, ma ev wê mafdar dike? Ji sedî yek be jî, zoreke baş hatiye bi rêxistinkirin, dikare hukim li mîlyonan bike, dikare mîlyonan rêve jî bibe. Dikare gotinên xwe jî weke rêbaz û zanista herî bîngêhîn jî ferz bike. Ma ev rastî, dikare bê maneya heqîqetê? Kî misteke zordar û yekdestdarî weke heqîqet îlan dike? Yên îlan dikin, weke mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û hunerê pêşkêş dikin, girêdana wan bi desthilatdariya şebekeya sermaye û zordaran dikare heqîqeta civakî (heqîqeta ji sedî nodî) biguherîne? Gelekî eşkere ye ku divê mirov

pirsgirêkê bi vî rengî deyne holê. Ti hegmondariya îdeolojîk, zanistî, dînî, felsefî û hunerî hêza xwe ji bo guhertina vê heqîqetê têrê nake, divê têrê neke.

Em dema ku civaka dîrokî ji aliyê avahiyê ve li ber rohiya vê rêbaza sereke lêkolîn bikin û bixwazin bi şeweyên fikrê yên cûrbicûr (mîtolojîk, dînî, felsefî, zanistî û hunerî) bigihînin îfadeyekê, şaxên heqîqetê wê zêdetir diyar û manedar bibin. Mirov dikare şaristaniya demokratîk bigihîne sîstematîkeke gelekî pêşketî bi vegotina wê ya civaka dîrokî ya du-alî (objektîvîzma wê û subjektîvîzma wê wek şewazê avabûna wê) hebe. Hewce dike û mumkîn e ku xwezaya civakî di nava yekparetî û dîrokîtiyê berfireh de sîstematîze were kirin. Divê ev analîza sîstematîk di bingehe paradîgmâtîk ê şoreşa zanistî û zanista civakî de were bi cihkirin.

Nêzîkatiyêke bi vî rengî ji bo pirsgirêka rêbazê, di wê qabîliyetê de ye ku xwezaya civakî bi tevahî dewlemendiya dîrokî û di nava yekparetiyê de wê bêtir pêşkêş bike. Çawa pêşî mirov awirekî diavêje tê dîtin,

**a-** Civaka bê sermaye û desthilatdarî mumkîn e, lê serameye û desthilatdarî bê civak mumkîn nînin.

**b-** Ekonomiya bê sermaye mumkîn e, lê sermayeya bê ekonomî mumkîn nîne.

**c-** Civaka bê dewlet mumkîn e, lê dewleta bê civak mumkîn nîne.

**d-** Civaka bê kapîtalîst, bê feodal, bê efendî mumkîn e, lê kapîtalîst, feodal û efendiyê bê civak mumkîn nînin.

**e-** Civaka bê çîn mumkîn e, lê çîna bê civak mumkîn nîne.

**f-** Gund û cotkariya bê bajar mumkîn e, lê bajarê bê gund û cotkarî mumkîn nîne.

**g-** Civaka bê huqûq mumkîn e, lê civaka bê exlaq mumkîn nîne.

**h-** Mirov dikare mîna kesê bi xwe li daholê dide û bi xwe govendê digire civakê bixe rewşeke bê polîtîka û bê exlaq. Lê wê demê jî civak ji aliyê Levîathanê nû ve (faşîzma dewleta netewe) tê parçekirin û daqurtandin ku ew kêliya mirina mirov û civakê bi vî awayî dibe ya temaşayê. Ev kêlî, kêliya pêkhatina qirkirinê ye. ev kêlî, kêliya mirina mirov e ku Michel Foucault îlan kiriye. Ev kêlî, ew kêlî ye ku Friedrich Nietzsche ew weke kêliya civak û mirov têde hatiye xesandin, têde kirine bejinbohst û bicirkî, kirine morî, kirine kerî û girse, îlan kiriye. Ev kêlî, ew kêlî ye ku civak di 'qefesa hesinî' ya M. Weber behsa wê kirî de hatiye girtin!

Bêyî yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê rewşa xwezayî ya civakê, civaka exlaqî û polîtîk e. Bi tevahî civaka mirov ji roja çêbûye û heta roja vemire divê bi vê xisletê rabe û bijî. Qalibên civakan ên koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst ku xwestin mîna kirasekî li xwezaya civakê bikin, rastiye îfade nakin. Îddîayên bi vî rengî dikarin hebin, lê civakên bi vî rengî tinene. Rewşa bingehe a civakan exlaqî û polîtîk e, lê ji ber ku tevahiya dîrokê timî ji aliyê yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê ve hatine tengavkirin, hatin mêtin, hatine mêtînghekirin bi temamî îmkanê pêşketinê nedîtine.

Ji ber ku civak mecbûr nîne dewamî xwe bispêre şerên (li hundir û derve) mêtinkariyê yên yekdestdaran, bi şeweyên cûrbicûr divê şaristaniya xwe ya demokratîk (hem li ser zemînê gund û cotkariyê hem jî di nav kedkarên bajêr de) pêş bixîne. Dîrok bi tenê koma dewlet û desthilatdariyan pêk nayê, ew li derveyî mirovahiyê ne, avahiyên kohne ne, amûrên şer in. Dîrok qatbiqat ji wan zêdetir bi mînakên şaristaniya demokratîk tijî ye (xwezaya civakî her tim ji sedî nod hebûna xwe di ser wan re ye). Bi tevahî malbat, qebîle û sîstemên eşîran, konfederasyon, demokrasiyên bajaran (bi qasî ku tê zanîn mînakê herî balkêş Atîna ye) û konfederasîzmên demokratîk, keşîxane, dergah, komin, partiyên wekhevîxwaz, civakên sîvîl, terîqet, mezheb, komên dîn û felsefeyê yên nebûne desthilatdar, piştgiriyan jînê û bêhejmar meclîs û cemaetên piştgiriyan yên nehatine nivîsandin, komên civakî yên bi qasî stêrkên li ezmanan divê li xaneya şaristaniya demokratîk bêne danîn. Mixabin, dîroka van koman bi awayekî sîstematîk nehatiye nivîsîn. Dibe ku dîroka mirovane ya rastî îfadeya sîstematîk a van koman be.

Şaristaniyên desthilatdariya fermî, ji ber ku yekdestdariyên sermaye û sîlehê bi hegmondariya îdeolojîk re di zikhev de meşandine, îdeolojiya şaristaniya demokratîk tim qels û bê sîstem maye. Ji aliyê desthilatdariyan ve timî hatiye tepisandin û ji rêderxistin, bi pirranî jî hatiye tinekirin. Ji ber ku gelek hozan, zanist, felsefe, dîn, mezheb û hunermend teslîm nebûn, guh dan dengê wijdanê azad bi cezayên herî giran hatine cezakirin û bêdengkirin. Bi sedema ku dîroka van nehatiye nivîsîn ev nayê wê maneyê ku ev tinene. Yek ji wezîfeyên me yên sereke yên entelektuelî ew e, divê em şaristaniya demokratîk bigihînin îfadeyêke sîstematîk a civaka dîrokî.

Li beramberî sîstema şaristaniya dewleta netewe ya çarsed salên dawî weke tevahiya yekdestdariyên desthilatdarî, îdeolojîk, îdarî, eskerî û ekonomîk xwe kiriye sîstema dinya kapîtalîst,

sîstematîkeke şaristaniya demokratîk a bi bi tamamî yekpare nebûyî heye û divê piçûk neyê dîtin, di nava vê sîstematîkê de gelek tevger li bazkekî cih digirin.

Rêbazên lêgerîna li heqîqetê yên zanistên civakî yên navenda wan Ewrûpa li gorî cewherê xwe hegemonîst in. Rêyên alternatîf ên heqîqetê bi du rêbazên bingehîn hema dikin ku bê îmkân dikin: Yekemîn, nêzîkatiya monîst (ferdparêz) gerdûnparêz e. Her tim heqîqetê dadixin 'yekê'. Duyemîn, modela li gorîxwebûnê ye. Dema ku dibêje her kesek li gorî xwe heqîqeteke wî-wê heye, ya rastî hewl dide îfade bike heqîqeta xwe nîne. Ev tiştekî wisa ye, mîna ku tu ji bo her tişt diguhere îddîa bike ku ti tişt naguhere. Eşkere ye ku herdu rêbaz jî di reduksiyonîzmê de dibin yek. Çi gerdûnparêziya 'yekperest', çî jî ligorîxwebûna 'tekîtiyê' heqîqetê dadixin tektiyê bi vî awayî jî herdu karaktera xwe ya hegemonîk eşkere nîşan didin.

Bêguman li pişt van rêbazan şaristaniya yekdestdar heye. Bingehê vê mijarê diçe heta dema rahibên Sumeran xwedayê herî mezin 'En' ava kirin. Sedema mezinkirina 'En' ew e, hiyarerşî û yekdestdariya bajar-çîn-dewletê bilind dibe, lewma hewce dibînin ku wan rewşa bikin, li ser zêhniyeta civakî serwer û hegemon (Ez difikirim ku serwer û hegemon ji heman kokê tên) bikin. Di felsefeya Yewnan de sedema pêşî, weke vedîtina herî mezin xweda timî ji heman çavkaniyê tê (Li gorî têgihiştina Arîsto û Eflatûn a xwedê). Di dînen yekxwedayî de şeweyê 'En' xwe pê nixumandî xwedayê aleman 'Allah' e. 'El' ji 'Allah' tê. Di bilindbûn û hilatîna Romayê de weke 'Jupîter' derdikeve pêşîya me. Di her civakê de ku rejîmên xweda-qraltî û împaratorî tên avakirin, ji bo wan li ser civakê rewşa bikin, weke gelek çarî hatîye dîtin, serî li têgînên dîniyan jî mîtolojîk dane. Hema hema di her qraltî, împaratorî û rejîma despotîk de, bi têgînan mezinkirin û hewldaneke hegemondarî ya îdeolojîk tê dîtin. Ji ber ku hegemondariyeke bi vî rengî li ser zêhnan nebe, rejîmên behsa wan tênê kirin nikarin mayînde bibin.

Yekdestdariya kapîtalîst a Ewrûpayê (weke şewê û navenda hegemonîk a nû ya şaristaniyê) wexta ku di sedsala 16. de mezin dibû, eşkere haya xwe jê hebû ku hewldaneke bi heman rengî nebe wê nikaribe serwer bibe. Di dîrokê de cara pêşî heta wê demê pere-sermaye (cotkarî, bazirganî û weke amûrê desthilatdariyê ji sermayeyê cudatir şeweyekî sermayeyê) ya xwe di çavî û telşên civakê de veşartibû weke hêza hegemonîk di nava civakê de û her diçe di çavîyan wê hemûyan de belav û mezin dibe.

Francis, Roger Bacon û Rene Descartes ên ji teolojiya koka xwe Xiristiyantiyê tên (ango bi koka xwe Sumer Rojhilata Navîn in) li rêbazên nû digerin û ev lêgerîna wan ji nêz ve têkiliya xwe bi derketina hegemondariya maddî re heye. 'Heqîqet' a bi pey wê ketine çî ji aliyê rêbazê ve, çî jî ji aliyê naverokê ve, bi vî cureyê nû yê sermayeyê re di mezinbûna hegemondariyê de hevpar e. Yekdestdariya kapîtalîst çiqasî hegemondariya xwe têkûz û qehîm dike, hegemondariya xwe ya îdeolojîk jî bi vî re di zikhev de têkûz û mayînde dike. Rêbaza nû, şoreşên zanist û felsefeyê bi tenê bi hêza veguherîner a şertên maddî dikare ravekirina xwe ya zanistî bike. Bêguman mirov her tiştî bi kapîtalîzmê ve girê bide wê mirov serkorî bike. Nêzîkatiyeke bi vî rengî ketina xefîk û reduksiyonîzmeke seresere ye. Lê eger girîngiya têkiliya di navbera wan de were paşguhkirin lêkolînên heqîqetê seqet bimînin û wê di nava vegotinên metafîzîk de qîmeta xwe nemîne.

Çî bi rêbazên metafîzîk çî jî bi yên pozîtîvîst hatibin bi karanîn, ez vegotinên civak û dîrokî yên bi vî rengî weke rêbaz qebûl nakim û tevî vî yekê divê kêm zêde ez ji aliyê xwe ve bibêjim, encamên yek mîna ya din diafirînin, şîroveyên rastî û heqîqetê berevajî îddîayên wan hevdu nagirin. Ji bo fikirîna malzemeyên ezmûna dîrokê ji sedî sed hewce dibînim. Di vî mijarê de ez mîna ampîrîstekî tîpîk (ceribkar) xwedî nêzîkatî nînim. Weke dijberê vî xwedî nêzîkatiya îdealîst (fikirkariya mutleq) a îddîa dike ji ceribandî û malzemeyên xwezayî û dîrokî serbixwe dikare fikrê çêke jî nînim. Ez dizanim bi van rêbazan tevahiya dîroka şaristaniyê kulliyatên gelekî mezin hatine çêkirin. Tevî ku ez bawer dikim divê haya mirov ji van hebe, lê ez îqna nînim ku di şîrovekirina heqîqetê dest ji wan nabe. Ez hez dikim, diyar bikim ku bêy van jî mirov dikare heqîqetê şîrove bike. Nexasim jî ekola lêkolîner a pozîtîvîst a di nava pirrbûna malzemeyên dîrokê de xeniqî ye, di rewşeke gelekî belengaz û dilê mirov pê bi şewite de dibînim. Herweha bi heman awayî şêxên gelekî bê malzeme û kerametên wan ji wan menqûl ên ji xeybê xeberê didin jî ez yeqîn nakim ku zêde têkiliya wan bi heqîqetê re heye. Ew di rewşeke gelekî sefîl û belengaz de ne.

Bi tenê rexnekirina nêzîkatiyên ampîrîk û îdealîst têrê nake. Gelekî girîng e ku mirov bi nêzîkatiya rexnekirinê bi ser şeweyên cuda yên van herdu rêbazan de biçe, ew jî rêbazên gerdûngirî, li ser xeteke dûz pêşketin û îzafiyet in. Bi giştî heqîqet ne li ser xeteke rast a pêşketinê, ne jî bi rêbaza îzafiyetê tê avakirin û keşîfkirin. Bêguman asta bilind a mejiyê nerm ê xwezaya civakî di avakirina rastiya civakî de alternatîfeke berfireh a azadiyê pêşkêş dike. Lê ev weke rêbaza îzafî îddîa dike "Herkes rastiya xwe bi

xwe dikare ava bike” xwedî mane nîne. Heman rastî weke îdealîst jî yeqîn dikin “Her tişt çawa ku di Lewha Mehîfûzê de hatiye nivîsandin wê pêk bê” nîne. Avakirina rastiyên civakî (xwezayên civakî ji klan heta netew, çîn, dewlet û hwd.), weke rastiyên nû bi fikrên nû bi malzemeyê civakî ya di nava şertên zeman û mekan ên daneyî de were çêkirin weke rêya zêhnî û rêbaza herî rastî xuya dike yan jî dikare wisa were pêjirandin.

Dubare bibe jî rêbaza hewl didim rave bikim ji sedî sedî divê xwe bispêre xwezaya civakî, nexasim jî rewşa hebûna wê ya bingehîn civaka exlaqî û polîtîk e ku ez jê bawer dikim û jê piştrast im. Ez hewl didim rave bikim ku bi tevahî êkolên fikrê yên têkiliya wan bi civaka exlaqî û polîtîk re nînin, avahiyên zanist, felsefe û hunerê bivê nevê wê seqet pêk bên, zû dereng wê rê li ber rewşên bi fikar vekin. Bi tevahî pîrsgirêkên rêbazê yên divê bi wan girêdayî were mayîn û berhemên wê yên agahî, etîk û estetîkê ji sedî sed civaka exlaqî û polîtîk esas bigire weke şertê pêşî diyar dikim. Ez dixwazim balê bikişînim ku li derveyî vî şertê pêşî bi tevahî rêbaz, agahî, etîk û estetîka pêk bê seqet û bawerî bi wan nayê, bi şaşiyên barkirî ne, bi krêtî û xirabiyên tijî ne. Ez bi israr rave dikim ku xusûsên behsa wan dikim bi tenê fikir û qenaetên min ên şexsî nînin, li ser rêya heqîqetê di asta nîrxên bingehîn de ne.

Xwezayên civakî jî weke xwezayên biyolojîk bi heman şeweyî xwedî şifreyên genetîk in. Haya min ji biyolojîzmê heye. Ez dizanim, mirov xwezaya civakî bi vê bipîve Darwînîzm e, û weke materyalîzma herî çor ji muhendisîyên civakî re malzemeyê fikrî tedarik dike. Lê xusûsa ez behsa wê dikim ew e, xweza weke mejiyê asta wê herî bilind xwedî qabîliyeta hilbijartina azadiyê be jî dîsa guhertina xisletên bingehîn ên avabûn û hafîza civakên dîrokî xusûsiyetên xwe yên xweser hene. Çawa ku bi şifreyên genetîk ên heywan û nebatan tene lîstin, nebatên cuda û heywanên ehlî tene gihandin, em nikarin civakan jî bi vî awayî biguherînin. Hafîza û bîra xwezaya civakî, ev jixwe bê sedem weke civaka exlaqî û xwezayî diyar nekiriye. Rêya guhertina civakî bi bilindkirina asta civakî ya exlaqî û polîtîk dikare rewşa bê qebûlîkirin, naxwe wê bi her cure rêbazên totalîter û otorîter asta civaka exlaqî û polîtîk bixe, lewma pirr girîng e ku mirov bibêje encam çî dibe bila bibe wê rewşa neyê qebûlîkirin.

### **3- Yekeya Esasî ya Heqîqetê; Civaka Exlaqî û Polîtîk**

Modelên cûbicûr ên ji bo qada civakî hatine pêşdebirin tene zanîn. Yekeya ji van herî zêde tene zanîn û tene bi karanîn bi giştî nêzîkatiya dewletê, bi taybetî jî dewleta netewe esas digirin, para bêhtir xwe dispêrin perspektîfa çîna navîn a bûrjûvayê ye. Dîrok û civak li dora avakirina dewletan, hilweşîna wan û pîrsgirêkên wan ên parçebûnê tene lêkolîn. Di rastiya civaka dîrokî de ev meyla yek ji modelên herî seresere ye, ji têngîhiştina perwerdeyê ya fermî ya dewletan wêdetir bi ti rolê ranabe. Armanca wê ya bingehîn ew e, dixwaze bi rola îdeolojiya rewakirinê ya dewletê rabe. Ji rohnîkirinê zêdetir, ji veşartin û sergirtina pîrsgirêkên tevlihev ên dîrok û civakê re xizmetê dike. Ev nêzîkatî di pozîsyona herî bê rûmet a sosyolojîk de ye.

Nêzîkatiya Marksîst a çîn û ekonomî weke yekeya bingehîn bijart, li dijî yekeya dewletê xwest xwe weke modela alternatîf formule bike. Çîna karker û ekonomîya kapîtalîst weke modela lêkolînê ya civakî hatin hilbijartin. Vê nêzîkatiyê herçiqasî hişt ku dîrok û civak ji aliyê pêkhatin û girîngiya ekonomî û çînî ve bêne ravekirin jî bi xwe re qusûrên girîng anîne. Ji ber ku ev nêzîkatiyê dewlet û saziyên din ên avahiya jor berhemên avahiya jêr hesibandin û bandorên wê yên besîr nîrxandin, kir ku rewşê daxîne ekonomîzmê. Reduksiyonîstiya ekonomîk jî mîna reduksiyonîstiya dewletê ya xwedî têkiliyên gelekî tevlihev ên yekpare, ser rastiyên civaka dîrokî girtin û ji bo nekeve vê rewşa bi qusûr nikarîbû xwe rizgar bike. Nexasim ji ber qelsbûna analîza desthilatdarî û dewletê çînen kedkar û gelên bîndest ên îddîa dikir ku bi navê wan radibe, ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve tere xwe gurçûpêç nebûn. Bi têkoşîneke teng a ekonomîk û bi têngîhiştina hilweşandin û avakirina desthilatdarî û dewleta bi şeweyê komplogeriya dewleta fîrsendperest, ji kapîtalîzmê re ji îdeolojiya wê ya herî xas lîberalîzmê zêdetir xizmet kir. Rastiya Çîn û Rûsyayê vê xusûsê pirr baş rohnî û zelal dikin.

Têngîhiştin hene, dîrok û civakê weke hêza desthilatdarî û erka wê şîrove dikin. Mirov pirrî caran li van têngîhiştinan rast tene. Lê ev nêzîkatî jî bi qasî hilbijartina modela dewletê bi qusûr in. Herçiqasî desthilatdarî yekeyek e ku berfireh a lêkolînê be jî bi serê xwe nikare xwezaya civakî rave bike. Desthilatdariya civakî mijareke girîng a lêkolînê ye, û gelek aliyên xwe yên raveker hene. Lê reduksiyonîstiya desthilatdariyê çawa ku di her cure têngîhiştinên reduksiyonîst de tene dîtin qusûrên xwe hene.

Cureyekî din e nêzîkatiyê ku timî derdikeve pêşiya me ew e, civakê ji rêzikan mehrûm, têkiliyên tekane weke bûyerên bêserûbinî lêkolîn dike. Mirov vê nêzîkatiyê hema hema dikare weke modeleke nêzîkatiya wêjeyî ya tesewirî destnîşan bike û ev nêzîkatiyên zêde îzafî ne, bi tenê dikare mirov li nava daristanên civakî bide wendakirin. Modelên nêzîkatiyên zêde gerdûnî yên berevajî xuya dikin lê bi

heman rolê radibin jî hewl didin bi çend qanûnan civakê bi tenê bi fizîkeke sivik terf bikin. Li hemberî pirrcuretî û pirrengîniya dewlemend a civakê, wer xuya ye ku nêzîkatiya ji çavtarîkirin û korkirinê re herî xizmet dike ev nêzîkatî ye. Têgihîştina civaka pozitivist a weke modela herî çor û seresere ya hem zêde îzafiyetê, hem jî zêde gerdûnîgiriye di hinavê xwe de dihewîne, hêjayî bi bîr xistinê ye.

Mirov dikare sîstema şaristaniya demokratîk weke dibistana zanista civakî ya rewşa hebûna xwezaya civakî û pêşketina wê li ser bingehê civaka exlaqî û polîtîk lêkolîn û qebûl dike. Ekolên zanista civakî yên cûrbicûr komikên wan ên lêkolînê yên cuda hene. Teolojî civak dîn dike bingeh. Sosyalîzma zanistî bingehê xwe çînî ye. Yekeya bingehîn a lîberalîzmê ferd e. Çawa ku yên dewlet û desthilatdariyê dikin bingeh hene, yên şaristaniyê dikin bingeh jî kêma nînin. Ev bi tevahî nêzîkatiyên di bingehê wan de yekeya wan hene, weke min gelek caran destnîşan kir, ji ber ku xwedî nêzîkatiyeke dîrokî û yekpare nînin hatine rexnekirin. Ji bo civakê lêkolîneke manedar divê li ser nuqtayên man û nemanê ango nuqtayên heyatî hûrûkûr rawest e. Bi awayekî bingehîn divê dîrok û rojane di wan nuqtayan de qala wan bê kirin. Naxwe lêkolînê ji çîrokbûnê wêdetir neçin.

Me yekeya xwe ya bingehîn weke civaka exlaqî û polîtîk destnîşan kir, ev ji ber ku şaxên dîrokiyê û yekparetiyê digirin nava xwe girîng in. Civaka exlaqî û polîtîk vegotina herî yekpare û dîrokî ya civakê ye. Mirov dikare exlaq û polîtîkayê bi xwe weke dîrokê jî bixwîne. Civaka şaxên wê yên exlaqî û polîtîk hene, civaka herî zêde nêzî tevahiya hebûn û yekparebûnan e. Dewlet, çîn, mêtinkarî, bajar, desthilatdarî û netewe nebin jî civak dikare hebe. Lê mirov nikare civakê bê exlaq û polîtîkayê bifikire. Belkî ji bo hêzên din, nexasim jî ji bo yekdestdariyên sermaye û dewletan weke mêtîngê û çavkaniya maddeya xam hebin, lê di van rewşan de jî bermahiyên civaka ji civakbûnê derketiye weke mîrate maye.

Weke rewşa civaka xwezayî civaka exlaqî û polîtîk bi etîket û rengên weke koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst bi navkirin maneya xwe nînin. Ya rastî, bi vî awayî binavkirin û terîfkirina civakê bi rola veşartina rastiya civakê radibin û civakê dadixin asta hêmanên wê (çîn, ekonomî, yekdestdarî). Wexta ku li ser bingehê van têngînan teorî û pratîka pêşketina civakî tê analîzkirin em di vegotinan de tengavbûn û asêbûnekê dibînin û ev jî çavkaniya xwe ji kêmasî û şaşiyên di cewherê wan de digire. Bi tevahî analîzên civakê yên bi van sifetên nêzî materyalîzma dîrokî disekinîn tene bîra mirov ketine vê rewşê û eşkere ye ku vegotinên nirxên wan ên zanistî qels wê bê çare bimînin. Şaxê dîni tevî ku gelekî behsa girîngiya exlaq kiriye jî şaxê polîtîk ji zû ve bi ser dewletê ve berdaye. Nêzîkatiyên lîberal ên bûrjûvayê jî bi tenê ser şaxên civakê yên exlaqî û polîtîk nagirin; di heman demê de her cara keys û firsendê bibînin xwe ji şerê bi vê civakê re paşve nadin. Ferdparêzî herî kêma bi qasî desthilatdarî û dewletê rewşa şer a li dijî civakê ye. Lîberalîzm bi awayekî bingehîn tê wê maneyê ku civak tê bêhêzkirin (civaka bêexlaq û polîtîk) û ji her cure êrîşên ferdparêziyê re tê amadekirin. Lîberalîzm îdeolojî û pratîka herî zêde li dijî civakgiriye ye.

Sîstema Şaristaniya Demokratîk bi awayekî paradîgmîk û ampîrîk (teorîk û pratîk) çarçoveya wê bi şeweyekî hîpotezî em dikarin bi vî rengî pêşkêş bikin. Lê eger em xisletên sereke yên yekeya Sîstema Şaristaniya Demokratîk careke din bi sernavên bingehîn pêşkêş bikin em ê wisa rêz bikin:

1- Civaka exlaqî û polîtîk, ji destpêka civaka mirov heta bi dawiya wê xisleteke bingehîn e, divê mirov lê bigere. Civak weke bingeh exlaqî û polîtîk e.

2- Civaka exlaqî û polîtîk, li qutba dijber a sîstemên şaristaniyên li ser sêberiya bajar-çîn-dewletê (avahiya berê ya hiyarerşîk) mezin dibin, cihê xwe digire.

3- Civaka exlaqî û polîtîk, weke dîroka xwezaya civakî bi sîstema şaristaniya demokratîk re di nava ahengekê de pêş dikeve.

4- Civaka exlaqî û polîtîk, civaka herî azad e.

5- Bi qasî xebata organ û komikên exlaqî û polîtîk hêzeke din a diyarker nîne ku civakê azad bike û bihêle. Ti şoreş û qehreman bi qasî şaxên exlaqî û polîtîk di azadkirina civakê de nikarin jêhatîbin. Jixwe şoreş û qehreman bi qasî ku alîkariya civaka exlaqî û polîtîk bikin dikarin bi rola xwe ya diyarker rabin.

6- Civaka exlaqî û polîtîk civaka demokratîk e. Li ser bingehê hebûna civaka exlaqî û polîtîk ku civaka şefaf û azad e, demokrasî dikare manedar bibe. Civaka demokratîk şeweyekî rêveberiyê ye ku tede ferd û kom dibin kirdar û li beramberî hev civaka exlaqî û polîtîk herî zêde pêşde dibin. Ya rastî, em jixwe ji fonksiyoneliya civaka polîtîk re demokrasî dibêjin. Bi maneyeke rastî polîtîka û demokrasî têngînen wekhev in. Eger azadî ew qada atmosferî ya polîtîka xwe tede îfade dike bê qebûlkirin, wê wextê demokrasî li vê qadê şewazê îcrakirina polîtîkayê ye. Sêbera azadî, polîtîka û demokasiyê, nabe ku ji bingehê exlaqî mehrûm bin. Em ji rewşa rêûresmî ya azadî, polîtîka û demokrasîya bi sazî bûyî re dikarin exlaq bibêjin.

7- Civakên exlaqî û polîtîk bi her şêweyê sermaye, milkiyet û desthilatdariyê re ku bi awayekî fermî dewletê îfade dikin, bi beramberî di nava nakokiyeke diyalektîkî de ne. Dewlet misêwa dixwaze li şûna exlaq huqûqê li şûna polîtîkayê jî burokrasiyê bi cih bike. Di tevahiya dîrokê de vê nakokiya dewam kiriye li seriyekî wê şaristaniya fermî ya dewletdar û li serê din jî sistematîka şaristaniya demokratîk a ne fermî pêşketiye. Du tîpolojiyên cihê yên maneyê derdikevin holê. Nakokî dikarin pirr dijwar bibin rê li şer vekin an jî dikarin li hev bîn û rê li aştiyê vekin.

8- Hêzên civaka exlaqî û polîtîk û hêzên yekdestdar ên dewletdar bêyî sîleh û bêyî kuştin li hev bikin ji bo bi hev re bijîn û vê îradeyê nîşan bidin pêkhatina aştiyê mumkîn dibe. Civakê dewletê yan jî dewletê civakê tine bike, ji vê zêdetir aştiya bi şert a jêre lihevkirina demokratîk tê gotin pêk tê ku di dîrokê de jî ev rewş hatine dîtin. Dîrok ne bi temamî bi şêweyê îfadeya civaka exlaqî û polîtîk weke şaristaniya demokratîk, ne jî bi temamî bi şêweyê îfadeya civaka çînî û dewletdar weke sîstema şaristaniyê pêk tê. Bi şêweyekî gelekî nakokî û têkilî, rewşên şer û aştiyê bi peyhevketî pêk tê. Ev rewş herî kêr bi qasî pênc hezar salan e ku welê dewam dike. Ji lewra bi şoreşên lezgîn tavilê ji holê rakirina wan bi qasî utopîk e, ji mêj ve hatina wan weke çarenûsê qebûlkiririn û wan di seyra wan de pejirandin û destnedana wan jî rewşeke exlaqî û polîtîk a nerast e. Divê mirov ji bîr neke ku têkoşîna sîsteman wê dirêj biqudîne û biajo. Di vê çarçoveyê de nêzîkatiyên taktîk û stratejîk ên qada demokratîk û azadiya civaka exlaqî û polîtîk berfireh bikin hê bêtir manedar û encamgir in.

9- Eger civaka exlaqî û polîtîk bi sifetên hev dişopînin ên weke komin, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst were terîfkirin, wê ev li şûna ravekirinê bi rola sergirtinê rabe. Bêguman di civaka exlaqî û polîtîk de ji sifetên koledar, feodal û kapîtalîst re cih nîne, lê di nava lihevkirine bi prensîb de bi mesafe, bi sînor û bi kontrol mirov dikare nêzî van sifetan bibe. Ya girîng ew e, mirov ne wan tine bike ne jî ji aliyê wan ve were daqurtandin; bi serdestiya civaka exlaqî û polîtîk timî hêz û qada wan bi sînor bike. Sîstemên komin û sosyalîst bi qasî demokratîk bibin bi civaka exlaqî û polîtîk re wekhev dibin. Bi rewşên wan ên dewletê re wekhev bûn nabe.

10- Civaka exlaqî û polîtîk weke hedefên lezgîn di nava hedefên wê de dewleta netewe, tercîheke dînî yan jî li pey rejîmeke li derveyî demokrasiyê nabeze û nabe ku hedefên wê yên wisa hebin. Mafê diyarkirina hedefên civakê û wesfên wan bi tenê mafê îradeya azad a civaka exlaqî û polîtîk e. Bi qasî biryar û guftûgoyên rojane, biryarên stratejîk jî bi îfade û îradeya polîtîk û exlaqî ya civakê diyar dibin. Ya esas, guftûgokirin û bûyîna hêza biryarê ye. Civaka vê hêzê di destê xwe de bigire, dikare tercîhên xwe bi awayekî herî têkûz diyar bike. Ti ferd û hêz xwedî wê hêz û erkê nîne li ser navê civaka exlaqî û polîtîk biryarê bide. Di civakên exlaqî û polîtîk de muhendisiya civakê nabe.

Li ber rohiya van terîfan ku min hewl da ji gelek aliyan ve pêşkêş bikim, wexta mirov li mijarê temaşe bike mirov ê bibîne; Sîstema Şaristaniya Demokratîk bi xwe bi awayê yekparebûna exlaqî û polîtîk a xwezaya civakî timî weke rûyekî dîroka şaristaniyê her hebûye û her hebûna xwe dewam kiriye hatiye. Tevî hemû mêtinkarî û zordestiya sîstema dinya fermî, rûyê din ê civakê tine nebûye, nikarîbûne tine bikin. Jixwe tinekirina wê jî mumkîn nabe. Çawa ku kapîtalîzm, bêyî civaka ne kapîtalîst nikare hebûna xwe dewam bike, sîstema dinyayê ya fermî jî weke şaristanî, bêyî sîstema şaristaniya demokratîk nikare hebûna xwe dewam bike. Eger em hê berbiçav bikin, şaristaniya bi yekdestdarî bêyî şaristaniya bê yekdestdarî nikare hebûna xwe dewam bike. Berevajiyê vê rast nîne. Ango sîstema herikîna dîrokî ya civaka exlaqî û polîtîk weke şaristaniya demokratîk, bêyî hebûna şaristaniya fermî, bê asteng û hê bi biste dikare dewam bike.

## 2- MÎTOLOJÎ

Di kûrahiya dîrokê de rêbaza pêşî ya em lê rast tên û em hewl didin wateyê bidinê, nêzîkbûna mîtolojîk a ji bo tevahiya bûyer û têgihîştinane. Bi wateya teng mîtolojî jî rêbazeke; rêbaza êşkerekirina heqîqetê ye. Mîtolojî weke tê zanîn vegotinên bi şêweyê çîrok, çivanok, efsane û destanî ne. Di mîtolojiyan de mutleq heqîqetek veşartîye. Ya rastî, mîtolojî şêweyekî vegotina heqîqetê ye. Dîne di şaristaniyê de hatiye dakirin jî li gorî mîtolojiyê aliyê xwe yê bawariyê zêdetire û şêweyekî vegotina heqîqetê ye ku misoger nirxên heqîqetê xurt dike. Li pişt mîtolojiyê têgihîştina li gerdûnekê heye. Di mîtolojiyê de xweza bi ruh û ruhberan tijî ye. Herçiqas di roja me ya îro de ev yek weke baweriyeke zarokane were dîtin jî, wexta mirov asta zanistê ya gihîştîyê li ber çav bigire ya rastî mirovê bibîne ku ev rêbaz bi qasî tê gotin şaş nîne. Têgihîştinên rêbazê yên mirî, bêruh û mehrûmê dînamîzmê, ji mîtolojiyê bêhtir ji wateyê bê parin.

Têkiliya helwesta mîtolojîk bi jiyane re ji sedî sed hawîrdorparêz e, ji qederê dûr e, determînîst nîne û zêdetir deriyê wê li azadiyê vekirîye. Ev têgihîştina jiyane ya bi xwezayîbûnê re li hev dike, komên mirovan heta serdema dînên mezin rengîn û bi coş kirîye. Destan, çîvanok û mîtolojiyên bi pîroziyan barkirî, bi taybetî zêhniyeta bingehîn a jiyana serdema neolîtîk e. Çîvanok bi objektîvîteyê re li hev nake, ev nayê wê wateyê ku wê şîroveyan watedar der barê naveroka wê de neyên kirin. Li ser mîtolojiyan mirov dikare şîroveyan gelekî giranbuha bike. Bêyî van şîroveyan dîrokê pir kêr were fêhmkirin. Ji bo mirov karibe komên mirovan ên demeke xwe ya dirêj bi çîvanokan bihurandine fêhm bike, weke rêbaza bingehîn mîtolojî xwedî cihekî girîng e ku dest jê nayê berdan. Rêbazên zanistî yên weke dijberê rêbaza mîtolojîk roja me ya îro derdikevin meydanê, bi delîl hatiye piştrastkirin ku piraniya wan bi xwe ji mîtolojiyê pêve ne ti tiştekî dinin.

Dogmayên dînên yekxweda hebin, rêbaza zanistî ya dewama wan e ku îdîa dike bi qanûnên mutleq dixebite, rêbaza mîtolojîk têra xwe piçûk xistine û divê îtibara maneyên mîtolojîk paşve bê dayîn. Sextbûyîna mîtolojî weke ol, rê li ber duyemîn cûreyek zanista civakî vekirîye. Mîtolojî xizmên utopyayanin, û şewazekî zêhnî û wateyê ne ku mirov nikare jê bigere. Bê mîtolojî (destan, çîvanok) û bê utopya hiştina zêhnê mirov dişibe tînî hiştina bedena mirov. Baş tê fêhmkirin ku zêhnê mirov ê tevahiya zêhnê ruhberane, nabe ku ev çarçoveya dewlemend a zêhnê mirov tenê bi zêhniyeteke analîtîk a matematîk were ravekirin. Ev bi jiyane re li hev nake. Çawa ku zêhnê bi mîlyonan ruhberî matematîkê nas nake, nabe ku zêhnê mirov ê tevahiya zêhnê ruhberan e, bi matematîkê were sînordarkirin. Jixwe wexta matematîk cara pêşî hat dîtin ku vedîtineke şaristaniya Sumeran e, weke rola wê ya esasî di hesabdariya berhemê zêde de hatiye bikaranîn. Roja me ya îro mentiqê mirov hema bêjin bûye mîna mekîneyeke hesabê. Başê, zêhnê bi mîlyonan ruhberî, heta tevgerên pirtikên jêr atoman, mezinahiyên bi pîvanên astronomîk nayên hesibandin, em ê bi çî û çawa fêhm bikin? Eşkere ye, hêza matematîkê têra van gerdûnên mîkro û makro nake. Qet nebe divê em deriyên xwe li rêbazên nû yên maneyê vekirî bihêlin da ku em yekser xwe bi dogmayan nefetîsin.

Nabe ku mirov hisên zindî piçûk bibîne. Li ser navê jiyane çî heye di HİSAN de veşartî ye. Mirov nikare bibêje; ev hisên makro û mîkro ji gerdûnan serbixwe ne. Ya hîne nêzî têgihîştinê ewe ku mirov bibêje; cîhana van his û pêjnan taybetiyeke bingehîn a gerdûnê ye. Ji ber vê, rêbaza mîtolojîk ji bo serwextbûna li gerdûnê ewqas jî bê qîmet nîne. Dibe ku herî kêr bi qasî rêbaza zanistî ji bo em li gerdûnê serwext bibin, bi kêr bê.

Vegotina mîtolojîk îfadekirina rastiya veşartî mayî ye. Çî mîtolojî, çî jî belgeyên dînî yên pîroz şeweyekî çîrokên berxwedanê ne. Mirov berxwedana destpêkê weke serhildana çanda îdeolojîk şîrove bike, tespîteke watedar e. Berxwedan gelekî berfirehe. Berî her tiştî berxwedana mezin a jinê, tevî ku di zindana malê û serweriya mêr de tê girtin, di figura Înannayê de zelale.

Piçûkxistina çanda îdeolojîk di van vegotinan de veşartiyê. Vegotinên mîtolojîk ên avakirina pêşî ya şaristaniyan, nemaze hostatiya wan a çêkirina xwedayan, mirov dikare weke şeweyê îdeolojîk ê têkoşîna çînî bibîne. Jixwe watekî din ê wê demê yê vegotinê nîne.

Em nikarin dest ji vegotina mîtolojîk berdin. Nexasim berî dîrokê, dîroka neolîtîk, serdema destpêkê û şaristaniya demokratîk beşekî mezin mîtolojîk e. Di vegotinên zanyaran û efsaneyan de xwe tînin ziman. Eger ji aliyê civakî ve bi awayekî serketî ji hev bêne derxistin wê vegotina dîrokê ji sedî sed bi hêz û rengîn bikin.

Pêvajoya şaristanî ku em jê re dibêjin çaxên dîrokê, şewazeke zanistê ji anîmîzm berbi mîtolojiyê ve bi xwe re aniye. Mîtolojî, tevî ku bi temamî neyê kirin malê şaristaniyê, bi gelek aliyê xwe ve mora şaristaniyê di xwe de werdigire. Yekemîn çirpandina xiyanet û çirpandina zanatî li zanistên civakî, pêwendîdare bi serweriya bîrdozî ya pêvajoyên şaristaniyê. Şerên em pirî caran li cem dînan û di mîtolojiyan de dibînin, di cewherê xwe de têkoşînen polîtîk û aborî ne. Yekdestiya desthilatî û sermaye ya li ser xwezaya civakî tê pêkanîn, bê derew, bê şewşandin û bêxiyanet li gotinê, nabe. Mîtolojî bi beşa xwe ya mezin, bi anîmîzmê dagirtî ye û hêjaye, lê dema wan çîrokên qehremankirin (nîvxwedakirin) û xwedkirinan, weke teyisîna mîtolojîk a sîstema xeraxîk û pergala ku ji sêmendiya keşîş+rêveber+fermandar pêk tê, ketin dewrê, şewşandin û çilçivandin, bûn tiştekî jênerevîn. Lê dîsa jî mîtolojî, bi mercê ku vê wesfa wê ya dûmend were girtin ber çavan, zanistêke civakî ya xeylî fêrkar e. Ez di wê baweriyê de me ku, her biçe, wê girîngî wergire. Her wisa wê hîn zêdetir rol bilîze di fêrbûyîna dîrokê de.

Di kapîtalîzmê de mîtolojî, dîn û felsefe xistine rewşekê hema bêje pênc pere nakin. Di sîstema fikra civakê de heta ku dîn, felsefe û efsaneyan cihên xwe parastin û mejiyê hisî di civakê de giraniya xwe dewam kir, mumkin nîne kapîtalîzm bibe ya sereke.



### 3- OL

Sosyolojiya dîn ji destnîşankirina rastiya civakî dûr e. Divê têkiliya Epîstemolojiyê (zanista zanînê) baş bi civakîbûnê re were danîn û analîzkirin.

Sembola têgihîştina li klanê totem e. Dibe ku totem yekemîn têgîna mucered û ne berçav a sîstemekê be. Ev nîzam ku wek dînê totem jî tê nirxandin pîrozbûna destpêkê û sîstema tabûyan ava dike. Klan xwe bi sembola totem pîroz dike. Bi vê rê, cara pêşîn têgîna exlaq jî dikeve jiyana mirov. Pir baş serwext e, eger koma klanê nebe jiyana dewam nake, wê demê hebûnên civakî pîroz in, divê wek nirxên mezin bêne simbolîzekirin û stû ji wan re were xwarkirin. Baweriya dînî jî hêza xwe ji vê çavkaniyê werdigire. Bi vî awayî dîn dibe yekemîn forma têgihîştina civakî. Ew û exlaq hevdu temam dikin. Ji zanebûn û têgihîştinê ber bi baweriyeke hişk ve diçe. Têgihîştina civakê êdî bi forma dîn dimeşe. Dîn bi vê taybetiya xwe, dibe hafîza bingeîn a civakê, çavkaniya exlaq û kevneşopiyeyeke bi bingehe. Civaka klanê, bi pratîka xwe çendîn zanebûn û têgihîştinê pêş de dibe vê yekê hemû bi totem yanî bi qabîliyeta xwe ve girê dide. Wek simbol totem û di rastiye de jî koma mirovan her diçe serketinê bi dest dixîne û pê re pîrozkirina serketinan tê. Pîrozkirin qûtsiyetê û qûtsiyet jî dibe hêza civakê.

Cîhana zêhniyeta civaka xwezayî, xwe dispêre têgihîştina xwezeyeke zindî û ruhber. Her hebûna di xwezayê de xwedî ruh tê qebûlkirin. Ruh wek sedemên zindîbûnê dihatin zanîn. Di têgihîştina dînên totemîk de hê têgihîştina xwedayekî ji der ve hukum bike pêş neketiye. Bi nazenînî hewl tê dayîn, ji bo bi ruhên di xwezayê de yanî bi hêzên wê re li hev were kirin. Ji ber ku rewşeke berovajî maneya wê mirin e. Wexta têgihîştin ev bû, hewceyî bi lihevkirineke awarte heye. Li gorî pîvana bingeîn a ekolojiyê, em bi jiyane re rûbirû ne. Ji bo jiyana civakî bi hêzên xwezayê re neyê dijberî hevdu, hewldaneke girîng heye. Wexta exlaq û dînê xwe pêş de dibin, prensîba bingeîn a lihevkirina bi xwezayê û hawîdorê re li ber çav digirin. Ev prensîba jiyane, ew çend di mejî û zêhnan de bi cih dibe, wek kevneşopiyeyeke exlaq û dîn li ser seran tê girtin. Ya esas, ev prensîbeke herikîne ya jiyana xwezayî ye, di nav civaka mirov de bi cih bûye. Ti hebûn nikare hawîrdora xwe li ber çav negire. Ji rêderketinên demkin, bi herikîne re bi şert û mercên der ve û hundur ên nû re tevî pêvajoyê dibin. Naxwe bi tevahî li derveyî sîstemê dimînin, hebûna xwe wenda dikin.

Di civaka xweza de hemû endamên komê di tevahiya jiyane de bi awayekî organîk cih digirin. Her kes ji dil û durust parçeyekî civakê ye. His û baweriyên wan hevpar in. Têgînen xapandin û derewê hîç pêş neketine. Weke ku bi xwezayê re bi zimanê zarokan bipeyivin. Li gorî qanûnên civakê yên kirine dîn û exlaq, hukumkirina li xwezayê û xirab bi karanîn, gunehêkî herî mezin –tabû- û xirabî ye.

Di şûna dînên ruhparêz ên civaka xwezayî de ku zirara wan nebûn, dînên xweda yên ferman dikin afirandin û stû tewandin daîmî kirin. Ketin cîhana tirsê, belovajîkirin û anîn ziman ka çima hewce ye ji xwedayan bitirsin û wexta guh bidin xwedayan wê çawa bêne xelatkirin. Ev xebat bi nazenînî û hostatî kirin. Yekem car utopyayên naveroka xwe cennet û cehennem vedîtin. Ya esas, ji çîna efendiyên nû re sîstema îdeolojîk tê avakirin ji bo bi wan re were lihevkirin. Şêwazê fikrê mîtolojîk e, ev yek li gorî demê li cih e. Ya rastîn, dînê zindîtiyê (anîmîzm) wekhevî û azadîxwaz e. Dînê nû yê bi giranî mîtolojîk e, dînê çinekê ye, wekhevî tê de nîne, dînê koletiyê ye. Ji sedî sed stûxwarkirinê ji xwedayan re – efendiyan – ferman dike.

Dînê totem di vê pêvajoyê de pîroz dibe. Ji ber ku civak bi dîn yekemîn nasnameya xwe bi dest dixê girîng e. Ev rewş, têgihîştin û serwextbûna seretayî îfade dike. Pîrozbûna serwextbûnê bi vî rengî ji jiyana civakî bi xwe tê. Piştî ku veqetîn ji jiyana heywanî ya prîmat bû, cudahiya mezin a manedanê destpêkir. Cudahiya nû balkêş e. Taybetiyên yekemînên di himbêza xwe de hildigire. Pratîka civakî di hemû gavên girîng de rê li ber pêşketinê bi heyecan vedike. Ev rewş serwextbûna zêde dibe îfade dike. Serwextbûn û têgihîştinê bi lêv dike, tîne ziman, bi nav û tarîf dike û pêre pêvajoya simbolîzekirinê dest pê dike. Pêvajoya têgihîştin û serwextbûnê ji bo pratîk û hilberandinê roleke xwe ya girîng heye. Bêyî têgihîştin mayîna li ser piyan zehmet dibe. Kalîteya jiyana tenegehîştî yekser tê dîtin. Kalîte û pêşketina naveroktîjî bi cudabûna serwextbûnê re bi hev re dimeşin. Dîn hemû girîng bûn û pîrozbûna xwe di vê qonaxa nazik a jiyane de werdigire û ji serî ve di nava xwe de nakokiyekê dihewîne. Ji ber ku civakîbûyîna seretayî, serwextbûn û nasnameyê îfade dike, jiyana bêyî civakîbûyîne zehmet e. Li aliyê dîn, ji ber ku pîrozbûnê, tabûtiyê –dest pê nekirin, dest nedan, qadên heram– û gelek rêzikan bi xwe re tîne, ji bo paşerojê muhafizekar e. Li serwextbûn û têgihîştinê nû girtiye. Bi vê taybetiya xwe pêşketinê berhend dike. Ji vê yekê, hê ji serî ve, pêvajoya pir dînan xwe ferz dike. Pir dîn û pir xweda, cudahiya di navbera têgihîştinan de îfade dikin. Erênî ye. Di destpêka dîn de her tişt bi

ruhan – anîmîzm – dihat ravekirin, ev encameke nertina xwezayî ya pradigma civakî bû. Erênî ye. Pişt re her ku çû, ruhê mezin û ji wir jî derbasî pêvajoya xwedatiyê bû, ev yek ponijandina civakê ya ji bo bidestxistina nasname û xweseriyê îfade dike. Di vê pêvajoyê de nasname û xweserî sembolîze dibin. Di destpêkê de xweda civak bi xwe ye.

Tevî ku ser gelekî hatiye girtin jî meşandina analîzên dînî bi vî awayî yek ji fonksiyona bingehîn a sosyolojiyê ye. Naxwe wê sosyolojî ji saxekî jêr ê zanistê pêve nikaribe bi ti rolê rabe. Jixwe pîrozîyên dînan hene û gelekî girîng in. Derxistina holê û eşkerekirina van jî wezîfeyeke gelekî girîng e. Eger dîn bi rastî kiribin rewşekê ku bi pîrozîyên xwe re îxanetê bike (pir eşkere dike) û eger kiribin amûrekî çor ê îdeolojîk, wê wextê weazkerên wê bi xwe yên nû ew xistine rewşekê ku bi minafiqiyê rabe.

Kesekî bi baldarî li ser sosyolojiyê hûrûkûr dibe û diponije, jêre zehmet nîne ku tespît bike, dîn û pêve girêdayî forma xwedê, şeweyê herî kevin ê nasnameya civakî ye. Dîn û xweda ji nasnameyên formîk ên bi zanebûn wêdetir, divê weke pêdiviyeye zêhnî ya serdeman were fêhmkirin. Tesewira kolektîf a civakî xwe bi têngînên herî pîroz bi nasname dike û vê weke yek ji rêyên xwe pê li ser piyan bigire difikire. Di bingeh û koka xwedatiyê de pîrozkirina hebûna civakî heye. Bi pêvajoyê re jihevqetina desthilatdarî, dewlet û civakê bi lez dibe, û bi vê re payeyên pîrozîyê û xwedatiyê ji nasnameya kolektîf a tevahiya civakê tê stendin û dikin milkê xwediyên desthilatdarî û dewletê. Hegemondariya îdeolojîk di vir de bi roleke girîng radiibe. Tê diyarkirin ku desthilatdarî û dewlet çavkaniya xwe xwedê ne; ango weke xwediyên desthilatdarî û dewletê rê vedikin ku karibin xwedatî û pîrozîtiya xwe îdea bikin. Êdî zehmet nîne ku xwe bigihînin têngînên qralê xwedê û dewleta xwedê. Li pey van, têngînên qasidê xwedê û siya xwedê dereng namînin tên.

Mirov her ku binê têngîna xwedê dikole, her carê ji binê wê zordestî û mêtinkariya yekdestdar, zordariya amûrên dewlet û desthilatdariyê, talana wan û hêza bi darê zorê ya xebitandina kolewarî derdikeve. Lê xusûseke girîng e ku mirov tespît bike, aliyên dîn ên demokratîk û civakî bi exlaq re wekhev in. Bi vî awayî, mirov dikare dîn tevahiya dîroka şaristaniyê weke çand, rêûresm û nasnameyêke du karakterî manedar bike. Xweda û dîn weke nasnameya hêzên şaristaniyê, çiqasî bi têngînên tirs, ceza, avêtina cehennemê, birçî hiştinê, tinekirinê, bêmerhametiyê, şer, tehakum, hukimranî, xwedîtî û perestîne (divê mirov ji bîr neke ku ev têngîn herî zêde wesfên hêzên şaristaniyê ne) barkirî be, nasnameya dîn û xwedê ya hêzên civaka exlaqî û polîtîk jî bi têngînên wêrekî, efûkirin, bexşandin, hêvî, bê rizq nehiştin, dike heyî, merhamet, hezkirin, aşî, ghiştin û di cewherê xwe de helandinê barkirî ye.

Ne dîn weke tê yeqînkirin têngîştineke ‘uxrewî’ ye, ne jî laîktî têngîştineke sekulerî ‘dinyewî’ ye. Di vir de cihêkirinek heye, li hev hatiye çêkirin. Dîn hemû bi dinyewîbûnê re têkildar in, girêdayî civakbûnê ne. Têngîştinên ji wan re dinyewî tê gotin beriya her tiştî dinyewî nînin, bi civakbûnê re têkildar in. Têngînên uxrewîtiyê û dinyewiyetê nakokiyên ciddî yên civakbûnê vedîşêrin û ji bo şer sergirtî dewam bike xizmetê dikin. Îdeolojiya Rohnîbûnê weke zanistî û pozîtîvîzmê her xwe bi sistem kir, bû îdeolojiya fermî ya dewleta netewe ya nû. Ev jî dihat wê maneyê ku pir bi lez vediguherî îdeolojiya milletgiriye.

Di pêvajoya dewleta netewe de dîn ji wan amûran e ku milletgiriye ew herî zêde bi kar aniye û yekser ew veguherandine dînê dewleta netewe. Ji ber ku dîn hem neteweyî dikin, hem jî milletgirî dikin, di dema dewleta netewe de weke saziyeke civakî herî zêde bi cewherê xwe re nelihev dibe. Beşê civakê yê li derveyî milletgiriya sekuler dimîne bi milletgiriya dînî, bi hebûna nû ya xwedayê berê bi zanebûn an jî xweber bi evdîtiya wî re dikin yek û bi awayekî îxaneta xwe ya hundirdijî. Şerê dîn û laîktiyê ji nêz ve bi vê îxanetê re têkildar e.

Dîn saziyeke beriya şaristaniyê ye, û ev ne ya guftûgoyê ye. Xusûsên exlaq ên zêde qedexeker û yên divê mirov ji wan dûr bisekine, yên merhamet û bexşîner digire nava xwe. Di nava pêvajoyê de hê zêdetir vediguhere rêûresmeke hişk. Di vê çarçoveyê de bi rêkûpêkiya rêzik û pîvanên hişk û pîroz ên exlaq dîn pêk tînin. Tevî ku ji nava exlaq derdikeve û di destpêkê de parçeyekî ji wî ye, bi guhertina şert û mercên zeman û mekan re bi hêz dibe, sazî û rêzikên xwe dike qanûnên gelekî hişk ên divê ji sedî sed mirov guh bidin wan (nîzamê tîpîk ên Deh Fermanên Mûsa) û bi vî awayî serxwebûn û serektiya xwe îlan dike. Huqûq jî gavavêtina wî mirov dikare bi heman rengî qiyas bike. Rêzikên huqûqê pêşî beşek ji rêzik û pîvanên exlaqê girtin, bi dewletbûnê re pêdiviyên xwe weke qanûnên divê bi cih bêne anîn ferz kirin û huqûqa em nas dikin pêk anî. Bi pêşketina pêvajoya şaristaniyê re di dîn de cudabûneke din pêk hat; bi hemanên xwe yên ji bo berjewendiyên hêzên mêtinkar û desthilatdariyê veguherîn li ser serê civakê veguherî hêzeke xwedayî ya wê bi dijwarî ceza dike. Berjewendiyên yekdestdariyê yên huqûqê bi destê dewletê meşandin, dînê bi mohra nû ya şaristaniyê hewl da bi destê xwedê bimeşîne.

Bi dogmabûyîna mîtolojiyê re dîn pêk tê. Mirov bi tamamî ni-kare ji mîtolojiyê re dîn bibêje. Ji bo dîn şeweyên bawerî û peres-tinê yên naguherin hewce dikin. Bi tevahî hûnandî ye. Bingeha dî-nî bawerkirina ji bûyerên hûnandî ye. Aliyê wê yê bi tenê erênî ew e ku di gavavêtina fikra neberçav de telşên mezin di nava civakê de vedike, zorê dide fikra felsefî û zanistî, û nebi-destê xwe ji wan re zemîn amade dike. Fikra zanist û felsefeyê bi fikra dînî re di nava pêwendiyêke diyalektîkî de pêş dikeve. Şopên kûr ên dînî li ser wan hene.

Ji têngihîştina mîtolojîk derbasbûna têngihîştina dînî ya dogmatîk qonaxêke mezin e. Têkiliyêke xurt di navbera vê derbasbûnê û dagirkirina qada zêhnî ji aliyê veguherîna civakî ya xwe dispêre hiyerarşî û çînîbûnê de heye. Pêdiviya hikumdar û mêtinkaran bi dogmayên neyêne guftûgokirin heye. Nirxên tabû yên pîroz in, gotinên Xwedê ne, û nabe mirov destê xwe bide wan, li dogmayan tê barkirin. Têkiliya vê bi desthilatdarî û mêtîngeriya wan heye, têkiliya vê bi berjewendiyên wan ên çînî û hiyerarşîk heye. Bi van dogmayan desthilatdarî û mêtîngeriya xwe, berjewendiyên xwe yên çînî û hiyerarşîk veşartine û rewşa kirine. Di têngihîştinekê de çiqas hikmekî hişk hebe, li wir ew çend zordarî û mêtîngerî veşartîye.

Herçend mêtîngerî û zordarî xurt bû, rêbaza dogmatîk a dînî jî kirin rêya sereke ya mirovî; ya rastî, weke rastiyeke civakê hat avakirin. Di bin hikmê van despotên bi maskeya xweda de jiyân li mirovan hat herimandin û bi vê rêbazê ji bo koletiya demdirêj serî li mirovan hat tewandin.

Helwest û nêzîkatiyên dînî di dîroka mirovatîyê de piştî dema mîtolojîk pêvajoya herî demdirêj e. Mirov dikare vê demê bi dîroka nivîsê bide destpêkirin. Yan jî pirr hindikî beriya wê, piştî wê. Ya divê em fêhm bikin ew e ka çima ev çend hewcedarî bi helwesta dînî hatiye dîtin. Eşkere ye, ev helwest rêbazek e. Li gorî nêzîkatiya dînî, ya esas di armanca jiyânê û rêya gihiştina rastiya de ew e, mirov li gorî GOTINÊN weke yên îlahên ji xweza û civakê wêdetir (mezintir) qebûlkirî tîne nîşan dan, tevbigere. Kengî ji van gotinan derket; hîne li heyatê be tê berbendkirin, her cure koletî rewşa dibe, piştî mirinê jî dibe cihennemî. Em li ber wê qonaxê ne ku êdî xwedayên bi maske tîne afirandin. Êdî mirov bi hêsayî têderdixê ku ev xweda di heman demê de ew despot û şef e, fermanan dide û civakê dikoje. Pirr zêde bi maskekirina van xwedayan, têkiliya wê ji nêz ve bi xapandina têngihîştina mirov ve heye. Jixwe wexta despot pêşî derketin ser dika dîrokê jî xwe weke qal-xweda bi nav kirin ku vê xusûsê jî baş rave dike. Paşê weke gelek caran di dîrokê de hatiye dîtin gotinên xwe kirin qanûn û weke heqîqetên mutleq pêşkêş kirin. Herçend mêtîngerî û zordarî xurt bû, rêbaza dogmatîk a dînî jî kirin rêya sereke ya mirovî; ya rastî, weke rastiyeke civakê hat avakirin. Di bin hikmê van despotên bi maskeya xweda de jiyân li mirovan hat herimandin û bi vê rêbazê ji bo koletiya demdirêj serî li mirovan hat tewandin.

Zêhnê mirovan hîne rêbaza dînî bûye. Ev jî nuqteyêke girîng e. Ji ber ku bi rêûresmên hişk ên hezar salan li komên mirovan serî tewandin û ev koletî jî rewşa kirin. Têngihîştina baweriya bi qedere jî bi kok û zexm kirin. Şerên hov û mêtîngeriya mezin bi saya vê rêbazê mumkîn bûne: li gorî gotina pîroz û fermana Xwedê jiyân! Bêguman ev rêbaz derfet û îmkânên baş dide kesên di asta rêveberiyê de ne. Bi vê, diyalektîka kerî û şivan hatiye danîn. Koletî weke qonaxêke pêşketinê ya diviyabû biqewime hatiye pêşkêşkirin û heta ji wê jî wêdetir bi têngihîştina civaka naguhere rastiya xwezayî li ser vî hîmî hatiye cemdandin. Li aliyekî têngihîştina civak û xwezayêke cangiran, li aliyê din têngihîştina xwedayê hikim dike û rêve dibe, bi eşqeke her tiştî diafirîne û gelekî çalak e. Bi vî awayî têkiliyêke diyalektîkî bi zorê hatiye danîn. Eger em bibêjin; vê têngihîştin û rêbazê serdema Destpêk û Navîn rêve biriyê, wê gotina me neyê wê maneyê ku me mesele zêde mezin kiriyê.

Aliyê rêbaza dogmatîk ê mirov jê fikaran bike ew e ku li şûna têngihîştina xwezaya zindî ya xwe bi xwe dibe, rêyêke sekan a bi fermanên ji derve yê fermandarê mezin li ser mirovatîyê ferz kiriyê. Encama vê ya girîng li ser civakê ew e ku heman pêkhatinên cangiran û rêveberiya ji derve bi destê şivên pirr xwezayî nîşan daye. Ev rêbaz gelekî kevn e û di serdema navîn de gihiştîye di asta herî jor a ultra-subjektîvîzmê. Ji lewra cîhana objektîv hema bêje tîne hatiye hesibandin û nayê fêhmkirin hatiye qebûlkirin. Dinya bûye xaneke demborî ya heyatê, îdealên ebedî û baqî jî weke şewazê jiyana esas hatine qebûlkirin. Kî gelekî bi dogma û klîşeyan baş zanibe ew alim hatiye qebûlkirin û li mertebeya herî jor rûniştîye. Di dîrokê de ev rêya fikrê ya di karaktera antî-mîtolojîk de, ji bo jiyânê gem bike û weke girtiyekî mehkûm bike, bûye xwedî roleke sereke.

Ne tenê di dînên mezin de rêbaza dogmatîk di fikra Yewnan a klasîk de giraniya xwe heye. Di vê fikrê de cihê rêbaza diyalektîk û nêzîkatiyên objektîv gelekî bi sînor in. Rêbazên serdest di vê fikrê de îdealîzma Arîsto û Eflatûn e. Ew di serdema navîn de ji bo rêbaza dînî ya dogmatîk bûne palpişt û spartekên xurt. Eflatûn weke filozofê herî mezin ê îdealîzmê hatiye qebûlkirin û heta afirînerê wê ye yan jî wisa hatiye pejirandin û ev yek bûye sedem bi çavê pêxemberan lê were nêrin. Ji lewra filozofê herî nêzî pêxemberiyê ye.

Helwestên pêxemberên her sê dînen mezin baş hatine stabîlîzekirin û nêzî damezrandina rêbaza dogmatîk in. Di her sê dînan de jî hêmanên damezrîneriya exlaqê metafîzîk bi giranî hene. Li cem Bûda, Zerdeşt, Konfuçyûs û Sokrates exlaq derdikeve asta herî bilind. Bi taybetî jî Zerdeşt weke felsefeya bingehîn qencî û xirabî bi dualîteya tarî û rohnîyê wekhev girtiye. Ev zanayên di dîrokê de cihê wan giranbuhaye, di şexsê wan de mirovatîyê di qada exlaq de qonaxeke mezin bihurandiye.

Aliyê baş ê rêbaza dînî ew e ku di nav civakê de exlaq gelekî pêşde biriye. Di vê qonaxê de li bin navê vê rêbazê fikra qencî û xirabiyê pirr baş ji hev hatin kirin û weke hikmên mutleq hatin ferz kirin. Xusûsa vê rêbazê tê derxistîye ew e; zêhnê mirov qayîşokî û nerm e, yanî bi hêsayî dikare şikil bigire. Mirov bi vê zêhniyetê ji alema heywanan a di bin xwe re cihê bûye û ev yek jî hîmê pêşketina exlaqî ye.

Têkiliya dîn û exlaq pîrsgirêkeke girîng e ku divê were analîz kirin. Çawa ku mirov dikare di navbera demokrasiya rasterast û exlaq de têkiliyeke wekhev bûnê deyne (ji bo civakên dijber û li derveyî şaristaniyê), mirov dikare bi heman rengî têkiliyeke wekhev bûnê di navbera dîn û exlaq de jî deyne. Di şert û mercên dîn hê mohra şaristaniyê nexwarî de exlaq, dîn û rasterast demokrasi di zikhev de pêk tên. Exlaq saziyek e ku berî dîn pêk hatiye. Wer tê fêhm kirin ku dîn zêdetir bi aliyên tabû yên exlaq, pîrozî, bi heybê bûn, di manedanê de zehmet kişandin, fikir û hisa nikarîbûna kontrola hêzên xwezayê re pêwendîdar e. Civak xwezaya li derveyî xwezaya xwe nas dike û qebûl kirina wê îdrak dike, ev hem hisa tirs û hem jî hisa merhametê hişyar dike. Lê hayil dibe ku ev hêz û xwezaya jiyana wê gelekî pêve girêdayî ye, neyênî û erênîyên wan hene, ji lewra fikra divê xwe ji neyênîyên wê dûr bigire û ji erênîyên wê sûd werbigire çêdibe û ev weke çavkaniya rêûresm û saziya dîn a resen û fikra wê ya pêşî xuya dike.

Bêyî exlaq mirov ne dikare bibe civak, ne jî dikare were rêvebirin. Di rêbazê de exlaq ji bo civakê rastiyeke rêveberiyê û pêkhatinek e, dest jê nabe. Bêyî ku mirov naveroka exlaq a pozîtîf û negatîf guftûgo bike, divê pêşketinên di vî warî de weke têgihîştin an jî hiseke civakî ya mirov nikare jê bigere qebûl bike. Bêguman exlaq têgihîştineke metafîzîk e, lê ev xusûs exlaq bêqîmet û bê kêr nake. Eger mirov bibêje; exlaqê metafîzîk ji yê serdema mîtolojîk çêtir e, bawer nakim ku em zêdegaviyê dikin. Nabe ku mirov civakê bê exlaq bifikire, belkî jî civaka bê exlaq weke dînozorên ji ber xwarin û gîha neslê wan qediya ye, belkî jî mirovê bê exlaq ew kes e, dawiyê li neslê xwe tîne yan jî hawîrdora cîhanê ya jiyana lê dibe diherimîne û dike ku jiyana lê nebe. Her du jî li heman benderê ne, di encamê de mirov nikare hebûna nîfşê xwe dewam bike. Jixwe di roja me ya îro de ji ber hilweşîna mezin a exlaq e ku pîrsgirêkên hawîrdor û jîngehê gihîştine ber felaketê.

#### 4- FELSEFE

Bîr û baweriya civakî ya spartî mîtolojî û dogmayên olî, baweriyeke wisaye ku yan bi kolebûn yan jî bi teqezî xwe bi hinekan bigire, yê karibe bijî. Di binyata vê bîr û baweriyê de, dîrketin yan jî derkirina ji dogma, bawerî û şêweya îbadetê, bi mirinê û dawîlêhatinê re yek e. Ev cezayê herî mezin e. Bihêzî û bêhêziya bîrdoziya dogmatîk, di vê taybetiya wê de ye. Takekes weke berbendekî (tabî) civakê, bê pîrs û pîrsiyarî girê dide. Di sazîbûneke wiha ya bîrdozî de, civak, bi hinek nîşane û nîrxên ku baweriya xwe bi wan tîne û bi pêwana (wesîteya) hêza ku li van bardike, dikare xwe bihêz hîs bike. Lê di pêvajoya qeyranekê de, jiberku bîr û baweriyeke wê ya serbixwe tine û nikare alternatîfêkê derîne holê, ev civak yan wê hilweşe, yan wê bibe civakekî gelekî li paş, yan jî wê ji aliyê hêzeke serdest ve were pişav kirin (asîmîlekirin).

Binyata bîr û baweriya dogmatîk ya bi civakên Rojhilata Navîn re, ev encam hemû li ber çavan raxistine. Mînak, Civaka Sumer digel wê heyîna xwe ya derasayî, di pêvajoya qeyranê de, li hember qebîleyên çol û çiyêyên asan (besît) têkçûye. Encama Misrê jî mîna ya Sumer bûye. Digel ku bingehê Grek û Roma ya felsefê heye jî, ji ber bîr û baweriya civaka koledar ku rê li ber dîlîtiyê vekirîye, ji hev de ketine, hilweşiyane û ji hev belavbûne. Bêşik di vê de, têkiliyên xwedaniya (xwedîti) koledar ya liser şêweya hilberînê, rola diyarker dilîze. Lê saziya bîrdozî ya serdestî tevaya civakê, bi berxwedaneke ku gihaye merhaleyekê, nehiştîye ku ji rewşê derkeve der. Ev di saziya bîrdozî de, ne derketin e, ne çareserîye û ji hev belavbûn e. Ji ber vê yekê, saziya dogmatîk ku serdestî ramanê ye, jibo civakan weke bîrdoziyeke bêçareserî rola xwe dilîze. Koletiya serdema pêşî ku gelekî domdirêj bûye jî, ji ber serdestiya ramana dogmatîk ya liser bîrdoziya civakê ye. Ji ber vê yekê derketina pêxemberan ku ewqasî bi nîrxên tînin û sedema ku yek ji wan bi hewldaneke şoreşgerî re weke hev digirin, li dijderketina wan ya li hember van dogma û qûlên ku di heyîna wan de vikirine. Şoreşa Hz Brahîm, bi şikandina pûtekî ve girêdaye, armanca Mûhamed ya yekem, berê xwe dide pûtên Kabeyê, Mûsa hêrsa

xwe ya herî mezin, nîşanî "yên îbadetê ji golika zêrîn re dikin" dide, ev ligor dema xwe kiryarên girîng û diyarker in. Armanckirina dogmayê û parçekirina wê, jibo wan deman tê wateya şoreşê.

Qeyran û bêçareseriya li navendên çêbûna şaristaniya koledar, rê li ber dewletên piçûk yê derdor ku nermtir û hişmendiya etnikî bihêztir vedike, ji aliyê din ve jî hewl dide ku di pilana bîrdozî de, derketinekê ji olên yek xweda û lêgerînên razdar (mîstîk) re bibîne. Bi taybetî felsefe, di dorhêla ku komên razdar zêde dibin de, ji pêşveçûnê re hê bikêrhatîtir e. Ev komên ku em dikarin bibêjin, bi veşartî serî li bîrdozîya koledarî ya fermî hildane, bêhtir xwedî derfetên ramana azad in. Ji xwedîbûna dogmayên diyar zêdetir, di nava lêgerîneke sazûmana nirxan de ne ku bîr û bawerî û giyana wan têr bike û tirsên wan tine bike. Evan cureyek terîqetên serdema pêşî ne. Ramana felsefî, hewldana ravekirina rastiyên xweza û civakê yê bêyî mîtolojiyê, ol û dogma ye. Hatina bîr û baweriya mirov ya vî astî, berhema pêşveçûna civakiye. Wêrekiya (cesaret) bîr û baweriya takekes ku li ramana felsefî dike, pêngaveke herî mezin ya azadiyê ye. Mirov yekem car e di derbarê xwe de, daxûyaniyê dide. Ev nêzîkbûn bixwe, peyana (teşebus) perçekirina dogmayên bicîhbûye. Çawa ku olê yek xweda, pûtên totemîk û lijneya xwedayan derbaskir û di binyata bîr û baweriyê de rê li ber guherînan vekirîye, ramana felsefî jî çespandiye ku bêyî xwedê yan jî xwedê tevî vî karî nebe jî, ev dikare were jiyankirin, herwihe şoreşa herî mezin ya dîroka ramanê pêktîne.

Pêkerekê (faktor) din ya ku rê li ber ramana felsefî vekirîye, pêşveçûna amûrên hilberînê ne. Bingehê wê şaristaniyên koledar yê pêşî, li ser serdema tûncê bilind bûne. Xwedaniya ku li ser madenên tûncê hatiya kirin, di warê çêkirina amûrên çandinî, pîşeyî û leşkerî de, derfeteke bihêzbûnê ya girsegir (muezem) kiriyê destê çîna koledar. Ji derî navendê, heyîna van amûran ya bi kêmayî û bisînor, heyînen etnikî bêhêz dihiştin, çiqas ku ev amûr bi dest dixistin, di berxwedanên xwe de ewqasî biserdiketin. Lêbelê BZ ji salên 1000an û pêde, teknîka hesin ku berfireh bûyî, rê li ber bandoreke demokratî, û kartêkirina ku bi dest qismê civakê yê hejar jî bikeve, vedike. Bi teknîka hesin, hilberîn û xweparastin giha asta herî pêş. Ev dihat wateya zêdebûn û ewlekariyê mezin. Ewlekarî û zêdebûnê rê li ber xweşî û dema vala vedikir. Felsefe jî, ji xwe li zemîneke civakê ya wisa digere. Klasîkên felsefî yê mezin BZ di sedsalên 5 û 6an de, ne ji berxwe ve derketine holê, ev yek bi perçebûna bîrdozîya civaka koledar ya serdema pêşî û şikandina gemerdana (yekdest) liser amûrên hilberînê yê bingeh ve girêdayî ye. Dema dawî ya serdema pêşî (navbera BZ sedsala 5an û PZ sedsala 5an) ku em dikarin bibêjin "serdema klasîk" ya sazûmana koledar, di heman demê de tê wateya "serdema felsefî" ku feylesofên mezin derketine holê, doktrînen xwe pêşvebirine û bisazîkirine.

Heger ji feylesofên vê demê, em yê ku liser navên xwe dibistan hiştine nas bikin, emê wî çaxî bêhtir bizanibin, bê jibo mirovatîyê merhaleya bîr û baweriya nû û ya giyanê tê çî wateyê.

### **Merheleyên Pêşveçûnê**

Şoreşa felsefî ya ku di singa koledariya klasîk ya Grek û Roma de pêşveçûyî, derbeya bîrdozî ya dawî lêdixe. Şêweya jiyana û saziya koledar, bi awayekî berbiçav bi hêza aqil, ji xwedê û ji dogmayên ol cuda, bi destpêkirina ramyariyê serbixwe, diçe sentezeke nû. Ramana felsefî, bi taybetî bi Eflatûn (Platon) û Arîsto, hewl dida ku dewleta sîte ya Atîna rizgar û tekûz bike. Hemû hewldanên Sokrates yê weke bavê hemû filozofan tê pejirandin, ev bû ku gengaziya hemwelatîyê zana bide nîşandan, herwiha rizgarkirina dewleta Atîna bi têgihîna hemwelatîyên wiha hişmend, bide çespanandin. Bi vê armancê, berî karekî bike, dixwest ku wî karî bi zanîne ve girê bide. Derûna felsefî ev bû.

Cudabûna di navbera ol û mîtolojiyê de ev e ku ol. Bawerî û perestina bi zorê dide pêş, lêbelê di mîtolojiyê de zoreke wiha tine ye. Di felsefeyê de, ne baweriya bîrdozî û ne jî şêweya efsaneyan, tine ne. Felsefe şêweyêke ramanê ye ku hinek taybetiyên ji dilîniyê wêdetir, bawerdêr û bi çespîn dikişîne bîr û bawerî û mantiqê mirov. Ewlekariya bi bîr û baweriya mirov û qîmet pêdana mirov, derdixe pêş. Takekesî û humanîzm jî, bi ramana felsefeyê ve girêdayî ne. Herwiha felsefe, jibo şêweya ramana civaka kapîtalîst, dibe merceke herî girîng. Çiqas ku levdana di navbera ramana felsefeyê, ya ol û mîtolojiyê de, pêşvedîçe û ev levdan bi serkeftina felsefeyê bi encam dibe, rê li ber qevastina şêweya ramana zanist vedibe. Şêweya ramana zanist, liser şopa felsefeyê pêşvedîçe. Şêweya ramana felsefeyê, hê bêtir berhema jiyana bajarê pêşveçûyî ye. Ev ne rашtatîniyêke ku dera lê derketiyê holê, bajarên herî zindî ne. Bajarên serdema pêşî yê pêşketî, bûne navendên pêşveçûna şêweya ramana felsefeyê. Mîletos a ku weke cihê felsefe lê çêbûyî tê zanîn, di dema xwe de, navenda jiyana bajarê a herî girîng e. Piştî vî bajarî re, Athene, Roma û Skenderiye derdikevine pêş.

Ev yek ne piçûk e ku felsefeyê rê li ber zanîstê vekirîye. Lêbelê ne rêyeke bi tenê ye. Rêya ku bêhtir hîkarîker, zanînen pratîk ên ku bi teknîkên hilberînê ve girêdayî, timî zêde dibin e. Pratîka hilberînê û jiyana bi xwe, bûyeran û têkiliyên di navbera wan de, dide nasîn û ber bi sazîkirina girêdana sedem-

encamê ve dibe. Teknîkên ku têne bikaranîn, timî vedîtina (kefş) taybetiyên xwezayî jî, zêde dike. Herwiha, mîtolojî û ramana olî ku di destpêkê de serdest bûn, bi rêya felsefê têne lawazkirin, zanista ku bi felsefeyê re di nava hev de timî pêşvedîçe, girîngiya xwe zêde dike. Sêbareya tez, antîtez, senteza ku li vê qadê tê sepandin, berwerî (leh) zanistê bi encam dibe. Teza yekemîn, mîtolojî û ramana ol e, antîtez felsefe ye. Têkoşîna di navbera wan de, bîr û baweriya zanist diderîne holê.

Ev nayê mandekirin ku pêşveçûna zanistî, bi felsefeyê lezgînî qezenc kiriye. Ev jî ne gengaz e ku em bibêjin, zanist felsefe derbaskiriye û felsefe ji pêdivî derketiye. Lêbelê ev jî rastiyeke ku, di dema gihîştina kapîtalîzmê de, girîngiya xwe ya kevin berdewam nake. Qasî ku em felsefeyê weke şêweyeke ramanê ya taybetmendiya kapîtalîzmê bibînin, pêwîst e em ne nirxînin ku kapîtalîzm jî têtikiliyên xwe ji felsefeyê qut dike.

Dem a kapîtalîst, bêhtir weke serdema felsefeyê tê nirxandin. Şerê raman ê mezin teolojî ji hev xistiye. Ev kemna li ser civakê kişandiye û di warê têtigihîştineke rast de, pêngaveke bêhempa avêtiye. Bi vî aliyê xwe feylesof, di rola pêxemberên serdema me de ne. Cudahiya wan a bitenê, xwedê zêde tevî karê xwe nakin, pêvajoyên xwezayî û civakî, bi zagonên xwe yê hundirîn rave dikin. Ramana bi vî şêweyî, mirovatiya ku bi tekûzbûna pratîkê asta hişmendîya gelemper qezenckirî, îfadekirina vê ya di asta herî bilind de ye. Ezmûna di derbarê xweza û civakê de, ravekirina bi nêzîkbûnên mîtolojîk û teolojîyê, anîbû rewşeke pêkenî. Takekesê ku di destê dogmatîzmê de, azadîbûna xwe winda kirî, hewl dide ku li xwe bigere, bi bêzarbûna (ecizbûn) ji xwedayan, dixwaze ku qedera xwe têxe destê xwe. Meşa ber bi takekesiyê, wêrekiyê pêdivî dike. Mirov hê nûka ji sibûnê derdikeve û hewl dide ku were rewşa kirde. Ji ber vê yekê jî, ji ewlebûna bi xwe pêde ti çareyên wî tine ne. Bi ewlebûna bi xwe, wî wêrekî ramanê dibe ku ol tevî karê xwe neke. Felsefe merhaleyeke ramana azad e ku, pêvajoyeke bi xwe ewlebûn û wêrekiyê rê li ber vekirî, derandîye holê. Êdî di nava kar de, xweda tine ne. Weke zarokan hûn xwe na spêrine mezinekî û najîn. Hûnê hewl bidin ku bi hêza nefsa xwe, bi daxwazên hişyarbûyî û ramanên xwe, cîhanê şîrove bikin û bijîn.

Felsefe herçiqasî çavkaniya xwe mejî be jî bi giranî bûyeran dihûne û ya berbiçav bi çavdêriyeke objektîv re timî têtikildar e. Têtikiliya xwe bi tevahî bi mejiyê hîsî re qut nake. Şêweyê fikra neberçav, şêweyê fikra herî payebilind e. Kêrhatin û tevkariya wî ya ji bo zanistê, ji ya dîn pêşdetir e.

Ya rastî, zêde cudahiya zanistê ji felsefeyê nîne. Mirov dikare zanistê weke felsefeya bingehe xwe yê ceribandî xurt, şîrove bike. Herdu bi çavdêrî û ceribandî hewl didin ku herdu xwezayan manedar bikin. Ya rast jî ev e. Lê ji pirs a dîn a 'çima' re bersiva wan nîne û ev kêmasiyeke wan a herî girîng e. Mirov bersiva xweza 'çawa ye' bide, ev nabe bersiveke têtûtîjî ya ji bo jiyane.

Di dîroka şaristaniyê de cihê felsefeyê li gorî dîn herçend bi sînor be jî girîng e. Pêşketina zanista manedanê û kêmasiya dîn di warê ravekirinê de hewcedariya bi felsefeyê derxistiye holê. Zanyariya dîroka wê bi qasî dîn kevin, mirov dikare destpêka felsefeyê bihesibîne. Zanyar mirovê difikire temsîl dike û ji teolojîyê cuda xwedî çavkaniyeke maneyê ye. Mirov bi qasî guh bidin berdevkên xwedê serî li fikrên wî didin. Zanyar bi dewlet û şaristaniyê re zêde li hev nînin. Bêhtir girêdayî civaka derveyî civaka fermî ne. Di pêşketina exlaq û zanistê de rola wan diyarker e. Herçend di çavkaniyên nivîskî de xuya neke jî di civaka neolîtîk de jinên dayik-xwedawend û beşê hiyarerşiyê yê dejenere nebûyî nêzî zanyariyê ne. Em şopên vê yekê di civaka Sumeran de bi xurtî dibînin. Di derketina pêxemberan de gelek zanyar hene. Rêûresma zanyarî û felsefeyê ya Rojhilata Naverast hewcedariya xwe bi lêkolînê heye. Beriya çanda Yewnan cihê felsefeyê ne ya guftûgoyê ye. Şensê filozofên Yewnan ew e ku tevî mekanê cografîk şensê qonaxa bilind a şaristaniyê bi hev re jiyane. Çawa ku rahibên Sumeran avakirina dîn û xwedê, tevî avakirina dewlet û civakê bi hev re meşandin, filozofên Yewnanan jî di qonaxa jortir de civaka şareza bi nîv dîn û nîv felsefeyê di zikhev de ava kirin û meşandin. Heman kar hatiye kirin: bikaranîna hunerê têtîgan. Ya pêşî bi avakirina dîn radibin, ya dîn jî bi têtîgan felsefî bi heman rolê radibin. Dest pê dike, xwedayên bê maske wê cihê xwe ji xwedayên bi maske û qralên tazî re bihêlin. Di vê yekê de têtikiliya di navbera felsefe û pêşveçûna fikra mirov de heye.

Di civaka Yewnan û Romayê de fikra felsefî rolake bi sînor list, wê di civaka kapîtalîst a Ewrûpayê de şoreşeke mezin çêke. Aloziyeke mîna di nava dînan de em li vir di nava pêşketina felsefî de jî dibînin. Di vê aloziyê de di qonaxa nû ya şaristaniyê de para berjewendiyên çînî û neteweyî yê ji aliyê sîstemê ve derketin pêş, gelekî hebû. Kengî bi şerê dînan nakokî çareser nebûn, zêdetir kar ket ser milê felsefeyê. Şerên di navbera salên 1618-1649'an de şerên dawî yê dînan in. Sedsala 17'an jî sedsala şoreşa felsefî ye. Felsefeya di civaka Yewnan û Romayê de roleke bi berpirsiyarî list di civaka şaristaniya nû de şeweya sereke ya îdeolojîk e. Ekolên mezin ên felsefî derdikevin. Li aliyekî 'mirina xwedê' tê îlankirin, li aliyê din serê qralên li piştperdeyê tê firandin. Bi dewleta netewe re ku bi xwe dibe mîna xwedê, qonaxa dewleta kapîtalîst dest pê dike ku ji qralekî tazî wêdetir tişteki dîn nîne.

Xisleta wê ya mezin a yekemîn ew e ku ji aliyê îdeolojîk ve felsefeyê weke şêweyê bawerî û fikrê ji dînên pûtperest zêdetir qebûl dike. Felsefe dibe sedem ku di warê mane û manedanê de pêngavên gelekî mezin werin avêtin. Tovê tevahiya êkolên felsefî di vê demê de hatine reşandin; tevahiya şêweyên fikrê yên xwedî naveroka Îdealîzm, materyalîzm, metafîzîk û diyalektîkê mumkîn dibe ku peyda bibin û werin guftûgokirin. Beriya Sokrates 'felsefeya xwezayê' li pêş bû, lê bi Sokrates re 'felsefeya civakê' giraniya xwe çêbû. Bi mezinbûna 'pirsgirêka civakî' re ango zordestî û mêtîngerî di pêşketina van bûyeran de rol digirin. Xusûsek heye divê ez careke din diyar bikim, em wexta 'pirsgirêka civakî' dibêjin ango em dixwazin bibêjin; rêwezincîra bajar-bazirganî-dewlet-rêveberî hatiye avakirin. Her weha bajar weke şaristaniya maddî dihêle ku fikra felsefî ferz bike. Bajar bi xwe qutbûna ji civaka organîk îfade dike. Ji lewra zêhniyeteke ji xwezayê qutbûyî di nava bajêr de bi hêsanî dikare şikil bigire. Malzaroka her cure fikra mucered, metafîzîka çor û fikra materyalîst, li ser hîmê bêbextiya bi hawîrdorê re şaristaniya bajêr e.

Hingê mirov dikare bibêje; felsefe ji aliyekî ve di warê fikrê de gavavêtinek e, li aliyê din şewekî fikrê yê xerîbketina bi xwezayê re ye. Sofîstên zanîna felsefî belav dikin bi awayekî mîna rewşenbîrên sedsala 18'an ên Ewropayê ne. Bi peran dersê didin zarokên malbatên halê wan xweş. Çawa ku rahiban vedîtînen dînî dikirin û mirovên perestgehên çêdikirin, filozof jî dibistanên xwe bi xwe çêdikin. Mîna ku dêrên (meclîsên) xwe bi xwe ava dikin. Fena dînên pirrxwedayî gelek dibistanên felsefî çêdibin. Ango mirov dikare her dibistanê weke dînekî yan jî selexaneyekê şîrove bike. Ji ber ku di dawîya dawî de dîn jî şewekî fikrê ne, mirov dikare wan weke felsefeya şeweyê baweriyê girtiye û bi sazî bûye qebûl bike. Divê mirov cudahiya di nava wan de bi temamî dijberê hevdu fêhm neke. Xwarina îdeolojîk a gelên tîrêvîrîna dîn e, ciwan û rewşenbîrên tebeqeya jor jî xwarina wan felsefe ye. Eflatûn û Arîsto bi awayekî dixwazin wezîfeya rahiban a avakirina bajêr, parastin û rizgarkirina wî bi riya felsefê serketî bi cih bînin. Ji xwe mijûliya bîngêhîna a filozofan ew e ka civak û dewleta sîte hîne baştir çawa tê rêvebirin, û beriya her tiştî çawa dikare li ser hîmekî baş bê danîn.

Felsefe herçiqasî çavkaniya xwe mejî be jî bi giranî bûyeran dihûne û bi çavdêriyê objektîv re timî tîkildar e. Bi tevahî tê-kiliya xwe ya bi mejiyê hîsî re qut nake. Şeweyê fikra mucered û neberçav, şeweyê fikra herî payebilind e. Kêrhatina wî ya ji bo zanîstê, ji ya dîn pêşdetir e.

Heger ji feylesofên vê demê, em yên ku liser navên xwe dibistan hiştine nas bikin, emê wî çaxî bêhtir bizanibin, bê jibo mirovatîyê merhaleya (qonax) bîr û bawerîya nû û ya giyanê tê çî wateyê.

## Hin Feylesofên Exlaqê

**Zerdeşt û Zerdestî:** Herçiqas ku Zerdeşt weke pêxemberekî tê nîrxandin jî, Rawestina wî bêhtir nêzîkî feylesofiyê ye. Tê texmînkirin ku di navbera BZ salên 1000 û sedsala 6an de jiya ye. Li bakurê rojavayî Îranê, li dera ku şoreşa çandinî bihêz lê tê jiyankirin, hatiye cîhanê. Di pîleya evîne de, girêdayê aboriya çandîniyê ye. Em dikarin di navbera kesayetî û heyina wî û hikariyên ku çanda neolîtîk derandine holê de, têkiliyan çêbikin. Kedê, hilberîna û qezenca helal bîngêh digire. Şînahiyê pîroz dike û parastina ajalan bîngêh digire. Qurban û dehîkirina ajalan qedexeyê kiriye, di warê cotkariyê de ji hêza wan û ji şîr û tewaşê wan sîdwergirtin, bi tîrêvîna dîtiyê.

Di bîngêha feylesofîya wî de, hêmana diyalektîka ku bi bîxleqî ya xwe, bi şeweya tekoşîna di navbera tarî û ronahî, qencî û xerabiyê de şeweya yekîtî û hemberiya dijan, cih digire. Yekem car mirov azadiya vîna xwe naskirîye. Naskirina azadiya vîna mirov, tê wateya ku heta wê rojê afirînerî tenê karê xwedê bû, êdî ev dibe karê mirovan jî. Afirîneriya takekesî ku derûniya ramana rojava ye, aliyê felsefeya Zerduşt ya herî girîng e. Bîngêh girtina vîna azad, destpêka felsefê û redkirina tîgîhîna benî (evd) ye. Doktrîna wî di vê xalê de, di navbera ol û felsefê de, di rewşeke derbasbûyîna de ye. Ev tê wateyê mezin ku di navbera ol û felsefê de, rêveqetandina (terka rê) wan temsîl dike.

**Bûdîzm:** Liqasî ku di felsefeya wî de cih ji xwedê re nîne, xwezayê jî bîngêh nagire. Tîkildarî afirîner û afirandî nabe. Pirsgirêka ku li çareserîya wê digere, rastiya cîhana biêş e, taybetiyên jiyanê civakê yên biêş in. Ev doktrîna ku di bin navê Bûdîzmê de, yê li başûrê rojhilatî Asya bibe felsefeya jiyanê civakeke girîng, ji aliyê taybetiyên bîngêhîna yên civakî ve, felsefeyê sinc e (exlaq), nûsaziyeke sinc e.

Formulasyona wê ya bîngêhîna, wiha li ber çavan tê rahêxistin:

a- Cîhan, civak ji êşan tije ye.

b- Di çavkaniya êşan de, daxwazên tîrêvîna, tîrêvîna û nezaniyê hene.

c- Rizgarbûna ji êşan mimkun e. Di vê hewldanê de pîleya herî bilind, ghişîna Nîrvana ye (xweda, bihişt, kêliya bextewariyê)

d- Rêya vê yekê Yoghî ye (Ronahîbûna bi zanîne, siftbûna hundirîn û jibo vê çend rêyên pêdivî û rêbaz)

Li qasî ku di bandora Zerdeşt de maye, wî jî bandor li Rojhilat û li Rojava kiriye. Bi razdariyê (mîstîsîzm, tesewûf) re têkiliyên wî yên xurt hene. Rêbazên weke zehmetkêşî, qutbûna ji daxwazan û jiyana bi serê xwe, pêdivî û têngîştina naskirina xweperstiya çîna serdest ya mêhtinger û bisînorkirina wê datîne holê. Tecrûbeyên jiyane yên bi vî rengî, nefsê terbiye dike, bi rasteqînî çavdêriyê li teraza xwezayê dike û bi rêbaza bestlêhatinê (îlhamgirtin) rê li ber hînbûnê vedike û wijdan rihet dike.

**Konfuçyûs:** Ji nûsazîbûnê zêdetir dişibe restorasyonê (ji nû ve damezrandina kevin) Bi Konfuçyûs re ol qet tine. Tenê pîrsgirêka civak û ya sazûmana siyasî heye. Sazûmana civakî û ya siyasî ku xerabûne, yên çawa ji nû ve werin damezrandin? Li vir mijara ku liser tê rawestîn, zêdetir ji têkiliyên di navbera saziyan de, tenê bi takekesan tê lebikandin. An ku di Konfuçyûsîtiyê de, pîrsgirêka bingehîn exlaqiye. Dixebitin ku bi damezrandina sazûmana exlaqî re, sazûmanê bidin rûniştandin. Di navbera takekesan de, bê rêzikên jiyane yên çawabin, bi awayekî kûr heta bi kitekita herî piçûk tê diyarkirin. Bandora vê bîr û baweriyê hê jî liser civaka Çînê gelekî heye, ev yek di rewîştên çînê de, bi Jêhatîbûn û xebatkariya wan xwe nîşan dide. Ev doktrîneke di rewîştên razdarî de ye û rola wê ya di pêşveçûna şaristaniyê de, nayê înkarkirin.

Pênc hêmanên wî yên bingehîn ev in:

a- Pêwîst e ku rêvebir rêvebirîtiya xwe bike.

b- Divê jin ligor pêwîstiyên jinîtiyê bijî.

c- Divê law pêdiviyên girêdana bi bav ve bîne cîh.

d- Pêwîst e birayê piçûk ahengdarî birayê mezin be.

e- Divê ku herkes pêdiviyên hevaltiyê bi cîh bîne.

### Hin Feylesofên Xwezayê û Piştî Wê

**Thales** ê Miletî ku di dîrokê de feylesofê yekemîn tê bi nav kirin, xwedê tevli kar nake, hewl dide ku xwezayê bi têkiliyên wê yên derûnî rave bike. Gotina wî ya "Gerdûn ji avê hatiye afirandin" belkî ligor pîvanên dema me, ne gotineke bi têrayî be. Lêbelê jiberku sîya xwedê liser vê gotinê nîne û bi awayekî serbixwe ev gotiye, di dîroka ramana mirovatiyê de xwedî nirxekî şoreşgerî ye. Dive neyê ji bîrkirin ku di bin vê ramanê de, nêrîna Sumer ya ku di bêje, 'xwedayê Sumer pêşî av afirandiye yan jî xweda ji avê hatiye afirandin', heye. Tê zanîn ku Thales him li Misrê û him jî li Babîl, perwerde dîtiye. Dîsa ramana "Her der ji xwedayan tije ne", ji Thales re dikine mal. Li vir jî, berpêbûniya felsefeya olî, dabaşa xebardane ye. Qutbûyina xwedê û xwezayê bi temamî ne hatiye pêkanîn. Bêhtir, du heyînen di nav hev de tê ferzkirin. Ev yek rê li ber têngîhîna şeweya pêşî ya "Wahdetê wicûd" vedike.

**Herakletîos** ji xwedê qet xeber nade û dibêje, bingeha xwezayê ji ber xwe ve hereket dike. Xweza bi sazûmana zagonên di nava xwe de ku bi wateya "logos" jî dikare were nirxandin, hereket dike, dibêje ku ji derve ti bizavên xwedê lê tinene û timî tê guhertin, vê ramana xwe bi gotina "Bi ava ku di çemekî de diherike du caran nayê şîştin" formule dike. Cara yekemîne bi awayekî vekirî, şeweyeke ramanê ku daringê bingeh digire, tê bingehkirin. "Daringperestî" ya di dîroka felsefê de, vê dawiyê nêrîna "daringperestiya dîrokî" ku hatî pêşvebirin, çavkaniya xwe ji vê ramanê digire.

**Phytagoras**, bingeha felsefeya îdealîst diavêje. Wî jî weke Thales, di xortaniya xwe de li Misir û Babîl, demeke dirêj (25 sal) di dibistanê rahîban de perwerde dîtiye, bi gerê rewşa şaristaniyê ya wê demê dîtiye. Girîngiya vî feylesofê BZ di sedsalên 6 û 5an de jiya ye ev e ku têkiliyên xwezayê, li matematîkê sepandine. Hijmaran pîrozwer dibîne, di wê baweriyê de ye ku bi hijmaran her tişt dikarin werin ravekirin. Di vê nêrîne de ye ku zimanê gerdûnê yê ahengdar, bi muzîkê dikare were ragihandin (hisandin), bipergaliya armonîa diparêze. Heyînen giyanî di bingeha her tiştî de dibîne, daringî û rastiya bedenî jî, di rola rekîhê (qefesê) de dibîne. Doktrîna xwe bi şeweyeke razdar dide meşandin, perwerdeyîyeke tund bingeh digire. Jibo civaka biçîn ku li Grek û Îtalya helatî, rêvebirîya feylesofî ya berî Eflatun amade dike. Eslê wê tiştên ku dike, rojanekirina hêmanên ku ji rêvebiriyên Sumer û Misrê re, bingehê teşkîl dikin û lêanîna li mercên cîgeyî ne, ev yek vekirîye ku ji van navendan, bi awayekî sift bandor girtiye. Ev jî tevkarîyeke girîng e ku dibêje her form û şewegirtinên di xwezayê de, bi têkiliyên



rêje (nîsbet) ya hijmarî ve girêdayîye, bingeh ev e ku ev rêjeya di tiştan de, were dîtin. Di pêşvebirina bijîşkî, qesirbendî û muzîkê de, girtina vê rêjeyîyê, gelekî girîng e. Bi cîhkirina hijmar, pîvan û sînoran ya nav tîkiliyan jî, pêşveçûneke gelekî girîng e. Di bîr û bawerî û heyîna giyanî ya mirovan de, di gihîştina mantiq de xwedî roleke li pêş e.

**Pharmenîdes**, girîngiya wî ev e ku di bingeha her tiştî de, mantiq, tîgihîştin û behreya (kapasîte) aqil derpêş dike. Ewlekariyê bi hînbûna dilnî nayîne û dibêje, zanîna ku bi dilnî were yê xapînok be, di wê baweriyê de ye ku zanîna bi aqil bingeh e û encex mirov wiha yê bikaribe bigihe rastiyê. Bingehê wê girîngiya Pharmenîdes, ev e ku nîrx dide aqlê mirovê ku hişyar bûye. Belkî pirole (pir zêde) çûbe, ji çavkaniyên berbiçav yê agihînan dîrketibe û bi xeletiya rêbazeke mezin deriyek ku hezar salan wê bidomîne vekirî hiştibe. Lêbelê bi avêtina bingeha ramana bi mantiq û danîna girîngbûna wê ya li holê, roleke gerdûnî jî listiye.

**Sokrates**, bingehê wê pîrsa ku Sokrates dixwaze bersiva wê bide ev e ku her tişt, bi taybetî her kar xûy pakiyeke (pîvanên tekûziyê, zagon û kevneşopiyên wê) xwe heye. Hinekî din were vekirin, dema ku di derbareyî mijarekê yan jî karekî de were peyvandin, tiştê pêşî ku yek bike ev e ku mirov bi bingeha wî karî an jî wê mijarê bizanibe. Di vî babetî de parole hêmana binav û deng "Xwe bizanibe" ye. Kesê ku di derbarê mijarê de ne xwedî zanînen tekûz be, divê ku liser mijarê qet neaxive û jê xebernde. Nezanî, cahilî dayika hemû aloziyan, xeletiyên û herwiha hemû neqenciyan e. Kesê ku bixwaze rêya qenciye veke, pêwîst e zanînen wê jî qezenc bike. Pîvanên gelemperî yê wê zanîne hene. Pîvanên ligora herkesî çênabin. Her saziyekî û her pişeyekî pîvan û zagonên xwe hene û ev jibo hemû beşên sazî û pişeyan derbasdar in. Pîvanên hemû saziyên civakî yê weke leşkerî, siyaset, cotkarî, pişekarî, û oldarî, ku bi zanînan ve girêdayî, hene. Dema ku yek ligor van pîvanan bilive, ew sazî an jî ew pişe wê rola xwe bi têr başî bileyze. Jibo vê yekê pêwîstiya herî girîng ev e ku her hewldana mijara kar û pişe, bi zanîne ve girêdayî be. Karê ku kesê nezan bike, di dawiyê de dikeve korerêyekê. Herwiha bingeha hêmana "Pratîka qayîm (sexlem) bi teoriya qayîm ve girêdayî ye" tê nîşandan. Heger em bala xwe bidîne, Bûdha, Konfucyûs û Zerduşt jî li pey vê helwestê bûn.

**Eflatûn û Arîsto**, bi van herdu kesan, dema felsefeya klasîk digihe bandev. Di felsefeya civakî de herdu jî şagirdên Sokrates in. Eflatûn liser bîranîna mamosteyê xwe, tîgînên rast, baş û xweşik, jibo rizgarbûna Atîna û bi awayekî feylesofî were rêvebirin, dike nimûne û pirtûka bi navê "Dewlet" dinivîse. Di cîhana Eflatûn de, "raman (îdea)" bingeh e. Cîhana daringî, ji bîranînen cîhana ramanê yê ku bi awayekî lawaz tî bibîrhatin, pêktî. Pêşî derûn, yanê raman heye. Dawiyê sift dibin û rê li ber hebûna cinsan vedikin. Daring bi serê xwe çênabe. Ev şeweyeke tîgihîna aqil ya Pharmenîdes ku pêşveçûye. Feylesofê îdealîzmê yê herî mezin e. Derawayekî wî ya nêzikî pêxemberiyê heye. Bi vê rewşa xwe hinekî dişibe Zerduşt. Mirov dikare bêje ku Arîsto têheva (komînek) Sokrates û Eflatûn e, bersiveke doktrîna Zerduşt e. Rêvebiriya pirzanan, dîmendariya hunerwarî, qilafetekî (timtêl) atletîk, taybetiyên felsefeya Eflatûn yê bingehî in. Dema ku kesên bijarte (xuyayî) wiha werin gihandin, dewlet wê bi awayekî zexm were rêvebirin. Ew jî weke Sokrates rêbaza gotûbêjê (dîyalog) bingeh digire. Jiberku di dîrokê de yekem car, dersên xwe li nêzikî Atîna li dera bi navê Akademîa dide, tim bi vî navê re tê bi bîranînen. Kevneşopiya Akademîa û sazîbûna wê, bi rêbaza wî ve girêdayî ye. Feylesofê civaka biçîn eŞaristaniya koledar weke sazûmaneke xwezayî û domdar tê hizirandin (ramandin). Di gotûbêja wî ya bi navê "Dewlet" de, dewleta Atîna weke ramana herî bi hêz ya vê sazûmana xwezayî tê sêwirandin.

Ji ber rêbaza vê ramanê ye ku Grekî herkesî ji xwe piçûktir dibînin. Piştî Eflatûn, gelek ramangêr hewldidin ku bi cur bi cur şeweyan wî pêşvebibin û doktrînen demê, bi wî rave bikin. Neo Eflatûntî wê wateyê ku bi gelemperî ramana olî û ramana felsefî, bi taybetî di berbiçaviya xiristiyantiyê de, pêkbînin. Bandora wê liser ol û felsefeya Îslamî jî heye. Ev bandor, di tîgihînen îdealîst yê serdema nêzik de jî rola xwe dilîze.

Arîsto (BZ 386-320) afirînerê felsefeya ramana serdema klasîk yê herî mezin yê dawî ye. Mamosteyê Skender e. Atînayî jê hez nakin. Li qalibê Grek nayê. Hemû ramanên olî û felsefeyî yê heta dema xwe, lêkolandine û fêrî wan bûye. Çavdêrekî liser xwezayiyê yê kûr e. Aqil û dilnî weke hev digre û cîh dide wan. Hewldide ku girêdana di navbera aqil, dilnî û bîrbirina (tîgihan) xwe de, bi awayekî zexm saz bike. Jiberku meraqa wî liser daneheva hemû zanînen demê hebû, bê cudakirina xweza û civakê, dixwest ku hemûyan bide hev. Ev hewldan wî dibe rêbaza talîlê (deduksiyon). Mantiqa Arîsto jî ev e. Eslê wê Arîsto, hewldana avakirina hîmên mantiqê giştiye ku ji zanînen û ramanên heta wê demê

gihabûn hev. Em dikarin bêjin ku Arîsto, jibo wê demê têheva (yekûn) bîr û baweriya mirov û hêza wî ya giştî ye. Ev encameke vê taybetiya wî ye ku weke sembola birêkûpêkiya zanîn û ramanê yê li bandevê, tê bi navkirin. Sepandin û îfadeya berbiçav, pêkanîna Skenderê Mezin ya împêratoriya cîhanê ye. Ev tê wateya, sepandina mezin ya ramana mezin, desthilatiya gerdûnî ya ramana gerdûnî jî.

Arîsto xwedê mandele (înkâr) nake. Sedema yekem di rame, pêvajoyên bi şûn de weke ku xwezayê xwe bi xwe pêşve biribe, bi însiyatîf berdide. Bi gotina ku dibêje, her tişt wê bi sedema yekem re yanê bi xwedê re bibe yek, têgihîna gerdûnê ya bi armanc, datîne holê. Distûra "Her tişteki armanc û sedemeke xwe heye", formuleke Arîstoyî ye. Herwiha xwedayî ye. Bi vê yeke biqasî ku bandora wî liser olên yek xweda heye, bandora wî liser felsefeya xiristiyanî û îslamî ya serdema navîn jî mezin e. Ya rast ev e ku felsefeya îslamtî û xiristiyanîyê, bi bikaranîna ramana Eflatûn û Arîsto hatine pêşvebirin.

Heta weke roja îro, nêrînên Arîstoyî serdestî mantiqê mirovê nîvekî (wasatî) ye jî. Mantiqê diyalektîkê hê ji serdestbûna bîr û baweriya mirov, dûr e. Bi vê taybetiya xwe, yê ku hêjî bi hêzî di mantiq de dijî, Arîsto ye. Yê ku di felesefeya baweriyê ya bawermand de jî, dijî dîsa ew e. Herwiha piçûk nayê girtin. Lêbelê ku ji Arîsto derbasbûyîn çênebe, fêrbûna şêweya raman û zanîna dema me, ne gengaz e (mimkun). Ev yek gelekî grîng e ku Arîsto di şêweya ramana felsefî de, weke merhaleyê mezin tê nixandî, lêbelê asta wî ya agahdarbûnê ji mêj ve hatiya derbaskirin, ji ber sedema pêşveçûna fizîk, kîmya, bîyolojî û zanista civakî, êdî weke rawestgeha di mantiq û baweriya kevneperestî de tê dîtin. Rawestîna li vê rawestgehê, di roja îroyîn de, paşverûtî ye. Di vî babetî de, derbasbûyîna ji Arîsto, girîngiyek e mezin e û jibo pêşveçûn û veguherînan pêdivî ye.

## 5- ZANIST

### a- Zanist Çiye?

Ya rastî, zanist zêde cudahiya xwe ji felsefeyê nîne. Mirov dikare zanistê weke felsefeya bingehê xwe yê ceribandî xurt, şîrove bike. Bi çavdêrî û ceribandî hewl dide herdu xwezayan manedar bike. Ya rast jî ev e. Lê pîrsa dîn a 'çima' bersiva wê nîne û ev kêmasiyeke wê ya girîng e. Mirov bersiva xweza 'çawa ye' bide, ev nabe bersiveke têrûtîjî ya ji bo jîyanê. Gerdûneke gelekî mezin heye, nabe ku mirov wê weke bê armanc, çima heye û bê sedem hebûna wê bibîne. Ev yek li gorî daxwazê nîne. Zanista ni-karibe ji bo jîyanê bersiva pîrsa 'çima' bide, bivê nevwê wê di en-camê de ji bo desthilatdariyê bibe amûrê kolekirinê. Ez weke te-zeke xurt pêşkêş dikim ku zanist ji ber têkiliya xwe ya bi zêhniye-ta kapîtalîst re ji felsefe û dîn cihê bûye.

Ez vê teza xwe weha dikarim piştrast bikim: Dîn û felsefe, û heta mîtolojî bîr û nasnameya civakê, hêza parastîna ya zêhnê wê ne. Gelekî berevajî bikin û bikin dijberê xwe jî ev yek rastiyeke civakî ye. Civakeke têkiliya wê ya bi bîr û dîroka wê re hatibe qutkirin, wê zanista wê bi vî rengî di xizmeta desthilatdariya rojane de be ku ew jî kapîtalîzm e. Di kapîtalîzmê de mîtolojî, dîn û felsefe ketine rewşekê hema bêje pênc pere nakin. Çima? Bersiv eşkere ye. Bi hezar salan, felsefe, dîn û destanan rê neda kapîtalîzma di telş û terkên civakê de ketibû kemînê. Wan kesên faîzxiwîr û spekulatîrên bi buhayê alavan lîstin û kareke neheq bi destxistin şermezar kir û ew di civakê de nerewa îlan kirin. Di fikra civakê de heta dîn, felsefe û efsaneyan cihên xwe parastin û mejiyê hisî giraniya xwe dewam kir, mumkin nîne kapîtalîzm bibe ya sereke. Ti desthilatdarî di vê rewşa zêhniyetê de ango di rewşa exlaqî de nikare kapîtalîzmê rewa bike. Nîzama civakî-aborî ya xwe dispêriyê, nikare biparêze.

Ji bo kapîtalîzm bibe sîstema dinyayê, têgihîştina li 'rêbaza zanistî' roleke girîng lîstîye. Roger, Francis Bacon û Descartes pêşengiya têgihîştina vê rêbaza nû kirine û bi hosteyî ferqa di navbera obje û súbje de tê diyarkirin. Di rêbaza dogmatîk a serdema navîn de cihê obje û súbje yê zêde nînin. Weke siyekê xuya dikin û tene bikaranîn.

Ewrûpaya Rojava ya bi ronesansê rabû ser piyan, bi reforma di Xirîstiyantiyê de û bi şoreşa rohnîbûnê ya felsefî rûyekî nû da obje û súbje yê, û bi vî awayî rêyeke nû vekir. Subjektîvîteya mirov û obejktîvîteya dinyayê du hemanên bingehîn in, li serê quncik û goşeyê rûniştine. Rêbaza dogmatîk a gotina xwedê esas digire bi exlaq re qîmeta xwe wenda dike. Ya rastî, li şûna xwedayên berê yên bi maske û qralên li piştperdeyê, serdema xwedayên bê maske û qralên tazî destpê dike. Mêtîngeriya kapîtalîstîk di vî şêwazî de xwediyê rola sereke ya tehrîkê ye. Îstîsmara bi navê karê, ji her alî ve hewce dibîne ku têgihîştin û fêhmkirina civakê biguhere. Sedema esasî ya di bin 'rêbaza zanistî' ya nû de ev hewcedarî û mecbûriyet e. Mirovatî û xweza bi îstîsmareke mezin re rûbirû hatine hiştin. Ev îstîsmara civakê wê bi hêsayî ji aliyê wîdanê (exlaq) wê ve neyê qebûl kirin, lê kengî karibe guhertineke mezin a zêhnî pêk bîne, hingî wê karibe xwe ji nû ve ava bike. Ha ji bo vê yekê weke rêya rast a bingehîn barekî

mezin dikeve ser milê 'rêbazê'. Tê zanîn, ji bo guhertineke bi kok û ji dil Descartes ketiye nexweşiyêke mezin a şik û gumanê, ji her tiştî guman kiriye û di encamê de xwe avêtiye wî hikmê xwe yê meşhûr û gotiye: 'Ez difikirim, wê wextê ez heme.' Baş tê zanîn ku Bacon'î ji bo 'objektîvîzmê' pîrr bi nazenînî tevgeriyane. Yên yekemîn; rê li ferd vekirine ku serbixwe bifikire, yên duyemîn jî derî li ferd vekirine ku çawa bixwaze bikaribe 'objeyê' bi kar bîne.

Ya diduyan, 'rêbaza zanistî' ye. Cihêkirina obje û sùbjeyê kilîta hegemonya zêhniyetê ye. Bi qasî xuya dike, rêbaza zanistî bêyî prensîba objektîvîzmê nabe, lê ya rastî ji bo serdestiya sùbjektîvîzmê qonaxêke pêş e, hewcedarî pê heye. Ji bo mirov karibe bi rê ve bibe divê mirov sùbje ango kirdar be. Di vê rewşê de bi awayekî xwezayî yê tene birêvebirin jî dibin obje. Tiştê dibe obje yanî dibe eşya jî serdestî lê tê kirin û tê rêvebirin. Eşya weke xweza obje ye, ji lewra mafê kirdar çêdibe wê bi rê ve bibe. Ango ev îfadeyêke birêvebirina eşya ji aliyê kirdar e. Mîna amentû ya zanistê be. Cihêkirina obje-sùbjeyê reh û rîşên xwe diçin heta dema Eflatûn. Cîhana 'îdea'yan a Eflatûn ku xwe bi dualîteyên basît nîşan didin, bingehê tevahiya cihêbûnên bi heman rengî ye. Jixwe em bingehê mîtolojîk ê van dualîteyan bi awayekî harîqûlade li cem civakên Sumer û Misrê dibînin. Hiya-rerşiya jor bi awayekî xwedayî tê mezinkirin û bilindkirin, yê li jêr jî dikin benî û bende. Ev rewşa dîrokî reh û rîşên dabaşê ne. Îfadeya zêhnî ya dualîteyên mîna afirîner û yê tê afirandin, rê-veber û yê tê rêvebirin, xweda û bende, kelam û eşya, îdeayên mukemmel û nîşandanên wan yê basît hêdî hêdî pêş dikevin û xwe digihînin. Cihêkirina obje û sùbjeyê. Cihêkirina beden û ruh jî di vê çarçoveyê de ye. Maneya siyasî ya vê yekê înkara demokrasîyê ye, û rêvekirina li olîgarşî û monarşiyê ye.

Di rêbaza zanistî de hewce dike ku mirov têngîna 'objektîvîzmê' ji nû ve û hûrûkûr şîrove bike. Ji bilî fikra analîtîk bedena mirov jî di navê de xweza hemû (zindî û ne zindî) weke obje tê binavkirin, ji bo kapîtalîzm karibe xweza û civakê bimije û hikim lê bike, vê rola bingehîn bi cih tîne. Eger mirov obje û sùbjeyê hûrûkûr ji hev neke û negihîne rewabûneke mezin, der barê serdema nû de wê veguherîna zêhnî çênebe.

Sùbje hêmanê herî rewa yê fikra analîtîk e, obje jî hêmanekî 'maddî' ye, her cure spekulasyon dikare li ser were kirin. Bi gotineke din 'objektîvîteyê' temsîl dike. Li ser vê cihêkirina ji hev a têngînan şerên mezin kirine. Şerê dêrê û zanistê divê mirov tenê weke xwe li hev rakîşandina ji bo 'rastiyê' nebîne. Di bin vî şerî de têkoşînên mezin ên civakî hene; bi awayekî din mirov dikare bibêje, civaka berê ya bi exlaq barkirî û civaka kapîtalîst a tazî ya dixwaze kirasê exlaqê ji xwe bike, xwe li hevdu radikîşînin. Mesele bi tenê xwe li hev rakîşandina dêrê û zanistê jî nîne. Em hîne bi giştî civakê bigirin dest em ê bibînin; wijdanê civakê tevahiya dîrokê xwedî sîstemekê bû ku îstîsmar qedexê dikir, lanet dikir û guneh dihesiband. Li aliyê din projeya civakî ya nû ya kapîtalîzmê ya ti qedexê, guneh û lanetê nas nake, dixwaze civakê heta dawiyê li mêtîngerî û tehakumê veke. 'Helwesta objektîv' têngîna kilîta a vê projeyê ye. Ev herdu sîstem pev diçin.

Fikra analîtîk bi têngîhiştina 'objektîvîzmê' ti 'nirx' tineye nexe bin operasyonê. Ne tenê keda mirov, dikare bi tevahî xwezaya zindî û nezindî bixe tesarufa xwe û bike milkê xwe. Dikare bixe ber lêkolîn û lêgerînê û li ser her cure mêtîngeriyê weke heq nîşan bide. Ji bilî sùbjeyên neqane, dikare her tiştî mekanîk bigire dest û bi awayekî bêrehm îstîsmar bike û hukim lê bike. Civaka dewlet-netewe-welatî-ferd weke objeya bingehîn li dijî civak û xwezayê bi rêxistin hatiye kirin 'vedîtinên nû ne' û xwedî wê qudretê ne, her dîntiyê bikin; komên mirovan qir bikin û hawîrdorê bikin ku jiyan lê nebe. Levîathanê berê mîna ku har bûye. Hema bêje ti obje nîne hukim lê neke û parçe neke. Divê baş were fêhmkirin ku nêzîkatiya objektîvîst a rêbaza zanistî weke têngîneke bêguneh were naskirin wê rê li ber felaketan, ji rê derketinan û heta komkujiyên bêrehm ên mîna engezîsyonên ji serdema navîn mayî veke. Bi taybetî divê were destnîşankirin ku nêzîkatiya objektîv têngîneke zanistî ya bêguneh nîne.

Eger 'rêbaza zanistî' weke amûrekî mezin ê cihêbûna çînî neyê fêhmkirin wê bêkêrî û îflasa sosyolojiyê ya di roja me ya îro de jî neyê ravekirin. Ez divê eşkere bibêjim ku min demekê 'sosyalîzma zanistî' weke zanista civakî ya bi îdîa didît, lê di îflaskirina wê de 'rêbaza zanistî' ya 'objektîv' xwedî roleke diyarker bû.

Sosyalîzma zanistî û şaxên wê hemû piştî avakirina sîstemên civakî û pêkanînen wan ên demdirêj ji hundir ve ji hev ketin, hilweşiyana an jî yekser ji kapîtalîzma dewletê ber bi kapîtalîzma taybet ve veguherîn, ev yek ji ber 'rêbaza zanistî' û têngîhiştina wê ya 'objektîvîzmê' pêk dihat. Ez niha qîma xwe pê tînim ku bibêjim; kengî cihê van mijaran hat, ez ê bi firehî wan rave bikim. Naxwe ji niyeta durist a kesên bi baweriyeke mezin beşdarî têkoşîna sosyalîzmê bûn û hewldan, guman nayê kirin.

Pêkhatînen zanistî hemû yê roleke sereke didin cihêkirina obje-sùbje'yê gelekî ji serxwebûna xwe hez dikin. Ewqasî dilê wan bi serxwebûna wan ve ye, îdîa dikin ku di ser her cure nirxên civakî de tevdiagerin. Belkî jî li ser navê zanistê ji rê derketina mezin di van îdîayan de veşartiyê. Belkî jî ti carî

nehatiye dîtin ku zanist bi qasî serdema kapîtalîst serdemeke din ev çend bi sîstema serdest re bûye yek. Cîhana zanistê bi naverok û heta rêbaza xwe, hem hêza avakirinê ya sîstemê ye, hem jî hêza parastin û rewakirina wê ye. Rêbaza zanistê ya serdema kapîtalîzmê û zanistên li ser vî hîmî çêbûne, hem hêza danûstendina sîstemê ji bo karê ne, hem jî ew hêz e; di xelekên derve û hundir ê civakê de rê li ber zêdebûna şênîyan, bêkarî, birçîbûn, êş, krîz û şeran vedike. Ji lewra tê gotin 'ZANIST HÊZ E' û ev yek bi gewîtî hatiye gotin.

Belkî bê gotin; ma di vê de çi xirabî heye. Sîstema xwe bi zirxê bêgunehî û rewabûnê nuxumandiye, bi hêsayî dikare van gotinan bîne ziman û ev yek jî bi awayekî pirr xwezayî têne îfadekirin.

Eger di roja me ya îro de modernîteya kapîtalîst di parametreyên xwe hemûyan de nîşan dide ku wê nikaribe dewam bike, di vê yekê de para 'rêbaza zanistî' gelekî heye. Ji lewra gelekî girîng e ku wexta mirov sîstemê rexne bike divê mirov li rêbaza wê ya xwe dispêrê û 'disîplîna zanistî' ya derketiye holê bike. Rexneya sosyalîst jî di navê de qelsiya bingehîn a sîstema rexneyan hemûyan ew bû ku wexta rêbaza sîstemê ya xwe pê ava kiribû û dewam dike, rexne kirin heman rêbaz bi kar anîn. Jixwe rastiyeke civakî ya bi vê rêbazê hatiye avakirin heye, bi heman rêbazê çiqas were rexnekirin jî mirovê nikaribe xwe ji heman encamê rizgar bike. Baş tê zanîn, yên di rêyên berê de hatine xêzkirin dimeşin wê neçar bigihîjin wan gund û bajarên rê diçin wan, naxwe wê negihîjin devereke din. Sosyalîzma zanistî jî di navê de ya hatiye serê dijberên sîstemê jî ev e.

### **b- Zanist Dikeve Destê Desthilatdara**

Di civakên beriya şaristaniyê û civakên dijber ên dema wê de zanist û agahî, parçeyên civaka exlaqî û polîtîk in. Berjewendiyên heyatî yên civakê heta pêdiviya wan nebe, gengaz nîne ku zanist bi awayekî din were bi karanîn. Armanca bi tenê ya zanîn û zanistê dikarîbû dewamkirina hebûn, parastin û debara civakê bûya, wekî din armanceke din nedihat fikirîn. Şaristaniyê ev rewş ji binî ve guhert. Li ser zanîn û zanistê yekdestdariya xwe danî û ew ji civakê qut kirin. Civak ji zanist û zanînê hat mehrûmkirin, hêzên dewlet û desthilatdariyê bi zanîn û zanistê têra xwe bi hêz bûn. Afirînerên zanînê û barhîlgirên wê bi xanedanî û qesran ve girêdan û bi vî awayî yekdestdariyên xwe qehîm û têkûz kirin. Bi vî awayî, ev dihat wê maneyê ku zanist ji binî ve ji civakê, nexasim jî ji jinê dihat qutkirin ango ji jiyana û hawîrdorê dihat qutkirin. Di heman demê de têkiliya mejiyê analîtîk ji mejiyê hisî dihat qutkirin û vê yekê jî dikir ku misêwa ji hev dûr bikevin.

Maneya zanistê di xwezaya civakî de xwedatî ye. Civak asta zanîn û zanista der barê xwezaya xwe de weke îfadeya nasnameya xwe dike xwedatî bi xwedatîyê re yek dihesibîne. Şaristaniyê ev rewş jî guhert. Kengî zanist ket destê xanedan û hevparên wan, rewşa xwedatîyê jî rewş guhert. Ji civakê re êdî evdîtî û payeyên ne yên xwedatîyê, ji xanedan û yên nêzî wan re jî payeya esilzadeyên xwedayan hêja hat dîtin û bi vî awayî di mîtoloji û dîn de cih girtin. Qralên xwedayan û esilzadeyên xwedatî berhemê pêvajoyeke bi vî rengî ne. Bi vî awayî qutkirina têkiliyên barhîgir û afirînerên zanîn û zanistê tevahiya serdemên şaristaniyan dewam kir. Herçiqasî yên li ber vê rabûn jî pirr bi hêsanî hatin tesfîyekirin. Zanîn û zanistê bi awayekî kastek pêkanî. Di dema şaristaniya Ewrûpayê de, nexasim ji ber xwe li hev rakişandina qralî û dêrê û dîsa ji ber qismê hewayaya xweser a keşîxaneyan afirînerên zanîn û zanistê demeke serbixwe ya bi sînor dîtin. Şerên zêde yên desthilatdariyê bêyî ku zirarê bide lêkolînên wan, firsên û keys dida wan ku bi hêsanî parêzvanan bibînin. Ronensans, Reform û Rohnîbûn bi van şerên desthilatdariyê yên rê li rewşeke xweser vedikirin ji nêz ve têkildar in. Tinebûna mutlaqiyeteke bi şewazê Çîn û Osmanîyan nebû alîkariya xweseriyê dikir. Di encamê de şoreşa felsefî û zanistî pêk hat. Lê ji aliyekî ve bilindbûna hegemonîk a kapîtalîzmê, ji aliyê din ve jî pêkhatina dewleta netewe, di sedsala 19. û 20. de damezrandina yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê li ser zanistê bi xwe re anî. Zanist êdî parçeyekî sermaye û desthilatdariyê bû ku ji wan nedibû. Jixwe ev rewşa ku tevahiya dîroka şaristaniyê li dijî civaka exlaqî û polîtîk pêşk ket bi modernîteya Ewrûpayê re derket asta herî jor.

Ev tê wê maneyê ku paradîgmayên zanistî yên navenda wan Ewrûpa ji mêj ve ji civakê qut bûne. Yên bi zanîn û zanistê re mijûl dibûn bi giranî xwedî perspektîva sermaye û desthilatdariyê bûn. Civaka exlaqî û polîtîk ji zû ve bê qîmet bûbû. Bi têkçûa dêrê re ev pêvajo bi leztir bû. Zanista ku fikara wê ya bingehîn civaka exlaqî û polîtîk nîne, êdî ji hedefên sermaye û dewletê pêve ti qadeke xwe ya mijûlbûnê tineye. Zanist êdî desthilatdarî û sermayeyê diafirîne, sermaye û desthilatdarî jî zanistê gelekî baş dikin malê xwe. Zanistê heta dawiyê têkiliya xwe bi exlaq û polîtîkayê re qut dike û ev jî dihêle ku derî heta dawiyê li her cure şer, pevçûn, bihevketin û îstîsmarê vebe. Jixwe dîroka şaristaniya Ewrûpayê di heman demê de dîroka gelek şeran e. Rola didin zanistê ew e, divê êdî amûrên şer ên bêqusûr û wan bibe serketinê îcad bike. Bi vî awayî di encamê de gihiştin heta çêkirina sîlehên nuklêr.

Di civakekê de ku pîvanên civaka exlaqî û polîtîk serwer bin sîlehên nuklêr ne, papatkek jî nayê îcadkirin. Bihata îcadkirin jî herî kêr li dijî civakê nedihat bi karanîn.

Tevahiya dîroka şaristaniya navendî zanîn-agahî her ku çûne parçe bûne û pîrozbûna xwe ji dest dane. Ev rewşa em behsa wê dikin jî çîrokeke xwe ya bi heman rengî heyî. Mekanîzmayên sermaye û desthilatdariyê çiqasî zêde bibin, zanîn-agahî jî ewqasî parçe dibin. Mirov çavdêriya vê xusûsê di dîrokê de dike. Di tevahiya civakên klan û qebîleyan de zanist yekpare ye. Nûnerên wê pîroz têne hesibandin. Zanist weke dayîneke xwedê tê qebûlkirin. Li gorî daxwaz û hewldana her kesî lê tê belavkirin. Di mîtolojiyan de ev bi tevahî welê ye. Di dîn û felsefeyê de nêzikatiya vê yekê pîvaneke sereke ye. Lê parçebûna pêşî di avahiya zanistî ya Ewrûpaya Rojava û zanistên xwezayê de tê dîtin. Organîzasyonên zanîne yê nû (akademî û zanîngeh) her ku çûne ji civakê qutbûne û bi tevahî ketine xizmeta elîtên sermaye-desthilatdariyê û bi awayekî êşkere xwe di mertebeya saziyên nadîde yên dewleta nû (Levîathan) de dibînin. Pêvajoya desthilatdarîbûn û sermayebûyîna zanistê, di heman demê de bûye pêvajoya xerîbketina bi civakê re. Biryargeh û perestgehên zanistê yên pîrsgirêkan çareser dikin êdî bûne navendên hegemonariyên îdeolojîk, xerîbkin û pîrsgirêk afirandinê. Çiqasî çavkaniyên civak û xwezayê hene, ewqasî beşên zanistî jî hatine zêdekirin. Ev rastî bi serê xwe jî têrê dike ku ji bo mirov ketina zikhev a zanist-sermaye-desthilatdariyê piştrast bike. Qada zanistê ji tevahiya civakê re cihekî pîroz e, lê ji vê xizmeta wê pîroz dike gelekî hatiye dûrkirin. Navendên zanistê her yek ji wan kirine pişeyên çavkaniya pereyan, heta bi xwe bûne sermaye; bûne hevparê herî gunehkar ên bi tehlûke yên desthilatdariyê. Em pîr baş dizanin ku di serî de sîlehên nukleer, her cure sîlehên hilweşîner ên dikarin hawîrdorê bi erdê re bikin yek li navendên zanistê têne çêkirin. Li şûna ku bi fikar xwedî li heqîqetê (wijdanê kolektîf ê civakê) derkeve, weke mamosteyên bîaqil ên hilberandina sermayeya herî bi bereket û desthilatdariyê hatine terfîkirin.

Roja me ya îro wexta ku zanist tê gotin pîrsa pêşî tê hişê mirov ev e, “Gelo çiqas pere têde heye?” Lê ya civak ji zanistê hêvî dike ew e, dixwaze ji fikarên xwe yên bîngêhîn re bersivê bibîne. Ji ber fikarên xwe yên maddî û manewî, civakê zanist bi awayekî yekpare weke pişeyekî xwedayî hesibandîye û wisa qebûl kiriye. Dejenerebûn û rizîna akademî û zanîngehê bi van şert û mercan ve girêdayî ye. Krîza zanistî çavkaniya xwe van şert û mercan e. Dîroka zanîn-agahiyê bi dîroka şaristaniyê ve girêdayî veguherîye û ji pêxîrtengîya giştî ya sîstemê di heman astê de para xwe girtiye û ji vê aqûbetê nikarîbûye xwe xilas bike. Li cihê ku xwestiyê bibe amûrê çareseriyê, bi xwe bûye amûrekî girîng ê pîrsgirêk afirandinê. Encam, parçebûna zanistî, belavbûn û kaos e.

Serên hilweşîna exlaq bandora her î girîng a destpêkê ye. Qutbûna tîkiliya zanist û exlaqê bîngêhê vedîtina her cure amûrên hilweşîner in. Ne pêkan bû ku ev tîkiliya di navbera zanist, desthilatdarî û civakê de xwe di rêbaz û paradîgmaya bîngêhîn de nîşan nedaya. Ji dewreyê derxistina civakê dihat wê maneyê ku civakê dikin obje. Çawa ku berê jin û kole kirin obje. Piştîre cihêkirina obje û sêbjê ya bi Bacon û Descartes destpêkir derbasî nava zanistan hemûyan bû. Di zanistê de pesnê objebûnê gelekî tê dayîn. Lê ya rastî, kengî navbera objektî û sêbjeyî gelekî vebû, derî jî li felaketa herî mezin vebû. Piştîre ev navber vebûn bi ez û yê din zêdetir mezin bû. Paşê ev veguherî seriyên diyalektîk ên hevdu tine dikin. Ev dualîte ji sedî sed navbervebûna civaka exlaqî û polîtîk û sermaye û desthilatdariyê nîşan dide. Kolekirina xwezayê, piştîre ya jin û koleyan, herî dawî jî kirina obje ya tevahiya civakê, di zanistê de weke ‘pîvana objektîvîyê’ ya navdar a hê jî tê bi karanîn derket pêşîya me. Tîkiliya berê ya xweda û evd, vê carê vugerî tîkiliya obje û sêbjê. Şûna tîgihîştina gelekî berê ya xwezaya zindî tîgihîştina objeya mirî xwezayê û li ser wê sêbjeya xwedayî mirov cih girt.

Ev nêzikatiyên paradîgmîk bandora wan li ser zanistê nexasim jî li ser zanistên civakî hilweşîner bûye. Mînak, bawer dike ku zanista fîzîkê ya xwezaya fîzîkî ya bi temamî objektîv e, dike bîngêh, li ser xwezayê azad e ku bê sînor ceribandin û tesarufê bike. Xwe azad dibîne ji ceribandînen nuklêr heta bi her cure otodînamîkan bixe nava tevgerê. Wexta ku vê yekê dike fikareke xwe ya exlaqî nîne. Kengî tîgihîştina xwezaya objektîv mafê bê sînor ê tesarufê li ser maddeyê bide, encam ê heta bombeya atomê biçê. Zanista xwedayî veguhere zanista amûrî wê ti tîkiliya xwe bi civakê re nemîne. Di destê desthilatdarî û sermayeyê de veguhere amûrekî qanûna kara herî zêde. Bi awayê xuya dike fîzîk bi temamî bê alî ye û zanistek e ku bi xwezaya objektîv re mijûl dibe. Lê êşkere ye ku bi xwe yek ji çavkaniyên hêza bîngêhîn a sermayeyê ye. Di rewşeke berevajî de zanista fîzîkî nikarîbû rewşa xwe ya heyî biparasta. Veguherîna wî ya hêzeke dijberê civakê nîşan dide ku zanistê objektîv a wisa bi alî tineye. Li gorî tehlîla dawî tîkiliyên hêzê yên weke qanûnên fîzîkê têne bi navkirin ji bilî nîşandana hêza mirov ti maneyê îfade nakin. Mirov jî em dizanin ku ji sedî sed hebûneke civakî ye.

### c- Pozîtîvîzm (Zanistperestî):

Dema em felsefeya pozitivist a mohra xwe li tevahiya avahiya zanistî ya modernîteyê xistî şîrove bikin, em ê karibin rûyê rastî yê têkiliya şaristanî-desthilatdarî-zanistê baştir derxin holê. Em dizanin felsefeya pozitivist bi diyardeyên objektîv ên vebirî dikeve rê û ji bilî vê rê nade ti nêzîkatiya zanistî. Dema ku ji nêz ve were nêrtin, mirov ê karibe fêhm bike ku zanista weke têkiliya objeyan ji tevahiya pûtperestiyên berê pûtperest û ji hêzên metafizîk zêdetir pûtperest û metafizîkperestir e. Di vê mijarê de eger em diyalektîka dîrokî bi kurtî bi bîr bixin em ê zêdetir serwext bibin. Çawa ku dînen yek û mucered xwedayî li ser bingehê rexnekirina paganîzmê (pûtperestî, bi awayekî dîne diyardeyan dike xwedayî) derketin holê û xwe bi gewde kirin, pozitîvîzm jî bi awayekî weke êrîşeke dijber bi şêweyê pûtperestiya nû derket holê. Rexnekirina dîn û metafizîkê weke pûtperestiya nû (heqîqetgiriya xwe dispêre diyardeya vebirî paganîzm e), weke neo-metafizîkê bi gewde bûye. Gelekî girîng e ku F. Nietzsche ji wan filozofan e, ev rastî pêşî tespît kiriye û nixandinên wî ji bo lêkolînên heqîqetê di asta alîkariyê de ne. Gelekî girîng e ku tespît kiriye têgîna diyardeya objektîv têgîneke ji heqîqetê dûr e. Diyarde bi serê xwe der barê heqîqetê de yan ti agahiyeke manedar nadin an jî bidin rê li gelek encamên şaş vedikin.

Zanistên pozîtîv ên heta dema nêz hukimraniya xwe dewam dikirin, çawa ku têne nîşandan xwedî perspektîfa antî-metafizîk û antî-dîn nînin, herî kêmbi qasî têgînên metafizîk û dîn xwedî asteke metafizîk û dînî ne, ev rastî eşkere bûye û tê guftûgokirin. Serketina zanistên xwezayê yên dikin malê civaka Yewnan a Klasîk û dema Rohnîbûnê ya Ewrûpayê, di himbêza zanistên xwezayê bi xwe de derbê herî girîng dixwe. Têgihîştina li ser xetê rast timî pêşveçûn aliyê herî qels û lawaz ê zanistên pozîtîvist e. Ji ber ku mirov nikarin armanc û avahiyeke bi vî rengî ya gerdûnê tespît bikin. Çi dinya jêr-atoman, çi gerdûna kozmolojîk, nikarin ji dualîteya çavdêrî û ya çav lê tê gerandin rizgar bibin. Ji ber ku serwextbûna mirov jî di çarçoveya vê pêvajoyê de ye. Nikare pêşbîniya rola wê derkeve derveyî çarçoveyê bike. Potansiyela bê sînora cudabûnê bi xwe hewcedariyê bi şîroveyên nû dibîne.

Pozîtîvîzm xisleta xwe ya dînî ji pozîtîvistiyê digire. Ji aliyê cewherî ve ji bo pozîtîvîzmê diyarde rastiya herî bingehîn e. Rastiya ne diyardeyî nîne. Jixwe bi tevahî lêkolîn û felsefe nîşan didin ku diyarde û hiskirin heman tişt in. Hiskirin jî fonksiyona herî hêsan a zêhn e. Di encama çavdêriya objeyê bi awayekî herî sere-sere de rêbaza zanîne ya hişkeber e. Ango şêwazekî ne zanistî ye û para xapandinê têde gelekî zêde ye. Mirov diyardeyê bike pozîtîvîzm, mirov rola rastiya bingehîn dide objeyê. Di bingehê paganîzmê (pûtperestiyê) de jî heman fikir heye: objeyê dike mijara perestîne. Di vê rewşê de di serî de dîn, pozîtîvîzm çiqasî êrîş bibe ser metafizîkê, ew bi xwe jî ji ber heqîqetpariziya objeyê ketiya rewşa dînekî materyalist ê herî hişk; ango di modernîteyê de şêweyekî nû yê pûtperestiya objektîvîteyê ye û weke nûnerê metafizîkê ye. Çîna navîn ji aliyê zêhnî ve pozîtîvist e. Ango ji cewher û kûrahiyê mehrûm e, seresere nêzî mijaran dibe, ji bilî pîvana diyardeyan wêdetir naçe, şêweyekî xwe yê avabûnê heye li gorî berjewendiyên xwe nabîne. Tevî ku pozîtîvîzmê bi kirasê 'zanistperestiyê' pêşkêş dike, di dîrokê de çîna herî pûtperest e (Pîrbûna heykelan di dema vê çînê de bûne çirrik). Bi şêweyê xuya dike, laîk û dinyewî ye, lê bi xwe herî zêde dîndar û xeyalperest e. Dîndartiya li vir behsa wê dikim, di dereceya baweriya hişk de bawerî û fikrên 'diyardegir' in. Em baş dizanin ku diyardegirî ti carî rastiya yekpareyê nîne. Qaşo laîktiyê, bi xwe jî projeyên xwe yên herî xeyalî (bi awayekî projeyên uxrevî) yên li dijî laîktiyê misêwa bêyî ku şerm bike pêşkêşî pêşiya civakê dike. Him jî a herî seresere ye.

Ji ber ku ev pozîtîvîzma bûye dîn berhemekî zêhnê mirov e, jixwe metafizîk e. Wexta behsa têgihîştina li civakê tê kirin, pozîtîvîzm hema bêje dibe şêweyek ji pûtperestiya hemdem. Pûtperestî, çarçoveya pûç a xwedatiya maneya xwe wendakirî ye. Xwedatî demekê ji bo civakê tişteki mezin bû, têgîneke kêrhatî ya pîrozbûnê bû, lê kengî ew rewşa wê ya kêrhatî nema ji dest derket, li dawiyê tenê rewşa wî ya pûtekî ma. Mirov dikare fêhm bike ku kesên ji zanista manedanê mehrûm çima pûtperestiyê dikin. Ji ber ku ew nizanin çavkaniya pût ji kêrhatîne ye, berevajî ew dikevin wê xefletê yan jî yeqîn dikin ku pût ê maneyê biafirîne, ew ê wan bigihîne meznahî û pîrozbûnê. Ji lewra di vê çarçoveyê de analîzkirina dînen li dijî pûtan dikare mirov gelekî serwext bike. Ez ji pûtperestiya hemdem a pozîtîvistên mehkûmî objektîvîzmê hîç guman nakim. Filozofên di qada modernîzmê bi xwe de jî dibêjin ku ev pûtperestên hemdem 'mîna pûtekî objeyên zêdexwarin û bikaranîne himbêz dikin.'

Bi vê armancê, min di beşa rêbazê de dîrûdirêj anîbû ziman ku mirov ji aliyê zêhnî ve xwedî karektereke metafizîk e. Pozîtîvîzm hay ji xwe nîne û nabîne ku 'pûtperestiya' wê ji ya demên berê hîne çortir e. Ez fikra xwe ya pozîtîvîzm = pûtperestî ye, bi girîngî pêşkêş dikim. Pozîtîvîzm şêweyekî şîrovekirina rastiye nîne. Herçiqas berevajiyê wê îdîa bike jî zanista felsefeya diyardeyan şîrove dike jî nîne. Ji ber ku felsefeyeke wisa nabe. Her a bi ber çav dikeve, her dîmen û dengê guhê mirov bilivîne diyarde ye. Her hiskirin jî diyarde ye. Kîjan cahil an jî dîn dikare îdîa bike ku rastiya gerdûnê tenê ji van

pêk tê? Mixabin, modernîte resmê jiyaneke ye, li gorî pozîtîvîzmê hatiye girtin. Ji ber ku modernîte ne bi cewherê jiyane, seresere bi şiklê wê re têkildar e.

Me gotibû, eger diyarde di çarçoveya têtikiliyên tevlihev de maneyê nebînîn, yan hîç agahiyê nadin an jî bidin dikarin rê li encamên herî şaş ve kin. Em diyardeyên fizîk, kîmya û biyolojiyê bidin aliyekî. Em bi tenê li ser mînaeke diyardeya civakî rawestî û ji nêz ve binêrin ka rê li ber çi encaman vedike. Li gorî pozîtîvîzmê dewleta netewe diyardeyek e. Bi tevahî hêmanên wê pêk tînin jî her yek ji wan diyardeyek e. Bi hezaran sazî û bi milyonan mirov jî her yek ji wan diyardeyek e. Em dema têtikiliyên di navbera wan de jî li vê zêde bikin resimê temam dibê. Li gorî pozîtîvîzmê me têtîna zanistî pêkanî. Êdî em bi heqîqetê mutleq re rûbirû ne: Heqîqeta dewleta netewe! Pozîtîvîzmê weke şîroveyekê li vê terîfê nanêre weke diyardeyê heqîqetê dinêre. Li tevahiya diyardeyên zanista civakî bi vê têtîhiştîne dinêre. Mîna yek ji diyardeyên fizîk, kîmya û biyolojiyê ev jî yek ji diyardeyan in. Terîfa wê ya heqîqetê bi vî awayî ye. Bi awayê xuya dike, ev nêzîkatî gelekî bê guneh xuya dike û ti tehlûkaya wê nîne, lê ev welê nîne, nexasîm jî di tevgerên qirkirin û kokqelandina etnîkî de em li tevahiya vê xeternakiyê hayil bûn. Ji Hîtler bigirin heta bi lîderê dewleta netewe yê qaşo herî nerm wê hemû bibêjin, ya dikin li gorî zanistê heta dawiyê rast e (li gorî zanista pozîtîv), rastiya netewe dadiwerivînin, neteweyê hê homojentir bi tenê ne heq, li gorî qanûna beridîna xwezayê pêşketîneke di cih de ye. Li gorî zanista esas digirin rast dibêjin. Vê hêza xwe ji felsefeya pozîtîv û zanistên pozîtîv digirin. Jixwe di tevahiya demên modernîteyê de bi vê têtîhiştîna pozîtîv xwe li welat, millet, dewlet, etnîsîte, îdeolojî û şerê sîstemê yê bê sînor rakişandin. Ji ber ku ev têtîgîn hemû pîroz bûn û diviyabû di rêya wan de heta dawiyê şer bihata kirin. Çawa ku tê zanîn di encama vê têtîhiştîne de dîrok bû derya xwîne. Pozîtîvîzma bêguneh xuya dike bi xwe rûyê wê yê xwînrîjî bi vî awayî dimirijî.

Em hewl bidin mijarê hinekî din rave bikin. Li dinya me ya îro nêzî dused dewletên netewe hene. Eger bi girseya welatî û saziyên me li jor diyarkirî û yekûna têtikiliyan ev dewlet hemû bêne hemberî hev, wê nîzamek an jî rewşeke hercûmerc a herî kêr bi dused xwedayî, bi hezaran perestgeh û bê sînor terîqetî bivê nevê derkeve holê. Ji ber ku bi tevahî diyardeyên temsîl dikin pîroz in, û hêjane ku mirov di rêya wan de bimirin. Em bala xwe bidîne, li hemberî me di asta nav de be jî ji civaka exlaqî û polîtîk a xwezaya civakî bi rastî nîşan bide ti eser nîne. Bi rastî ya li êrîşê rast bê û di rêya wê de hêja be mirov xwe bide kuştin rastiya civaka exlaqî û polîtîk e. Di dewleta netewe de herkes li ser navê pûtê bi destê xwe çêkirî û pûtên diyardeyî yên hatine pêşkêşkirin pêş wan şer dikin. Ji şerên berê yên di rêya pûtan de hezar qatî çavsortir bi dema şeran re em rûbirû ne. Di encamê de qanûna kara herî zêde ya yekdestdariyên dewleta netewe û sermayeyê dimeşe; jiyaneke firewn jî nikarîbûn bibînin ji hindikayîya bextewar re tê pêşkêşkirin. Ya jiyana modern jêre tê gotin, ji vê rastiya pozîtîvîzmê, ya rastî ji encamên qetilkirina rastiyan wêdetir tiştêkî din nîne. Em îro gihiştîna civaka ferazî. Ti rastî bi qasî civaka ferazî nikare pozîtîvîzmê rave bike. Civaka pozîtîvist civaka feraziye ye. Civaka ferazî rûyê rastî yê civaka pozîtîvist, ji rûyê wê jî wêdetir heqîqet bi xwe ye. Bêmanebûna diyardeyan (ya rastî serşoka bi xwîne, civaka xeyalî, di bêmanebûna civaka xwire de mane) bi civaka ferazî derketine asta herî jor. Civaka medyatîk, civaka şowê, civaka magazîni ev hemû heqîqetên têtîhiştîna pozîtîvîzm, objektîv û diyardetiyê ne, derketine holê. Ya rastî, ev jî înkara heqîqetê ye.

Li gorî mijara me, bêyî ku lêkolîne bikim, encamên bi vî rengî hê jî dikarin rêz bikim. Têtîgînên weke civaka Îslam, Xiristîyan, Mûsevî, Bûdîst, kapîtalîst, sosyalîst, fodal û koledar dîsa rastiyan heman nêzîkatiyê ne. Rûyê metafîzîk ê pozîtîvîzmê di vir de jî derdikeve pêşîya me. Erê, civaka Îslamê, civaka kapîtalîst encamên heman nêzîkatiyê ne. Ango ev têtîgînên diyardeyî ne; bi gotîneke din têtîgînên zahîrî û pêvekîrî ne. Mirov heman tiştî dikare ji bo aîdiyetên netewe jî bibêje. Têtîgînên neteweya Elman, Fransî, Erebb, Tirk û Kurd di karaktera pozîtîvist de her yek ji wan heqîqetek e. Lê bi xwe, dîmenên matbûyî yên heqîqetê ne. Baş e, mirov wê wextê dikarin bipirsin heqîqet çiyê. Li gorî min bersiv gelekî hêsan e. Di çarçoveya rastiya civakê de heqîqeta civaka exlaqî û polîtîk û heqîqeta şaristaniya timî dixwaze wê birizîne heye. Ez nav û sîfetên ji bilî van nabêjim ti rastiye temsîl nakin. Ez dibêjim, heqîqetê bi xwe ne, zahîrê wê, forma wê ya hêsan û tim guherbar temsîl dikin.

Mînak em li rastiya neteweya Erebb binêrin. Herçiqasî gelekî qels bibe jî li mekanekî bi navê Erebbistanê civakeke bi xisletên exlaqî û polîtîk û rastiyeke desthilatdariyê ya bi hezarê salan li ser piştê vê civakê silteya xwe meşandî û heta roja me ya îro aniye vê nuqtêya rizîne heye, ji bilî vê rastiye Erebbî kêr tiştan îfade dike. Bi hezaran cuda, bi nakok, heta dijminên hevdu yên sondxwarî Erebb hene. Ango bi hezaran heqîqetên bi nakok! Li gorî pozîtîvîzmê divê welê be. Lê em baş dizanin ku rastiya Erebb bi xwe diviyabû ev nebe. Mînaekeke din a mirov ê karibe baştir jê fêhm bike dar in. Darek weke diyardeyekê bi hezaran guliyên wê û bi qasî neyên jimartin pelên wê hene. Eger dareke fêkiyên tê zanîn û hêja be, li gorî wê maneyek xwe heye; ne li gorî gulî û pelên wê. Pozîtîvîzm ew korî ye ku bi

heman giraniyê nêzî hemûyan dibe. Belê, pel û gulî jî rastiyeke in. Lê rastiyeke manedar nînin. Goşiyek, kîloyek tirî nîrx û maneyek xwe heye. Lê pelekî mêmê bi tenê zahiriya wê ye, wê bi xwe nîşan nade, rastiyeke diyardeyî ye ku şeweyeke bi çavan were dîtin didiyê.

Pozîtîvîzm mîna zanistê jî felsefeya herî çor a diyardeyê ye. Diyarde dîmenê rastiye ye; pozîtîvîzm jî rastî bi xwe ye, ji lewra ti tiştê ne diyarde rastî nîne. Ji fizîka kûantûm, astronomî û biyolojiyê heta ji fikrê bi xwe em dizanin ku rastî ji bûyerên bi çavan mezin xuya dikin wêdetir di aleman de cereyan dike. Rastî (heqîqet) weke di têtikiliya çavdêr û çavdêrî lêkirî de bi rengê herî sirrdar wer hatiye nixumandin ku di ti pîvana fizîkî û terîfê de hilnayê. Pozîtîvîzm weke înkara vê kûrahiyê, herî zêde dişibe pûtperestiya (paganîzm) serdema destpêkê. Ji ber ku pût weke diyardeyekê xuya dike, têtikiliya hevpar a di navbera paganîzm û pozîtîvîzmê de nîşan dide.

Ji ber ku zanist di nava diyardeyan de tene xeniqandin, her roj disiplîneke zanistî derdikeve û hemû xwe bi heman giraniyê heqîqet dihesibînin ev dibe sedema sereke ya krîza zanistiyê. Me ji destpêkê ve têtikiliya wê bi sîstemê re diyar kir. Heqîqet dewamî û her diçe bi şeweyên dualîteyên her diçin kûr dibin ên weke obje-sûbje, em-yên din, ruh-beden, dîn-zanist, mîtoloji-felsefe, xweda-evd, bîndest-serdest, hakim-mehkûm û hwd. parçe dibe. Ev bi xwe encama çalakiya mêtîngehkirin û rizandina şebekeyên yekdestdariya şaristaniya li ser civaka exlaqî û polîtîk piçikiye. Modernîteya kapîtalîst ev dualîteya şaristaniyê bi awayekî bê sînor zêde kiriye û îro civak aniye vê asta ji hev belavbûn û rizînê. Di vê de pareke mezin a zanista bi sîstemê re hevkarîyê dike heye. Kengî nakokîya di navbera îdeolojiyê bi xwe û avabûna amûrî de dipêpê û vê rewşa hay jê çêdibe krîz e; ev jî bi bêkarî, şer, birçîbûn, xizanî, zordestî, qirkirin, ne wekhevî û ne azadbûnê îfade dike û di goşt û ruhê pîrraniyan de vegudiherîne qêrînê.

Objektîvîstên pozîtîvîst îdîa dikin ku civakê bi awayekî zanistî rave dikin, lê tevî vê yekê, objektîvîzm pozîtîvîst dibistaneke fikrê ye ku herî kêr herikîn û pêşketina civakê nas dike. Civakê bê dîrok weke lodeke hişk a materyalîst şîrove dike, bi ravekirineke kêr û çeloxwarî rê li ber operasyonên civakî yên bi tehlûke vedike. Têgîna muhendîstiya civakî têtikiliya xwe bi pozîtîvîzmê re heye. Ev kes bawer dikin ku wê bi destwerdaneke ji derve ve karibin şikil bidin civakê. Ev helwestên em behsa wan dikin, di heman demê de têgîhiştina fermî ya modernîteyê ye, û ji bo şerên îstîsmarê û desthilatdariyê yên li derve û hundirê civakê tene meşandin sedemên rewşa çêdikin.

Yek ji gunehên mezin ê pozîtîvîstan ew e ku rastiye cîvakî weke diyardeyên fizîkî di heman kategoriyê de bi cih kirine. Wexta ku hûn diyardeya cîvakî bi rastiye naguherin re yek bigirin, hûn ê derî heta ser piştê li paradîgmayên cîvakî yên di nava xwe de gelek nuqtayên mirov pê bixape dihewîne, vekin. Dema mirov ji vî alî ve bi awayekî pozîtîvîst li ekonomiyê binêre, ne mumkin e ku van nuqtayên divê mirov ji wan dûr bisekine nebîne. Wexta mirov milletgiriye weke îfadeyêke rastiya objektîv fêhm bike, herçiqaqas di rewşên cihê de bin jî ji aliyê felsefî ve Hîtler û Stalîn yek in, û hûn ê bikevin rewşa wan. Ev herdu jî ango pozîtîvîst hemû û materyalîstên çor jî rastiye di civakê de weke rastiye mutleq dinirxînin û nikarin xwe ji vê xilas bikin. Sedema ku mijara pere gelekî nazik û girîng dike têgîhiştina bi vê helwesta pozîtîvîst nêzî civakê dibe ye: ango pere bi temamî rastî dihesibîne. Ji lewra bi rêya wî destguhertin her diçe, dihêle ku weke rastiyeke temam bê fêhmkirin.

1- Zanistên cîvakî yên dixwazin bi têgîhiştina zanistên pozî-tîvîst ango bi paradîgmaya wê pêşde bibin, bi temamî asê bûne. Naxwe em nikarin diyardeya mêtinkarî û şer a ev çend mezin bûye rave bikin. Nabe ku zanyarek herî kêr bi qasî alimekî dînî û exlaqparêzekî berpirsiyar nebe. Eger zanist ji mîtoloji, dîn û felsefeyê zêdetir xwediyê hêza maneyê ye û tevî ku şoreşa xwe di sedsala 17. de kiriye û serketina xwe îlan kiriye, çima nikarîbû vê serdestiya xwe li hemberî diyardeya şer û mêtinkariya nedîtî nîşan bide? Mirov dikare di desthilatdarbûna zanistê de vê yekê weke sedem nîşan bide. Zanista bibe desthilatdar azadiya xwe ji dest dide.

Eger em zanistê weke şîroveya pêşketî ya maneyê bi nav bi-kin, em ê ev çend bi lez yekbûna wê bi desthilatdariyê re yan li ser navê zanistê weke têtikîlî yan jî em ê weke pîrsgirêkeke cid-dî ya bi navkirina zanistê fêhm bikin. Min xwest ez têtikîliya vê pîrsgirêkê bi pozîtîvîzmê re deynim. Tevî ku ew bi xwe dîn gelekî rexne jî dike, pozîtîvîzm ji dîn û metafîzîkê jî paşdetir bi materya-lîzmeke çor di zikhev de dîn û metafîzîkek e, û ev yek xwe di asta bêberpirsiyariya wan de bi awayekî eşkere nîşan da. Nîşanên bê-berpirsiyariya wan ev in; li dijî mêtîngerî û şer ti tişt nekirin, ew pîrsgirêkên xwe jî nehesibandin û paşê jî zanista desthilatdariyê bûn. Ji vir encama divê em derxin ew e ku zanist hewcedarê şîro-veyeke nû ya maneyê ye. Zanist hewcedariya xwe bi şoreşeke nû ya paradîmatîk heye. Min hêza xwe ya şîroveyê weke bi cîha-nîna qabîliyeta xwe ya maneyê di vê xebatê de ceriband. Encam bi vê ceribandîne re têtikildar in.



Çawa ku tê zanîn, pozîtîvîzm anti-metafizîk û anti-dînî nîne, berevajî dînekî çor ê materyalist e, bi tenê bi awayekî şayîk bi cîlaya zanistî ser şapînzkirî ye. Ya rastî, pûtperestiya modernîteyê ye. Di navbera herdu rêbazên dogmatîk de wekhevîya bingehîn ew e, ji hebûna hêzekê bawer dikin ku qanûnên wê li xwezayê hukim dikin. Li şûna qanûnên xwedê bi tenê gotina qanûnên zanistî hatiye danîn. Jê pêve vegotin heman tişt in. Aliyê herî xeternak ê fikra pozîtîvîst, di hukmên wê de nêzîkbûna wê ya di hêza qanûnê de ye. Şîrove tineye. Ji sedî sed e, objektîv e, ev nêrtina hukmê wê ji bo her kesî wekhev tê bi xwe tersê zanistê ye. Ji ber ku bi xetên tûj ên obje-sûbje ji hev tê qetandin di encamê de para şaşbûn û bi tiştêkî xapînê jî nahêle.

Mirov hewldana çîna bûrjûvayê ya teolojiya serdema navîn weke felsefeyeke zanistî û sekuler boyaxkirî û bi pozîtîvîzmê cîlakirî pêşkêşkirina wê fêhm dike. Hemin wê li ser wê şopên rastiya civakî ya malzaroka jê çêbûyî hebin. Ji serdema navîn, heta tevahiya dîroka şaristaniyê ji nêzîkatîyên formên li zêhnên me hatine barkirin em xwe rizgar nekin, bivê nevwê pêla pozîtîvîst wê zêhnên mîna êsîr bigire hukim lê bike. Vê rewşê kir ku mirov retorîkeke (hostatiya gotinbêjîyê, cambaziya wê) hişk, pûç, zêde tê dubarekirin weke rastî bibîne û ji vê jî wêdetir firsend neda ti pêşketinê. Li şûna helwesta "Îmam çî bibêje ew rast e", vê carê jî "Mamoste û filozof çî bibêje ew rast e" cih digire. Di bingehê bêkêrî û bêberdariya zêhnê me de ev rastî heye. Ji lewra em mehrûm kirin ku em nikaribin şîroveyek bi tenê der barê xwezaya xwe ya civakî de bikin. Ev rewşeke gelekî xeternak e. Xwe bi xwe mejiyê xwe serkorî û êsîr dike. Dogmatîzma dînî qet nebe bi awayekî mîna hêza barhilgir a rêûresmê hinek rastiyan dîrokî bi bîra mirov dixîne. Di pozîtîvîzmê de ev jî nîne. Di navbera me û rastiyan me de benedike mezin a xerîbxistinê datîne, dideribîne. Weke hêza hegemon a îdeolojiya Rojava, bi awayekî mîna hîç sîlehê bernede (bêyî ku mejiyê xwe bixebitîne) teslîm digire. Eşkere ye ku heta dogmatîzm neyê şikandin, bi giştî şaristaniya fermî, bi taybetî jî paradîgmaya modernîteya kapîtalîst şikandina wê mumkîn nebû. Ji lewra nikaribûn bigihîjin hêza şîroveya azad. Ez di vê fikra xwe îqna bûme, ew jî ev e: sîlehên îdeolojîk ji sîlehên eskerî zêdetir bi rola qedexeker radibin.

Hingê pirs û pirsgerêka girîng dibe ev e: Em ê heqîqetê li ku û çawa bibînin? Ez dixwazim pîvaneke hêsan bi bîr bixim û bersiva xwe bidim: Te tiştêk li ku wenda kiriye, tu dikarî li wir bigerî û bibînî. Naxwe li deverên din, tu li tevahiya dinyayê jî bigere û lêbikolî tu nikarî bibînî. Ji ber ku rêbaz şaş e. Li cihê te wendakirî ne, rêbaza gerî ya li deverêke din bi tenê têkçûna zeman û enerjîyê îfade dike. Ez lêgerînên heqîqetê yê serdema me jî dişibînin vê mînakê. Tevî laboratuarên mezin ên lêkolîn û lêgerînê, fonên mezin ên ji bo vê têne veqetandin, rastiyan xwe digihîninê mîna min diyarkiribû bi krîz û êşê barkirî ne. Eşkere ye ku heqîqeta mirovatîyê li pey bi bez e, wê ev nebe. Bersiva min wê weke gelek caran dubareya dubareyê be. Heqîqet bi tenê dikare civakî be. Di pêvajoya şaristaniyê de dema civaka exlaqî û polîtîk hat rizandin û xistin bin serweriya hişk a yekdestdariya desthilatdarî û mêtinkariyê, ev hat wê maneyê ku heqîqeta civakî ji dest hatiye dayîn. Ya ji dest hatiye dayîn, tevî nixê exlaqî û polîtîk ji dest hatiye dayîn. Eger tu dîsa dixwazî bibînî, divê tu li devera te wendakirî lê bigerî. Ango tu yê li dijî şaristanî û modernîteyê li civaka exlaqî û polîtîk, li rastiya wê bigerî, bibînî. Tu yê bi vê jî qîma xwe neynî; tu yê hebûna xwe ya kirine ku neyê naskirin jî ji nû ve ava bikî. Hingê tu yê bibînî ku tu bi tevahî heqîqetên di buhaya zêr de yê ku tevahiya dîrokê te wan wenda kirî yek bi yek tab û peyda dikî. Li ser vî bingehî tu yê bextewar û şadîr bibî û tu yê fêhm bikî ku ev jî bi civaka exlaqî û polîtîk dibe.

#### **d- Di Rêya Heqîqeta Civakî de Ji Nûve Şîrovekirina Zanista Civakî**

Zanîn bi heyîna gerdûnî re têkildar e. Nîzama gerdûnî ya heyî bi tenê bi têgîna zanîne mirov dikare rave bike. Ya balkêş şewazê zanîne yê xwe anîna ziman e. Wer tê fêhmkirin ku bi tevahî cûrbicûriya gerdûnî encama xwesteka xwe anîna ziman a zanîne ye. Em der barê zanatiya zanîne de ti tiştî nizanin. Hema hema lêgerîna zanîne ya li cûrbicûriya bêserûbinî pirseke sedemê dide fikirîn. Pirsra çima gelekî şîlo û nediyar dimîne. Hin filozofên navdar, heta hin ji Pirtûkên Pîroz van pirsan bi arezûya gerdûnê ya dixwaze bi bîr were yan jî bi arezûya xwedê ya dixwaze ji aliyê evdên xwe ve were zanîn girê didin. Gotina hayjêbûn ji bo min hê bi heybet û raveker e. Ji zerreya herî piçûk heta bi hebûna herî kozmîk hayjixwebûn, dikare bibe bersivên pirsên çima û sedemê. Maneya em ê li hayjixwebûnê bar bikin, ji bilî jiyanê bi têgînên din nayê terîfkirin. Mirov dikare terîfa jiyanê ya herî nêzî rastiyan weke hayjixwebûnê diyar bike. Ji vê jî girîngtir, hayjixwebûn çima evqasî girîng dibe? Em dizanin bêyî hayjixwebûnê jî jiyan mumkîn e. Lê wexta em bi kûrî hewl didin pê bi his in, em fêhm dikin ku ev mumkînbûna zêde mumkîn xuya nake. Mirov dikare bibêje dema dirêj a jiyanê ya hay mirov jê nabe û dibihure nixê wê yê jiyanê kêr dibe, heta dihele diçe. Diyardeya mirinê jî ji sedî sed hayjêbûna ji jiyanê ango ji bo mumkînkirina jiyanê weke hostatî yan jî listikeke xwezayê xuya dike. Mînak hebûneke bi jiyanêke bêserûbinî hatibe

cezakin, gelo çî cudahiya xwe ji trajediya Sîsiphos (ew kes e ku xwedawendan wî ceza kirine, cezayê wî jî her kevir tam dibe serê gir kevir digindire jêr û dîsa diçe wî tîne) dimîne? Liberketina mirinê bi tenê nîrxê jîyanê zêde dike û bi bîr dixê.

Ji bilî hayjêbûnên der barê jîyanê de zanîn nayê maneyek din. Tiştê tê zanîn, tiştê hayjêbûyî ye. Em ji bo hebûnên fizîkî nikaribin tiştêkî bibêjin jî ma mumkîn e ku mirov his neke di hebûnên biyolojîk de çûneke eşqî ber bi zanîne ve heye. Em wexta ber bi cureyê mirov ve tîn mîna ku ev eşq pêk hatiye. Rewşê gelekî pêşketî ya zanîne herî baş gotina eşqê dikare terîf bike. Lê mirov hebûneke welê ya seyr û sostret e, xisletên wî hene em dibînin der barê zanîne de ji kirna xiyaret û berevajîkirinên mezin paşve namîne. Mirov vê rastiya mirov bûyerên di nava xwezaya civakî de ya em jêre Xwezaya Duyemîn dibêjin diqewimin rave bike hê rastir xuya dike.

Ne zanistên fizîkî bi qasî ku tîne gotin bi xwezaya fizîkî re (kîmya û biyolojî jî di navê de ye) girêdayî ye, ne jî zanistên ji wan re beşerî tîne gotin weke wêje, dîrok, felsefe, polîtîka ekonomiyê û sosyolojî bi tenê bi xwezaya civakê re têkildar in. Herdu zanist dikarin di tîgîna zanista civakî de bigihîjin hev û mirov dikare vê erênî bibîne. Ji ber ku her zanist divê civakî be.

Zanista civakî weke tîgîn bi şaristaniya navend Ewrûpayê re pêşket. Bêguman tevahiya xwezaya civakî disiplîneke em dikarin weke cureyekî zanista civakî bi nav bikin her hebû. Em ji zanista civakî ya beriya dîrokê re bi hêsanî dikarin bibêjin anîmîzm. Anîmîzm (zindîtî) tîgîneke zanista civakî ya navend Ewrûpayê ye, gelo bi qasî ku tî gotin zanîna destpêkê ya mirovên destpêkê ye? Kî fitûyê dide ku avahiya zanista civakî ya îro ya obje û súbje cihê dike di ser anîmîzmê re ye? Dîsa zanyarên civakî! Lê her ku diçe baştir tî fêhmîkirin ku ekola zindîgîriyê paradîgmayek e, ji cihêkirina obje-súbjeyê ango bêcankirina objeyê bi nîrxê e. Eşkere ye ku bi zindîtî terîfîkirina gerdûnê ji terîfa wê ya bi bêcaniyê encamên rastir dide. Bi tevahî pêşketinên zanistî vê xusûsê piştrast dikin. Eger tevgerên perçikên jêr-atomên ên hê sîrr in, û balkêş in, nebûna, rastiya yek curetî pêk nayê me yê nikarîbûya ji bilî anîmîzmê bi ti awayê din rave bikira. Pozitivîzmê (zanistperestiya diyardeyan) weke cureyekî pîrr bi tehlûke yê metafîzîkê (herçiqasî berevajiyê wê îdea bike jî) zanista civakî kûr birîndar kiriye.

Pêvajoya şaristaniyê ya em jêre serdemên dîrokê dibêjin, ji anîmîzmê ber bi mîtolojiyê ve şewazekî zanistê jî bi xwe re aniye. Herçiqasî mîtolojî bi temamî weke malê şaristaniyê neyê hesibandin jî ji gelek aliyan ve mohra şaristaniyê lê heye. Berevajîkirina pêşî ya zanîne û îxanetxistina nava zanista civakî bi hegemondariya îdeolojîk a pêvajoyên şaristaniyê re têkildar e. Yekdestdariya sermaye û desthilatdariya li ser xwezaya civakî hat avakirin bê derew, bê berevajîkirin û bê xiyaneta li gotinê nabe. Mîtolojî bi giranî bi anîmîzmê barkirî ye, û bi nîrx e. Lê wexta sîstema hiyarkerşîk û nîzama ji sêberiya rahîb + rêveber + fermanîdar pêk hatî bi çîrokên mîtolojîk ên qehremankirin (nîv-xwedatî) û xwedakirinê ketin dewrê, rizîn û berevajîkirin bivê neyê pêk hatin. Mîtolojî bi şertê ev wesfê wê yê dualî li ber çavan were girtin, dîsa zanistekê civakî ye ku mirov dikare gelekî jê hîn bibe. Ez yeqîn dikim ku wê her biçe girîng bibe. Ji sedî sed di hînbûna dîrokê de wê hê bêtir bi roleke mezin rabe.

Kengî mîtolojî weke dîn hişk bû, rê li ber duyemîn cureyekî zanista civakî vekir. Bêguman dîn bi tenê mîtolojiyê weke mîrate nagire. Dogmayên wê bi xwe jî hene. Herçiqasî bi giranî mohra hêzên şaristaniyê li ser hebe jî şîroveya dînî ya hêzên dijberê sîstemê hê zelal e, û ji ber xwezayîtiya wê rastir e. Yek ji erdkolanerê bîngêhîn ê rêya diçe zanista hemdem e. Di dînen yek xwedayî de mirov dikare nîşaneyên herdu hêzên dijber bişopîne. Şaxê fermanîker, ceza dide, teolojiya mirovan dike evd hêzên şaristaniyê nîşan dide, şaxê mirovan beşdar dike, xelatê dide û azad dike jî fikir û baweriyên hêzên dijberê şaristaniyê nîşan dide. Serdema navîn bi şerên di navbera dîn û mezhebên van herdu tîgîhiştinan de tîjî derbas bûye. Eger şerê van dîn û mezheban nebûya, ji sedî sed wê zanista civakî ya Ewrûpayê jî pêk nehata. Bi tenê mirov bandora Îslamê bifikire tîrê dike ji bo em li vê rastiye serwest bibin. Wekî din jî tevahiya serdema zanyar û filozofên mîna çîrîskan hene. Şik û guman nîne ku van kesan çavkaniya bi nîrx a zanista civakî pêkanîne.

Zanista civakî (modernîteya) serdema şaristaniya Ewrûpayê hem weke berhema tevahiya mîrateya vê dîrokê, hem jî weke pêdiviyêke tîkoşîna mezin a civakî derket holê. Bi awayekî bîngêhîn weke amûrekî disiplîne yê çareserîkirina pîrsgirêkan fikirîn. Sîstema zordestiyê û îstîsmara bê sînor a kapîtalîzmê rê li vekir, ji destpêkê ve modernîte neçar kir ku bi krîzê bakirî pêk bê. Bi giştî zanist hemû, bi taybetê jî zanistên civakî ji aliyekî ve kirin xizmeta sîstema zordestî û îstîsmarê, ji aliyê din ve jî rola rewakirinê ango bi awayekî erênî ravekirina sîstemê wekî din dan zanistên civakî. Retorîka yekdestdariya desthilatdarî û sermayeya nû mohra xwe li zanista civakî da.

Sosyolojiya pozitivîst ji destpêkê ve kir ku zanista civakî seqet pêk bê. Fikara bîngêhîn a sosyologên pozitivîst ew bû ku ji Şoreşa Franseyê komareke xwedî li berjewendiyên bûrjûvayê derdikeve pêk bînin. Polîtîkvanên ekonomiya Ingilîz hewl didan kapîtalê rasyonel û rewakirin. Îdeologên Elman di

her qadê de bi pêkanîna dêwane ya dewleta netewe ya Elman re mijûl dibûn. Damezrênerên sosyalîzma zanistî û serkêşên dijberên sîstemê K. Marks û F. Engels a dixwestin bikin ew bû, ji retorîka sê sermayeyan zanisteke bi mohra proleter biafirînin. Dijbertiya kapîtalîzmê û li ser vî binge hî analîzkirina kapîtalê dikarîbû alîkariya zanista civakî bikirana. Lê çavkaniyên wan jê gav diavêtin û dijbertiya xwe ya sîstemê bi dijbertiya kapîtalîzmê bi sînor dikirin û vê jî dikir ku bi tevahî avahiyên sîstemê li hemberî modernîteya kapîtalîst bêparastin bimînin. Analîzên anarşîstan li ser desthilatdariyê herçiqasî gaveke li pêş bû jî lê qada polîtîk mîna ku vala hiştibûn. Zanista civakî ya Ewrûpayê ji aliyê herdu bazkan ve jî ji lêkolînkirina xwezaya civakî wêdetir bi pirsgirêkên sîstemê rê li wan vekiribûn mijûl dibû. Bi awayekî xwe li pisporiya çareserkirina pirsgirêkan datanîn. Dinya û dîrok di dereceya duyemîn de dihatin. Divê mirov matmayî nemîne ku çima zanista civakî navenda xwe Ewrûpaye. Mirov nikare li bendê be ku pirsgirêkên bi sedsalan ketine ser hev û kombûne bi derbekê jê bibihurin. Ji nava wan îdeolojiya lîberal herî zîrek derket. Rê dît ku hemûyan bi sîstemê entegre bike. Bi tenê Şoreşa Franseyê ne, Şoreşa Rûsyayê jî di navê de zanîbû tevahiya şoreşên serdemê û dijberên sîstemê bê tesîr bike; zanistê bi awayekî serketî veguherîne zanista desthilatdarî û sermayeyê.

Lê mirov nikare bifikire ku modernîteya Ewrûpayê weke sîstema herî desthiltdar û îstîsmarkar a pêvajoya şaristaniyê, dijberên xwe bi temamî tine û bêdeng bike. Bi pêşveçûna wê re ev modernîte ne bi tenê di bereya îdeolojîk de, di bereya exlaqî û polîtîk de jî li berxwedanên mezin rast hat. Dijbertiya sîstemê jî herî kêr bi qasî sîstemê xwe nû dikir. Sîstem çiqasî global dibû, dijberên sîstemê jî globalîze dibûn. Hegemondariya wê ya li ser zanistê her ku diçe dişkiya. Hêdî hêdî dihat fêhmkirin ku dîrok dibe bi tenê ya dinyayê be, hegemondariya Ewrûpayê ya demeke kin ajotî bi tenê dikare parçeyekî piçûk ê dîrokê be.

Fîlozofîya Fransî ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Şoreşa Çandî ya Ciwanên 1968, ji hundir ve jihevdeketina sîstema Sovyetîk, têkçûna dewleta xweşhaliyê, lêgerînên postmodernîst û tesfîyeya mêtîngeriya klasîk derfet û îmkân didan ji bo zanista civakî demeke nû bide destpêkirin. Bi awayekî ji astengiya pozîtîvîzmê û navendîtiya Ewrûpayê rizgarbûyî, lêkolînkirina heqîqetan ketibû rêyeke hê erênî û baştir. Zanista civakî dema ku xwezaya civakî bi tevahî li zeman û mekân hemûayn bike mijara lêkolînê, divê bi tenê qîma xwe bi çareserkirina krîz û pirsgirêkan neyne, ji aliyekî ve fîzîk, kîmya, biyolojîk û kozmolojiya bi awayekî binge hî têkiliya xwe bi civakê re hene û li aliyê din jî ji zanistên beşerî yên weke felsefe, wêje û hunerê re pêşengiyê bike da ku bi rola xwe ya zanista qralîçeyê rabe. Şecereya zanistê bi tenê bi zanista civakî mirov dikare şaxan jê bibe. Bi vî awayî mirov ê hem wê ji zêde parçebûnê xelas bike, hem jî mirov ê fikaran neke ku zêde ji her tiştî şuştî ye. Tevî krîza giştî ji krîza di qada zanista civakî de bihurîn wezîfeyê pêştir divê were bi cih anîn. Zanisteke civakî ya hayjêbûna jiyane weke azadî, lêgerîna azadiyê jî weke heqîqetê şîrove bike, rêberê pêşketin û rohnîbûna civaka exlaqî û polîtîk e ku dest jê nabe.

Sosyolojî avahiyê wê ya zanî-agahiyê ya navend Ewrûpayê heye. Çawa ku hewesdarên zanista pozîtîv ên fîzîk, kîmya û biyolojiyê civakê jî diyardeyek bi heman rengî dihesibînin, bi heman awayî sosyolojî jî nêzik dibe û ji îddîayên bi vî rengî wêdetir naçe. Civaka mirov xwediyê xwezayê gelekî cuda ye. Çawa diwêrin wê weke objeyekê bigirin dest û li ser rawestin. Nêzikatiyê bi vî rengî berevajî yeqînan wê rê li ber rohnîbûnê ne, wê li rê li pûtbûneke çor veke û nikariye xwe ji vê rizgar bike. Gavavêtinên felsefeyê yên îdeologên Elman ên ji bo dewletên netewe avahiyên agahî-zanîne bigihînin, zanista polîtîka ekonomiyê ya îdeologên Ingilîz û sosyolojiya filozofên Fransî her yek ji wan amûrekî rewakirîne yê mekanîzmeyên danehevê yên sermayeyê û desthilatdariyê ne. Guftûgoyên zanistî yên roja me ya îro vê rastiyê têra xwe eşkere dikin. Li gorî analîza dawî felsefeya Elman, polîtîka ekonomiya Ingilîz û sosyolojiya Fransî ji milliyetgiriya dewleta netewe ya mezin dibe xizmet kirine û nikarîne xwe ji vê yekê rizgar bikin. Ev sosyolojiyên bi tevahî navend Ewrûpayê ne, em bi hêsanî dikarin bibêjin avahiyên zanî-agahiyê yên sîstema dinya kapîtalîst ên navend Ewrûpayê ne.

Di Sosyolojiya Rojava de (zanisteke bi navê Sosyolojiya Rojhilatê hê li naverastê nîne) têgînên sîstema şaristanî û civakê gelekî bi pirsgirêkan in. Divê neyê jîbîrkirin ku sosyolojî ji ber pirsgirêkên şer, pevçûn, pêxîrtengî û nakokiyên mezin ên yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê rê li wan vekirin weke pêdiviyê bi çareseriyê derket holê. Ji bo nîzam hilneweşe, were rizgarkirin û mirov karibin têde bijîn, ji her milî ve tez li ser teze dihat çêkirin. Tevî hemû şîroveyan teolojîk, reformîst û mezhebî yên doktrîna Xiristîyantiyê pirsgirêkên civakî her çûn girantir bûn û vê jî hişt ku şîroveyan bi awirê zanistî (pozîtîvîst) li pirsgirêkên civakê derkeve pêş. Şoreşa Felsefeyê û dema Rohnîbûnê (sedsalên 17. û 18.) bi awayekî binge hî encama vê pêdiviyê ne. Bi Şoreşa Franseyê re li şûna çareserbûna pirsgirêkan, pirsgirêkê hê bêtir tevlihev bûn û vê yekê jî kir ku meylên sosyolojiyê weke şaxekî zanistî yê serbixwe bigire dest û pêşde bibe zêde bibin. Sosyolîstên utopîk Saint Simon, Fourier, Proudhon,

Auguste Comte û Durkheim li ser vê rê qonaxa pêş temsîl dikin. Hemû jî zarokên Rohnbûnê ne. Bêserûbinî baweriya wan bi zanistî hebû. Ji lewra jî bawer dikir ku ew ê karibin bi rêya zanistê çawa dixwazin civakê ji nû ve biafirînin. Bi rola xwedê radibûn. Bi gotina Hegel, jixwe Xwedê daketibû rûyê erdê. Hem jî weke dewleta netewe. Ya diviyabû bihata kirin, bi nazikî û nazenînî 'muhendisiya civakê' proje û plansazî bû. Bi rêya dewleta netewe ti plan û proje tinebû ku di pratîkê de bi cih neyê anîn. Hema bi tenê bila 'pozîtîvîst zanist' be û dewleta netewe qebûl bike!

Zanyarên civakî yê Ingilîz (polîtîkvanên ekonomiyê) bi çareseriyên ekonomîk alîkariya sosyolojiya Fransî kirin, îdeologên Elman jî bi rêya felsefeyê alîkarî kirin. Adam Smith û Hegel ji wan kesan in ku di serê alîkaran de tên. Ji ber ku kapîtalîzma pişesaziyê ya sedsala 19. di asteke xeternak de civak îstîsmar kir û rê li gelek pirsgirêkan vekir, çep rast rêçeteyên hatin pêşkêşkirin cûrbicûr bûn. Îdeolojiya navendî ya yekdestdariya kapîtalîst Lîberalîzm, bi hostatiyeke mezin ji her fikrê dikarîbû sûd werbigire û bi ser hev bike û mîna tûrikê pînekirî di afirandina sîsteman de herî dest sivik bû. Sosyolojiyên şematîk ên rastgir û çepgir jî wexta proyeyên xwe yê der barê rabihurî (lêgerîna rastgiran a li serdema zêrîn) yan jî paşerojê (civaka utopîk) de amade dikirin, mîna ku haya wan ji xwezaya civakî, dîrok û rojaneyê tinebû. Dema ku bi dîrok û rojaneyê jî rûbirû dibûn misêwa parçe dibûn. Rastiya hemû jî bûbûn êsîrê wê 'qefesa hesinî' ya modernîteya kapîtalîst hûrûkûr deribandibû û ew giş ji aliyê zêhnî û şewazê jiyana pratîkî ve xistibûn hundirê wê. Fîlozof Nietzsche dema ku ew hemû weke 'metafizîkvanên pozîtîvîzmê' 'bejinbohstên xesandî yê modernîzma kapîtalîst' bi nav dikir hê zêdetir nêzî heqîqeta civakî disekinî. Yek ji wan kêma fîlozofan e ku cara pêşî bal kişandiye ser tehlûkeya modernîzma kapîtalîst civakê daqurtîne. Tevî ku tê gunehbarkirin ku bi fikra xwe ji faşîzmê re xizmet kiriye jî bi şîroveyên xwe yê hatina faşîzmê û şerên dinyayê xeber dide balkêş e.

Lê gotin û destnîşankirina van rastiyan pirsgrêkê çareser nake. Marks û Engels weke fikra dijber derketin, lê têra xwe eşkere bûye ku sosyalîzma wan an jî sosyolojiya wan şîroveyeke herî seresere û çor (vulger) a civakê ye. Tevî hemû îddîayên wan ên dijber, ji lîberalîzmê -îdeolojiya fermî ya kapîtalîzmê ye -zêdetir ji kapîtalîzmê re xizmet kirin û nikarîbûn xwe ji vê rizgar bikin. Em vê yekê bi sosyalîzma pêkhatî, bi ekol û tevgerên demokrasiya sosyal û rizgariya neteweyî, sîstemên dewletan têra xwe dikarin fêhm bikin. Tevî rêûresma wan a têkoşînê ya gelekî esîl, hem jî li ser navê netewe û çînen bindest ketina wan a vê rewşê, ji nêz ve bi avahiyên wan ên zanîn-agahiyê ve têkildar e. Avahiyên agahî-zanînê yê xwe spartinê, tevî aliyên wan ên erênî û neyênî tevahî dijberî xwestekan encam dane. Eger di avahî û paradîgmayên wan ên bingehîn de qusûrên ciddî û şaşiyên zincîrwarî nebûna, encamên bi vî rengî bi hêsanî derneketin holê.

Ekoleke din a dijber teoriya wan a îzafiyeta zêde ye. Ne tenê bûn avahiya agahî-zanînê ya sîstema dinya kapîtalîst, belkî jî ji ber ferdparêziya xwe ya zêde, em dikarin bêjin wan ji kapîtalîzmê zêdetir ji ferdparêziya wê re xizmet kirin. Nêzîkatiyên anarşîst jî di nava vê de cih digirin. Rexnekirina kapîtalîzmê û di gotinê de gelekî dijbertiya wê, weke ku gelek caran tê dîtin mirov dixwe rêya xizmetkariya wê. Di vê de jî bi awayekî bingehîn nêrtina paradîgmâtîk, şaşî û kêmasiyên di avahiyên agahî-zanînê de bandorê dikin û rê li vê yekê vedikin.

Li ser danasîn û terîfa zanista civakî lihevkerin pirsgrêkê çareser nake. Ji vê jî ya girîngtir ew e, wê çî weke modela bingehîn were girtin, bi gotineke din di analîzkirina civakê de kîjan komik, yeke an jî şaneyê esas bê dîtin. Eger mirov bibêje "Yekeya bingehîn bi tevahî xwezaya civakî ye", ev yek ji bo zanista civakî zêde maneyekê îfade nake. Ji nava bêhejmar tîkiliyên civakî yê girîng neqandin ji bo nêzîkatîyeke manedar a teorîk tercîha pêşî ye ku divê were kirin. Ew yekeya civakî ya were hîlbijartin çiqasî giştî rave bike ewqasî wê manedar bibe.

### **Ji ber vê Çendê;**

**1-** Hewldanên entelektuel û xebatên li ser zanîn û zanistê divê bêne pêşdebirin di çarçoveya civaka exlaqî û polîtîk de ya awayê hebûna bingehîn a xwezaya civakî ye. Tevahiya dîroka şaristaniyê ji vê rastiya civakî mirovatî hatiye qutkirin û ev rastî hatiye rizandin, bi serdema modern a kapîtalîzmê mohra xwe lê xistî ev rastiya civakî hatiye parçekirin, bi rizînê re rûbirû hatiye hiştin û anîne ber tinebûnê.

**2-** Wê wextê berê pêşî divê ev hewldanên entelektuel, xebatên li ser zanîn û zanistê armanca xwe rawestandina vê rêveçûnê bin. Ji ber ku tiştêkî hatibe tinekirin zanista wî nabe. Belkî bîranîna wî bibe, lê bîranîn jî zanist nîne. Zanist bi ya heyî bi ya dijî re têkildar e. Civaka di vê rewşê de eger naxwaze bi tevahî tine bibe, divê li dijî modernîteya kapîtalîst tevî hemû hêmanên xwe li ber xwe bide. Berxwedan êdî bi hebûnê re li ser heman rê ye, û wekhev e. Weke hemaltî û sermayeya entelektuel ne, eger dixwaze bi rûmeta lêkolînerêkî rastî bijî û li ser piyan bimîne, divê di hemû hewldanên xwe yê

entelektuel de hem li ber xwe bide hem jî divê tevahî hêmanên berxwedanê di asta berxwedanê de bin. Di vê çarçoveyê de hem entelektul hem jî zanista wê berxwedan û têkoşer in. Wekî din, yan xwe xapandin an jî veşartina nasnameya sermayeyê yan hemaltiyê ye.

3- Zanista were pêşdebirin berê pêşî divê weke 'zanista civakî' were bi rêkûpêkirin. Divê zanista civakî weke qralîçeya sereke ya tevahiya zanistan were qebûl kirin. Çi zanistên din ên der barê Xwezaya Yekemîn de (fizîk, astronomî, kîmya, biyolojî) çi jî zanist û zanîn din ên beşerî yên Xwezaya Duyemîn (wêje, felsefe, huner, ekonomî û hwd.) dikarin bi mîsyona pêşengiyê rabin; ev ti carî nikarin bi heqîqetê re têkiliyeke manedar deynin. Eger herdu qad bi zanista civakî re bi awayekî serketî têkiliyê deynin dikarin ji heqîqetê para xwe bigirin.

4- Zanista civakî weke mijara xwe ya sereke civaka exlaqî û polîtîk divê weke objeyekê negire dest, herweha weke dualîteyên navbera wan gelekî hatine vekirin û kûr kirin ên fêhm kirinên mirov weke obje-sûbje, em-yên din, ruh-beden, xweda-evd, mirî-zindî jî negire dest, divê bi rêbazêke ji van dualîteyan bihurî jî esas bigire û lêkolîn bike. Cudabûn şewazê jiyanê yê gerdûnê ye, di xwezaya civakê de jî hê bêtir dimeşe û bi nermî, azadî û zêdebûyî heye. Lê mirov vê cudabûnê rabe daxe asta obje-sûbje ya şaristanî û modernîteyê kirine bingehê tevahî avabûnên xwe yên îdeolojîk, ji sedî sed wê ev bihêle ku hem heqîqeta gerdûnê hem jî ya civakî parçe bibe û ji dest bê dayîn.

5- Pozitivîzm di modernîteya Ewrûpayê de derket asta xwe ya herî jor. Felsefeya xwe bi giştî objektîvîzm e ku bi giştî zanist bi taybetî jî zanista civakî li ser wê bilind dibin û ev hê jî bi hemû şiddeta xwe dewam dike. Eger ev pozitivîzm li ser bingeha rexneyan cihê xwe li ser sergovê dîrokê nebûne paradîgmayeke manedar a zanista civakî ango felsefeyêke bi kok a zanista antî-şaristanî pêş nakeve. Zanista navend Ewrûpa, nexasim jî zanista civakî herçiqasî gelekî ji hev parçe bûbin û tehlûke hebe heqîqetê ji dest bidin şert e ku mirov para wan a di heqîqetê de û destketiyên wan fêhm û qebûl bike. Pozitivîzm herçiqasî di rewşa rexnekirinê de be û divê mirov ji wê karibe bibihure jî ewqasî jî divê mirov para wan a heqîqetê qebûl bike. Di lêkolîn û lêgerînên heqîqetê de bi tevahî antî-Ewrûpagirî herî kêr bi qasî tevahî Ewrûpagiriyê dikare rê li encamên neyênî veke.

6- Herçiqasî ev lêkolîn û lêgerînên heqîqetê yên ji wan re postmodernîzm têne gotin pozitivîzmê rexne dikin û zanista civakî ya navend Ewrûpayê red dikin jî ev nêzîkatiyên wan bi hêsanî dikarin bêne lîberalizekirin û weke antî-Ewrûpagiriyê hê bêtir antî-heqîqetgirî ye, bi gewde bibin. Ev lêkolînên postmodern ên ji rewşa bi krîz a zanista civakî sûd werdigirin herçiqasî bi temamî neyên redkirin jî gelekî girîng e ku mirov heta dawiyê bi rexnegirî nêzîk bibe. Perspektîv û rêbaza pozitivîzma modernîst a gerdûnger û li ser xeteke rast a pêşketinê çawa dibe sedema ji rê derketinê, rêbaza xelekwarî ya zêde îzafî ya gelek postmodernîstan jî li heman rêderketinan vekirî ye. Ji bo mirov ber bi bayê yek ji van seriyan nekeve, şert e ku prensîbên bingehîn ên em hewl didin rêz bikin divê baş bêne fêhm kirin û qebûl kirin. Rewşa bi krîz hema hema ji her kesî re li gorî wan rêyêke heqîqetê pêşkêş dike û ji bo vê rewş di cih de ye, di lêgerînên heqîqetê de ev xusus bi serê xwe jî têrê dike ji gelek aliyan ve ji rê derxe, pûç û tewş bike.

Di lêgerîna heqîqetê de rêbaza me ya sereke ne objektîvîzma pozitivîst e, ne jî kirdartiya îzafî ye. Herdu bi xwe jî du rûyên lîberalizmê ne, têra xwe wan tevlîhev kirine û pêşkêşî piyaseyê kirine, bi vî awayî di çêkirina hemaltî û sermayeya entelektuel de enflasyona rêbazê ye ku bi kar tîne. Aliyê herî bi tesîr ê bêhm kankirina heqîqetê ev enflasyona rêbazê ye. Ev jî bi tevlîhev kirina rêbazên objektîv û sîbjektîv dibe û ev jî tê wê maneyê ku hema hema bi qasî serê kesan bereketa rêbazan e. Ev çalakiyek e ku heqîqetê mîna pereyên xurde ji qîmetê dixin û ji lewra girîng e ku mirov bi vê bereket û çirîkbûna rêbazan nexape. Bêguman aliyê rastiyê yê objektîv û sîbjektîv hene. Di tehlîla dawî de zanîn û heqîqet gihiştina hev a dualîteya çavdêr û ya tê çavdêrkirin îfade dikin (Mebesta min hemanbûna wan nîne, zêdetir weke wekhevîbûnê bêne fêhm kirin dikare erênî be). Di vê mijarê de mirov çiqas kûr bibe û biponije ewqasî parên heqîqetê derkhevin holê. Di vê rewşê de ne yê çavdêr sîbjektîv, ne jî yê tê çavdêrkirin obje ye. Di vir de ya dibe ew e, herdu nêzîkî hev dibin, herçiqasî nebin heman tişt jî wekhev dibin. Pêvajoya heqîqet herî zêde dibe, derfet û îmkanên wekhevîbûnê tê bi destxistin. Ez niha hewce nabînim navekî lê bikim û dixwazim mijara rêbazê bi vî awayî bidim naskirin. Bêguman em di ti zeman û mekanî de ji nedîtî ve nayên ku yekeya sereke ya çavdêr û tê çavdêrkirin civaka exlaqî û polîtîk e.

7- Mekanên lêgerînê yên bingehîn di serî de zanîngeh, nabe ku saziyên fermî yên şaristanî û modernîteyê bin. Di dema bihurî û roja me ya îro de desthilatdarkirina zanistê û li saziyên fermî yên dewletê çêkirina wê, kir ku têkiliya wê bi heqîqetê re qut bibe. Eger têkiliya zanistê bi civaka exlaqî û polîtîk re were qut kirin û bikin ku bi kêra civakê neyê, berevajî wê ev were wê maneyê ku di pêşdebirina yekdestdariya mêtinkarî û zordestiya li ser civakê de alîkariyê bike. Çawa ku jin li mala taybet an jî giştî (kerxane) tê girtin rastiya xwe ya azadiyê, heqîqeta xwe ji dest dide, zanist û

entelekteulên li saziyên fermî têne girtin ewqas azadiya xwe, nasnameya xwe ya rastî ji dest didin. Ya divê were fêhmkirin, zanist û entelektueliya dibe desthilatdar ji armanca xwe ya vedîtin û lêgerîna rastiyan civakî qut dibe. Kêm berhemên di asta zanistî û entelektuelî de derdikevin holê, lê ev rewşên îstîsnayî rastiya sereke nikarin biguherin.

**8-** Mekanên lêgerînê yê bingehî di serî de zanîngeh, nabe ku saziyên fermî yê şaristanî û modernîteyê bin. Di dema bihurî û roja me ya îro de desthilatdarkirina zanistê û li saziyên fermî yê dewletê çêkirina wê, kir ku têkiliya wê bi heqîqetê re qut bibe. Eger têkiliya zanistê bi civaka exlaqî û polîtîk re were qutkirin û bikin ku bi kêra civakê neyê, berevajî wê ev were wê maneyê ku di pêşdebirina yekdestdariya mêtinkarî û zordestiya li ser civakê de alîkariyê bike. Çawa ku jin li mala taybet an jî giştî (kerxane) tê girtin rastiya xwe ya azadiyê, heqîqeta xwe ji dest dide, zanist û entelekteulên li saziyên fermî têne girtin ewqas azadiya xwe, nasnameya xwe ya rastî ji dest didin. Ya divê were fêhmkirin, zanist û entelektueliya dibe desthilatdar ji armanca xwe ya vedîtin û lêgerîna rastiyan civakî qut dibe. Kêm berhemên di asta zanistî û entelektuelî de derdikevin holê, lê ev rewşên îstîsnayî rastiya sereke nikarin biguherin.

Zanista civakî ya hewce ye were pêşdebirin, divê van xisletên sereke hûrûkûr bike mijara lêkolîn û lêgerînê, û divê ne pêşketina li ser xeteke rast a gerdûnparêz ne jî îzafiyeta taybet a xelekwarî ya bêserûbinî esas bigire. Di tehlîla dawî de derket holê ku divê li şûna van nêzîkatîyên qalibî yê dogmatîk ên di dîroka şaristanîyê de ji rewakirina danehevên kumulatîf ên sermaye û desthilatdariyê re xizmet dikin, zanista civakî ya rêbaza diyalektîkê ya tineker nîne esas digire were pêşdebirin ku bi mejiyê analîtîk û hisî re ahengê îfade dike û ji qalibên hişk ên sûbjektîv û objektîvî bihurî ye.

Yek ji dersên sereke yê modernîteya demokratîk ji demên bihurî bigire ew e, divê xwe bi şoreşeke rohnîbûnê ya bi kok di zikhev de ava bike. Tevî vê, divê ez yekser destnîşan bikim ku rabihurî niha ye. Herçiqasî em bi temamî behsa rabihuriya civaka exlaqî û polîtîk a şeweyê hebûna bingehî xwezaya civakî ye, nekin jî (lê divê em ji bîr nekin ku nexasim civaka neolîtîk, civaka gund û cotkariyê, koçerî, qebîle, eşîr û cemaetên dînî xisletên xwe yê jiyane bi rik dewam dikin) ji bo nixxê xwe yê di pênc hezar salên dawî de ji aliyê yekdestdariyê daneheva sermaye û desthilatdariyê hatine têkbirin ji nû ve bi dest bixe di asteke şoreşî de afirêneriya zanist û entelektueliyê ya gelekî pêdivî pê heye wê bibe desteka herî mezin. Ji bo ev pêdiviya bivê neyê divê pêk bê, ji her demê zêdetir heyatî û girîng e ku divê em li ser wezîfeyên xwe yê entelektuelî baponijîn, analîz bikin û hewl bidin çareser bikin.